# "HETA EDALET BI CÎ NEYÊ AŞTÎ JÎ ÇÊNABE"

## *PÊPESKIRINÊN MAFÊN JÎYANÊ YÊN LI BAJARÊN KURDAN LI SER ZAROK Û CIWANAN TÊN MEŞANDIN (2000-2015)*

HAFIZA MERKEZİ
HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

DERYA BOZARSLAN
NOÉMI LÉVY-AKSU
ADNAN ÇELİK

**"HETA EDALET BI CÎ NEYÊ AŞTÎ JÎ ÇÊNABE"**

***PÊPESKIRINÊN MAFÊN JÎYANÊ YÊN LI BAJARÊN KURDAN***

***LI SER ZAROK Û CIWANAN TÊN MEŞANDIN***

***(2000-2015)***

**NAVENDA VEBÎR EDALET Û HEQÎQETÊ**
Ömer Avni Mahallesi İnönü Caddesi
Akar Palas No: 14 Kat: 1
Beyoğlu 34427 İstanbul / Türkiye
0212 243 32 27
info@hafiza-merkezi.org
www.hakikatadalethafiza.org

**NIVÎSKAR**
Derya Bozarslan
Noémi Lévy-Aksu
Adnan Çelik

**BERPIRSA QADÊ**
Derya Bozarslan

**WERGERA BO KURDÎ**
Dr. Dilawer Zeraq

**XWENDINA DAWÎ YA DI KURDÎ DE**
Derya Bozarslan

**PÊŞNÛMA**
Ekin Sanaç

**© Weşanên Komeleya Xebatên Heqîqet,**
**Edalet û Vebîrê, 2025**
ISBN: 978-625-95069-3-7

*Navê Raporê, "Heta Edalet Çênebe Aştî Jî Çênabe", di dema xebata qadî de, ji derbirana hevaxêverekî hatiye girtin.

**Ev weşan, di çarçoveya Edalet Sarêj Dike de, bi piştgirîya Yekîtîya Ewropayê û Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftung a Nûnertîya Tirkîyeyê hatiye amadekirin. Berpirsîya naverokê, bi tevayî li ser Navenda Vebîrê ye. Dîtinên Yekîtîya Ewropayê û Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftung a Nûnertîya Tirkîyeyê nade der.**

Avrupa Birliği tarafından finanse edilmektedir

# “HETA EDALET BI CÎ NEYÊ AŞTÎ JÎ ÇÊNABE”

## *PÊPESKIRINÊN MAFÊN JÎYANÊ YÊN LI BAJARÊN KURDAN LI SER ZAROK Û CIWANAN TÊN MEŞANDIN (2000-2015)*

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ
TRUTH JUSTICE MEMORY CENTER
HAFIZA MERKEZİ

**DESTPÊK** 7

**2000-2015: LI BER SÎYA TUNDÎYÊ "ÇI ŞER ÇI JÎ AŞTÎ"** 9

Berfirehbûn û Pircurebûna Qada Giştî ya li Tirkîyeyê 14
Geşbûna Daxwazên Polîtîk ên Li Ser Hîma Mafên Mirovan û Dagera Vebîrê 15
Di Werçerxa Salên 2000'î de Veguherîna Paradîgmatîk a Tevgera Kurdan 16
Krîza Desthilat û Hegemonyayê ya Di Nava Dewletê De 17

**MIJARA VEKOLÎNÊ RÊBAZ Û METODOLOJÎ** 20

**GAVA LÊGERÎN BO EDALETÊ TÊ KIRIN:**
**BER BI RANÊZIKÎYA TEVAHÎGIR VE** 27

Sînor û Giringîya Hiqûqê ya Li Hemberî Pêpeskirinên Mafên Mirovan 28
Gelo Edaleta Cezaker Ji Kîjan Hêlê Ve (Hê Jî) Giring E?
Bicîkirina Gengeşeyê ya Di Kontekstê De 30
Sarêjbûn û Veguherîn: Xeyalkirina Edalet û Aştîyê 33

**ANALÎZA QADÎ** 38

**BEŞA 1'ê - Jîyîn: Azmûnên Zaroktî û Ciwantîyê yên Li Bajarên Kurdan** 39
1) Azmûnên Li Bajaran: Livdarîya Komalî û Polîtîkayên Ewlehîxwaz 40
A) Li Amedê Tundî û Tevgerînên Komalî yên salên 2000'î 40
Avakirina Tirkîyeyê ya Navenda Qada Gelemperî ya Kurdan 41
Bûyerên 28'ê Adara 2006'an: Şêweyê Tundîyê ya Vediguhere 43
B) Li Cizîrê, Li Ber Sîya Tundîyê Azmûnên Zaroktîyê 45
Yahya Menekşe û Zarokên ku Keviran Diavêjin 47
2) Jîyanên Li Ser Sînor: Jîyana Rojane ya Li Ber Sîya Milîtarîzasyonê 49
A) Kovala Tundîyê ya li Geverê Vediguhere 49
B) Li Wanê "Çûyîna bo Mazotê" 51
C) Robozik: Qetlîameke Li Ser Sînor 52

**BEŞA 2'yan - Jîyanên ku Zû Dawî Li Wan Hatiye Anîn:**
**Mirina Bi Zarokî û Ciwanî ya Li Bajarên Kurdan** 55
**1) Hin Nimûneyên Der Heqê Mirin û Kuştinê De** 56
A) Teqînên Mayînan û Teqemenîyan 56
Teqîna Li Gundê Elemûnayê (2003) 57
B) Zarokên ku bi Guleyan Tên Kuştin 58

C) Dînamîkên Komalî yên Mirinên Takekesî:
Cenazeyên ku Cenazeyan Tînin 61
2) Li Pey Mirî: Cenaze, Binaxkirin, Hawarî, Şîngirtin û ya Dûmahîkê 63
A) Ji Mirinê Heta Bi Otopsîyê 64
B) Ji Ber Derîyê Morgan Heta Bi Nobetgirtinên Bo Cenazeyan 66
C) Binaxkirin: Cezayekî ku Li Ser Kuştinê Tê Zêdekirin 68
D) Şîn Danîn: Mala Şînê, Konê Şînê 71
E) Helwesta Dewletê 73

3) Lê paşê! Dijwarîyên Serederîkirina Bi Windakirinê Re 74
A) Jîyanên ku Diguherin 74
B) Zarokên ku Bêbav Mezin Bûn 77
C) Jinên ku Hevjînê Wan Hatine Kuştin 78
D) Girêdana Şîna Hevalên Xwe: Travmayeke Kolektîf 81

BEŞA 3'yan – Lêgerîna bo Edaletê 83
1) Sînorên Têkoşîna bo Hiqûqê 84
A) Kiryar kî ye? Pirsyarîkirina Berpirsîya Dewletê 84
B) Doz Lê Vekirin-Nekarîn Doz Lê Vekin 86
Nepenî: Rapirsînên ku Aqûbeta Wan Nayên Zanîn 86
C) Edaleta Hatî Bêdengkirin: Salonên Dadgehê 88
D) Dozên ku “Nayên Qazanckirin” 90
E) Çerxa Cezanekirinê û DMME 92

2) Edaleteke Çawa: Lêgerîna bo Sarêjbûnê 96
A) Efû û Lêborînxwestin 97
B) Qerebû - Xurome 99
C) Palpiştî 102

3) Bi Bîra Xwe Anîn 104
A) Vebîrên Di Nava Malbatê De 105
B) Bibîranînên Di Qada Gelemperî De 108
C) Bandorên ku Li Ser Xebatên Vebîrê Dikin 113

**BER BI RANÊZIKÎYEKE TEVAHÎGIR VE: DAXWAZ Û AŞOPKIRIN** 116
**LI SER BÎRANÎNA ZAROK Û CIWANÊN KU JÎYANA XWE JI DEST DANE** 120
**ÇAVKANÎ** 138
**BÎYOGRAFÎ** 143

**SPASÎ**

Serê pêşîn em bi minetdarî, li kesûkarên zarok û ciwanên kuştî **spas dikin** ku derîyê xwe, derîyê mala xwe, derîyê dilê xwe, derîyê êşên xwe li me vekirin û qebûl kirin ku bi me re hevdîtinan çêkin.

Di çarçoveya vê vekolînê de koma **Navenda Vebîrê**, **Yasemin Soydan**, **Xemgîn Yusuf Görücü** û **Medzan Nakçî** wekî parçeyekî koma qadê piştgirî û tevkarî li me kir kir; şaxên **Komeleya Mafên Mirovan ên Amed**, **Batman** û **Geverê** alîkarî bi me re kirin da ku em xwe bigihînin hevaxêveran; li Mêrdînê **MEBYA-DER**; li Kerboranê **Abdulaziz Altınkaynak**, li Cizîr û Şirnexê **İdris Özen**; li Geverê, **Caner Dara** û **malbata wî**; li Wanê **Zozan Bor**; li Amedê **Av. Rehşan Bataray**, **Xecê P.**, **Deniz Tekin** û **Metin Bekiroğlu** piştevanî li me kir; **Mahmut Bozarslan**, **Didem Aydemir**, **Volkan Tuncer** û **Semiha Yıldız** wekî rêber û wergêr piştgirî dan me; **Amed Eğitim-Sen**, **Amed Rosa Kadın Derneği (Komeleya Jinan a Rosa)**, **Amed Şehir Tiyatrosu (Şanoya Bajêr a Amedê)**, **Türkiye Gazeteciler Sendikası Diyarbakır Temsilciliği (Nûnertîya Sendîkaya Rojnamegerên Tirkîyeyê ya Şaxa Amedê)**, **Van Aryen Sanat Derneği (Komeleya Hunerê ya Aryen a Wanê)**, **Yüksekova Dem Parti İlçe Örgütü (Partîya DEM'ê ya Rêxistina Bajaroka Geverê)** ku ji bo hevdîtinan piştgirîya şûngehî dan me; **Veli Encü** û **malbata wî** ku alîkarî bi me re kir da ku em forûma malbatî ya Robozikê pêk bînin; ji bo dîmena Robozikê bo **Azad Doğru; Diyarbakır Sanat Merkezi (Navenda Hunerê ya Amedê)-Anadolu Kültür** ku di dema xebata qada pîlotê de, piştgirîya şûngehî da me; û koma **Botan International** di hemû qadan de, digel kelûmelên teknîkî derîyê ofîsên xwe li me vekirin û koma ku hemû hevdîtinên qadê deşîfre kirin û wergerandin; em spasîya xwe li hemûyan dikin.

# DESTPÊK

Ev rapor, encama vekolîna qadî û meydanî ya Navenda Vebîrê ye ku bi sernava *Edalet Sarêj Dike* hatiye kirin û sê sal ajotiye. Vekolan, bi ranêzikîyeke navdîsîplînî, ji bo têgihîştinê, bala xwe bi hûrgerî dibe ser pêpeskirinên mafê jîyanê yên ku di navbera salên 2000-2015'an de li bajarên kurdan hatine bicîanîn. Vekolan, bala xwe dibe ser polîtîkayên ewlehîkirinê yên wê demê û paşperdeya ku rûdanên di warê sîyaset û hiqûqê de teşe dane wan û şêweyên bicîanîna pêpeskirinên ku ketine behsê, dixe navenda xwe. Rapora bi navê *Heta Ku Edalet Pêk Neyê Wê Aştî Jî Çênebe*, pêpeskirinên ku dikevin behsê ji perpektîfeke sosyolojîk û antropolojîk dinirxîne û li ser vegotin û azmûnên mirovên ku pêpeskirinên di warê mafê jîyanê de li wan hatine qewimandin, lêdikole. Rapora bi navê *Hiqûq Li Ber Sîya Ewlehîyê* jî, şêwe û nimûneyên bicîanîna hêzeke kujende yên hêzên ewlekarîyê û helwesta darazê ya li pêşberî pêpeskirinan a di heman qonaxê de çêbûyî, di çarçoveyeke hiqûqî de lêdikole.

Ev xebat wekî berdewama xebatên Navenda Vebîrê ye ku li ser salên 1990'î hatine kirin û sedemên bisînorkirina dema vê xebatê ya di navbera salên 2000-2015'an de, di beşa metodolojîyê ya her du raporan de jî bi kitekit hatine gotin. Giringtira wan ev e; piştî ku di sala 2015'an de pêvajoya çareserîyê bi dawî bû û şer û pevçûnên li bajaran dest pê kir loma jî vê rewşê keys û derfeta xebatên qadê nedida û seqaya polîtîk jî ne guncan bû. Di heman demê de, tevî ku di navbera salên 2000-2015'an de rojev li ser mafên mirovan bû û hin serbestî û pêvajoya aştîyê lidar bû jî, lê dîsa jî pêpeskirinên mafên jîyanê û pêkanînên bicezanekirinê, bi şêweyên cuda, li bajarên kurdan didomiyan; loma jî em wisa difikirin ku ev rêbaz giring e ji bo em karibin rehendên xebatê yên avanîyî yên tundî û newekhevîyê, ku bandorê li demên pêşî û paşîya xwe jî kiriye, têbigihîjin.

Yek ji armanca vê xebatê ew e ku em dixwazin pênaseyên cuda yên edaletê û rehendên cuda yên lêgerînên bo edaletê tên kirin bidin ber gengeşekirinê. Di vî warî de, ev rapor, gazîyekê dike da ku cihêtîya di navbera edaleta cezaker û edaleta sarêjker de heyî were pirsyarîkirin û ji bo ku ji alî takekesî û komalî ve edalet were danîn, hewlê dide ku têbigihîje ka ev ranêzikî dikarin çawa hev temam bikin û bi roleke veguherker rabin. Ev vekolan, di demeke wisa de tê kirin ku asoya edaleta serdema têbihurînê kêm an jî ximamî ye û balpêdanê ji bo giringîya têkoşîna edaleta pirhêlî dike ku teweqên tundîyê û newekhevîyên avanîyî werdigire nava xwe ku hem bandorê li îrorojê hem jî li siberojê dikin; wekî din jî, mijarê di çarçoveya edaleta berfireh û gengeşekirinên li ser aştîyê cîbicî dike.

*“Em, ciwanên ku nû ketine xortanîya xwe, dibû ku em jî wekî hevalên xwe werin kuştin û qetilkirin, dibû ku bermayîyên şer ên ku me digot qey pêlîstok in, di destê me de biteqiyana, dibû ku bombeyên ji balafirên şer dihatin avêtin li me biketana, dibû ku gava me ajelên xwe diçêrandin, me pê li mayînan bikira, dibû ku li malê, gava em di xew de bûn amrazên bizirx em bikirana armanc, dibû ku kûçikên hêzên ewlehîyê li me bihatana sorkirin û êrîşî me bikirana, dibû ku bombeyên gazê li me biketana, dibû ku di sibehekê de bi ser mala me de bigirtana, em bihatana kuştin û çekên giran danîyana ber serê me, tew bi ser de jî, dibû ku em di serdaban de bihatana şewitandin! Lê bi rasthatinî û korfeleqî be jî, em dijîn û roja îro hesabê hemû hevalên xwe yên hatine kuştin, dipirsin.!”*

**Yasemin Soydan, Medzan Nakçi ve Xemgîn Yusuf Görücü**
*Heke Nehatina Kuştin dê Niha Hevalê Me Bûna*

# 2000 - 2015: LI BER SÎYA TUNDÎYÊ “NE ŞER NE JÎ AŞTÎ”

Projeya bi navê *Edalet Sarêj Dike*, di bingeha xwe de, bala xwe bi hûrayî dide ser zarok û ciwanên ku di navbera salên 2000-2015'an de, piştî çalakîyên tundîyê yên ji alî hêzên ewlehîyê ve hatin kirin, mafên jîyanê li wan hatin qewimandin. Ev zarok û ciwan, wekî armanc hatin girtin an jî ji ber milîtarîzasyona şûngehî ya şer hatin kuştin û piştî mirina wan kesûkarên wan dest bi lêgerîna bo edaletê kirin û van yekan li Tirkîyeyê, di nav pêvajoyeke sîyasî ya de rû didan ku mirov dikare wê wekî "ne şer ne jî aştî" pênase bike. Têgihîkirina "ne şer ne jî aştî"/"*ni guerre, ni paix*" (Linhardt&Moreau, 2013; Gayer 2014) ku di lîteratura zanistên sosyal de, pir zêde tê serî tê lêdan, wê rewşê pênase dike ku pevçûnekê bi awayekî geş û yekser berdewam nake lê belê bi çareserîyeke mayende jî bi dawî nabe, loma jî di gerdûneke nedîyar û têper de dimîne. Di vê çarçoveyê de, rewşa pevçûnî bi dawî bûbe an jî ji giranîya xwe ketibe jî, ji ber ku dînamîkên avanînyê û sedemên bingehîn, ên ku şer û pevçûnê xurt dikin, ji navê nehatine windakirin, çêkirina aştîyê nepêkan e; ev yek jî tê wê wateyê ku di ser de mirina mirovan, gelek rewşên kujende berdewam dikin.

Rewşeke wisa ya mayîna di navberê de ye ku ne şer dibe serdest ne jî aştî dibe sazîyî. Ji alî watedarkirina dema di navbera salên 2000-2015'an de ku çarçoveya demî ya projeya *Edalet Sarêj Dike* ye, referanseke giring derpêş dike. Li Tirkîyeyê, dema bi qasî pazdeh salan ku dikeve behsê, navdemeke wisa ye ku hem tê de bandora giran a polîtîk û komalî ya salên 1990'î berdewam dike; hem jî di heman demê de, kirdewarîyên sîyasî yên nû, daxwazên mafên kolektîfê û aşopkirinên komalî yên ji bo aştîyê, digel hev, aj didin. Ev dem, wekî demeke têbihurînê tê nirxandin ku êdî statukoya dewleta avakar di gelek rûxaran de dest bi maşînê kiriye, lê belê hê ev veguherîna avanîyî nehatiye bidawîkirin, loma jî, dînamîkên di nav hev de bi nakok, digel hev xwe heyî dikin.

Ji alî gelek vekoleran ve hatiye destnîşankirin ku ji avabûna wê heta niha, li Komara Tirkîyeyê, rewşa ne asayî ya li li bajarên kurdan ne wekî *neasayî*yekê lê wekî *rêzik*ekê ye (Has, 2023: 435-444). Her wiha, dema ku ji destpêka Komarê heta bi sala 2002'yan ku rewşa neasayî hat betalkirin, beşeke mezin a rejîma Komarê bi rêbazên birêvebirina awarteyî yên wekî birêvebirina leşkerî, mifetişîya umûmî û bi rewşa neasayî teşe girtiye. Di vê çarçoveyê de, serdema ku dema vekolîna me ye, ji alî dîrokê ve awarteyî ye. Serdema ji sala 2002'yan heta bi 2015'an ku rewşa neasayî hat betalkirin, ew dema nadir e ku li bajarên kurdan birêvebirina neasayî çênebûye. Serdemeke awarte ya wekî vê serdemê, di dîroka Komarê de, tenê di destpêka salên 1950'yî û heta bi salên 1978'an çêbûye; lê belê, ji ber ku di vê serdemê de du derbeyên leşkerî çêbûne, dem bi dem rejîma birêvebirina leşkerî hatiye bicîanîn. Bi kurtayî, ev navdemîya "ne şer ne jî aştî"yê, di dîroka Komara Tirkîyeyê de, nîşan bi azmûnekê dike ku bi parantezê ji rejîma Rewşa Awarte cuda dibe.

Ji ber vê yekê jî, em çarçoveya dîrokî ya vê vekolînê ji salên 2000'î didin destpêkirin û di navîna sala 2015'an de, bi bidawîbûna pêvajoya aştîyê, dawî lê tînin (2000-2015). A rast, pêkan e ku mirov vê serdemê wekî şerê pir ne giran ê di rejîma rewşa awarteyê de ku di

salên 1990'î de qewimî, wekî giranbûna şer a piştî salên 2015 û 2016'an de ku arîşeya kurdan ji nû ve hat ewlehîdarkirin û wekî serdemeke dawestînê binirxîne. Helbet em nikarin bêjin, di vê serdemê de, berdewamîyên bingehînê ên wekî tundîya dewletê, pêpeskirina mafan û nijadperestîya avanîyî hatin birîn, lê belê, divê mirov bêje, li gorî salên 1990'î û van deh salên dawîyê, qada giştî li leha *gelemperên dij-jêrdest*[1] (Fraser, 1990) berfirehtir bûye. Her çend di nava xwe de demên cuda û şêweyên bibîranînê yên cuda dihewîne jî, di vê serdemê de ku navdemeke wisa derdibire ku dîrok tê de lez girtiye, azmûneke wisa çêbû ku asoyên bendewarîyê yên grûbên komalî yên bindest ên li Tirkîyeyê berfirehtir bûn û wan karibû dengê xwe bigihînin qada giştî ya serdest an jî karibû gelemperîbûna xwe li vê qadê bisepînin.

Ev navdemî (2000-2015), di mîxwera arîşeya kurdan de jî serdemeke giring a wisa derdibire ku tê de veguherîn û qurifînên pir bingehîn çêbûne. Bi taybetî, di wê pêvajoyê de ku bi girtina serokê Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) Abdullah Öcalan, ya di sala 1999'an de dest pê kir û heta bi sala 2004'an domand; di vê navdemê de gelek pêşketinên giring çêbûn: Li ser cezayê bidarvekirinê gengeşe hatin kirin, Öcalan ji bo paşvekişîn û agirbestê li endamên PKK'ê bangewazî kir, dijberî di nava PKK'ê de çêbûn û ji hev parçe bûn, PKK'ê xwe fesh kir û Kongreya Demokrasî û Azadîya Kurdistanê (KADEK) ava bû û di pey re jî Kongreya Gel (KONGRA-GEL) ava bû û Öcalan der heqê çareserîya demokratîk a arîşeya kurdan de paradîgmayeke nû bi pêş xist. Piştî ku di Pûşpera 2004'an de PKK'ê biryar girt ku ji nû ve dest bi têkoşîna çekdarîyê bike, pêvajoya ketî behsê bi dawî bû. Ev serdem, ne tenê di asta rêxistinî de, di heman demê de, di şêweyê nirxandina arîşeya kurdan de jî nîşan bi qonaxekê wisa dike ku veguherîneke bingehîn çêbûn tê de. Di bêjar û stratejîyên der heqê mijarê de, hem ji alî kurdan hem jî ji alî dewletê ve guherînên giring didin der û tê dîtin ku dînamîkên wêdetirî-neteweyê û yên kurewî, roj bi roj, xuyanîtir dibin û bandorê li pêvajoyê dikin.

Heke em demên agirbestê yên demkurt û yekalî yên di nîveka salên 1990'î de hatin daxuyandin, nehesibînin, li Tirkîyeyê, serdema ku tê de şer û pevçûn çênebû û herî zêde mizakere hatin kirin, navbera salên 1999-2015'an bû. A yekem, piştî ku Öcalan hat girtin, di navbera salên 1999-2004'an de, PKK'ê bi awayekî yekalî agirbest daxuyand û vekişîya derveyî sînorên Tirkîyeyê; di vê demê de, dewleta Tirkîyeyê ji bo aştîyê tu hewlekê neda der. A duyem, hevdîtinên li Osloyê (2007-2011), wekî pêvajoya mizakerekirina Tirkîye û PKK'ê ya herî berfireh û giştgir di dîrokê de cî da xwe. A sêyem, di navbera salên 2013-2015'an de, pêvajoya aştî û çareserîyê çêbû ku her du alî jî bi belêndanên xurt dimeşand û di 28'ê Sibata 2015'an de bi Mitebeqata Dolmbahçeyê berbiçavtir bû. Lê belê di vê pêvajoya

[1] Em vê têgihê ji Nancy Fraser deyn digirin. Li gorî Fraser, gelemperên dij-jêrdest, ew qadên bêjarî ne ku bi awayekî paralelî qadên giştî yên fermî bi pêş dikevin û "ji bo ku şiroveyên dijber ên zanav, berjewendî û hewcetîyên endamên grûba komalî yên pêgirtîkirî formule bike, dijbêjar îcad dikin û berbelav dikin." (Fraser, 1990: 56-80).

bi qasî 16 salan de, her çend ne bi qasî salên 1990'î be jî, di salên navbera 2005-2007'an û 2011-2013'an de çalakîyên çekdarî yên PKK'ê zêdetir bûn.

Berî ku em berê xwe bidin gengeşekirina paşperdeya gelemperî û puxteker, bi naverok û navdemîya projeya vekolîna me ve girêdayî, divê em behsa çend dîyardeyên bingehîn bikin ku divê di mîxwera arîşeya kurdan de li ber çavan werin danîn.

Ji wan, a yekem, hem koma hiqûqê di çarçoveya projeyê de xebitî hem jî koma qadê der heqê zarok û ciwanên de ku jîyana xwe ji dest dane, ji çavkanîyên cur bi cur daneyên hiqûqî, demografîk, cografî û sosyolojîk dan hev û hat dîtin ku pêpeskirinên mafê jîyanê rasterast mîrateya "şerê ne giran" e ku di salên 1990'î de qewimiye. Teqînên mayînan ên li deverên çolterî û derbajaran de çêbûne, digel takekesên ku ji ber bermayîyên/mihîmatên leşkerî an jî ji ber operasyonên ewlehîyê jîyana xwe ji dest dane, di qadên bajarî de, bûyerên ku ji ber lêqelibîna amrazên bizirx û ji ber ku di çalakîyên protestokirinê de hêzên ewlekarîyê takekes kirine armanca xwe jî wekî bandorên berdewam ên serdema bi şer û pevçûn tê pêşîya me. Bi taybetî li qad û deverên çolterî û derbajaran, mayîn û mihîmat li derdorê hatin danîn, di salên 1990'î de, ev dever pir zêde hatin milîtarîzekirin û qadên berfireh mîna qadên ku ketina wan qedexe ye hatin daxuyandin; û ev hemû rasterast bi hev ve eleqedar in. Her wiha, li navenda bajaran bikaranîna amrazên bizirx zêdetir bû û çalakîyên protestokirinê jî bi awayekî sîstematîk hatin tepisandin û ev yek jî, bi rêjeyeke mezin, bi gelheya/şênîya sivîl ve tê eleqedarkirin ku di salên 1990'î de bi kotekî ji warên xwe hatin vederkirin û ew bêgav hêlan ku koçî bajaran bikin. Di vê çarçoveyê de, pêpeskirinên mafê jîyanê ku çêdibûn, divê ne wekî bûyerên soba; berevajîya wê, divê wekî dûmahîka dînamîkên pevçûnê werin nirxandin ku di salên 1990'î de teşe girtin û heta bi roja îro hatin veguhastin.

A duyem, ev pêpeskirinên mafê jîyanê ne tenê wekî bûyerên soba, takekesî an jî rasthatinî; lê divê wekî encama berfirehtir a pêvajoyên dîrokî û avanîyî ya bi arîşeya kurdan re eleqedar were nirxandin. Ji hêlekê ve jî, jêderka van pêpeskirinan li ser polîtîkaya bêmirovhêlan û milîtarîzekirina şûngehê ye ku dewletê di salên 1990'î û di çarçoveya stratejîya şerê kontrgerîla de -di demeke pêştir de jî ku li herêmên sînor bi teqînên mayînan jî çêdibû- ew bi pêş xist. Di vê çarçoveyê de, pêkanînên wekî avakirina qereqolan, lêgerîna berdewamî ya tîmên mobîl, danîna mayînan û hêlana mihîmata leşkerî ya li pey xwe; ji bo ku şûngeha çolterî ji bo sivîlan bibe cîyê ku lê jîyan ne pêkan e, wekî amraz tên bikaranîn. Ji hêla din ve, bi taybetî ji salên 2000'î û şûnde, stratejîyên li dijî çalakîyên xwenîşandan û protestokirinê yên ku li navenda bajaran çêdibin jî, milîtarîzasyona şûngeha bajarî kûrtir dike. Dorgirtina bajaran a bi amrazên bizirx, ji bo tepisandina xwenîşandanan pejirandina tundî û mentîqa leşkerî ya wekî rêbaza pêşî; di dirêjeya salên di navbera 2000-2015'an û di warê pêpeskirinên mafê jîyanê yên di şûngehên cuda de, wekî yek ji sedemên bingehîn didin der. Ji ber hindê jî, divê were dîtin ku ev pêpeskirin; hem di asta çolterî hem jî di asta bajarî de, parçeyekî

stratejîya dewletê ya demdirêj e ku bi rêya polîtîkayên şûngehî teşe girtiye û di heman demê de jî, encama ranêzikîyên ewlehîxwaz e ku ji bo tepisandina dijberîya komalî û daxwazên sivîl hatine bikaranîn.

Wekî dawî, serdema vekolînê; navdemîya ku mirov dikare wê, bi kurtayî, wekî “ne şer ne jî aştî” bi nav û pênase bike, berevajîya du deh salên ku berîya vê serdemê û piştî wê şer giran û rûxîner bû, ne tenê li cografyaya kurdan, di tevahîya Tirkîyeyê de jî, pêvajoyeke wisa dînamîk dinimîne ku dijberîya komalî ji nû ve xwe birêxistin kir û daxwazên sosyal û alternatîf ji nû ve aj da. Di vê çarçoveyê de, giring e ku mirov ji vê hêlê ve zemîna sosyo-polîtîk binirxîne ku pêpeskirinên mafê jîyanê li ser zarok û ciwanan hatin bicîanîn. Ji ber ku her wekî ku wê di beşên raporê yên dûmahîkê de jî were dîtin, xebatên vebîrê yên der heqê van zarok û ciwanên jîyana xwe jidestdayî de hatine kirin, rasterast bi karaktera resen a serdema ketî behsê ve eleqedar e. Ev hilberandina vebîrê, ne tenê şahidîya borîrojê, di heman demê de, di warê avakirina vebîra komalî de jî, dînamîkên resen yên vê serdemê dide der.

Gelek bûyerên ku di serdema ketî behsê de qewimîne, hem di pêvajoyên hiqûqî hem jî di vebîra komalî de cîyekî wan ê xurt çêbûye û di çarçoveya vê vekolanê de ku me behs jê kir, pêk hatine. Her wekî em ê di rûpelên dûmahîkê yên raporê de jî bi hûrgilî li ser bisekinin, em dikarin digel bûyerên ku ji yekê zêdetir mirov jîyana xwe ji dest daye (wekî mînak di sala 2006’an de, xwenîşandanên li Amedê çêbûn û wekî bûyerên 28’ê Adarê tên zanîn an jî qetlîama Robozikê ku di 28’ê Berfanbara 2011’an de hat kirin), bûyerên dîtir ên bi sedan jî ku kuştin wekî takekesî çêbûne (wekî mînak; Uğur Kaymaz, Ceylan Önkol, Aydın Erdem û hwd.), wekî mînak bêjin.

Mijareke din jî, gava em serdema ku vekolan li xwe dike dema bingehîn analîz dikin, divê em bizanibin ne tenê kontekstên deverî û neteweyî, di heman demê de, dînamîkên herêmî û kurewî jî bi roleke dîyarker rabûne. Bi taybetî jî, gava mirov ji mîxwera arîşeya kurdan bala xwe didiyê, bandora van kontekstên pirteweqî xuyanîtir dibe. Di vê çarçoveyê de, di serî de êrîşa ku di 11’ê Îlona 2001’ê de li Dewletên Yekbûyî yên Emerîqayê (DYE) û li dijî Barûyên Cotik hat kirin û di pey re jî, giringîya bandorên doktrîna “têkoşîna bi terorê re” ku bi pêşengîya DYE’yê û di asta kurewî de hat pêkanîn, zede û mezin e. Balkêş e ku di vê serdemê de, Îraq ji alî DYE’yê ve hat dagirkirin, lîstên “rêxistinên terorê” ji nû ve hatin duristkirin û Tirkîyeyê bi bêjara “têkoşîna li dijî terorê”, stratejîya xwe ya çareserkirina arîşeya kurdan bi rêbazên ne demokratîk danî û hewl da ku vê stratejîya xwe di qada navneteweyî de rewa û meşrû bike. Wekî din jî, dînamîkên wekî; pêvajoya endamîya Tirkîyeyê ya ji bo Yekîtîya Ewropayê (YE), feraseta polîtîkaya derveyî ya li ser neo-Osmanî ya firehbûnxwaz ku bi serokatîya Erdoğan xuyanîtir bû û entegrabûna bilez a Tirkîyeyê ya li bazara neolîberal, hem di polîtîkaya navxweyî hem jî di hevkêşên hêzên herêmî de wekî faktorên dîyarker bi pêş de tên.

Me serdem; bi girtina Abdullah Öcalan a di sala 1999'an de da destpêkirin û bi bidawîbûna pêvajoya aştîyê ya di navîna sala 2015'an de, bi dawî kir û ji bo ku em karibin paşperdeya vê serdemê têbigihîjin, em dikarin behsa çend mîxwerên bingehîn bikin:

## Berfirehbûn û Pircurebûna Qada Giştî ya li Tirkîyeyê

Destpêka salên 2000'î, ya ku xwe dispêre azmûnên têkoşîna komalî ya bi dayîna berdêlên giran ên di salên 1980'yî û 1990'î de hatî kirin; bû şahid ji bo wê pêvajoya ku îdeolojîya fermî ya dewleta Tirkîyeyê ew bi xetên sor dîyar kiribû û qada giştî ya serdest ji bo xêra alternatîfên polîtîk ên nû, berfirehtir û pircure dibû. Ev rewşa nû ku tê de vegotina neteweyî ya fermî ya serwerîxwaz a Tirk-Sunî dihat pirsyarîkirin û dimaşîya, li ser hevbirîna dînamîkên kurewî, herêmî û neteweyî çêbû. Di vê serdemê de, PKK'ê têkoşîna çekdarîyê li azîyê hişt, piştî demeke dirêj Birêvebirina Rewşa Awarte hat betalkirin, pêvajoyên mizakerekirinê û endamîya bo YE'yê lez girt, pozîsyona Partîya Edalet û Bipêşketinê (AKP) ku dikaribû ji bo guherînê zorûzextê li statukoyê bike û hêvîya ku dihat kirin wê Tirkîye ji krîza ekonomîk a di sala 2001'ê de destpêkirî pak bibe; ev hemû bûn sedem ku li Tirkîyeyê, statuko di qada giştî de were pirsyarîkirin û gengeşeyeke pir dînamîk were destpêkirin. Digel vê gengeşeyê, qada civaka sivîl berfirehtir bû, li hemberî vegotina dewleta neteweyî ya Tirk-Sunî ya serdest derfetên hilberandina zanînê û hînbûnê zêdetir bûn, qadên xwegihandina bo zanîna dîjîtal û medyaya sosyal pirtir bûn û digel wê jî tevgerên komalî yên nû rabûn (Tevgera Kurdan, tevgera Îslamîst, tevgera femînîst, tevgera hawîrdorî) û wekî encama vê yekê jî *gelemperên dij-jêrdest* derketin holê.

Di wê serdemê de ku ji destpêka salên 2000'î heta bi 2015'an dirêjeyê dide xwe, *gelemperên dij-serdest*, di gengeşeyên li ser qada gelemperî ya li Tirkîyeyê de bi roleke dîyarker û veguherîner rabû û têgih, daxwaz û aşopkirinên nû tev li repertuwara têkoşîna sîyasî kir. Vegotina Tirk-Sunî ya li ser hîma yekîtîya neteweyî û tekperest, di aşopkirina komalî de hê jî di navendê de cî dida xwe. Lê belê, bêjareke alternatîf, ya ku cudatî û pircuretîyê ne wekî gefekê, lê berevajîya wê wekî zengînî û erênîbûnê dizanî, dest pê kir di van gelemperên dij-serdest de xuyanîtir bû û ji alî sîyasî ve jî, bi awayekî wisa hat bilêvkirin ku vediguherî ser daxwazên sîyasî. Mirov dikare bêje, di vê veguherînê de, bi taybetî tevgera kurdan, tevgera femînîst û di destpêka salên 2000'î de bi awayekî parçekî be jî tevgerên Îslamî bi bandor bûn. Di warê maşandin û kêmnirxkirina bêjara serdest de, ne tenê van tevgerên komalî; weşanxane, kovar û qadên medyaya alternatîf jî, ji alî hilberandin û belavbûna agahîya rexnegir ve kargînên giring hilgirtin û wan tevkarî li pirsyarîkirina vegotina hegemonîk kir.

## Geşbûna Daxwazên Polîtîk ên Li Ser Hîma Mafên Mirovan û Dagera Vebîrê

Digel bidawîbûna Şerê Sar, geşbûna demokrasîyên lîberal ku dawîya dîrokê daxuyand û di serî de Holokost, dîktatorîyên li Emerîqaya Başûr û şerê li welatên Balkanan, xebatên vebîrê, yên ku bala xwe bi hûrgerî dibirin ser azmûnên tundîyê yên ji hev cuda, derketin holê û vê yekê kir ku di asta kurewî de zemînek çêbibe û bêjara edalet û demokrasîyê ya li ser hîma mafên mirovan bibe çarçoveya referansa bingehîn. Bêjara sîyasî ya li ser hîma mafên mirovan ku ji salên 1990'î û şûnde lez girt û di vê kontekstê de, çarçoveyên hiqûqî yên wekî "sûcên li dijî mirovahîyê hatine kirin" ku ji bo rarûbûna bi borîrojê re tê bikaranîn, di vê paradîgmaya bibîrxistinê de, tevkarî lê kir da ku eleqedarî ji bo şahidîya takekesî zêdetir bibin û şahid wekî fîgurekî gelemperî derkeve pêş û xuyanî bike. Di vê demê de, mexdûran jî dest pê kir û wekî şahid axivîn û vebîr jî, wekî cureyekî "cebilxaneya şahidîyê" binirx û biqîmet bû.

Digel dînamîkên kurewî ku bi Holokostê dest pê dike û bi taybetî jî, piştî bidawîbûna Şerê Sar, birêvebirên cuntaya leşkerî yên li Rojhilatê Ewropayê û welatên bloga Sovyetê yên berê û  pêvajoya "dagera vebîrê" (Sezer & Çelik, 2021) ya kurewî ku li Emerîqaya Latîn tê dîtin, qada civaka sivîl a li ser hîma mafan bi pêş ket ku paralelî reformên qanûnî û demokratîk e ku Tirkîyeyê di çarçoveya endamtîya YE'yê de ew çêkirin û bi polîtîkayên pirçandî yên YE'yê ve bûn yek û di serî de kurd, pêşîya grûbên bindest yên li Tirkîyeyê vekir da ku karibin bêjarên xwe yên sîyasî û daxwazên xwe yên ku di *qadên gelemperî yên jêrdest* de bi pêş xistine bi awayekî aşkere derbibirin.

Wekî dawî, lêgerînên nû yên ku serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ku piştî girtina xwe ya di sala 1999'an de da destpêkirin û hewlên ku ji bo veavakirina perspektîfa sîyasî ya tevgera kurdan a li ser hîma demokrasîya radîkal dihatin dayîn, li ser xeta "komara demokratîk", aşopkirina Tirkîyeyeke dîtir, a ku wê hemû zanavên cuda yên li welêt karibin di mercên wekhev de û bi hev re bijîn, anî rojevê. Ev aşopkirin, di peyzaja vebîrê de, ya ku di ser repertuwarên bibîranîn û bibîrxistinê re teşe da xwe, bû hêmaneke dîyarker.

Her wiha, digel bandora vê paşperdeyê, li Tirkîyeyê, lêgerîna bo mafên mirovan ên di qadên sivîl de û lêgerînên ji bo demokrasîyê hevalbendî li hev kirin û bêjara mafên mirovan ku ji navîna salên 1990'î û şûnde hat bilêvkirin, ji salên destpêkî yên sala 2000'î û şûnde veguherî ser çarçoveya referansa bizava bingehîn û *xebata vebîrê*[2] jî di nava vê kontekstê de aj da û geşe da xwe. Di vê pêvajoyê de, vebîrên dijber; ên grûbên bindest ên ji hev cuda ku ew di *qadên gelemperî yên jêrdest* de bi pêş xistin, bi rêya "rabûna agahîyên hatî pêgirkirin" (Foucault, 1997) di qada gelemperî de xuyanîtir bû.

[2] Em bi têgiha xebata vebîrê, hemû destpêkerîyên madî, sembolîk û axlaqî tînin bîrê (refere dikin) ku li xwe dike armanc ji bêedaletîyên dîrokî yên borîrojê hesabê bixwaze ku bandorên wan roja îro jî berdewam dike.

Vê bêjara mafên mirovan û vegera vebîrê, li Tirkîyeyê, qadeke kirdewarîyê ya heta tu bêjî bes dînamîk jî afirand ku hewldana hesabxwestin û rarûbûna bi gelek borîrojan re û lêgerîna edaletê jî di xwe de dihewîne. Ev qada ku bi rêya merasîmên bibîranînê, projeyên dîroka devkî û şahidîyê, pêşane, pirtûk, fîlmên sînemayê, panel û konferansan berfirehtir dibû, bû awêneyek ku ji perspektîfên cuda ronî dida ser dîroka tundîyê ya Tirkîyeyê û di *qadên gelemperî yên jêrdest* de tevkarî li çêbûna vebîreke xurt a civakî kir (Sezer & Çelik, 2021).

## Di werçerxa salên 2000'î de Veguherîna Paradîgmatîk a Tevgera Kurdan

Yek ji werçerxa herî giring a di salên 2000'î de ew e ku piştî ku Abdullah Öcalan di sala 1999'an de hat girtin heta bi sala 2004'an, tevgera kurdan ket nav krîzeke kûr û di pey vê krîzê re, bi veguherîna paradîgmayê ku bi piranî li ser çarçoveya teorîk a ku Öcalan danî rastê bi pêş ket, bi lezeke hêjayî gotinê xwe bi ser hev da. Tevgera kurdan, li dor paradîgmaya ku Öcalan bi navê "konfederalîzma demokratîk" bi pêş xist, careke din jî xwe birêxistin kir; dev ji armanca xwe ya avakirina dewleteke Kurdistanê ya serbixwe berda û berê xwe da fikira komara demokratîk ku wê kurd û tirk û komikên etnîk û dînî yên din, karibin li Tirkîyeyê, li ser hîma hevwelatîyên wekhev, digel hev bijîn.

Vê ranêzikîyê, ji hêlekê ve kir ku nêrîneke rexnegir ji bo pratîkên tekperest û homojenker ên netewedewletê bi pêş bikeve; û ji hêla din ve jî, feraseta "neteweya demokratîk" ya piranîparêz parast ku li ser hîma demokratîk xwe birêxistin kiribû û cudahî wekî zengînî qebûl dikirin. Ev paradîgma li ser aşopkirineke sîyasî û li ser bingeha bihevrejîyanê hatibû danîn ku wê kurd di demeke kurt û navincî de, di nava sînorên netewedewletên ku tê de dijîyan, bi hev re bijîyana û di heman demê de jî, di nava van dewletan de, li ser hîma xweserîya demokratîk bibûna xweyî statuyekê û wê di demeke dirêj de jî, hevbandorîya gelê kurd ê di çar parçeyan de dijîya, zêdetir bibûya û ew ê jî di avanîyeke konfederal de bijîyana. Tevgera kurd ku li dor vê paradîgmaya nû ji nû ve teşe da xwe, ji sala 2004'an û şûnde bandora xwe ya di qada sîyaseta qanûnî de zêdetir kir.

Di vê pêvajoyê de, tevgera sîyasî ya kurdan ne tenê li Tirkîyeyê, di heman demê de ki Îranê, li Îraqê û li Sûrî jî bihêztir bû. Vê tevgera sîyasî, di heman demê de, di qada sîyaseta legal de, bi taybetî di ser birêvebirinên cihkî, di ser rêxistinên civaka sivîl û di ser çalakîyên li kolanan re, pir zû zemîn û bingeheke civakî pêk anî. Digel partîyên sîyasî ku bi perspektîfa "Komara Demokratîk" tevdigerîyan, wekî amrazên civakîkirina vê paradîgmaya nû, di sala 2007'an de, Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û di sala 2011'an de jî, Kongreya Demokratîk a Gelan (KDG) hat avakirin. Bizava jinan, a ciwanan û ya ekolojîyê, di mîxwera vê paradîgmaya nû de, xwe ji nû ve birêxistin kir û bi awayekî xurt xwe kir sazîyî. Herçî geşedanên di warên çand, huner, ziman û wêjeyê de ne, wekî afirandina ronesansekê da der.

Wekî encama jişûnkirinên bi bi darê zorê yên di salên 1990'î de qewimîn, li navendên bajarên ku gelheya kurdan lê zêdetir in û li metropolên rojavayê yên wekî Mêrsîn, Edene, Antalya, Îzmîr û Stenbolê ku pir zêde kurdan koçî wan deran kir, nifşa duyem a kurdan polîtîze bû û ev yek bû sedem ku ji destpêka salên 2000'î û şûnde li bajarên kurdan tevgerek derkeve holê ku ciwanên bajarî -û zarokên kurdan jî- li xwe digirt. Ev tevgera ku di raya giştî ya tirkan de wekî *zarokên ku keviran diavêjin* hat şeqilkirin, hem ji alî famkirina ji karakterîstîkên sosyo-demografîk ên salên 2000'î ve hem jî ji alî analîzkirina pêpeskirinên mafên jîyanê yên li ser zarok û ciwanan meşandî ve ku ew zarok û ciwan di navîna vê xebatê de ne, wekî dîyardeyeke giring derket pêş (Toplum ve Kuram Dergisi, 2009). Tevgera zarok-ciwanan ku berîya sala 2010'an, bi taybetî, li bajarên rojavayê yên wekî Mêrsîn û Edeneyê xuya kir, gava sal bû 2015, li gelek bajarên kurdan, xwe xurttir birêxistin kiribû û radîkaltir bûbû (Darıcı & Hakyemez, 2019).

## Krîza Desthilat û Hegemonyayê ya Di Nava Dewletê De

Salên 2000'î, ne tenê bi têkoşîna grûbên jêrdest ên di qadên sîyasî û komalî, di heman demê de, bi têkoşîna desthilatê ya di nava aktorên ku dubendî di nava wan de heye ku di nava "Türklük Sözleşmesi (Peymana Tirkbûnê)" de cî dane xwe û bi krîza hegemonyayê ku li gorî wê çêdibû, teşe girt. Îslama sîyasî, derfetên îdeolojîya senteza Tirk-Îslamê ku piştî derbeya 12'ê Îlona 1980'yî bo wê hat derpêşkirin, li xwe kir zemîn û ji nîveka salên 1990'î û şûnde, her ku çû di qada sîyasî de xurttir bû û bi desthilata AKP'ê (Partîya Edalet û Bipêşketinê) ku di sala 2002'yan de bi hilbijartinê hat ser text, gihîşt werçerxeke giring. Piştî ku AKP'ê bi tena serê xwe desthilat bi dest xist, hevbendîya ku bi Cimaeta Gülen re danîbû -ku cimaetê bi taybetî di nava artêş û perwerdeyê de xwe birêxistin kiribû- dest bi bicîanîna stratejîya jinavêhilanîn û desteserkirina bloga desthilat a Kemalîst-neteweparêz kir.

Di vê serdemê de, hevrikî, dubendî û pevçûna di navbera artêş, dewleta kûr, mafya û çînên serdest de kir ku rewşeke krîzî çêbibe. Li alîyekî bloka Kemalîst a laîk û neteweparêz ku "Tirkîyeya berê" dinimand; li alîyê din jî hevbendîya miletperest, mihafizekar, neolîberal û Îslamîst cî da xwe ku hewl dida "Tirkîyeya nû" ava bike. Li hemberî van her du blogên hegemonîk, bi pêşengîya tevgera kurdan û hêzên dijber ên demokratîk, xeteke sêyem a polîtîk derket holê ku li ser aşopkirina "Tirkîyeya din" teşe digirt (Tekdemir, 2016).

Ev krîza desthilat û hegemonyayê ya di nava dewletê de, tenê di qada giştî de û bi têkoşîna asta bêjarî an jî bi tevlêbûna hilbijartinan bisînorkirî nema; di heman demê de, pêşî li wan qurifînên sîyasî, ekonomîk û îdeolojîk vekir ku çawanîya rejîmê ji binî ve diguherand. Vê qurifînê; di ser pêkanînên neolîberal re û bi arizîkirina milkên gelemperî, bi polîtîkayên ku xwe dispartin rûxandinên ekolojîk û bi kûrtirkirin û zêdetirkirina newekhevîya dahatê ya bi awayekî radîkal, teşe girt. Di heman demê de, di sala 2010'an de, guherînên makeqanûnî yên ku sîstema birêvebirinê vediguherand, hatin kirin û pê re jî, pêvajoyeke otorîterbûnê

dest pê kir ku bi polîtîkayên ewlehîxwaz û bi pratîkên birêvebirinê yên mihafizekar-Îslamparêz hewl dida jîyana rojane bi rêk û pêk bike. Piştî ku di 'Berxwedana Gezi'yê ya di sala 2013'an û di protestoyên Kobanê ya di sala 2014'an de, mafê derbirîn û protestokirinê hat krîmînalîzekirin, ev pêvajo xuyanîtir bû.

AKP, a ku bi rêya hilbijartinan hat ser desthilatê, di dawîya salên 2000'î de, êdî ne tenê ew hikûmet bû ku ji bo guherînên makeqanûnî, bi rêya referanduman razîbûneke komalî hildiberand, digel wê jî, bi piştgirîya 'tevgera Gülen'ê berê xwe da dewletbûnê û pê re jî endîşe û reaksîyona derdorên neteweparêz-Kemalîst a li hemberî vê rewşê xuyanîtir bû. Mixtirayên aşkere an jî veşartî yên artêşê şandî jî têrî nekirin ku vê rewşa nû ku çêdibû bidin rawestandin û Mitîngên Cumhurîyetê ku di vê serdemê de dest pê kirin, bûn mobîlîzasyonên yekem û girseyî yên vê endîşeyê. Di heman demê de, lêgerînên ji bo çareserkirina arîşeya kurdan û stratejîyên ku dixwestin vê arîşeyê bi rêbazên tundîyê bitepisînin û li ser xeta van stratejîyan hewldanên ku dixwestin razîbûna komalî çêkin, bûn mekanîka sereke ya krîza di nava dewletê de.

Wekî encam, her çend pir zêde dem di ser re neçûbe jî, divê mirov serdema pazdeh salî ya di navbera salên 2000-2015'an de, di dîroka Komara Tirkîyeyê de, wekî dema qurifînê ya dîrokî ya xweserî xwe binirxîne. Heke em bidin ser şopa Gramsci, vê momenta "ne şer ne jî aştî" ku ya kevn ji hev vedirêsîya û ya nû jî hê bi temamî nehatibû avakirin; gerdûneke dibetîyan a wisa derpêş kir ku di serî de asoya çareserkirina meseleya kurdan a bi awayekî demokratîk, hemû grûbên bindest ên li Tirkîyeyê, bi awayekî sîyasî, tê de mobîlîze bûn û kirdewarîyên cuda û aşopkirinên polîtîk ên alternatîf teşe girtin. Lê belê, ev rewşa aşkeretîya sîyasî, di dawîyê de, bû armanca otorîterîya Tirk-Sunî ya hegemonîk ku di nava sînorên Peymana Tirkbûnê de teşe dida xwe û ji sala 2015'an û şûnde bi milmilîna jihevşikînên sîyasî re rû bi rû ma.

Digel vê yekê, her çend serdema "ne şer ne jî aştî"yê ya di navbera salên 2000-2015'an de, xweyî taybetîyên arizî xwe be jî, tevî ku bi awayekî îzafî mîna ku xwe bi paş ve dida xuya dikir jî, em ê hin berdewamîyên bingehîn ên ku di dîroka Komara Tirkîyeyê de naguherin, bînin bîra we û bi dawî bikin. Çar hêmanên avanîyî ku tim dubare dibin, polîtîkaya komarê dinimînin ku ji bo komal û grûbên ku ji derveyî "Peymana Tirkbûnê" dimînin, pêk tînin: *tundîya etnîk a pîlankirî* ku ji qirkirinan heta bi polîtîkayên tedîp û tenkîlê û ji pogroman heta bi nijadkujîyan bi form û astên ji hev cuda tên bicîanîn; *nijadperest*îya avanîyî û rojaneyî ku carinan ji Tirkbûn carinan jî ji feraseta zanaveke Îslamîst diqewime; *bicezanekirina* qanûnîkirî ku ji bo sûcên ku li ser navê aqûbeta neteweyî hatibûn kirin û kes û rêxistinên ku sûcdarîya wan hatibû peyitandin, diparast û wekî dawî jî *mandelkirin*a vê tundîyê ya bi awayekî xurt (Çelik, 2025).

Bi tevî van çar pratîkên avanîyî ku domdarîya tundîya dewletê dîyar dikin, serdema di navbera salên 2000-2015'an de, bi me da aşopkirin ku Tirkîyeyeke ku rewşa neasayî tê de

ne *qayde* ye lê *awarte* ye pêkan e û ev yek nîşanî me dide ku bi tevî hin domdarîyan jî hin qurifîn çêdibin an jî herî kêm ev domdarî bi awayekî parçekî bimaşin jî, dîsa jî, tundî bi berdewamî tên hilberandin. Ev tundîya dewletê, ne tenê bi kuştina zarok û ciwanan, di jîyana rojane de, bi pêkanînên hiqûqî û di gelek waran de ku jîyana civakî birêkûpêk dike, xwe hildiberîne. Ev yek jî, ji me re dibêje; di momenta "ne şer ne jî aştî" de ku rewşa neasayî tê de ne *qayde* lê *awarte* ye jî, tundî bêyî ku navberê bide xwe her berdewam dike û digel qurifînan jî, berdewamîyekê di xwe de dihewîne.

# MIJARA VEKOLÎNÊ RÊBAZ Û METODOLOJÎ

Ev rapor, analîza qadî ya projeya bi navê *Edalet Sarêj Dike: Ranêzikîyeke Tevahîgir Li Pêpeskirinên Mafê Jîyanê ya Zarok û Ciwanan* li xwe digire.

Di çarçoveya projeyê de, di ser daneyên heman qadê re, du vekolîn hatin kirin ku hev temam dikirin. Koma Xebatên Vebîr û Aştîyê, di navbera salên 2000-2015'an de, li cografyaya kurdan a Tirkîyeyê, pêpeskirinên mafê jîyanê yên zarok û ciwanan ên ku ji ber tundîya dewletê qewimîn û lêgerîna bo edaletê, bi rehendên wê yên komalî û takekesî dinirxîne; koma hiqûqê jî, di çarçoveyeke hiqûqî û der heqê van pêpeskirinan de pêvajoyên darizandinê û pratîkên cezanekirinê analîz kir. Ev rapor, hem zêdetir analîzeke li ser xebata qadî derpêş dike hem jî daneyên koma hiqûqê li xwe digire ku bi awayekî hevdemî hatine amadekirin.

Armanca bingehîn a vekolînê ew e ku hewl dide nîşan bide ka ev pêpeskirinên mafê jîyanê çawa berdewamî dane xwe û çawa wekî parçeyekî çerxa bicezenekirinê hatine bicîanîn; çîrokên kesên jîyana xwe jidestdayî û lêgerîna bo edaletê yên li pey wan mayî xuyanî bike û bide bihîstin; di heman demê de, vekolîn li xwe dike armanc ku derfet û sînorên perspektîfa edaleta sarêjker ên di gelek qadan de bide ber pirsyarîyan û di asta komalî de bala xwe bibe ser derfetên sarêjkirina birînên kûr ku ji ber tundî û kuştinan/mirinan û van derfetan gengeşe bike.

Di vê çarçoveyê de, me da pey van pirsan: me 15 salên pêşî yên salên 2000'î û salên 1990'î dan ber hev û me xwest em bizanibin, di vê demê de ku "bi awayekî îzafî nermbûnek" tê de xuya dike, pêpeskirinên mafê jîyanê di rewşeke civakî û hiqûqî ya çawa de pêk hat? Şopên ku van pêpeskirinan di vebîra takekesî û komalî de hiştin çi bûn û hêvîyên çawa tê de qurifîn? Roja ku zarokên malbatan jîyana xwe ji dest da û roja di pey wê re, pêvajoyeke çawa çêbû, çi qewimî, dijwarîyên jîyana li dû kesê jîyana xwe jidestdayî çi bûn û çawa hatin watedarkirin? Pêvajoya hiqûqî çawa çêbû? Malbatan, dijwarîyên ku çêbûn, hem ji hêla madî ve hem ji hêla manewî ve, çawa serederî bi wan re kir? Piştî hemû tiştên qewimî, têgihîja edaletê ya malbatan û aşopkirinên wan ên der heqê edalet û siberojê de çawa hatin derbirîn? Zarok û ciwanên ku hatin kuştin kî bûn, çawa dijîyan, bi çi dilxweş dibûn, jîyana wan a rojane çawa bû, eleqeya wan li ser çi bû, têkilîyên wan ên bi malbata xwe re û bi derdorê re çawa bû û taybetîyên wan ên ku pir xweş wan pênase dike, çi bûn?


Me, bi van pirsan, pêvajoya ku di salên destpêkî yên salên 2000'î de dest pê kir û heta bi 28'ê Sibata sala 2015'an ku Mitebeqata Dolmabahçeyê (Çiçek & Coşkun, 2016) bi dawî bû, nirxand. Piştî ku Tirkîye tev li pêvajoya guncandina YE'yê hat kirin, gelek qanûn hatin duristkirin; di vê demê de, "Çareserîya arîşeya kurdan" hat rojevê û bi awayekî îzafî rewşeke bêşer û pevçûn çêbû; û vê yekê çarçoveya demî ya xebata me pêk anî. Piştî tundîya giran a dewletê ya salên 1990'î, serdema di navbera salên 2000-2015'an de ku qonaxeke wisa ye ku bi awayekî îzafî bi bêjarên reform û aştîyê tê pênasekirin; em, wekî Navenda Vebîrê, me ev dem û qonax hilbijart da ku em daynin rastê ka di vê qonaxê de pêpeskirinên mafê jîyanê çawa teşe li xwe guhertiye, polîtîkayên cezanekirinê bi kîjan mekanîzmayan didomin û hêvîya sarêjbûna komalî çima bi cî nayê.

Ji ber ku ne hêsan e mirov li bajarên kurdan, hejmara kesên ku bi midaxaleya hêzên ewlehîyê hatine kuştin, tespît bike; ji ber ku Komeleya Mafên Mirovan (KMM) û Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyeyê (WMMT) bi salan in li ser vê mijarê dixebitin, loma jî rapor, analîza daneyên wan kirî û lêgerînên di çapemenîyê de bûn xala destpêka vê vekolînê. Me di ser van çavkanîyan re, li ser pêpeskirinên mafên jîyanê binkeyeke daneyan a giştgir da hev ku ji ber ku hêzên ewlehîyê hêzeke kujende li hemberî zarok û ciwanan bi cî anîne û zarokan û ciwanan jîyana xwe ji dest dane. Wekî din jî, bûyerên ku di lîstên sazîyan de cî nedigirtin û agahî û daneyên ku me ew di vekolînên qadî de bi dest xistin, bi rêbaza giloka berfê, tev li yên din kirin û me tabloya di destê xwe de berfirehtir kir.

Ev binkeya daneyan bû zemîna hevpar a her du vekolînên paralel ku di çarçoveya projeya *Edalet Sarêj Dike* de dihat meşandin. Koma hiqûqê, ji bo beşeke ji van bûyeran bi parêzeran re hevdîtin çêkirin, dosyeyên dozan lêkola û di ser belgeyên hiqûqî re, raporên cihê amade kirin. Koma qadê jî, bûyerên ku bûne mijarên vê weşînekê, bi kesûkarên kesên ku hatine kuştin re hevdîtinên hûr û kûr kirin û rehendên komalî, dilînî û vebîrî yên pêpeskirinan dahûrand.

Ji binkeya daneyan ku di vê weşînekê de hat bidestveanîn, me 40 bûyerên ku temenê mexdûrên wan di navbera 0-30'yî de ne, xist navenda vekolînê. Di vê çarçoveyê de, me li Amedê 15, li Şirnexê 11, li Culemêrgê 5, li Wanê 4, li Mêrdînê 4 û li Batmanê jî 1 bûyer û bi temamî jî 40 bûyerên pêpeskirina mafê jîyanê lêkola. Zarok û ciwanên ku di van bûyeran de jîyana xwe ji dest dane, 22 zarok (salên wan di navbera 0-18 de ye) û 18 ciwan in (salên wan di navbera 18-30'yî de ye) û 18 hebên wan mêrên ciwan, 18 hebên wan zarokên lawîn û 4 hebên wan jî zarokên keçîn in. Her wekî em ji qada xwe ya windakirinên bi darê zorê dizanin (Kaya & Bozkurt, 2014), li Tirkîyeyê, piranîya mexdûrên pêpeskirinên jîyanê mêr in. Herçî gava bûyerên ku di vê vekolanê de hatine nirxandin, zêdetirî wan zarok û ciwan bin jî, ev yek rewşa heyî naguherîne. Her wiha, xaleke balkêş a vekolanê ev bû ku bûyerên 4 zarokên keçîn ku me lêkola jî, temenê wan ji 18 salîyê kêmtir bû.[3]


## Hejmara Bûyerên ku li Gorî Temenan Hatine Vekolan




[3] Ji ber ku di nav bûyeran de ku me ew vekola, tenê çar zarokên keçîn hebûn û di raporê de ew ên ku sala wan di binîya 18'an de bû statuya wan wekî zarok dihatin qebûlkirin û ji bo ku em mafên wan ên taybet ku ji ber vê statuya wan çêdibûn destnîşan bikin, gava me ev mirov pênase kirin, me derbiranên wekî "zaroka keçîn" û "zarokê lawîn" bi kar anîn.

Di xebata qadî ya ku di navbera Gulana 2023'yan û Gulana 2025'an de hat kirin, li ser 40 bûyerên ku hatin dîyarkirin, bi tevayî 55 hevdîtin hatin kirin. 137 kes tev li van hevdîtinan bûn: 78 kesên wan ji lêzimên nêz bûn, 6 kesên wan ji lêzimên dûr bûn, 53 kesên wan jî ji kesên derdora bandora civakî bûn. 45 hevdîtinan bi rêbaza yek bi yek a kûrûhûr hatiye kirin, pêncên wan wekî hevdîtinên navend-grûp hatine kirin, duduyên ji wan bi malbatan re û wekî forûma bergirtî hatiye kirin. Hemû hevdîtin bi awayekî rû bi rû hatin kirin. Her yek hevdîtinek, bi navekî, di navbera 40 deqe û sê saet û nîvan de berdewam kir. 41 ji hevdîtinan bi Kurdîya Kurmancî, 2 ji wan bi Kurdîya Zazakî, 10 ji wan bi Tirkî, 4 ji wan jî bi awayekî Kurdî û Tirkî di nav hev de hatiye kirin û ji ber ku koma me ya qadî di her du zaravayên Kurdî de zal in hevdîtin bêyî wergerandinê hatine kirin. Berî ku hevdîtin werin kirin, agahî li kesên ku wê hevdîtin pê re were kirin hat dayîn ku wê piştî hevdîtinê agahîyeke bi kitekit û hûrgilî bo wan werin dayîn û destûra hem devkî hem jî nivîskî hatin girtin.

### Hejmara Bûyerên ku li Gorî Bajaran Hatine Vekolan




Di vê vekolînê de, me cografyaya ku gelheya kurdan li wan bajaran zêde ne, kir navendê. Me belavbûna şêweyên kuştinan dan ber çavan û me da ser rêya ku bûyeran nîşanî me dida û heta jê tê me hewl da ku em bala xwe bidin ser azmûnên cuda û bajarên cuda û xwe bigihînin mirovan. Her wiha; me li navenda Batman, Amed, Culemêrg, Mêrdîn, Şirnex û Wanê û li gundên wan xebata qadî kir. Me cografyaya kurdan wekî tevdehîyekê qebûl kir, lê gava dînamîkên bajaran bi xwe em beralî kirin, me li gorî wê teşe da vekolîna xwe. Ji ber ku her çend rêbazên kiryaran diguherî jî, berdewamîya çalakîya kuştinê tu carî nedihat birîn, ji ber hindê, me jî hewl da ku em ne yek bi yek bajaran, lê berdewamîya tundîya ku li vebîra hemû cografyayê hevpar e, xuyanîtir bikin. Li ser vê armancê, me rêbazên vekolana çawanîyî û analîza tematîk bi hev re bi cî anî û me bala xwe bi hûrûkûr bir serê ku em hem ji azmûnên takekesî hem jî ji vebîra civakî fam bikin.

Di vê çarçoveyê de, bi tevayî, em şeş caran çûn Amedê, çar caran çûn Şirnexê, sê caran çûn Mêrdînê û carek jî çûn Batmanê, Wanê û Culemêrgê. Ji ber ku malbat piştî kuştina zarokê wan koçî Mêrsînê kiribû, ji bo ku em pê re hevdîtinê bikin, em carek jî çûn Mêrsînê. Digel bajarokên navendê, em çûn gund û navenda bajarokên Licê, Farqîn, Çêrmûg, Erxenî, Dîcle, Bismil û Pasûrê. Me li bajarokên Mêrdînê, Qoser û Kerboranê, li navenda Batmanê, li navenda Wanê û li bajaroka Çildêranê û li gundên wê, li navenda Geverê û li gundên wê hevdîtin çêkirin. Me ev hevdîtin hemû, bi pêwendîyên cihkî û bi rêya sazîyên civaka sivîl pêk anîn. Bi taybetî, di serî de şaxa KMM (Komeleya Mafên Mirovan) a Amedê, Batmanê û Geverê û li Mêrdînê jî Komeleya Piştevanî û Alîkarîyê ya Bi Malbatên ku Kesûkarên Wan Hatine Kuştin di Dergûşa Şarezayîyan de (KOM-PAMKK) ev pêwendî çêkirin. Digel vê yekê jî, bi taybetî li Amedê, li Şirnexê û li Wanê, parêzvanên mafên mirovan, hiqûqnas û rojnamegerên ku di vî warî de dixebitin, ji bo ku em karibin xwe bigihînin malbatan, hewleke mezin da.

Daneya bingehîn a vekolînê, ji hevdîtinên bi hûrûkûr hat bidestveanîn. Di hevdîtinên ku bi malbatan re hatin kirin, ên ku zarokên wan, hevjinê wan an jî kesûkarên wan hatine kuştin, vegotinên der heqê şîn, vebîr û lêgerîna bo edaletê jî hatin berhevkirin. Wekî pêşînî, pircureyîya beşdaran li ber çavan hat danîn û bi lêzimên herî nêz, dê û bav, xwişk û bira û hevjînên ku ji nifşên cuda ne, hevdîtinên hûrûkûr hatin kirin. Ji bo ku em bandorên navnifşî yên tundîya dewletê têbigihîjin, van şahidîyên takekesî zemîneke giring çêkir. Di hevdîtinên bi malbatan re, bi jinan re, bi taybetî bi wan jinan re ku hevjînê wan hatiye kuştin, bi pirsên hê spesifîk, hevdîtinên cuda hatin kirin.

Di çembera duyan a xeleka hevdîtinan de, bi xizmên ku bi awayekî nerasterast bi kuştîyan re pêwendîdar in, bi der û cîranên wan, bi mamostayên wan û bi hevalên wan ên dibistanê re hevdîtin hatin kirin. Van hevdîtinan alîkarî bi me re kir ku em têbigihîjin ka pratîkên şîngirtin û bibîranînê di asta komalî de bi çi awayî teşe dide xwe. Her wisa, ji bo ku em bala xwe bibin ser bandora van kuştin û windayîyan, me bi aktorên sivîl re, hevdîtinên navend-grûp pêk anîn.

Di çembera sêyan de jî, ji bo ku bandora civakî ya windayîyan/kuştîyan were gengeşekirin hevdîtinên navend-grûp hatin kirin. Me di van hevdîtinan de, bala xwe bi hûrgerî bir ser temayên dîyarkirî û aktorên serdemê anîn cem hev. Me digel rojnamegerên ku di bûyerên civakî de li qadê aktîf dixebitin, digel mamostayên ku di dibistanên zarokan de mamostetîyê dikin, digel hunermendên ku li ser pêpeskirinên mafê jîyanê hilberînê dikin û digel girtîyên jin ku demeke dirêj e girtî ne û şahidên giring ên dîroka tundîyê ne, hevdîtin çêkirin. Bi vî awayî, em ji wêdetirî azmûnên takekesî çûn û me derfet bi dest xist da ku em karibin şopên ku tundîyê di vebîra komalî de dihêle bi awayekî pirteweqî analîz bikin. Ev grûbên navendî, di heman demê de, ji bo ku em karibin ranêzikîyên bo edaletê û daxwazan têbigihîjin, zemîneke giring çêkir.

## QAD | HEVDÎTIN | PEVCIVÎN | FORÛM

1. XEBATA QADÎ
Şirnex | Cizîr
1-2'yê Gulana 2023'yan

2. XEBATA QADÎ
Amed (Navend, Licê, Farqîn, Çêrmûg)
1-6'ê Berfanbara 2023'yan

3. NAVEND-GRÛP | Bi Rojanmegeran Re
Amed
19'ê Sibata 2024'an

4. XEBATA QADÎ
Amed (Navend, Licê, Erxenî, Dîcle), Batman (Navend), Mêrdîn (Qoser, Kerboran)
13'ê Pûşpera 2024'an

5. NAVEND-GRÛP | Bi Mamostayan Re
Amed
13'ê Pûşpera 2024'an

6. XEBATA QADÎ
Amed (Navend, Licê, Bismil)
22-26'ê Pûşpera 2024'an

7. XEBATA QADÎ
Amed (Pasûr), Şirnex (Navend, Cizîr)
26'ê Tîrmehê û 5'ê Tebaxa 2024'an

8. FORÛMA MALBATÊ
Amed
4'ê Tebaxa 2024'an

9. XEBATA QADÎ
Mêrdîn (Qoser)
4'ê Cotmeha 2024'an

10. PANEL: Zarok û Travma Di Konteksta Edaleta Sarêjker De
Mêrdîn
5'ê Cotmeha 2024'an

11. SEMPOZYÛM: Ranêzikîyên Edaleta Sarêjker ên Li Ser Pevçûn û Pêpeskirinên Mafên Mirovanı
Stenbol
15-16'ê Mijdara 2024'an

12. XEBATA QADÎ
Şirnex (Qilaban, Robozik), Mêrsîn (Navend)
19-22'yê Berfanbara 2024'an

13. FORÛMA MALBATÊ
Şirnex (Robozik)
22'yê Berfanbara 2024'an

14. NAVEND-GRÛP | Bi Hunermendan Re
Amed
10'ê Rêbendana 2025'an

15. XEBATA QADÎ
Şirnex (Cizîr, Qilaban)
13-15'ê Sibata 2025'an

16. NAVEND-GRÛP | Bi Ciwanan Re
Şirnex | Cizîr
14'ê Sibata 2025'an

17. NAVEND-GRÛP | Bi Girtîyên Jin ên 30 Sal Di Hepsê De Mayî Re
Amed
21'ê Sibata 2025'an

18. XEBATA QADÎ
Wan (Navend, Çildêran), Culemêrg (Gever)
23-30'yê Nîsana 2025'an

19. FORÛMA MALBATÊ
Amed
22'yê Mijdara 2025'an

Bi tevî hevdîtinan, girteyên dadgehê, raporên mafên mirovan, lêgerînên di çapemenîyê de û çavdêrîyên qadê jî tev li vekolanê hatin kirin. Wekî din jî, ji bo ku were dîtin ka gelo bandorên civakî yên van bûyeran çawa li vebîrê reng vedide, xebatên hunerî yên li ser vebîrê jî hatin lêkolan. Xebatên vebîrkirinê yên ku ji bo zarokên kuştî hatine kirin jî bûn navendeke giring. Beryadên ku ji bo zarokên kuştî hatine kirin, berhemên hunerî û pirtûk hatine lêkolan; û ev berhem, di hevdîtinên ku bi malbatan re hatin kirin jî wekî pirsên gengeşekirin û bibîranînê hatin bikaranîn. Vê ranêzikîyê, li xwe kir armanc ku hevgirêdana di navbera vegotinên takekesî û vebîra civakî de heyî, xuyanîtir bibe.

Hemû deşîfrasyona hevdîtinan, bi awayekî manuel, ji alî kesên profesyonel ve hatin kirin. Hevdîtinên Kurdî (Kurmancî û Zazakî) bo Tirkî hatin wergerandin; di pey re jî, bi rêbaza analîza tematîk, dane hatin kodkirin; temayên bingehîn û temayên jêrîn hatin destnîşankirin û piştî pêşanalîzan, nirxandineke hevberî û giştgir hat kirin. Di vê pêvajoyê de, bi saya ranêzikîya hevberkirinê ya di navbera bajaran de, azmûnên resen ên her herêmê û pratîkên lêgerîna bo edaleta hevpar, digel hev hatin xuyanîkirin. Her wiha, vekolînê, ne tenê bûyerên takekesî, di heman demê de, dînamîkên komalî yên berfirehtir jî analîz kir.

Piştî sala 2015'an, qada demokratîk ya li Tirkîyeyê tengtir bûbû û seqayeke krîmînalîzasyonê zêdetir bûbû û vê yekê jî kiribû ku navajoya malbatan a ji bo parastina zarokên xwe xurttir bibe. Ji ber vê hindê, hevdîtin pirî caran di ser referansên xurt û pêbawer re hatin kirin, hin randevu di kêlîya dawî de hatin betalkirin an jî ji ber fikarkirinê bi cî nehatin. Vê rewşê, bi awayekî aşkere nîşan daye ka rewşa pênebawerîyê ya li welêt çawa vedibirûse ser qadê jî.

Bi dirêjeya vekolînê, ewlehî û mehremîya beşdaran, bi nişmîtî hat parastin û bicîanîn. Hevdîtin bi temamî li ser hîma dilyarîyê hatin kirin û nav û agahîyên kesan hatin anonîmkirin. Ji ber ku divîya têkilîya di navbera vekoler û beşdaran de li ser pevbawerbûnê bûya; wekî din jî, ji ber ku dibû ku vegotinên/behskirinên li ser tundî û windayan/kuştîyan ji alî beşdaran ve bibe sedemeke travmatîzekirinê, hevdîtin bi baldarî û bi pêjnkarî hatin kirin. Ji bo endîşe û pêjnkarîya malbatan a li ser tiştên ku vegotin û qilqilîna wan a der heqê ewlehîya xwe de, baldarîyeke mezin hat nîşandan û hevdîtin bi dilsozîyeke nişmî hatin kirin. Digel vê jî, hemû berpirsîya analîzê li ser nivîskarên raporê ye.

Bi qasî rêbaza vê vekolînê û xebatên qadî, feraseta edaletê ku ew beralî kir jî, bû pêkhateya bingehîn a xebatê. Vegotinên ku em li qadan rastî wan hatin, ne tenê pêpeskirinên ku qewimîne, di heman demê de, der heqê çibûn û çawa pêkanbûna edaletê de jî bûn derbirîna têgihîştinên cuda. Ji ber hindê jî, berî ku em derbasî beşa analîzkirina qadê bibin, ger em li ser ranêzikîya edaleta tevahîgir ku çarçoveya têgihî ya vekolînê dide der, bisekinin û gengeşeyên ku li ser vê ranêzikîyê hatine kirin binirxînin, wê çêtir û watedartir be.

# GAVA LÊGERÎN BO EDALETÊ TÊ KIRIN: BER BI RANÊZIKÎYA TEVAHÎGIR VE

Her wekî li welatên din jî wisa ye û li wan deran jî pevçûn û bandorên sîstematîk ên pêpeskirinên mafên mirovan zêde ne, li Tirkîyeyê jî, têkoşîna li dijî bicezanekirinê, di navenda têkoşîna bo edaletê ya aktîvîstan, hiqûqnasan, zindîmayîyan û kesûkarên mexdûran de cî girt ku wan hewl dida da ku rêyeke hesabxwestinê ya ji kiryaran peyde bikin. Di piranîya rewşan de, ev têkoşîna hiqûqî, bi mehkûmbûna kiryaran bi encam nebûye, di gelek rewşan de jî, hê bêtir xisar gihîştiye mexdûr û kesûkarên wan û hatine krîmînalîzekirin. Digel vê yekê, giringîya van hewldanan zêdetir in ji bisînorkirina bi destkeftîyên ku di warê hiqûqê de hatine bidestxistin; û bi wateyeke berfirehtir, van hewldanan hêmanên bingehîn ên lêgerîna bo heqîqet û edaletê ya civaka kurd pêk anî.

Me di çarçoveya vekolînê de, pirsên wekî “*Edalet ji bo we tê çi wateyê? Li gorî we, gava kîjan merc werin pêkanîn wê ev yek were wateya ku edalet hatiye bicîanîn?*” ji kesûkarên mexdûran kirin û piranîya wan bersiveke zelal da: gava kiryar werin bicezakirin. Her wiha, gelekên ji wan bal pê da ku bicezakirin nayê wateya heyfhilanînê. Li gorî wan, ev ceza pêşmercek bû ji bo ku ev pêpeskirin neyên dubarekirin û hem ew hem jî wê nifşên di pey re karibin di siberojê nava aştî û ewlehîyê de bijîn û ev mafê wan were parastin. Van çavdêrîyan kir ku em di çarçoveya xebata xwe de, jihevcihêbûna têzan a di navbera edaleta cezaker û edaleta sarêjker de heyî, bidin ber pirsyarîyan. Vê raporê, li şûna ku ranêzikîyên ketî behsê di pozîsyonên dijî hev de binirxîne, pirsa ka gelo ji bo ku ji alî takekesî û komalî ve edalet were dabînkirin, ev ranêzikî dikarin bi çi awayî hev temam bikin, li xwe kir armanc û nirxand.

Ji ber hindê jî, têgihîştina hewcetî û bendewarîyên kesûkarên mexdûran a der heqê edaletê de, di navenda xebata *Edalet Sarêj Dike* de cî da xwe. Têkoşîna hiqûqî ya di rewşeke wisa de ku bicezanekirin bi awayekî sîstematîk tê bicîanîn, tê çi wateyê? Gelo ranêzikîyên cuda yên bo edaletê dikare xisara çêbûyî sarêj bike an jî dikare sîstema bêedalet ku pêpeskirinan pêkan dike û kiryaran diparêze, veguherîne? Me ev vekolîn wekî fersendekê qebûl kir ji bo ku em rêgezên edaleta sarêjker û pêkanînên wê bidin ber gengeşeyê; û bi tevî pêpeskirinên giran ên mafan, di navenda meseleya kurdan de, wê binirxînin û bipirsin ka gelo ev rêgez li Tirkîyeyê tên çi wateyê û sînorên wan çi ne. Di vê beşê de jî, me li xwe kir armanc ku em têgih û perspektîfên ku teşe didin vê ranêzikîya me daynin rastê û encamên raporê, di çarçoveya gengeşeyên li ser aştî û edaletê ya li Tirkîyeyê de, bi şûn bikin.

## Sînor û Giringîya Hiqûqê ya Li Hemberî Pêpeskirinên Mafên Mirovan

Edaleta cezaker ku bala xwe dibe ser cezakirina kiryar, pala xwe dide ser rêgeza qisasê (*lex talionis*) û çavkanîyên dîtir ên berê ku bi gelemperî wekî şêweyekî edaletê yê kevn tê zanîn. Jê zêdetir, gava xisarek çêbibe ajoya mirovan diçe ser cezakirinê û referans ji bo vê xwezaya mirovî tê kirin û ev ranêzikî li ser zemîneke sirûştî tê danîn (Zehr, 2002). Bipêşketina sîstemên ceza, yên ku sûcan pênase dike û cezayên berginda wan dîyar dike,

bi avakirina dewletên modern bi awayekî hevdemî bi pêş ve çûye; dewletan kontrolkirin û bicezakirina hevwelatîyan di navenda hewldanên xwe de bi cî kiriye. Digel vê yekê, xebatên teorîk û sîyasî yên ku di kontekstên cuda de û li ser armanc û rêbazên bicezakirinê hatine kirin, etîk û kargîna edaleta cezaker dane ber pirsyarîyan. Ji ber vê yekê jî, gengeşeyên ku li ser cezayê bidarvekirinê, yên li ser rakirina bi temamî ya sîstema edaleta cezakirinê (*penal abolitionism*) û yên li ser sîstema edaletê ya bo zarokan hatine kirin, ji bo edaleta cezakirinê ya dewleta modern bûne parçeyên kevneşopîya rexnegir ên demdirêj.

Gava pêpeskirina mafên mirovan dikeve behsê, meseleya hesabdayînbarîyê, di gelek kontekstan de, li dor têkoşîna li dijî cezanekirinê tê nirxandin. Di konteksta dîktatorî û/an jî di konteksta şer û pevçûnî de, hiqûqnas, aktîvîst û kesûkarên mexdûran, ji bo ku karibin wisa bikin ku kiryar hesabê bidin, tên cem hev û stratejîyên wisa bi pêş dixin ku diçe wêdetirî hiqûqê û hiqûqîbûnê. Piştî şerê cîhanê yê duyem, hiqûqa cezakirinê ya navneteweyî û hiqûqa mafên mirovan bi pêş ket û kategorîyên sûc ên nû, yên wekî “sûcên li dijî mirovahîyê” û “nijadkujî” hatin pênasekirin; ji bo ku mafên mirovan di asta cihkî, herêmî û navneteweyî de were parastin, mekanîzmayên navneteweyî hatine çêkirin. Tevî ku gelek kend û kosp derketin pêşîya wan jî, têkoşîna hiqûqnasan, aktîvîstan, zindîmayî û kesûkarên mexdûran, encamên berbiçav dane: Duristkirinên hiqûqî û îçtîhadan, der heqê pêpeskirinên giran ên li ser mafên mirovan, bi awayekî pêlingî çarçoveya hesabdayînbarîyê pênase û berfirehtir kiriye; dadgehên navneteweyî, komîsyonên heqîqetê û carinan jî dadgehên cihkî, mafê heqîqetê yên mexdûran û kesûkarên mexdûran nas kiriye; pêvajoyên darizandinê, alîkarî kiriye ji bo ku dîyardeyên der heqê aqûbeta mexdûran de derkevin rastê û ji bo rarûbûna bi kiryaran re derî werin vekirin.

Digel vê yekê, têkoşînên li ser mafên mirovan tên meşandin, di astên cuda de rastî kend û bendan hat. Gelek dewlet, ji bo ku xwe ji hesabdayînbarîyê hemet bikin, di duristkirinên xwe yên hiqûqî de derbiranên ximam û nezelal bi kar anîne û qanûnên efûkirinê an jî yên mirûrî zeman durist kirine. Digel ku mexdûr, aktîvîst û hiqûqnas hatine qutifandin an jî hatine krîmînalîzekirin, qelsîya serbixwebûna darazê û çewisandinên li ser dadger û dozgeran hatine kirin jî, tevkarî li berdewamkirina zirxa bicezanekirinê kir ku kiryaran diparêze. Herçî biryara dadgehên navneteweyî yên wekî Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ye, ji bo ku pêpeskirinên ku dewlet dikin an jî dewlet çavên xwe ji wan pêpeskirinan re digirin, werin nasîn, ev dadgeh bi roleke bingehîn radibe. Lê belê gelek dewlet, ji dayîna xuromeyê wêdetir naçe û ji bo ku kiryar hesabê bidin û pêpeskirinên ku dikevin behsê dubare nebin, di çêkirina reforman de texsîrîyan dike.

Gava pêpeskirinên mafên mirovan ên li Tirkîyeyê dikeve behsê, têkoşîna mexdûran û kesûkarên mexdûran rastî gelek kend û bendan hat; û ji ber ku pirsyarîkirin netekûz hatin kirin, ji ber ku di warê veguhastina dosyeyan a ji bo dadgehê de dijwarî çêdibin, ji ber ku çewisandin heye li ser sîstema darizandinê û mexdûran û ji ber ku doz pir zêde berdewam

dikin an jî ji ber mirûrî zeman, doz pûç û betal dibin (Kurt, 2014; Ataktürk Sevimli et al., 2021). Di konteksta windakirinên bi darê zorê de, belgesela bi navê *Dargeçit* ku Berke Baş derhênerîya wê kiriye û Navenda Vebîrê bûye hevpara derhênerîya wê; bi awayekî balkêş û bi aşkereyî datîne rastê ka ji bo parastina kiryarên ku kîbûna wan tê zanîn, kîjan taktîk bi awayekî hevdemî an jî lidûhevî hatine bicîanîn (Lévy-Aksu, 2025). Di vê raporê de, bûyerên wisa yên ku mafê jîyanê yê zarok û ciwanan hatine pêpeskirin, hatine nirxandin; û her çend mercên sîyasî û ekonomîk yên ku diguherin û dînamîkên cihkî, di warê serîlêdana dadgehan û çêkirin an jî çênekirina zemîneke hiqûqî de bi roleke giring radibin jî, ji alî parêzeran û kesûkarên mexdûran ve mekanîzmayên mîna hev tên pênasekirin. Di bergeheke gelemperî de, ji salên 1980'yî û bi vir ve, tê dîtin ku pêpeskirinên mafan ku li bajarên kurdan hatine qewimandin, bi tevî hewldanên biryardar ên hiqûqnasan, parêzvanên mafan û komên cihkî jî, bi rêjeyeke mezin necezakirî mane; û ev rewş, hê jî yek ji wan meseleyên bi berberî ye li pêşîya danîna aştîyeke adil û mayende.

## Gelo Edaleta Cezaker Ji Kîjan Hêlê Ve (Hê Jî) Giring E? Bicîkirina Gengeşeyê ya Di Kontekstê De

Digel kend û kospên pirteweqî yên li pêş hesabdayînbarîya kiryaran heyî, di van çend deh salên dawî de, têkoşîna li dijî edaleta cezaker û li dijî bicezanekirinê, li gelek cografyayên cuda, ji alî akademîsyen, pêkhêner û aktîvîstan ve, ji alîgirên rakirina sîstema edaleta cezakirinê (abolitionist) an jî ji yên perspektîfa reformîst zêdetir tê rexnekirin. Her çend ev ranêzikîyên rexnegir li Tirkîyeyê zêde deng venade jî, van ranêzikîyan di asteke giring de teşe da pirsên vekolana bingehîn ên projeya *Edalet Sarêj Dike*. Di vê çarçoveyê de, me ji alîyekî ve di vê vekolanê de hewl da ku em zemîna teorîk û sîyasî yên rexneyên ku ji bo edaleta cezaker tên kirin, têbigihîjin, ji alîyekî din ve jî, di konteksta Tirkîyeyê de têkoşîna li dijî bicezanekirinê ku ji alî tevgerên mafên mirovan û mexdûran ve pêşînîyeke bivênevê ye, me hewl da ku em lêtîya (valid) van rexneyan binirxînin.

Yek ji îtirazên cidî ku ji bo edaleta cezaker tê kirin ew e ku têkoşîna hiqûqî ya li ser berpirskirina kiryaran a di asta takekesîyê de, têrî nake ku rehendên avanîyî yên pêpeskirinên mafên mirovan û teweqên cuda yên berpirsîyên di nav amraza dewletê de an jî di asta komalî de xweşikî werin çespandin (Clamp, 2016). Ji vê hêlê ve, *bidawîkirin*a ku tê îdiakirin ku piştî pêvajoya mehkemekirineke serkeftî hatiye kirin, ji ber ku dînamîkên sîyasî û komalî yên ku di bin tundîyê de veşartî ne, li ber çavan nayên danîn, bi gelemperî tenê wekî honakkirinê dimînin. Her çend, xwegihandina bo heqîqetê, bi taybetî di pêpeskirinên wekî windakirina bi darê zorê û kuştinên bêmehkemekirinê de wekî encam û motîvasyona esasî ya têkoşîna hiqûqî tê dîtin jî, pirî caran doz û mehkemekirin dibin sedem ku dîyarde û pêvajoyên ku li derveyî dozê dimînin, werin bindoşekkirin.

Alîyekî din ê hiqûqê yê bi gengeşe, awayê pênasekirina berjewendîyên mexdûran e. Her wekî di vê raporê de jî li rastê hatiye danîn, darizandin û bicezakirina kiryaran di nava daxwazên sereke yên kesûkarên wan zarok û ciwan in ku di salên 2000'î de jîyana xwe ji dest dane. Tevî ku ev giringîya pêşînîlêdayî ku li edaleta cezaker tê barkirin ne xweserî Tirkîyeyê ye jî; hiqûqnas û rêxistinên mafan ku ji salên 1970'yî û bi vir ve ye li hemû dinyayê ji bo maf û daxwazên mexdûran û li dijî bicezanekirinê têdikoşin, bal pê didin û tînin rojevê ku hesabdayînbarîya bi awayekî hiqûqî, deyneke exlaqî ye li hemberî mexdûran. Ji hêla din ve, ranêzikîyên rexnegir ên ji bo tevgera têkoşîna li dijî bicezanekirinê tên nîşandan, bêjara berjewendîya mexdûr ji hêl û bergehên dîtir ve pirsyarî dikin (Engle, 2016). Ev rexne, serê pêşîn bal pê didin ku pêvajoyên hiqûqî pirî caran ji bo parastina berjewendîyên mexdûran nayên aşopkirin. Ji ber hindê jî, di pêvajoyên dozan de; tiştên ku li mexdûran û kesûkarên wan hatine qewimandin tên negiringkirin an jî tên mandelkirin, rêya derbirîna azmûn û dilînên wan tê berbendkirin an jî kiryar tên parastin û ji sûc tên pakkirin (beraatkirin) û bi vî awayî hê bêtir xisar li mexdûran û li kesûkarên wan tê gihandin. Ji ber vê sedemê, gava kiryar tên cezakirin jî, ji bo ku mexdûr û kesûkarên mexdûran xweş û sarêj bibin, hewcetî bi mekanîzmayên zêde yên wekî desteka psîkolojîk, xuromeya darayî û misogerîya dubarenebûnê, çêdibin. Wekî din jî, hin akademîsyen, dîtina ku dibêje; 'mexdûr bi awayekî sirûştî, edaletê bi cezakirina kiryaran re dikin yek', didin ber pirsyarîyan û balê dibin serê ku di gelek komalên cihkî de, feraseta edaletê pircure ne û têkoşîna li dijî bicezanekirinê ku ji Şerê Cîhanê yê Duyem û bi vir ve ye berê tevgerên mafên mirovan dîyar dike, di vê pircurebûnê de berpirs e. Her çend di nava van ranêzikîyên rexnegir de, hê jî di gelek mijaran de hevfikirî çênebûbe û hewcetî bi gengeşekirinên kûrtir hebe jî, ev ranêzikî balê dikişînin serê û dibêjin, divê têkoşîna li dijî bicezanekirinê were dîrokîkirin û kontekstîkirin û tînin bîrê ku di nava tevgerên mafên mirovan de, ranêzikîyeke rexnegirî û xwesehkirinî (self reflexive) giring e.

Di konteksta meseleya kurdan de, gelo ev ranêzikîyên rexnegir dikare çawa xîtabî daxwazên edaleta cezaker bike ku ji alî malbatên mexdûran ve aşkere tê bilêvkirin? Li Tirkîyeyê, di têkoşînên hiqûqî de ku ji alî mexdûran, malbatên wan, hiqûqnasan û aktîvîstan ve û bêrawestan tê berdewamkirin, kîjan dînamîk bi pêş de tên? Divê em balê bibin vê yekê ku rexneyên ku li edaleta cezaker tên kirin, bi asoyeke lihevkirin û veguherînê ya wisa tê bilêvkirin ku wê di siberojê de, ne tenê ji bo mexdûran, her wiha bi tevî kiryaran û wê bi kêrî hemû civatê were. Sûc û pêpeskirinên mafan, di têkilîyên adil de wekî qurifînekê tê dîtin; loma jî bicîanîna edaletê, ji sînorên takekesparêz ên pêvajoyên hiqûqî wêdetir, wekî pêvajoya gihîştina komaleke adil, wekhev û aştîxwaz tê pênasekirin (Llewellyn & Philpott, 2014). A ku balê dibe ser xwe ew e ku piranîya kesûkarên mexdûran ku di pêvajoya vê vekolînê de hevdîtin bi wan re hatiye kirin, ev asoya veguherînê wekî motîvasyona bingehîn a berdewamkirina têkoşîna xwe ya hiqûqî, nîşan da. Her wekî wan bi xwe derbirî, tu nakokî û tengije tune di navberê de gava ew wekî berpirsîyeke

exlaqî lêgerînê bo edaletê bikin û li ser navê mexdûran vê yekê berdewam bikin û ji alî hesabdayînbarî, mafên wekhev û ewlehîyê ve jî, ji bo ku pêvajoya darizandinê ji bo hemû komalê guherînekê çêke, li bendê bimînin.

Digel vê sînordarîya pêjnkarîyê ku ji bo mafên mexdûran û bicezanekirina sîstematîk tê nîşandan, em jî wisa difikirin ku divê qada hiqûqê, hê jî di lêgerîna bo edaletê de bibe warekî ku tê tercîhkirin û ji çarçoveyeke berfirehtir, divê di konteksta berxwedan û çewisandina sîyasî ya li Tirkîyeyê de were nirxandin (Uçarlar, 2015). Berevajîya konteksta serdema têperînê an jî piştî serdema têperînê ku di xebatên akademîk de li ser edaleta sarêker tê nirxandin, li Tirkîyeyê, meseleya kurdan, ji salên pêşî yên Komarê û bi vir ve ye, di astên cuda yên rabûn û danînê de, her didome. Jê zêdetir, sîstema sîyasî ya Tirkîyeyê, ji alî maf, nimandin û azadîyê ve hê jî gelemşeyên giran dihewîne di xwe de. Piştî serdema lîberalbûna îzafî ya di salên 2000'î de, veguherîna ototrîter ku ji 2016'an û bi vir ve ye diqewime, roj pê de, qada sivîl tengtir û derfetên berxwedanê jî kêmtir dike. Midaxeleyên sîstematîk ên li ser serbixwebûna darazê û berdewamîya zirxa bicezanekirinê ku ji serdemên berê wekî mîrate maye, nîşan dide ku qada hiqûqê jî ji vê kontekstê ne bêrî ye. Digel vê yekê, dadgeh hê jî ew platformên degme ne ku kesûkarên mexdûran dikarin li wir daxwazên xwe yên ji bo heqîqetê û hesabdayînbarîyê bînin ziman. Di konteksta windakirina bi darê zorê de, her çend ev rarûbûn hê jî bi ser neketibe û encamên cezayî jê çênebûbin jî, kesûkarên mexdûran balpêdanê dikin ji bo giringîya mehkemekirinên doza Dargeçitê (Kerboran) û doza JÎTEM'ê (Îstixbarata Cendirmeyan û Têkoşîna Li Dijî Terorê) ku di sala 2010'an de hatin meşandin.

Di vê raporê de, giringîya sîyasî ya van dozan pir bi neyînî dide der: Di piranîya bûyeran de, lêpirsîn nehatine vekolan jî; qada hiqûqî, dibe sembola nepêkanîya xwegihandina bo edaletê û pêknehatina rarûbûna bi dezgehên dewletê re. Ji alîyê din ve, di hin lêpirsînan de ku hatine vekolan, têrînekirina mobîlîzasyona sîyasî û hiqûqî ya di dordera van dozan de, dike ku wateya qada hiqûqî were pirsyarîkirin. Di van têkoşînên hiqûqî de ku di asta cihkî de encam ji wan çênabe, DMME'yê ku li ser dozên pêpeskirinê yên di salên 1990'î de, bi biryarên xwe birq li dewranê xist, wekî hêvîya dawî xuya dike. Lê belê, ev rapor datîne rastê ku di deh salên dawîyê de, pir derengmayîna DMME'yê ya di dayîna piranîya biryarên xwe de û biryarên wê yên redkirinê jî li ser mexdûran bandoreke hêvîqurifînê dike. Gava mirov bi awayekî gelemperî bala xwe didiyê, wisa xuya dike ku siberoja têkoşîna hiqûqî -ji alî wan malbatan ve jî ku tundîya dewletê û bicezanekirin bi çend nifşan li wan hatiye qewimandin jî- ji berê pir zêde asê bûye.

Bi tevî vê tabloya reşbîn jî, encamên vê raporê rastîyekê dide der ku qada hiqûqî hê jî di çavê mexdûran û kesûkarên mexdûran de giringîya xwe ya sîyasî û exlaqî heye. Di konteksteke komalî de ku "edalet" pirî caran bi "edaleta cezaker" an jî bi "têkoşîna hiqûqî" re tê yekkirin, digel ku pirsyarîkirina vê nêrîna hanê çi ji alî metodolojîk ve çi jî ji alî etîkî ve ne li gorî armanca vê vekolanê ye jî, di van deh salên dawîyê de, li bajarên kurdan, bi dozên hiqûqî

yên takekesî, berdewamîyek çêbû di têkoşîna sîyasî ya berfireh de ku asoyeke edaletê nîşan dike û mirov nikare wê daşikîne qada hiqûqî. Ji ber hindê jî, ev rapor, hem potansîyela veguherandin û sarêjkirina di asta komalî de dide ber pirsyarîyan hem jî teorîyên edaleta sarêjker û pêkanînên wan bi kêrî xwe tîne.

## Sarêjbûn û Veguherîn: Xeyalkirina Edalet û Aştîyê

Her çend, edaleta sarêjker wekî ranêzikîyeke rexneyî ya li hemberî sîstema edaleta cezayî ya heyî tê zanîn jî, ev têgih, bi dehan salan in, ji alî akademîsyen û pêkhêneran ve, di konteksta mafên mirovan û pevçûnan de, dînamîkên komalî û sîyasî jî, yên di bin xisara ku di asta takekesî û kolektîf de çêbûye, dide ber pirsyarîyan û ji bo derbirîna rêgez û pêkanînên ku sarêjkirina van xisaran li xwe dike armanc, tê bikaranîn.

Edaleta sarêjker; li ser balpêdana ku ji bo sarêjkirina tevna sosyal û asoya veguherîner dike, ji avabûna Komîsyona Lihevkirin û Heqîqetê ya Li Efrîqaya Başûr ya di sala 1997'an bi vir ve, bi taybetî bi kontekstên edaleta dema têperînê re tê pêwendîdarkirin (Clamp, 2014). Di van salên dawîyê de, mekanîzmayên edaleta sarêjker, li gelek edaleta dema têperînê tê entegrekirin. Li Ruandayê, Dadgehên Gacaca ku li ser hîma komalî bû û di navbera salên 2002-2012'an de çalak bû û hesabdayîna kiryarên nijadkujîya Tutsîyan li xwe dikir armanc, her çend rêbaza ku pejirand û encamên ku jê çêbûn ketibin ber gengeşeyê jî, kiryarên ku berpirsîyên xwe qebûl dikirin, heqîqet anîn ziman û ji rêbazên çareserkirina pevçûnên gerdîşî, ku han dida tevlibûna li komalê û entegrebûna li komalê ya ji nû ve çêbibe, havil girt û bû yek ji sazîyên sembolî yên edaleta sarêjker (Clark, 2014). Wekî mînakeke ji demeke nêziktir, di Îlona sala 2025'an de, Dadgeha Aştîyê ya Taybet (DAT), der heqê leşkerên berê de ku tev li kuştinên sivîlan ên derqanûnî bûne, cezayên sarêjker ên yekem birî: leşkerên ku sûcê xwe qebûl dikirin û bi DAT'ê re hevkarî kiribûn, cezayê dayîna xuromeyê li wan birî ku wan ê ji pênc salan heta bi heşt salan di nava wan komalan de xizmeta gelemperî jî bikirana (Umana, 2025). Edaleta sarêjker, di wan komalan de ku asoyeke wan a dema têperînê xuya nake, şer û pevçûn û pêpeskirinên mafên mirovan hê jî didomin, ji bo ku heqîqet were aşkerekirin, xurome û lihevkirin pêk were, wekî mekanîzma û rêgezên li dû hev, her roj hê zêdetir li serê tê gengeşekirin (Gready & Robins, 2019). Lê belê, di van hemû mînakan de, der heqê ka gelo edaleta sarêjker dikare li pêpeskirinên mafên mirovan were pêkanîn û tevkarîya rastîn a edaleta sarêjker a li aştî û lihevkirinê çi ye, gelek dîtinên cuda hene.

Di konteskta Tirkîyeyê de têgiha edaleta sarêjker, bi tevî pêpeskirinên mafan ên pirkesî, qirkirin û bêedaletîyên ku ji sed salan zêdetir in li welêt çêdibin, pir bi sînorkirî be jî, hê jî tê zanîn û tê gengeşekirin. Her wekî berê jî hat destnîşankirin, têkoşîna li dijî bicezanekirinê û çêkirina rêyên hesabdayînbarîya kiryaran ku ji alî berjewendîyên sîyasî û sazîyên dewletê ve tên parastin, di navenda têkoşîna ji bo edaletê ya aktîvîstan, hiqûqnasan, zindîmayîyan û kesûkarên mexdûran de cî digire. Di salên 2000'î de, bi taybetî jî di navbera salên 2013-2015'an

de, di wê dema ku di navbera hikûmeta tirkan û tevgera kurdan de pêvajoya aştîyê hebû, her çend di derdorên sivîl û akademîk de eleqeyeke mezin ji bo paradîgmaya edaleta dema têperînê hatibe nîşandan jî, tundîya ku bi têkçûna pêvajoya aştîyê re li bajarên kurdan ji nû ve zêdetir bû û li hemû welêt çewisandinên ku li dijî mafan hatin kirin, eleqeya ketî behsê kêmtir kir (Alıcı, 2025). Di vê vekolînê de, hevdîtin û civînên ku bi hevkarên cure bi cure re hatine kirin jî, vê kêmbûna asoya der barê edaleta dema têperînê de heyî -an jî bi gotineke din, kêmbûna bendewarîyên der barê çareserîya arîşeya kurdan û der barê guherîna sîyasî de- bi awayekî aşkere dide der. Digel vê yekê, demên dawî yên xebata qadî ya vekolînê rastî bihara sala 2025'an hat û di vê demê de, di navbera dewlet û tevgera kurdan de, pêvajoyeke nû ya mizakerekirinê dest pê kiribû. Her çend şefafîya der barê pêvajoyê de kêm e û dewlet xwe hemet dike ku gavên berbiçav biavêje jî, di hevdîtinên ku di vê demê de bi kesûkarên mexdûran re hatine kirin, her çend behskirina ku ji bo aştîyeke îhtîmal hatin kirin, qurifokî bin jî, nîşan bi hêvîya guherînekê dike ku ji nû ve aj dide.

Gava der barê edaleta dema têperînê de asoyek tunebe an jî aso nezelal be, em dikarin ji ranêzikîya edaleta sarêjker çi hîn bibin? Serê pêşîn, ranêzikîyên edaleta sarêjker, jêderka pevçûn û newekhevîyan dide ber pirsyarîyan; ji bo avakirina pêwendîyên hê adiltir û aştîya mayende, balê dikişîne ser divêtîya derbirîna demîbûnên cuda cuda (Clamp, 2014). Ji vê hêlê ve, divê dema têperîneke berdibetî (îhtîmal), wekî ne gava pêşî ne jî gava dawî ya hewldanên edaletê were zanîn. Tevî ku di demên pevçûnên aşkere yan jî yên veşartî de, bandora hewldanên bo edaletê ya li ser geşedanên sîyasî yên makro sînorkirî be jî; ev hewldan, bi rêya xebat û çalakîyên wekî belgekirina pêpeskirinên mafên mirovan, dabînkirina piştgirîyê ya ji bo mexdûran, xebatên dîyalog û vebîrê, dibe hêmanên bingehîn ên tîrûşkirin û berxwedanê. Di heman demê de ev hewldan, di pêvajoyên dema têperînê de, delîl û azmûnên hêja derpêş dike ku ew ê karibin tevkarîyê li lêgerîna bo heqîqetê û lihevkirinê bikin. Ji hêla din ve, gava mirov ji perspektîfa edaleta sarêjker ve berê xwe didiyê, pêvajoyên edaleta dema têperînê, di warê pirsyarîkirina newekhevî, rehendên avanîyî yên bêedaletîyê û qalibên tundî û derkirinê de têrî nake -ku piştî bidawîbûna demên nedemokratîk jî pir zêde lidar in-. Ji ber hindê jî, gava mirov bixwaze ji edaleta sarejker bi borîrojê re serederîyê bike, divê mirov demîbûnên ji hev cuda bîne ziman û berdewamî û guherînên ku di navbera mijaran û serdeman de heye û ji hev cuda cuda tên nirxandin, bide ber pirsyarîyan. Di mînaka Tirkîyeyê de, vekolana rola newekhevîya komalî, nijadperestî û miletperestî û girêdana di navbera tundî û cihêgirîyê de ku ji serdema Osmanî ya dawî heta bi roja îro wekî Qirkirina Ermenan û Şerê bi Kurdan re (Çelik & Dinç, 2018) hatiye, hêmanên ranêzikîyeke giştgir pêk tînin ku dijwar e mirov wan di pêvajoya edaleta têperînê û sînorên wê yên xweş pênasekirî de hilbîne. Wekî din jî, piştî bidawîbûna dema têperînê, di warê dijberîya bo cihêgirîyê an jî di warê perwerdeyê de hewcetî bi mafên sosyal tê dîtin. Ji vê hêlê ve, digel ku ranêzikîya edaleta sarêjker nîşan bi asoyeke edaletê dike ku borîrojê, îrorojê û siberojê bi hev re ava dike; di zemîneke berfireh de jî, pêkanîn û destpêkerîyên wisa li xwe digire ku tevkarîyê li pirsyarîkirina pergala heyî û veguherandina wê dikin.

Wekî ya duyem, perspektîfa edaleta sarêjker, ji bo ku daxwaz û hewcetîyên kes û komalên ku bandora pevçûn û pêpeskirinên mafan li wan bûye, dabîn bike, çarçoveyeke giştgir derpêş dike. Ev ranêzikî, teweqên pirhêlî yên xisara ku ji ber pêpeskirinên mafan û tundîyê çêbûye, qebûl dike û ji bo mexdûran û komalên eleqedar, balpêdanê li giringîya desteka psîkososyal û xuromeyê, dike. Ji bo ku mexdûr û zindîmayî karibin azmûnên xwe û daxwazên xwe derbibirin, ji bo ku tevkarîyê hem li sarêjbûna takekesî û komalî bike hem jî ji bo ku pêpeskirinên mafan neyên dubarekirin; vekirina qadan, belgekirina pêpeskirinan û vebîrkirina van azmûnan, wekî pêkhateyên bingehîn ên hewldanên bo pêkhatina edaletê tên qebûlkirin. Ev perspektîfa tevahîgir, di konteksta pevçûnên demdirêj û pêkanînên mêtinger de giring e; ji ber ku bajarên kurdan pênase dike ku bi dirêjeya nifşan şopên tundîyê û bandorên wê hilgirtine, pirî caran ji derfeta gotina êşên xwe an jî ji girtina şîna windayîyên xwe bêpar hatine hiştin (Biner & Biner, 2019). Vegotinên ku di xebata bi navê *Heke Nehatana Kuştin Wê Bibûna Hevalên Me* de tê derpêşkirin ku bûne kana besthilanînê ya vê xebatê, bîranînên zarokên kurdan ku di salên 2000'î de hatin kuştin, dilînên dê û bavên wan û nêrînên nivîskarên ciwan ku di salên 2000'î de li bajarên kurdan rabûne, dixe nava hev û ronîyê dide ser van teweqên ji hev cuda (Soydan et al., 2023). Di vê ranêzikîya berfirehtir de ku berê wê bi edaletê ve ye, digel hiqûqnas û parêzvanên mafan, pisporên xizmetên sosyal, terapîst, perwerdekar, vekoler û hunermend jî di warê têgihîştina tundî û azmûnên bêedaletîyê, raguhastina wan a li raya giştî û veguherandina wan de bi rolekê rabûne; ji ber vê yekê, ew jî di nava wan aktoran de cî digirin ku divê werin pesinandin û destekkirin. Di çarçoveya vekolîna heyî de; hevdîtinên ku bi terapîst, mamosta û hunermendan re hatine kirin û hevkarîya wan kirî û desteka ku ji bo destpêkerîyên mîkro yên li ser zarok û ciwanan hatî dayîn, bi taybetî giring in ji bo ku nîşan bidin ka ev rehendên ji hev cuda çawa dikarin werin cem hev û ji bo ku nîşan bidin ka dijwarîyên ku di van waran de çêdibin çawa dikarin werin famkirin.[4]

Ev ranêzikîya tevahîgir, ji hêlekê ve, di tunebûna asoya dema têperînê de, ji bo destekkirina mexdûr û komalên ku bêedaletîyê bandor li wan kiriye, perspektîfên cuda derpêş dike, ji hêla din ve jî, hêmanên ku pir gengeşedar in di xwe de dihewîne. Fikira sarêjkirina têkilîyên jihevçûyî ku di nav paradîgmaya edaleta sarêjker de dihewe, kiryarên pêpeskirinên mafan jî tê de, pêvajoyeke wisa derdibire ku hemû alîyan entegre dike (Llewellyn, 2012). Ev entegrasyona ji nû ve, di konteksta dema têperînê de, carinan li ser navê lihevanîna alîyên ku tev li pêpeskirina mafan an jî tev li pevçûnan bûne, dikeve teşeyeke wisa ku ji hesabdayînbarîyê bêrî dike an jî dibe wekî qanûnên efûkirinê (McEvoy & Mallinder, 2012).

[4] Digel xebata qadî ku bi malbatên mexdûran re hat kirin, di konteksta vê vekolînê de, ji bo çarçovekirina feraseta me ya bo edaletê ev rastîhevhatin bi roleke mezin rabûn: grûbên navendî yên bi parêzer, mamosta û hunermendan re hatî kirin; kargeha bi navê "Ji Perspektîfa Edaleta Sarêjker Zarok û Travma" (Eylül 2024) ku li Mêrdînê û bi bizava Psakolojî Kurdî re bi hevkarî hat lidarxistin; Sempozyûma Edaleta Sarêjker a Navneteweyî ya Navenda Vebîrê (Kasım 2024). Wekî din jî, li Mêrdînê, kargehên digel zarokên ku bandora şer û pevçûnê li wan bûye, digel zarokên li Amedê vegotina çîrokan û nîşandana fîlmekî anîmasyonê ku li ser pevçûnê bû; her wiha, em pir tiştan hîn bûn ji projeyên edaleta sarêjker ên mîkro ku di vê projeyê de dihatin destekkirin.

Her çend, qanûnên efûkirinê, bi hinceta ku dibe zirxê bicezanekirinê û tê wateya bêrêzîya li êşên hatine qewimandin, ji alî parêzvanên mafan û kolektîfên mexdûran ve, pir bi hişkî tê rexnekirin jî, divê bandorên sîyasî, komalî û takekesî yên van qanûnan di kontekstên dîyarkirî de werin nirxandin. Tevdîrên sarêjker, li ser kiryarên ku berpirsîya xwe qebûl dikin û tevkarîyê li lêgerîna bo edaletê dikin, tên bicîanîn û her wekî li Kolombîyayê û di mînaka DAT'ê de jî tê dîtin, ji bo ku em karibin entegrasyona ji nû ve û lihevkirinê binirxînin, alternatîfekê derpêşî me dikin. Lê belê, ji ber ku li şûna bicezakirinê pêşînî bo xizmeta raya giştî û xuromedanê tê dayîn, ev yek dibe sedem ku  mexdûr bi xurtî îtiraz bikin; loma jî, hê gelek zû ye ku em binirxînin û bêjin, tevdîrên bi vî rengî tevkarîyê li avakirina komaleke adilane û aştîyane dikin an nakin.

Di vekolîna heyî de, hevdîtin, civîn û sihbetên ne fermî ku bi kesûkarên mexdûran, bi hiqûqnasan û bi parêzvanên mafan re hatin kirin, nîşan dide ku her kes, bi awayekî yekdengî, li dijî fikira efûkirina kiryarên pêpeskirinên mafên mirovan, radibe. Her wekî di beşa dawî ya raporê de jî li ser tê sekinandin, nepêkanîya efûkirinê û dermijarîya xuromedanê -her çend di vî warî de dîtinên ji hev cuda hebin jî- ji alî kesûkarên mexdûran ve tim û tim tê bilêvkirin. Ji ber ku bi ranêzikîyekê pêşî lê digire ku kiryar hesabê nedin, ev helwest bi gelemperî dibe sedem ku li dijî têgiha "edaleta sarêjker" îtirazên xurt çêbibin. Ev bertek, digel ku ji hêlekê ve nîşan dide ku teorî û pêkanînên edaleta sarêjker heta astekê şaş in ji hêla din ve jî, nîşan bi rehenda sîyasî ya pêpeskirinên mafên mirovan jî dike. Her wekî berê jî hat destnîşankirin, pêpeskirinên giran ên mafên mirovan, tenê hêlekê avanîya hegemonyaya pirteweqî pêk tîne; herçî têkoşîna bo edaletê ye, divê bi wateyeke berfirehtir û di konteksta têkoşîna sîyasî ya kurdan de were nirxandin ku ji bo maf û azadîyê ye. Ji ber hindê jî, pêşmerca sarêjkirina têkilîyên komalî yên xerabûyî, divê jinavêrakirin an jî veguherandina avanîya sîyasî be ku bûye sedem ku pêpeskirinên mafan bi dehan salan dubare bibin û hevwelatîyên kurd ji mafên xwe yên sîyasî û çandî yên bingehîn bêpar werin hêlan. Heke xisara gihandî neyê qebûlkirin û ji bo bipêşxistina mafan û demokrasîyê gavên berbiçav neyên avêtin, mijara entegrasyona ji nû ve ya kiryaran, ji bo gelek kesên ku me hevdîtin bi wan re kirin, ji alî etîk û sîyasî ve negiring dide der.

Termînolojîya "Edaleta sarêjker" û honaka "sarêjkirina" têkilîyên komalî yên adil û pergaleke îdeal ku qet heyî nebûye, ji alî hin kesan ve ku me hevdîtin bi wan re kirin, hat rexnekirin. Van kesan, bal pê da ku gava pirsa edaletê ji sîyasetê were dûrxistin, rîskek çêdibe ku pêşî li gengeşeyên der barê bergehên tundî, miletperestî û birêvebirina kolonyal de heyî, were girtin. Her wiha, têgiha "edaleta veguherîner" (Nocella, 2011), ku ji alî hin akademîsyenan û pêkhêneran ve, ji bo derbirana rêgez û pêkanînên mînahev tê tercîhkirin, ji ber ku ji hêla guherînên sîyasî û sosyal ve bendewarîyên wan çêtir dide der, ji alî gelek kesên ku me hevdîtin bi wan re çêkir, guncan hat dîtin. Lê belê, gava em bi awayekî gelemperî bala xwe didin serê, em dibînin ku dewlet û nûnerên wê bi berdewamî

xwe ji hesabdayînbarî û rarûbûnê hemet dikin û çewisandinên li ser qada sivîl heyî jî dibetîya dîyalog û lihevkirinê lawaztir dike, loma jî, di konteksteke wisa de, rehenda pêwendîyî ku di navenda ranêzikîyên veguherîner û sarêjker de cî dide xwe, bi piranî, di asteke neberbiçav de dimîne.

Gelo pêvajoya mizakerekirinê ya di navbera hikûmeta tirkan û tevegera kurdan de ku di dawîya sala 2024'an de dest pê kir, ew ê karibe asoyeke dema têperînê biafirîne û ew ê karibe ranêzikîya pêwendîyî ya ku di navenda edaleta sarêjker de cî dide xwe, watedartir bike? Her çend vê pêvajoyê li bajarên kurdan hêvîyên der barê aştîyê de ji nû ve geş kiribe jî, ranêzikîya nihêrîna ji jor de ku roja îro serdest e, ji rêgez û pêkanînên edaleta sarêjker pir dûr xuya dike. Çi bêjara "bêterorbûn"ê ku ji alî rayedarên dewletê ve tê pejirandin çi jî avanîya hîyerarşîk û çarçoveya teng a Komîsyona Demokrasî û Biratîyê ya Piştevanîya Milî ku di Tebaxa 2025'an de ava bû, nikare tevkarîyê lê bike da ku rarûbûna bi borîrojê re çêbibe, hesabdayînbarî û newekhevîyên avanîyî werin gengeşekirin û rewşeke guncan çêbibe ji bo ku daxwazên mexdûran werin guhdarîkirin. Digel vê yekê, tevî ku nedîyarîyên zêde hene der barê wate û encamên pêvajoyê de, çareserîya berdibetî (mihtemel) ya pevçûna ji deh salan zêdetir, dike ku pirsên bingehîn ên ku di navenda edaleta sarêjker de cî digirin, careke din têkevin rojevê: Gelo wê qanûna efûyê li girtîyên sîyasî jî bixin? Gelo wê di pêvajoya tesfîyekirinê de endamên gerîlayê bi çi awayî entegreyî komalê were kirin? Û ji bo ku gelê kurd bigihîje mafên xwe yên sîyasî û çandî ku demeke dirêj e jê bêpar hatiye hiştin, wê kîjan reform werin bicîanîn? Her çend hê bersivên zelal ên van pirsan peyde nabin jî, ji ber ku di van mehên dawîyê de ji alî hêlên cuda ve tên bilêvkirin, ev yek nîşan dide ku wê di navenda mizakereyên sîyasî de cî bigirin.

Encamên vê raporê, her çend geşedanên vê pêla dawîyê behs neke jî, datîne rastê û nîşan dide ku di navbera wan komalan de ku bandora pevçûnan rasterast li wan çêbûye, hêvîdarîyên ji bo aştîyê nikare ji daxwazên xurt ên der barê edaletê de cihê were fikirandin. Gelo mirov dikare serederîyeke çawa bi mîrateya pirteweq a pêpeskirinan re bike ku li hemberî kurdan û li hemberî takekesên din di dirêjeya sedsala borî de hatine kirin û gelo mirov çawa dikare van pêpeskirinan belge bike da ku werin bibîranîn? Divê berpirsîya dewletê û nûnerên wê bi çi awayî were nasîn; gelo efûkirin, lêborînxwestina li ber raya giştî an jî xurome, dikare di kîjan mercan de ji bo mexdûran û ji bo komala giştî watedar bibe û were qebûlkirin? Wekî dawî û belkî jî ya herî giring, gelo em dikarin asoya ku aştî û demokrasîyê derdibire; em dikarin asoyeke veguherîner a wê ku tevkarîyê li komaleke adil û wekhev bike, çawa çêkin di aşopa xwe de? Vê vekolanê, bersivandina van pirsên serînexuya li xwe nekir armanc. Lê belê, ji gelek alîyan ve, ev pirs, bi daxwazên edaletê û azmûnên kesûkarên mexdûrên ciwan re eleqedar in ku di navenda vê raporê de cî digirin. Loma jî, bêyî ku dengê wan biçe cîyên pêwîst, ne pêkan e mirov ji bo aştî û edaletê asoyeke watedar çêke di aşopa xwe de.

# ANALÎZA QADÎ

*Ev beş, li ser sê mîxweran e û encamên qadî yên li ser çawanîya analîzkirina daneyan a vekolanê ne, dinirxîne. Beşa yekem, zemîna sîyasî, şûngehî û komalî ya ku mercên jîyana zarok û ciwanan dîyar dike, lêdikole; û hewlê dide têbigihîje ka tundî di kîjan mercên dîrokî û avanîyî de berdewamî daye xwe. Beşa di pey re, li ser vê zemîna avanîyî, bala xwe dide şêweyên cuda yên qalibên domdar û şûngehên kuştinan û rûdanên tundîyê yên di jîyana rojane de datîne rastê. Beşa sêyem, lêgerîna bo edaletê û hewldanên ji bo vebîrkirinê ku piştî pêpeskirinan tên kirin, di asta takekesî û kolektîf de lêdikole û hûrgerîyê li serê dike ka ev pêvajo çawa veguherîne ser qada berxwedanê.*[5]

# BEŞA 1'ê
# Jîyîn: Azmûnên Zaroktî û Ciwantîyê yên Li Bajarên Kurdan

Beşa yekem a analîza daneyan a çawanîyî, bala xwe bi hûrgerî dibe ser azmûnên jîyanî yên zarok û ciwanan, ku di demên pevçûnî yên di salên 2000'î de ku bi awayekî îzafî kêmtir bû, li bajarên kurdan dijîyan. Her çend, mijara sereke ya vê xebatê pêpeskirinên mafên jîyanê be ku li zarok û ciwanan hatine qewimandin, bêyî ku em van daşikînin (reduction) ser bûyerekê an jî hejmarekê, yek ji armancên vekolanê ew bû ku em balê bibin ser jîyana zarok û ciwanên ku hatine kuştin. Loma jî, me giringî pê da ku em azmûnên zaroktîyê û rewş û derava sîyasî û komalî ku zarok tê de rabûne (mezin bûne), têbigihîjin. Bi saya vê ranêzikîyê, me dît ka mercên şûngehî û sosyo-ekonomîk ên di navbera zarokan de çawa dibin sedema azmûnên ji hev cuda. Ciwanên ku me bala xwe da ser wan, ew takekes bûn ku li bajaran an jî li çolteran mezin bûbûn, çûbûn dibistanê an jî neçûbûn û di zaroktîya xwe de dest bi şixulê kiribûn û di temenekî pir ciwan de bal û meraqa wan çûbû ser sîyasetê. Lê belê, digel van hemû cudahîyên takekesî, du mercên hevpar û bingehîn ku teşe dide azmûnên wan, balê dibin ser xwe:

1. Şopên pirteweqî yên tundî û pevçûna di salên 1990'î de, hem di jîyana wan a taybet hem jî di dînamîkên komalî de bi roleke mezin rabûye.

2. Di salên 2000'î de, tevî ku birêvebirina rewşa neasayî betal bûbû jî, cografyaya kurdan ji herêmên din ên Tirkîyeyê cuda û cihê hatin girtin û polîtîkayên ewlehîyê yên resen û pêpeskirinên mafan li wan deran hatin qewimandin.

[5] Gotinên hevaxêveran ên ku bi Kurdî hatine tomarkirin, ji alî rastnivîsînê ve hatine sererastkirin lê wekî din midaxale li zimanê wan nehatiye kirin; her wiha, gotinên bi Tirkî yên di axaftina hevaxêveran de jî nehatine wergerandin. Digel wê yekê jî, cihêgirî di zaravayên Kurdî de nehatiye kirin û gotinên Kirmanckî wekî xwe hatine weşandin.

Ji vî alîyî ve, ji ber ku em ê di beşa duyem de, zemîna ku pêpeskirina mafên jîyanê pêkan dike, analîz bikin, loma jî ji bo famkirina ji wan, ev beşa ku ronî dide şûngeh û azmûnên cuda, giring e.

Her yek şûngehek ku mafê jîyanê yên zarok û ciwanan lê hatiye pêpeskirin, xweyî karakterîstîkeke dîrokî û sîyasî ne. Lê belê, pêkan e ku em wan bi du kategorîyan ji hev cihê bikin: an ew navenda bajar û bajarokan in ku gelheyên ku di salên 1990'î de bi darê zorê ji şûn û warên xwe hatine derkirin û ew jî hatine li van deran bi cî bûne û loma jî ew bajar û bajarok bi awayekî demografîk mezintir bûne; an jî, ew cînişînên çolterî ne ku ji alî polîtîkayên ewlehîyê ve stratejîk in û li ser xetên sînorî ne. Ji ber hindê jî, ev her du karakterîstîk, çarçoveya pêpeskirinên mafê jîyanê jî pêk tînin.

## 1) Azmûnên Li Bajaran: Livdarîya Komalî û Polîtîkayên Ewlehîxwaz

Taxên ku mirovên di salên 1990'î de bi darê zorê ji gundên xwe hatine koçberkirin û hatine li bajaran ew ava kirine, wekî hilgirên windayîyên borîrojê û şîngirtina hatî dewisandin teşe digire (Dinç, 1997;  Jongerden, 2008; Çağlayan et al., 2011; Akın & Danışman, 2011). Pêpeskirinên mafê jîyanê yên li bajaran, bi piranî li ser wê armancê ye ku dixwaze vê mobîlîzasyona sîyasî belawela bike û enerjîya komalî biçewisîne. Bûyerên komalî yên di vê serdemê de qewimîne, nîşan didin ka ranêzikîya ewlehîxwaz a dewletê çawa di nav jîyana li bajêr de bi cî bûye (Kılıç, 2023). Di wê pêvajoya ku wekî dema pevneçûnî tê binavkirin jî, derbirîna sîyasî ya qada giştî ya bi her şêweyî, wekî "tehdît"ekê hatiye kodkirin û sînorê di navbera pêkhatina ewlehîyê û çewisandina dijberîyê de, dem pê de, nedîyar û ximamî bûye. Ji ber hindê jî, salên 2000'î nîşan didin ka tundî çawa rasterast ji pevçûnên çekdarîyê ber bi duristkirina qada giştî ve hatiye anîn û şêweyên hebûnê yên di kuçeyan de hatine krîmînalîzekirin.

### A) Li Amedê Tundî û Tevgerînên Komalî yên salên 2000'î

Di vê rewşê de, Amed yek ji wan bajaran e ku em dikarin veguherîna şêweyî ya tundîyê bi awayekî aşkeretir bibînin. Di salên 2000'î de, li Amedê, tundî ne wekî pevçûna çekdarîyê, lê zêdetir bi rêya kontrolkirina jîyana rojane û bisînorkirina jîyana gelemperî, xuyanîtir bûbû. Gava bi bajarên din re hevberî were kirin, tundî li bajarên kurdan, bi şêweyê xwe yê midaxelekirina hêzên ewlehîyê û bi şêweyê xwe yê rewakirina tundîyê, bi kontrol bû û di heman astê de jî sîstematîk bû. Her çend, şûna bajêr, a ku li ber çavên raya giştî ya navneteweyî û xuyanîkirina wî ya ji ber metropolbûnê çêbûbû, tona tundîyê diguherand jî, vê carê jî, bi rejîma ewlehîyê ku di nava "pergala asayî" de dihat berdewamkirin, dor li komalê girtibû. Li gorî qadên bajarî û çolterî yên bajarên din ên kurdan, Amedê derfetên cuda yên perwerdeyî, sosyalbûn, kar û çandî derpêş dikirin û ji ber vê jî, van qadan

mobilîzasyona komalî û sîyasî û hevpêwendîyê zêdetir kiribûn. Lê belê, her wekî di mînakên ku em ê bidin de jî tê dîtin, di salên 2000'î de ku bi telefona destan û bi înternetê ragihandin hêsanîtir bûbû, tevgerên civakî, tenê bi taxekê an jî bi bajarekî re sînorkirî nemabû û bandor li gelek deran kiribû. Loma jî, her çend qurifînên xwe yên cuda hebin jî, pêkan e ku em behsa şûngehên berxwedana pevgirêdayî û şûngehên dewisandinê bikin.

***Avakirina Navenda Qada Gelemperî ya Kurdan a li Tirkîyeyê***

Piştî derbeya sala 1980'yî, milîtanên kurdan ên ji fraksîyonên polîtîk ên ji hev cuda li Girtîgeha bi 5 Nimro ya Amedê hatin hepskirin û bajarê Amedê, bi berxwedana ku li dijî tundî û şkenceya sîstematîk a di wê girtîgehê de dihatin kirin û di bingeha xwe de jî, bi serîhildanên ku di salên 1990'î de hatin kirin, bû hilgirê nasnaveke sîyasî; û di salên 2000'î de jî, ji alî sîyasî, komalî û çandî ve, veguherînên giring li bajêr çêbûn. Wekî encama valakirina gundan û koçberkirinên bi darê zorê, zêdebûna demografîk lez girt û bi taybetî li bajarokên Kayapınar (Peyas), Bağlar (Rezan) û Yenişehirê (Bajarê Nû) bajarîbûneke bêpîlan çêbû. Di vê serdemê de, li Amedê pevçûn kêmtir bûn, rêjeya xizanî û bêkarîyê bilind bûn û sektorên xizmet û înşaatê, koçkirina ji gund ber bi bajêr ve zindî hişt. Di sala 2000'î de, gelheya bajêr 1.3 milyon bû û di destpêka salên 2010'an de bû 1.6 milyon (Türkiye İstatistik Kurumu [TÜİK], 2000;2010). Di salên 2000'î de, li gorî navekîya Tirkîyeyê, Amed yek ji wan bajaran bû ku ciwan tê de zêde bû û li gorî vê rêjeyê, ji %60'ê bajêr temenê wan ji 25'an kêmtir bû. (TÜİK, 2000). Her wiha, di salên 2000'î de, Zanîngeha Dîcleyê jî mezintir bû û vê yekê kir ku ciwanên herêmê berê xwe bidinê û wê derê bikin navend. Ev ciwanên ku ji çolterê bûn, di mercên ekonomîk ên dijwar de dijîyan lê hişmendîya wan a sîyasî bilind bû, di tevgerînên komalî yên salên 2000'î de bi roleke pêşeng rabûn.

Ji sala 1999'an şûnde, Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê û şaredarîyên bajarokan ji alî partîyên sîyasî yên kurdan ve hatin birêvebirin û vê yekê kir ku bajêr di nav bajarên kurdan de şûna xwe ya navendî xurttir bike. Şaredarî bi pêkanînên xwe yên pêşeng ên wekî şaredarîya pirzimanî, birêvebirina beşdar, nimandina jin û ciwanan û di veguherîna qada gelemperî de bi roleke giring rabû (Gambetti, 2005). Ji sala 2000'î û şûnde, festîvalên çand û hunerê an jî festîvalên wêjeyê ku ji alî Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê ve her sal dihatin lidarxistin, grûbên etnîk û çandî yên ji hev cuda dianîn cem hev û dibû sembola serdema ku pircureyîya çandî tê de geş û lidar bû. Bi vî awayî, Amed bû şûna bingehîn a restorasyon, rehabilîtasyon û rarûbûna bi borîrojê re. Bi taybetî ji sala 1999'an şûnde ku tevgera sîyasî ya kurdan di hilbijartina şaredarîyan de bi ser ket, bajar hem ji bo tevgera kurdan hem jî ji bo aktorên sivîl ên komalî, bû şantîyeyeke polîtîk a avakirina vebîreke gelemperî. Tevgera kurdan, di serî de şaredarî, di ser tora rêxistinên sivîl, înîsîyatîf û sazîyan re, Amed ji nû ve vaftîz kir û bajar ji sala 1999'an heta bi 2016'an ku bi rêya qeyûman hat desteserkirin, bû şahidê avakirineke di asta çandî, sembolî û şûngehî de (Çelik, 2021).

Ji ber hindê jî, em dikarin heta sala 2015'an behsa Amedê bikin û bêjin; şaredarîya bajêr destek da despêkerîyên (attempt) çandî û sosyal yên ji hev cuda, polîtîkayeke nû ya bibîranîn û beryadê bi pêş xist û di warê dekolonîzekirina jîyana komalî û qada gelemperî de gavên giring avêtin (Gambetti, 2010).

Lê belê, destpêkerîyên sivîl ên ji warên cuda û tevgerên komalî jî di veguherîna qada gelemperî de bi roleke giring rabûn (Çiçek, 2012). Di van salan de ku tevgera jinan, tevgera ciwanan û destpêkerîyên çand û hunerî zêde bûn, gelek sazîyên çandî û yên civaka sivîl derketin holê û daxwazên xwe jî di qada gelemperî de xuyanîtir kirin. Amed, bi sazîyên xwe yên medyayê ku weşana xwe bi Kurdî dikirin û bi çalakîyên xwe yên şano, muzîk û wêjeya bi Kurdî, bû navenda hilberandina çandî. Dibistanên Kurdî ku di heman salan de hatin vekirin, hewl da ku ji bo zarok û ciwanan modeleke perwerdeyê ya alternatîf bi pêş bixe. Bi taybetî, texma Bağlarê (Rezan) ku wekî taxên reşbanan dihat zanîn û di koçberkirina bi darê zorê ya salên 1990'î de bûbû warê cînişîna mirovên ku ji gundan dihatin bajêr, (Andiç & Pasta, 2025); konservatuwarên ku di warên muzîk, sînema û şanoyê de û bi zimanê dayikê derfeta perwerdeyê derpêş dikirin ji bo ciwanên ku di vê texmê de (Bağlar-Rezan) mezin bûbûn û ji ber gelek sedeman nikaribûn perwerdeya xwe ya formel bidomînin, qadeke giring a hilberandinê çêkir.

Di destpêka salên 2000'î de, xebatên di warê zarokan de hatin kirin jî, hem destpêkerîyên civaka sivîl hem jî di rojeva birêvebirinên cihkî de cîyekî xuyayî da xwe. Ji sala 2001'ê û şûnde, bi pêşengîya Şaredarîya Surê ya Amedê û bi desteka gelek sazîyên sivîl, Festîvala Zarokan (Sosyal Kültürel Yaşam Geliştirme Derneği, 2003) hat lidarxistin û vê çalakîyê, wekî çalakîya yekem a di vî warî de, bal bir ser xwe. Xebatên li ser zarokan, qadeke wisa ye ku hê nû geşe dide xwe û li Amedê, di mercên pevçûnê de, bi perspektîfeke hem sarêjker hem jî ya nûxwaz hat nirxandin. Ev destpêkerîyên ku bi taybetî ji bo zarokên wan malbetên ku di salên 1990'î de ji ber valakirinên gundan koçî bajêr kirine, hatin kirin, di warê psîko-sosyal, perwerde û hunerê de valahîyeke giring tijî kir. Her çend sazî van destpêkerîyan bi vî awayî pênase nekin jî, aşkere ye ku xebatên ku hatine kirin, bi rêya hunerê desteka psîko-sosyal didin. Di vê demê û di warê zarokan de, mirov dikare wekî mînakên herî kartêker û mayende van sazîyan bêje: Komeleya Zarok Di Bin Heman Banê De (KZHB) ku di sala 2003'yan de hat avakirin û der heqê hilberandina polîtîkayên li ser hîma zarokan de, ji bo zarokên ku bi dezavantaj in projeyên sarêjker bi rê ve dibe; Weqfa Alîkarîya Mirovane û Koçkirinê (WAMK) ku di destpêka salên 2000'î hat avakirin û di warê ekolojî, jin û zarokanda xebatan dike; Kooperatîfa Ronîya Hêvîyê ku di sala 2004'an de, di warê çand û perwerdeyê de bi zarokên li Sûrê re xebat meşandin û ji sala 2015'an şûnde jî bi navê Komeleya Hêvîyên Rengîn xebatên xwe domandin. Van sazîyan, bi taybetî di konteksta mafên zarokan û sarêjkirina komalî ya piştî pevçûnan de, paşxaneyeke resen û veguherîner tev li qada zarokan kir ku li Tirkîyeyê hê nû geşe dide xwe.

Herçî pîrozkirinên Newrozan e, sembola tevlivînên komalî yên di salên 2000'î de ye. Newroz di salên 1990'î de hatin qedexekirin û ji sala 2000'î û şûnde jî, bi destûrên fermî li Amedê bi awayekî girseyî hatin pîrozkirin. Pîrozkirinên Newrozê ku di wan salan de, bi sed hezaran mirov anîn cem hev, bi tevî hewldanên dewletê yên ji bo “Tirkkirina wê” jî, di têkoşîna kurdan a ji bo maf û zanavê (identity) de, bû qadeke ku kurdan hêza xwe ya komalî nîşan dida. Newroz, heta sala 2006'an di Qada Fuarê de, piştre jî di Parka Newrozê de hatin pîrozkirin û di hin salan de, mesajên serokê PKK'ê Abdullah Öcalan tê de hatin xwendin û bû qada berxwedanê ku daxwazên aştî û azadîyê lê berz dibûn. Ji bilî 21'ê Adarê, bi dirêjeya salê, merasîmên cenazeyan, çalakîyên girtina derebeyan, boykotkirina dibistanan û meş dihatin lidarxistin û vê yekê livdarîya bajêr nîşan dida. Ev livdarîyên komalî ku ji alî dewletê ve pir ji nêzik ve dihatin şopandin, her wekî di mînaka 28'ê Adara 2006'an de jî tê xuyan, di heman demê de, bûn qewamên ku tundî û çewisandina dewletê û rûyê wê yê veguherîyayî nîşan dida.

### *Bûyerên 28'ê Adara 2006'an: Şêweyê Tundîyê ya Vediguhere*

Bûyerên ku di 28'ê Adara 2006'an de dest pê kirin, wekî yek ji mînakên bi bandor ên van dînamîkên cihkî û herêmî bi pêş de tê. Mirov dikare bûyerê wekî kêlîyeke qurifînê bibîne ku hebûna polîtîkayên ewlehîxwaz a di qada giştî de û ranêzikîya dewletê ya li bertekên komalî krîstalîze dike (Günay, 2009). Di heman demê de, tevgera komalî ku di 28'ê Adar 2006'an de li Amedê dest pê kir, hem şêweyê rarûbûna bi dewletê re hem jî awayê veguherîna berteka komalî ya li bûyerên zincîrî, datîne rastê.

14 endamên PKK'ê ku di operasyonan de hatibûn kuştin, di 28'ê Adara 2006'an de li Amedê dihatin veşartin û vê yekê leq li bûyerên protestokirinê xist. Di merasîma cenazayê de, gelek balafirên F-16 li ser goristanê difirîyan û di vegera ji goristanê de jî polêsan li girseya ku ji goristanê vedigeriya, midaxale kir. Li ser vê yekê protestoyan dest pê kir û piştî Amedê belavî Mêrdîn, Batman û Sêrtê bû. Dikandaran derebeyên dikanên xwe ranekirin, xwendevanan dibistan boykot kir. Li Amedê, ji ber hingivîna çekên guleyî an jî kapsulê gazan, 5'ê wan zarok 10 kesan jîyana xwe ji dest da. 200'î wan zarok 563 kes hatin binçavkirin û 91'ê ji wan zarok 382 kes hatin girtin; li Mêrdînê, Batmanê û Sêrtê jî 3 kesan jîyana xwe ji dest da (Epli & Yaşar, 2024: 172-173).

Ji ber ku hêzên ewlehîyê hêza bêkontrol û derhemd bi cî anîn, bûyer berbelav û zêdetir bûn; digel wê jî, hevdîtin hatin çêkirin bi kesûkarên zarok û ciwanan re ku di van bûyeran de hatin kuştin; û ew roj, di van hevdîtinan de, bi zimanekî zelal û aşkereyî tên vegotin. Gelek hevaxêverên me, daxuyandina serokwezîrê wê demê Recep Tayyip Erdoğan ya wekî “Herçî zarok be jî, jin be jî, heke bûbe alava terorê, em ê midaxeleya hewce lê bikin” (“Çoçok da olsa”, 2006), wekî beyanekê ku bûye sedem ku hêzên ewlehîyê di bûyerên 28'ê Adarê de hêzeke

derhemd bi cî bînin. Hevaxêveran di heman demê de, ev rewş wekî destpêka pêvajoyekê wisa didîtin ku êdî "*Zarok li ber çavê hemû dinyayê tên kuştin û fermana wê jî ji alî rayedaran ve tê dayîn*"[6] û wan digot, piştî vê gotinê kurd ketin demeke pir cuda. AKP'ê piştî ku di saala 2002'yan de bû desthilat bendewarîyek di gel de çêkiribû; lê vê bûyerê, di heman demê de, der barê wê bendewarîya de nîşan bi qurifînekê dikir. Ev gotinên Erdoğan, wekî nîşaneyekê dihat famkirin ku wê ranêzikîya ewlehîxwaz ya ji serdemên berê mayî, berdewam bikira.

Gava protesto bi lezekê berbelav dibûn, aktorên sivîl ên bajêr tevlivîyan û ji bo ku bûyer bi dawî bibin, xwestin bila hêzên ewlehîyê xwe bidin paş û lihevkirinek çêbibe. Rojnameger, mamosta, sendîka, sazîyên civaka sivîl û birêveberîyên cihkî, ji bo ku di nav aramîyê de cenaze werin teslîmkirin, werin binaxkirin û di çarçoveya rêzgirtinê de şîn were danîn, hewleke pir zêde da. Lê ji van hewldanan tu encam çênebû; tengijeya heyî her roj zêdetir bû. Tevlivîna civaka sivîl ku ji bo sekinîna bûyeran çêdibû, hevdîtinên ku sendîkayan û înîsîyatîfan bi birêvebirina navendî re çêdikirin/dixwestin çêkin, bêencam man û tevî ku gelek dem di ser re çû jî, ev yek, wekî berpirsîyeke giran ma li ser aktorên wê demê.

> *"Gava bûyerên 28'ê Adarê çêbûn (...) Te dî her kesî hewl dida ku em tiştekî bikin, me ji wîlayetê randevu dixwest û walî randevu nedida me. Lê li kuçeyê, di cîyên ku teng li wan [hêzên ewlehîyê] dihat, digotin, 'Girseyê rawestînin' (...) Em li wê derê wekî mertal bi kar dianîn, digotin, 'Wan rawestînin!' lê bi wateya fermî, walî em nedikirin mixatabê xwe. Hevalên mamosta yên ku li wan deran [li cîyên ku pevçûn lê giran bûn] çi gava keys didîtin dihatin sendîkayê, (...) 'Em dikarin çi bikin? Ji vê pêvtir divê çi bikin?' Û a rast, vê yekê dida der ku me nedikarî tiştekî bikin, pêşî li wê qetlîamê bigirin û ev yek li me dibû barekî giran. Di vê qonaxê de ku em hatinê, berpirsîya me jî heye ku me nekarî em tiştekî bikin. (...) Me nekarî pêşî lê bigirin..."*[7]

Di dema bûyeran de, li hemû bajaran jîyan hat ber rawestînê û dibistanan nekarî perwerdeyê bidomînin. Hevdîtina ku me digel mamostayên ku di dibistanên navenda cîyên bûyeran de dixebitîn, çêkirin, pêwendîya ku bi xwendekarên xwe re danîbûn û rolên ku di vê pêvajoyê de pê rabûbûn wekî, "*ji hêlekê ve me hewl dida ku em ewlehîya xwendekaran pêk bînin, ji hêla din ve jî, ji bo ku pevçûnên li bajêr bidin rawestandin zor li me kirin ku em bibin alî*"[8] dianîn zimên. Carinan em dibûn navbeynkar carinan em dibûn mertal carinan jî em tev li cenazeyên xwendekaran dibûn.

---

[6] Hevdîtin: Amed, Navend -Digel mamostayan Grûb-Navend -13.06.2024

[7] Hevdîtin: Amed, Navend -Digel mamostayan Grûb-Navend -13.06.2024

[8] Hevdîtin: Amed, Navend -Digel mamostayan Grûb-Navend -13.06.2024

*"Ji dibistanan xwendekarek jîyana xwe ji dest dabû û me ancax roja çaran bihîst, ji ber ku di wê pêvajoyê de, ne pêkan e mirov bizanibe ka kî li ku derê ye, [li kê] çi pê hatiye. (...) Em çûn dibistanê, hevalên mamosta hemû diqilqilin, xwendekar jixwe nehatine. Agahîya birîndarbûnekê gihîşt me, di pola min de xwendekar e. (...) Xwendekarek ku gava li şaneşînê ye, fîşeka gazê dikeve [lê dihingive] birîndar dibe. (...) bûyerên 2006'an (...) Bi taybetî bandora wê li ser perwerdeyê pir mezin bû. Li vê derê, xwendekar, mamosta jî, dibistan wekî hedef hatin girtin. (...) Yanê, perwerdekarek jibêgavî li vê difikire. Yanê wê li wê derê perwerde çawa be, tu wan li hêlekê dihêlî, mafê jîyana min, mafê jîyana zarokan, mafê jîyana xwendekaran, wê çawa be? Xwendekarê min birîndar e, em çûn mala wan bo serdanê. (...) Roja sêyem, vê carê Abdullah Duran, di pola li tenişta pola min (...) Agahîya kuştina wî. Di wê rewşa kaosê de, here cem malbatê, cenaze..."*[9]

Ahmet Araç (26 salî), Emrah Fidan (17 salî) û İlyas Aktaş (24 salî) ku me di çarçoveya vê vekolanê de bi kesûkarên wan re hevdîtin kir, di protestoyên 28'ê Adar 2006'an de jîyana xwe ji dest dan. Bi hevdîtinên ku digel keskûkarên zarok û ciwanan, mamosta, rojnameger û hunermendan hatin çêkirin, da der ku 28'ê Adara 2006'an, wekî werçerxekê ye ku tundîya dewletê û berteka komalî hev dibirin û ev yek di vebîra kolektîf de cîyê xwe dihêvişîne. Ev berdewamî, her çend ji deh salan zêdetir dem di ser re çûbe jî, datîne rastê ku bandorê li vebîra şûngehî ya roja îro dike û hêmaneke dînamîk e ku teşe dide hilberandina vebîra sîyasî. Tê vegotin ku ambulans nehatiye alîkarîya Enes Ata, destûr nedane ku mirov midaxaleyê lê bikin û ev ên hanê parçeyên çalakîyeke sîstematîk û honakkirî ye:

*"Ambulans nehat. Ji bo ku wî bigihînin nexweşxaneyê rojnamegeran ew hilda, bûyer li ber çavên rojnamegeran qewimî."*[10]

### B) Li Cizîrê, Li Ber Sîya Tundîyê Azmûnên Zaroktîyê

Cizîr bû ew der ku dijwarî lê çêbû da ku tiştên der heqê bûyerên salên 2000'î de qewimîne û di hiş û bîran de mane, bersivek were peydekirin. Sedema herî giring a vê yekê ew bû ku tiştên di sala 2015'an û di şerên bajaran de qewimîbûn, li bajêr bûbûn travmayek û bendeke wisa çêkiribû ku berdewamîya komalî û şûngehî ya bajêr, asê kiribû. Tundîya giran ku di wê demê de qewimîbû, ji nû ve teşe dabû bergeh û şûngeha bajêr; û bi awayekî mayende hevkêşa di navbera şûngeh, jîyana rojane û vebîra komalî de heyî, hejandibû (Darıcı & Hakyemez, 2019). Tevî ku deh sal di ser re bihurîbûn jî, li Cizîrê, vebîra kolektîf hê jî li dor rûxîna sala 2015'an teşe digirt. Şêweyên bibîranînê yên berî sala 2015'an hatibû ber jibîrkirinê, vebîra bajêr xwe di wê kêlîya qurifînê de asê kiribû.

[9] Hevdîtin: Amed, Navend -Digel mamostayan Grûb-Navend -13.06.2024

[10] Hevdîtin: Amed, Navend -Bi rojnamegeran re, Grûb-Navend – 13.06.2024

Ji ber van sedeman, pirsîna me ya rewşa salên 2000'î ya li Cizîrê û daxwaza bihîstina ka di wê demê de çi qewimî, ji bo me bû hewleke pûç. Ji destpêka salên 2000'î û şûnde, nermbûna guherbar a li bajarên kurdan çêbû û seqaya hêvîdarîyê ku bi "pêvajoya çareserîyê" ya di sala 2012'an de dest pê kir, li Cizîrê, bi şerên bajaran ên di sala 2015'an de, li feksê ket. Tiştên ku der heqê aştîya civakî û di wan rojan de qewimîn, wekî kêlîya sarbûna hemû hêvîyan di bîr û vebîran de cî girtin. Di hevdîtinan de, ev rewşa jibîrkirinê, ji tercîheke bi hişmendîyê zêdetir wekî encama giranîya travmayê hat pêşîya me. Vebîr, di 2015'an de asê mabûn; tu kesî nedixwest rojên salên 2000'î ku gelek caran bêşer û pevçûn bû, vebêje; her kes ji bo bîrxistina wan rojan diket dijwarîyê. Tiştên ku di salên 1990'î de li kuçeyên Cizîrê qewimîbûn, bi "serdabên Cizîrê" re (Altay, 2016) dibûn yek û di hevdîtinan de diqulibî ser gazinckirin û hesabpirsînê. Ji dewletê û ji hemû sazîyên wê, ji rêxistinên sîyasî, ji civaka sivîl û ji raya giştî ya navneteweyî dipirsîn; "Wê hingê hûn li ku bûn? We çi kir? We çima pêşî lê negirt?"

Digel bêdengmayîna mezinên ku bûyerên salên 1990'î dîtin, di wan hevdîtinan de ku me bi ciwanan re kirin, hêrsa ku ji ber vebîra di navbera nifşan de dewrî hev dibe, bi pratîkên wan ên devkî û çalakîyî xwe dida der. Beşdarekî ciwan yê ji Cizîrî ku tenê torosên spî di bîra wî de mabûn, salên 2000'î wiha pênase dike:

> *"Belkî jî salên 90'î hê sexttir û dijwartir bûye. Nizanim. Lê di mercên salên 2000'î de, salên 2000'î, sexttir bihurîn. Yanê, ez bawer nakim ku ew dijwarî ji alî dewletê ve hatibe nermkirin. (...) Bi ya min midaxaleyeke biçûk jî sextbûn e. (...) Mesela Yahya Menekşe... Hevalekî min ku min rojek berê ew dît, dotira rojê di bin panzêrekê de ma û mir."*[11]

Ev yek jî nîşanî me dide ku em li Cizîrê, di warê raguhastina vebîrê ya di nav nifşan de bi encameke din re rû bi rû ne: zarokên di salên 1990'î de ji dayika xwe bûne di salên 2000'î de veguherîne ser nifşa ku wekî *Zarokên ku Keviran Diavêjin* tê binavkirin. Nifşek e ku her çend di salên 1990'î de nejîyabe jî, vebîra wê serdemê ji malbatên xwe û ji derdora xwe ya nêzik guhdarî kiribû, bi wan mezin bûbû û vebîra heyî vediguherand şêweyên têkoşîna xwe. Ev vebîr, bû yek jî dînamîkên xurt û dîyarker ên salên 2000'î. Ciwanekî ku me li Cizîrê hevdîtin pê re kir, raguhastina vebîrê ya di nav nifşan de, di jîyana wan de çawa veguheriye ser pratîkekê, wiha derdibire:

> *"Ji bîr dikin ku ev zarok bi travmayên salên 90'î mezin bûn û travmayên wan teşe girt û veguherî ser çalakgerîyê. Jixwe em li Cizîrê, li Taxa Nur, li Taxa Cûdîyê rabûn.*[12] *Li van deran her tim çalakî hebû. Her çend ew ên ku salên 90'î ji dayika xwe bûne wehşeta*

[11] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Yahya Menekşe -15.02.2025

[12] Taxa ku şer û pevçûnên 2015'an lê qewimîn.

*salên 90'î yek bi yek nedîtibin û nejîyabin jî, em bi mîrateya travmayê mezin dibûn. Em tiştên di wê seqayê de çêdibûn, heta bi hestîyên xwe hîs dikirin û mezin dibûn. Yanê, gava ez niha wê demê dinirxînim, ji vê derê li wê 16 salîya xwe dinêrim, tiştê ku berê me dida kuçeyê, ew kevir bi me dida avêtin; ew travma bû ku ji salên 90'î li me hatibû raguhastin."*[13]

Gava sal, serdem û aktor diguherîn, ji bo her du alîyan, pratîk jî diguherîn. Şêwe û şêwaza her serdemê û vebîra wê dibû diyarker. Dewlet û sazîyên wê, dest pê kiribû bi amrazeke din derdiket hemberî zarokên 1990'î. Ciwanekî din ê Cizîrî, têkilîya ku dewletê bi Cizîrê re danîbû, bi gotinên wekî "*Li vê derê tu tişt ne rasthatin e*"[14] pênase dikir.

***Yahya Menekşe û Zarokên ku Keviran Diavêjin***

Her wiha, di çarçoveya vê vekolînê de, em çar caran çûn Cizîrê û em li wir bi kê re axivîbin, hemû axaftinan berê xwe dida Yahya Menekşe yê 16 salî ku panzêr lê qelibîbû û ew kuştibû. Ev bûyer, li Cizîrê, vediguherî ser kêlîya qurifîna nifşekê, vediguherî ser protestokirina ku bi sedan kesên ku Yahya nas dikirin an jî nas nedikirin dabû destpêkirin û vediguherî ser vebîra ku mohra xwe li şûngehê dida. Yek ji ciwanan ku tev li protestoyan bûbû, motîvasyona xwe wiha pênase dike:

*"Ez Yahya nas nakim. Tu bîranîneke min tune pê re. Me bo carekê be jî hev nas nekiriye. Lê belê, gava li bajarekî, ciwanek, bi zanebûn an jî bêhemd, di bin panzêrê de bimîne, ev yek hêrseke qerase bi mirov re çêdike."*[15]

Hin zarokên ku bi vê hêrsê derketibûn kuçeyan, hin ji wan hevalên Yahya yên taxê bûn hin ji wan hevalên wî yên dibistanê bûn û hin ji wan jî qet ew nas nedikir. Hin ji wan hê nebûbûn 18 salî. Cizîr, bi vê bûyerê, ji nişkê ve li nav hev diket, hemû dikandaran derebeya xwe dianîn xwarê û tev li cenazeyê dibûn. Hevalê Yehya yê dibistana seretayî, hevaxêverekî ciwan, motîvasyona xwe ya wê rojê ku ji erdê kevir hilanîye û avêtiye, wiha pênase dike:

*"Ez û Yehya, em hevalên hev ên dibistana seretayî û yên navîn bûn. Em li heman taxê mezin bûn. Cîranê me bû. Ez wê çaxê 16 salî bûm. Roja 15'ê Sibata 2008'an bû. Min lîse dixwend. Gava ji dibistanê diçûm maê, hîn bûm ku hatiye kuştin. Gava min bihîst, min zende girt. Tavilê çûm cîyê bûyer lê qewimîye. Hê jî xwîna wî li erdê bû. Min ew li wir nedît. Lê xwîna wî li erdê bû. Çawa ku min bihîst, hêrsa min a mezin rabû. Bi vebîra ku ji salên 90'î bi me re hatibû, ji nişkê ve, tu hîs dikî ku êrîşî îroroja te jî dikin. Di wê kêlîyê*

---

[13] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

[14] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

[15] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

*de dinya di çavên min de tarî bû. Jixwe li te wisa tê ku tu nikarî lê bifikirî. Wekî mînak, sedema ku min hema ew kevir hilda û avêt, ev e; cara pêşî min êrîşkirinê li ser xwe hîs kir. Cara pêşî, hevalekî min, hevsalekî min, bi hovane hat kuştin. Ez 16 salî bûm. Di wî temenî de, min nedikarî vê binirxînim û ne hişasa bûm. Tenê min bertek li hemberî xerabîya ku li me/li min haitbû kirin, nîşan dida."*[16]

Li gorî ku hevaxêver radiguhêzîne; di cenazeya Yahya Menekşe û di bûyeran de ku piştî merasîma cenazê derketine, nêzikî 700 kesî hatine binçavkirin û piranîya wan zarok 300 kes hatine girtin. Ev zarokên ku bi rêya çapemenî û amrazên medyayê hatin teşhîrkirin, wekî *Zarokên ku Keviran Diavêjin hatin binavkirin. "Piştî guherîna di TMK'ê de (Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê) ku di 2006'an de hat kirin, bi sedan zarok, ji ber sûcên terorê hatin girtin û ew avêtin girtîgehan. (...) Di 27'ê Tîrmeha 2010'an de, guherîneke qanûnî hat kirin ku di raya giştî de wek* Qanûna Zarokên ku Keviran Diavêjin *tê zanîn.*" (Epli & Yaşar, 2024: 179-180). Zarokên ku ji ber vê xalbenda qanûnê dihatin girtin, ew nebirin qawîşeke normal, lê ew birin tîmarxaneyê û ew li wê derê mezin bûn (Turgut, 2024). Yek ji wan ku gava zarok bûye ew avêtine tîmarxaneyê û tundîya gardîyanan lê qewimîye, dibêje, "min cara pêşî hêza dewletê li wê derê nas kir" û lê zêde dike:

*"Tundîya ku gardîyanan li me diqewimand, bi temamî, ew hêza dewletê bû ku ew ê ji vê û şûnde û di jîyana te de nîşanî te bidaya. Pir dijwar bû. Misêwa tundî li me dikirin. An bi awayekî fizîkî an jî psîkolojîk... Gava tu ji wê derê derdikevî, tu tûjtir dibî. A rast, tu di tîmarxaneyên zarokan de, dest pê dikî hêrsê birêxistin dikî. Li hundir, hêrs dihat birêxistinkirin."*[17]

Ev hêrsa ku li hundir hatibû birêxistinkirin, di salonên dadgehan de dihat zimên û wateya wî kevirê ku ji erdê hatibû hilanîn û avêtin, wekî parastinekê, ji desteya dadgehê re tê gotin:

*"Min jê re [ji dadger re] got, kî bûya jî wê li hemberî kuştineke wisa bertek nîşan bidaya, her kesî wê nîşan bidaya. Min got, îro jî, dîsa, gava hûn hevalekî min bikujin, ez ê dîsa keviran biavêjim."*[18]

*Zarokên ku Keviran Diavêjin* ku bi bûyera Yahya Menekşe re ketin rojevê û li Cizîrê qurifîneke mezin çêkir, ne tenê bi polîtîkayên ewlehîxwaz ên serdemekê, di heman demê de, bi hêrsa ku vebîra di nav nifşan de ew hilgirt û bi lêgerîna bo edaletê teşe girt. Girtin, cezakirin û mercên girtîgehan ên giran, li şûna ku vê hêrsê biçewisîne, kûrtir kir. Ciwanên

[16] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

[17] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

[18] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi ciwanan re navend-grûp – 14.02.2025

ku li Cizîrê mezin bûn, ji serdema xwe wêdetir, vebîra borîrojê û qurifînên roja îro jî xuyanîtir kirin.

## 2) Jîyanên Li Ser Sînor: Jîyana Rojane ya Li Ber Sîya Milîtarîzasyonê

Di vê xebatê de ku me dît ka polîtîkayên ewlehîxwaz, li navenda bajaran, çawa teşe didin jîyana rojane; û kategorîya din a şûngehî ya dîyarker jî herêmên ser sînor bûn. Ji ber ku beşek ji pêpeskirinên mafê jîyanê ku li deverên çolterî diqewimin, encama wê milîtarîzasyonê bû ku bi hinceta pêkanîna "ewlehîya sînorî" dihat kirin. Ev deverên ku amrazên leşkerî, barûyên çavdêrîkirinê û qereqolên sînorî dor lê digirtin, ji hêlekê ve di salên 2000'î de ji nû ve bûn qadên jîyanê û ji hêla din ve jî, tevî ku bermayîyên şer ên ji şerê germ mane, nehatibûn hilanîn jî, bi hinceta ewlehîyê, wekî "şûngehên ku tehdîtê çêdikin" ji nû ve dihatin pênasekirin.[19] Loma jî, şûngehên ku di navenda van bûyeran de bûn, dibûn ew der ku li wan deran, tengijeya di navbera sîyaseta ewlehîxwaz a dewletê û qada jîyanê ya civakê de heyî, xuyanîtir dibû. Sê mînakên li jêr, ronîyê dibe ser mercên sîyasî û ekonomîk ên jîyana li ser sînor û bala xwe bi hûrgerî dibe ser beşên tundîya resen a van herêman.

### A) Kovala Tundîyê ya li Geverê Vediguhere

*"Min sûnd xwar, Ez dizanî... min gotê bi Xudê hûn ê li Geverê bêne kuştin, min gotê çi dera hûn hez biken, heta Iraqê herin, Geverê, Ergenekon e, hûn dê bêne kuştin. ...dê bêne kuştin."*[20]

Gava em li Geverê, bi kesûkarên zarok û ciwanan, bi rêxistinên civaka sivîl û bi aktorên cuda re hevdîtin çêkirin, ev gotinên ku yek ji hevaxêveran radiguhêzîne, car din û car din hat pêşîya me. Ev rewş, bi hemû aşkeretîya xwe datîne rastê ka Gever di salên 2000'î de bûye şahida tundîyeke çawa giran. Loma jî, di vê beşê de, li şûna ku em bi awayekî spesîfîk tenê behsa bûyerekê bikin, me biryar da ku em qurifînên ku ji ber bûyeran çêbûne û bandorên wan lê bikolin. Her wiha, her çend bûyer û sedem mîna yên bajarên din bin jî, tundîya ku li vê derê hatiye pêkanîn, hê sîstematîktir û bênavber bû. Gelek hevaxêverên şûngehên din digot, piştî ku di salên 2000'î de birêvebirina neasayî betal bû, giranîya tundîyê û şêweyên wê diguherîn, lê li Geverê, salên 2000'î, hema bêje bi qasî salên 1990'î giran û sext derbas bûbûn. Hevaxêverekî vê yekê wiha derdibire:

[19] Di konteksta pevçûnê de, talûkeya mayînan, ku di sînorên Tirkîyeyê de hatibûn danîn û bi tevî belêndayînên dewletê jî ancax beşeke wan hatibû rakirin, di dirêjeya salên 2000'î de jî berdewam kir. Raporên destpêkerîya Tirkîyeyeke bêMayîn ku ji sala 2001'ê heta bi sala 2010'an, bi awayekî salane, piştre jî ji sala 2014'an û 2017'an heta bi 2020'î, dîsa bi awayekî salane hatin weşandin, der heqê mayînên ku li herêmên sînorî hatine danîn, daneyên hejmarî didin. (Tirkîyeke bêMayîn, 2001 û di pey re)

[20] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan – Bûyera Bêmal Tokçu - 28.04.2025

Mînakeke bandorker a van mercên giran û dijwar, pîrozkirinên Newrozan e. Di pêvajoya salên 2000'î de, nermbûna îzafî yek ji wan mijaran e ku dewletê pê pesna xwe dida û Cejna Newrozê êdî dikaribû di zemîneke qanûnî de bihata pîrozkirin (helbet wekî "Nevruz"ê). Her wekî di mînaka Amedê de jî wisa ye, zêdebûna xuyanîkirina Newrozê ya di qada gelemperî de, wekî nîşaneyeke çandî ya pêvajoya aştîyê dihat derpêşkirin. Bi ser de jî, hewl dihat dayîn ku wateya sembolîk a Newrozê were veguherandin; û ne tenê cejna kurdan, mîna ku cejna "hemû neteweyê" be dihat nasandin û wekî "mîrateyeke çandî ya hevpar" dihat nîşandan ku ji alî qeymeqamî û walîtîyan ve jî dihat pîrozkirin.

Lê belê, li Geverê berginda vê bêjarê peyde nedibû. Newroz li vê derê, her wekî salên 1990'î, bi kuştin, şkencekirin û girtinan dihat bibîranîn. Kesûkarê İkbal Yaşar ku di pîrozkirinên Newrozê de hatibû kuştin, digot; qedexekirinê bi xwe bû sedema bûyerê û bi vî awayî ji qeymeqamê Geverê yê wê çaxê dipirsî:

> *"Eger ku, zaten [Newrozê] nekiriba yasax ev tişta çênedibû. Yanî em jî kurd in Newroza me, em biçûk bûn, zarok bûn û heta nika ev tişt heye yanî. Mafê me ya kurdan, heqê me yê kurdan e yanî. Newroz ya kurdan e zaten em hemûyan vîya dizanin. Çima kire yasax yanî?"* [21]

Li Geverê, raguhastina di nav nifşan de ya vebîra serdemî û şûngehî jî, cudatir rû dida; ciwanên li vê derê tundîya salên 1990'î ne tenê ji vegotinan hîn dibûn di heman demê de ew bi xwe dijîyan û li wan dibû azmûn. Ciwanekî 23 salî, azmûna xwe ya Newrozê ya di salên 2000'î de wiha radiguhêzîne:

> *"Ez bi xwe hatim girtin, serê şefeqê, bi ser malê de hatin girtin. Ji ber bûyerên Newrozê, tenê çi ye, me govend gerandiye, di Newrozê de slogan berz kiriye, di 5'ê sibehê de, em ji malê girtin. Ji ber ku me di Newrozê de govend gerandiye, di şefeqê de bi ser mala me de digirtin."* [22]

Hevaxêverekî ku di destpêka salên 2000'î de hê zarok e, şkencekirin û girtina bi ser malan de û hîsa neçarîyê ku ji ber van qewimandinan çêbûye, wiha vedibêje:

> *"Yaw em biçûk bûn (...) Em hê zarokên 10-12 salî bûn û şkence li me dikirin. Yanê, ez difikirîm, di wî emrî de, me çi kiribû"* [23]

---

[21] Hevdîtin: Culemêrg, Gever –Bûyera İkbal Yaşar - 28.04.2025

[22] Hevdîtin: Culemêrg, Gever –Bûyera Rojhat Özdel - 28.04.2025

[23] Hevdîtin: Culemêrg, Gever –Bûyera Rojhat Özdel - 28.04.2025

### B) Li Wanê "Çûyîna bo Mazotê"

Mercên cografîk û ekonomîk ên xweserî herêmên sînorî, bi awayekî rasterast teşe da şêweyê jîyana malbatan. Ev sînorên ku ji bo dewletê herêmên ewlehîyê ya giringtir bûn, bandora pevçûnên salên 1990'î bi awayekî cuda li wan çêbû. Li Wanê, li gundên ser sînor, bûyerên kuştina bi hingivandinê, bûyerên hişyarkirina "raweste!" û teqînên mayînan digel hev rû dida; û xizanîya kûr û qedexekirinên karûbarên ajelkarîyê û dewrkirina mêrgan a li xezîneyê, hema bêje hemû kan û çavkanîyên debarkirinê ji navê hildan. Ji ber wê yekê jî, bazirganîya li ser sînor ku wekî "Çûyîna bo Mazotê" dihat binavkirin (Bozçalı, 2014) bû bêgavîtîyeke ekonomîk. "Çûyîna bo Mazotê" ew çend bû karê rojane ku ji dahata ekonomîk zêdetir, ciwanan carinan tenê ji bo ku bi hevalên xwe re sosyalîze bibin, ev kar dikir.

Mehmet Nuri Tançoban ê 15 salî jî, yek ji wan kesan bû ku piştî ku di betlaneyê de vegeriyabû gundê xwe, ji bo ku bi hevalên xwe re demê parve bike, digel wan "çûbû mazotê." 3 kîlometre dûrî gundê wan, li ser rêya vegerê, li gorî gotina hevalên wî ku pê re bûn, leşkeran bêyî ku hişyarîya "raweste" bidin, gule berdan. Guleya ku di tarîyê de û ji 50 metre nêzik ve hatibû berdan, li qelbê wî hingivî. Malbat, bûyerên bi vî rengî yên pêpeskirinên li ser sînorî ku mirin û jîyan tê de li ser xeteke ziravik in, wekî encama xizanî û polîtîkayên ewlehîxwazîyê dibînin. Ji ber ku hinceta ku nahêlin ew li gundê xwe ajelkarîyê bikin, wiha dibêjin:

> *"Heywancilix jî esasî tune, zaten çend sal in berê hemû zozan mozanên me tev yasax kirin. Niha jî hidûda me yasaxe ha! Yanî yêra me, normal de heya sinir gerek heywanê me biçêre, niha nahêlin. (...) Ev gundê me ji wê şûndatir gelek merayê gundê me niha xistine xezîne. Xistine malê dewletê û tê de niha qûle çêkirine. Nahêlin yanî em herin çîya."*[24]

Ev neçarî û xizanî, du vebijêrkan datîne ber mirov: an tu yê koç bikî an jî tu yê biçî mazotê. Di vê rewşê de, rewşa xizanî û qaçaxkarîyê dike ku gundî başê xeraban hilbijêrin.

> *"Ma mirov li ser axa xwe rehet be mirov diçe ser axa xelkê? Kî hes li canê xwe nake? (...) Mesela qûle li erdên me de çêkirine [Bi wateya, mayîn danîne] nahêlin em herin heywancîtî bikin. Diçin qereqolê tê de çêdikin kû nahêlin em herin pazê xwe tê de biçêrin. Nahêlin pez xweyî bikin encax dewar xwedî bikin. Tu pezê neçêrî tu yê çawa debara xwe bikî, tu yê çawa îdara xwe bikî? İnsanan wisa wisa mecbûr dikin. Însanan bi xwe xwe radibin û koç dikin. Însan tên kuştin (...)"*[25]

---

[24] Hevdîtin: Wan, Çildêran, Gundê Hecî Xatûn–Bûyera Mehmet Nuri Tançoban – 24.04.2025

[25] Hevdîtin: Wan, Çildêran, Gundê Hecî Xatûn–Bûyera Mehmet Nuri Tançoban – 24.04.2025

Li Wanê, meseleyeke din ku pir zêde tê bilêvkirin ew tundî bû ku hin peywirdarên ewlehîyê dikir û gundîyan jî ew nas dikirin. Ji ber ku hin kesên dîyarkirî, bi taybetî, li van herêman dihatin peywirdarkirin, vê yekê jî tundî hem dikir takekesî hem jî sîstematîk. Her wekî di bûyera Ercan Uca de jî wisa bû, tundîya sîstematîk ku kiryar li ser mirov û ajelan û li ser hemû heyînên zindî meşandibû, êdî gihîştibû asta bicezakirina sîstematîk. Kesûkarê Ercan, rewşê wiha vedibêje:

> *"Wê çaxê hespê destê jinêkê de jî bi gule li ber çavê me kuşt yanî. Gule berdidan hespan, diketin nav gundan, ji millet re xeber dida, millet dikutand, hesp dikuştin…"*[26]

Kesûkarekî din ê Ercan jî, digot, "Heke ji bo kuştinê mirovek peyde nekira, gule berdida ajelan, gule direşandin ser daran."[27] û ast û rehenda tundîyê pênase dikir. Ev bûyer, wekî mînakekê ye ku nîşan dide ka tundîya hatî birayekirin dikare bigihîje kîjan astê. Wan, di salên 2000'î de, cîyekî wisa bû.

### C) Robozik: Qetlîameke Li Ser Sînor

Li gundê Robozikê ku bi ser bajaroka Qilabana Şirnexê ye, qetlîama ku şeva 28'ê Berfanbara 2011'an hat kirin, di wan salên dawîyê de, yek ji bûyerên herî giran ev bû. Balafirên şer ên Hêzên Çekdar ên Tirk, bombe barandin ser 34 sivîlan ku piranîya wan zarok bû. Hemû mirovên ku hatin kuştin, sivîl bûn û ji heman gundî û endamên heman malbatê bûn. Qetlîama Robozikê di demekê de ku behsa asoya aştîyê dihat kirin, ket rojeva Tirkîyeyê û qurifokîbûna jîyanên li ser sînor danî ber çavan.

Şûna cografîk a Robozikê, faktoreke bingehîn bû ku hê ji serî de rêyên debarê yên xelkê gund dîyar dikir. Robozik, şûneke cînişînê ye ku çîyayên ku pişta xwe dane sînorê Îraqê ew dorpêç kiriye, qadên wê yên ku ji bo çandinî û ajelkarîyê kêm in û di mehên dirêj ên zivistanê de di bin berfê de dimînin û rêya çûnûhata wê derê gelek asê û dijwar e. Lê belê, hêmaneke dîyarker ew e ku ji salên 1990'î û bi vir ve ye, ji ber polîtîkayên ewlehîxwaz, di derfetên kêm ên heyî de jî hema bêje ne pêkan bû çandinî û ajelkarî werin kirin. Gava ev faktor hemû dibûn yek, gund ji alî ekonomîyê ve bi temamî dihat îzolekirin. Encama herî xuyanî ya vê îzolasyonê ew bû ku bazirganîya sînorî bûbû tekane rêya debarkirinê.

Piştî qetlîamê, meseleya "qaçaxkarî" ku gelek caran di medyayê de di rojevê hat xistin, ji alî Robozikîyan ve wiha dihat pênasekirin. Ji bo wan ev yek, hem rêya berdewamkirina pêwendîyên xwe yên lêzimîyê bû ku çend nifş bûn ku merivên wan li wî alî sînor bûn û hem jî rêya debarkirina malbatê bû. Gelek lêzimên malbatan, ên ku li ser xeta sînor dijîyan,

---

[26] Hevdîtin: Wan, Çildêran – Bûyera Ercan Uca – 24.04.2025

[27] Hevdîtin: Wan, Çildêran – Bûyera Ercan Uca – 24.04.2025

hebûn ku ji ber ku cerdevanî red kiribûn, jibêgavî koçî hêla Îraqê kiribûn. Ji ber hindê jî, sînorê di navberê de, ji xêzeke cografîk wêdetir, xeteke jîyanê bû ku alîyek wê li gund alîyê din jî li gundên cîran bû û ew di navbera wan de diçûn û dihatin (Yıldırım, 2013). Ev bazirganî, di heman demê de, qaqibokirinek bû li hemberî sînorên netewedewletê ku ev xeta xwezayî ya jîyanê bi xêzên sunî ji hev cihê kiribû (Çelik, 2019).

Ev bazirganîya sînorî, li paşperdeya qetlîamê cî dida xwe ku kana bingehîn a debarkirina gund bû. Kirîn û firotina çay, şekir û mazotê ku bi lêzimên li alî Îraqê re dihat kirin, bi salan bû bi pêagahbûna dewletê û bi rêya "peymanên nenivîskî" yên ku bi leşkeran re hatibûn danîn, didomîya. Gotinên hevaxêverekî nîşan dide ka ev têkilî çi qas aşkere ye:

> *"(...) Hingê aslında navbeyna me û askerên vê derê, buradaki askerlerle aramızda yazısız bir antlaşma vardı. Carinan korucu başı digeriya, muxtar digeriyan digotin bila qaçaxçi bila carna roj neçin. Bi roj biçin jî êvarî bila nêzîkî hududê Tirkiyê nebin. Yanî li gor talîmat û ewidiyê wan em diçûn û dihatin. Ewdiyeke me hebû. (...) yanî aslında faaliyeta me ne veşartî bû. Sih sal in tê kirinê û dewletê jî dizanî askerî jî dizanî. Her kesî dizanî (...)"*[28]

Vê rutînê, li Robizikê, bi grafîkeke saetê ku her malê ew dizanibû, berdewam dikir. "Karwan" piştî nîvro bi rê diketin û êvarê vedigerîyan. Zarokan jî di nav vî karî de cî didan xwe; hin ji wan bar hildigirt hin ji wan xweytî li ajelan dikir hin ji wan jî tenê hevaltî dikir. Neçarîya ekonomîk, bi taybetî dikir ku ciwan xwe bidin ber vê bazirganîyê. Serhat Encü ku di qetlîamê de hat kuştin û gotina wî ku ji dêya xwe re gotiye, bi awayekî xurt bandorê li mirov dike û bi kurtayî vê bêgavîyê dide der:

> *"Got, 'dayê ma ez ku bikime em mecbûr in. Li vî çiyayî ma qey em ê axê bixwin, ku bikim mecbûr im ji ber her du birayê xwe. Qey em ê çi bixwin' digot."*[29]

Tevî ku hînî zordestîyên dewletê bûbûn jî, "qaçaxkarî" ji bo malbatên Robozikî parçeyekî jîyanê bû û wê tu carî nehata bîra wan ku ew ê bibe sedema êrîşeke ev çend kujende:

> *"Hema keyfê pê dihatin û li dewarê xwe siwar bûn û çûn. Saet bî heft min got dayê Serhadî telefun nevekir xêr be. (...) Saet bî heft çi ne, Seat bî 19.30 kurikê min ev ê li Stenbol te dît yê biçûk Amed biçûk bî. (...) Got welê dibên hikûmetê avêtîya karwanîyan. Got xwudê çûne pêşiya karwaniyan. Min got dayê karwanî ma çi li gel e? Eroîn li gel e, sîleh li gel e? Çi tişt li gel nîn e bîdonê avê ne dê an rêjin qey nîv saetan îfade kirin, ciza*

[28] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatê – 22.12.2024

[29] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma malbatê -22.12.2024

*kirin dê berdin. Ama me hizir nekir dê çawa bi teyaran êne ser. Min got tiştek nîn e da netirsin. (...) Ew Servetê xelas bûyî kurtar biyî telefun vekir got hawar e libek ji me nehêlane. Hema qêr ket ser gundî bigre serî heta binî.”*[30]

Berteka pêşî ya dewletê, ew çend bi sînor bû ku hema bêjî bêdengî bû. Sererkanê wê demê got, ew ji ber bûyerê xemgîn in lê belê berpirsîya xwe qebûl nekir. Hikûmetê bûyer wekî çewtîya îstixbaratê pênase kir. Lê belê, li gorî malbatên Robozikî, “*dema vê qetlîamê pir giring bû ji ber ku di vê demê de ji bo pêvajoya çareserîyê gav dihatin avêtin.*”[31] Qey ev demîbûn, ji bo dewletê jî giring bû ku gavên nepayî hatin avêtin. Serokwezîrê wê demê Recep Tayyip Erdoğan bi malbatan re hevdîtin kir û got, “em ê nehêlin ev dosye di dehlîzên Enqereyê de winda bibde.”[32] Hevjîna wî û keça wî çûn gund û bi malbatên Robozikî re hatin cem hev. Ev doza hanê, bû sembola pêvajoya aştîyê ya salên 2010’an jî. Lê lêpirsîna di warê dozê de, bi salan wisa li azîyê ma û rayedarekî leşkerî jî nehat darizandin. Tu encamek ji serîlêdanên neteweyî û navneteweyî jî çênebû.

Robozik, yek ji mînakan e ku bi taybetî karaktera sîstematîk a pêpeskirinên jîyanê yên di salên 2000’î de çêbûne bi awayekî aşkere datîne rastê û di vebîran de cî dide xwe:

*“Şev, tarî, cemidî, befir... Xwudê ez û babê wî bîn. Yek hat got ez çûm ser Serhat, Serhat baş bî pîyek jê avêt evê dî baş bî.Got de min qultar kin, de min qultar kin. Ot Serhat sax e heçgu. Min bibin doktor min qultar kin. Birazayê min çû kir pişta xwe hinda ser kehniya xiyalan kir pişta xwe. Xwudê got destê min girt û givaşt Serhatî got min îna danî ber wî berî. Evdila çû ser halo mala min xelîya wele Serhat jî temam bû. Çawa rebilalemîn... min qijênik da êdî min haj xwe nema. Hesoyê Feqe jî hat em ya li ber agirî got malika hewe mîratino ve livek ji biçûkên mala Îsiv nehiştîne. (...) lê çûye tê da xwudê hineka dest û pê çûye tê da xwudê hineka serkirî çûne tê da. Xwudê sê rojan piştî hingê şipî pêyê destek û pêyek (...) bi Xwudê ji hidûdî hir ve dîtin. Çend torbe dagirtin ji parçeyên wan.... me 18 şûştin min nedizanî kî yê dewaran e kîjk yê însanan e. Xwudê vê zilmê qebûl nekit.”*[33]

[30] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma malbatê -22.12.2024

[31] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma malbatê -22.12.2024

[32] Kovara Girteyê ya Meclîsa Milet a Mezin a Tirkîyeyê, 10’ê Berfanbara 2013’an, https://www5.tbmm.gov.tr/tutanaklar/TUTANAK/TBMM/d24/c064/tbmm24064027.pdf

[33] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma malbatê -22.12.2024

# BEŞA 2'yan
# Jîyanên ku Zû Dawî Li Wan Hatiye Anîn: Mirina Bi Zarokî û Ciwanî ya Li Bajarên Kurdan

Ev beş, bûyerên pêpeskirina mafê jîyanê yê zarok û ciwanan tîne cem hev ku di navbera salên 2000-2015'an de û li bajarên kurdan qewimîne. Beşa berî vê hewl dida ku zemîna dîrokî, şûngehî û komalî ku ev pêpeskirin pêkan dikirin, têbigihîje; ev beş, di heman zemînê de, lê dikole ka tundî çawa li kar ketiye, ketiye kîjana şêwe û dirûvan û çawa ketiye pêdeçûna asayî ya jîyana rojane.

Armanca me, ji vegotina bûyeran a bi awayekî yek bi yek zêdetir, ew e ku em dixwazin daynin rastê ka şêweyên hêzê yên ku dewletê di demên cuda de bi cî anîye, çawa veguherîye qalibên domdar ên hevpar û rejîma tundîyê ya sîstematîk ku berdewamîyekê dide der.

Gava mirov ji vê bergehê ve berê xwe didiyê, bûyerên ku hatine lêkolan, hem li gorî nîyeta kiryar hem jî li gorî şêweyên binbarîya dewletê, dikare bi du sernavan were danîn. A yekem, "ew kuştin in" ku li ser bicîanîna rasterast a hêzê ye, yanê bi qesta kuştinê "hêzeke kujende" tê bicîanîn. Di vê sernavê de, guleberdana di kombûn û xwenîşandanan de, kuştinên bi hinceta ku guh nedaye hişyarkirina "raweste" û kuştinên ku di dema operasyonan de qewimîne, cî didin xwe. A duyem jî, ji ber ku dewletê binbarîya xwe ya parastinê bi cî neanîye û wekî encam, kuştinên ku "ji ber bêtevdîrî û feramoşkirinê" çêbûne, li xwe digire. Di vê sernavê de jî, mirinên ku ji ber mayîn/an jî teqemenîya neteqîyayî û ji ber lêqelibîna amrazên bizirx çêbûne, tê lêkolan. Di her du sernavan de jî, ji ber ku bi taybetî bandorê li zarok û ciwanan dike, ev vegotin dikare wekî nexşeya xalên ku polîtîkayên ewlehîxwaz û jîyana rojane li ser wan hev dibirin, werin xwendin.[34]

Her çend ev her du sernav bi awayekî hiqûqî di kategorîyên cuda de tên nirxandin jî, bandora wan a di pêdeçûna jîyana asayî ya vê cografyayê de di nava hev de ye ku bi hûrgerî li ser vê yekê hatiye sekinandin. Gava mirov di protestoyekê de wekî hedef were girtin, gava pê li bermayîya şer an jî mayînekê bike û bimire, gava bi hinceta ku guh nedaye hişyarkirina "raweste" û were kuştin, gava mirov di bin amrazeke bizirx de bimîne an jî di operasyonekê de were kuştin; her çend awayên kuştinê cuda bin jî, ev yek berhema heman aqilê sîyasî û heman paradîgmaya ewlehîxwaz e. (Lévy-Aksu, 2025).

[34] Di nav serdema ku di çarçoveya vekolanê de hatiye lêkolan, ji bo analîza berfireh a di çarçoveyeke hiqûqî de ya pêpeskirinên mafê jîyanê ku di konteksta van her du kategorîyan de çêbûne, hûn dikarin li rapora bi navê Hiqûqa Li Ber Sîya Ewlehîyê binêrin. (Ataktürk Sevimli vd., 2025)

Ji ber hindê jî, ev beş, li xwe dike armanc da ku nîşan bide ku tundî bûye dîyardeyeke berbelav û hatiye navoyîkirin ku nikare di nav kategorîyên hiqûqî de were bicîkirin; û kuştina zarok û ciwanan, wekî encamên "asayî" yên polîtîkayên dewletê yên ewlehîxwaz hatine hilberandin.

## 1) Hin Nimûneyên Der Heqê Mirin û Kuştinê De

Pêpeskirinên mafê jîyanê yên zarok û ciwanan, di mercên cuda û di şêweyên cuda de derdikeve rastê. Her çend her bûyer dînamîkên xwe yên resen hebin jî, di çarçoveya vê vekolînê de, pêkan bû ku em wan ji alî çendanî û çawanîyê ve di hin kategorîyan de bikin çend grûp: Hin jê di teqînên mayîn an jî teqemenîyê de hin jê bi lêqelibîna amrazên bizirx hin jê jî di protestoyan da hat kuştin. Gava me ev kitekit dikirin, bêyî ku em têkevin detayên teknîk û hiqûqî, me tercîh kir ku em bala xwe hûr û kûr bibin ser azmûnên kirdeyan.

### A) Teqînên Mayînan û Teqemenîyan

Yek ji sedema bingehîn a mirinên zarokan, mayînên antî-personel ("mayîn") û teqemenîyên leşkerî yên neteqîyayî ne ("teqemenî"). Di dema bêpevçûn a îzafî ku di salên 2000'î de dest pê kir, hem divîya xebata rakirina mayînan bihata kirin lê nehat kirin hem jî giringî nedan hişyarkirinên sazîyên civaka sivîl ên wekî Tirkîyeyeke bêMayîn û KMM ku di rengê pêşnîyazê de ne. Di rapora ku Baroya Amedê di sala 2018'an de weşand, got; "bi taybetî li dibistanên herêmên çolterî ku deverên bi mayîn lê pir zêde ne an jî li dibistanên ku nêzî herêmên mayînkirî ne, divê der heqê mayîn û teqemenîyê û der heqê xweparastina ji rîskên teqînê de, zarok werin perwerdekirin" (Diyarbakır Barosu, 2018), lê belê pêşnîyaza Baroyê wekî "pêşnîyaz" ma û hewldanên sazîyên sivîl ên ku di vî warî de dixebitîn jî hatin berbendkirin.

Seroka desteya birêvebirinê ya Komeleya Pêjnkarîyê (Duyarlılık Derneği) Özlem Öztürk, balê dikişîne serê û dibêje, Li Tirkîyeyê, meseleya mayîn û teqemenîyê ne gelemşeyeke ewlehîyê lê gelemşeyeke mafê mirovan e û wiha didomîne, "*tu hincet, tu şer, mirina mirovan a bi bermayîyên mayîn û pevçûnê nikare rewa bike*." Öztürk, bi taybetî rîskên ku zarok bi wan re rû bi rû ne û nepêjnkarîya rayedaran a di vê mijarê de, bi vê mînakê dibêje:

> *"(...) Li Cizîrê, me der heqê xebata xwe de ku me dixwest em bikin, ji rayedarekî hevdîtin-randevu xwest. Me bi wan da zanîn ku em dixwazin der barê xweparastina ji mayînan de zarokan perwerde bikin û ji bo ku em karibin li dibistanan xebatê bikin, me ji wan destûr xwest. Qeymeqam be got, xebata we ne xebateke pedagojîk e û mayîn ji bo zarokên li Cizîrê, ne gelemşeyeke giring e. (...) Qeymeqam begî ev yek ji bîr kiribû: Ji bo ku xebateke pedagojîk bihata kirin, serê pêşîn, divîya zarok jîndar bûna. Em hê di qonaxa pêşî de bûn. Divîya em hîn bibûna ka em ê çawa nemirin, çawa seqet nemînin."* (Heinrich Böll Stiftung Derneği, 2013)

### *Teqîna Li Gundê Elemûnayê (2003)*

Li gundê Elemûnayê ku bi ser Qilabana Şirnexê ve ye, di 2'yê Mijdara 2003'yan de, zarok li ser rêya dibistanê, li erdê guleyeke bi 81 MM'yî ya topa hawanê dibînin; gav pê dilîzin gule diteqe û 4 zarok jîyana xwe ji dest didin. Di cîyê bûyerê de, hemû jî xwendekarên dibistana seretayî, bi temamî 13 zarok hebûn. Tenê yek ji wan birîndar nebû û filitî. Heşt zarok, bi giranîyên cur bi cur birîndar bûn; hin ji wan endamên wan ji laşê wan bû, hin ji wan wisa li wan hat ku ew ê bi dirêjeya temenê xwe di nav nivînan de bin. Zarokek jî, piştî tedawîya ku gelek salan ajot, jîyana xwe ji dest da.

Teqîna li gundê Elemûnayê çêbû, ne mînakeke tekane ye ku li bajarên kurdan çêbûye. Polîtîkayên ewlehîyê ku bi hinceta "ewlehîya sînor" û "têkoşîna li dijî terorê" tên bicîanîn, dibe sedem ku mayîn û teqemenî di qadên jîyana sivîl de werin dîtin. Zarok jî hedefên herî bêparastin ên vê talûkeyê ne. Kesûkarekî zarokên ku di teqîna li Elemûnayê de jîyana xwe ji dest da û birîndar bûn, wê rojê wiha vedibêje:

> *"Me ya mesela hatiye serê me jî (...) ew patlayîcîyekî, muhîmmatekî 81'lîk havan mermisi bû. Ew biçûk bûn, hem ji mektebe derdikevin hem jî gelek in. Hem têne vê rastê û newalekî av pêve tê. Balê xwe didin ew patlayicî maddeye kû li wê derê. Ew keçik yanî, kiz çocuklari, ew jî wî patlayici maddeye dibînin. Tên ji bîrayê min re dibêjin "Walle me tiştekî dîtîye ecayîp e. Waye di rîya me de ye. Ji Zahîr re dibêjin û Zahîr jî biraz daha yaş olarak farklîtir bû (...) Ew jî dibêje ji hevalên xwe re (...) hevalên xwe kom dike û diçin berê xwe didin û dibejê "Qûran eva patlayici madde ye, ew ê kû dest bide kê dikûje." Yanî "Ez vîya en azindan yox bikem, heke eva belali bir şey e, ev ê yekî bikûje." (...) Ew jî di wê arayê de gote hevalên xwe "Kele dibît." Yanî gelek germ bû. Hevalê wî jî dibêje wî "Bavêje!" Yanî heta davêje diteqe. Yanî lav lepê wî de diteqe."*[35]

Zarokên ku mayînan dibînin û çibûna wan meraq dikin an jî dibêjin qey ew pêlîstok in û wan ji erdê radikin, an dimirin an jî laşê wan wisa kût û seqet dibe ku jibêgavî bi mawey jîyana xwe bi wan astengîyan re dijîn:

> *"Zaten piştî wê [teqînê] jî ji xwe ev însana birîndar ketin, hin engelli ketin, hin nexweş ketin û hina vê gavê jî ji van însanan kes li vê gundî zaten nîn e. Yanî, hin jî xwişk û birayên min van jî biriye Wanê. Ev ê din jî hê li wî vextî heft salî bûn, zarok bûn, niha vê gavê jî emrê wan bûye 30, yanî exlebe, yê kû birîndar bûn... Birayê min zaten pîyê xwe, dest da, ruhînî pê de nema, yanî kalçadan îtîbaren ew jê avêt û xwişka min ji xwe jê birîndar bû. Birayê min e din emrê Xwedê kir. Ev cîranekî min heye, du zarokên wî birîndar bû, keçikekî wî jî zarokekî wî jî wefat kir. Mamekî min heye ew jî dîsa*

[35] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban, Bûyera Li Gundê Elemûnayê- 14.02.2025

*keçikekî wî birîndar bû, kûrekî wî vefat kir. Mirovekî me li vir heye ew jî dîsa keçikekî wî birindar bû, keçîkekî wî emrê Xwedê kir. Û ev domamekî min heye, xanîyê vî ev e, yanî 13 kes. Hemû zarok bûn.”*[36]

Mayîn û teqemenî ne tenê jîyana zarokan di heman demê de jîyana mezinan jî dixe talûkeyê. Digel vê, hema bêje hemû kesên ku me di çarçoveya vekolînê de bi wan re hevdîtin çêkirin, gava li derdora gund doş bûne, ji endamekî xwe bûne. Kesûkarê yek ji wan zarokan ku di teqîna li Elemûnayê de jîyana xwe ji dest daye, dibêje; mayîn û teqemenî, bêyî ku cihêtî bixe nava wan, jîyana gundîyan dixe ber talûkeya mirinê:

*“Vê cografyayê de, bi van rîyan de, di van çîyayan de, van filana de, belkî 20 însana lingêxweavêtîye.Çûyeberpezûnizane,çûyepiknigênizane,yançûyeberdarêûnizanîbûye, çûye mesela, çûye şolekî yan jî rênçberîyekî lê nizanîbûye mayin in û ber ling de teqîyaye. Mesela ez vê gavê biçim navê 20-30 însanan û linge hemûyan jî pê ve nîn e. Û heta vê gavê jî ev bölgeye me gelek mayin in, yanî bi tespît hin jî mayin in.”*[37]

Em ji van derbirînan fam dikin ku ji ber ku dewlet binbarîya xwe ya rakirina mayînan û parastinê bi cî nayîne, jîyana rojane ya gundîyan di qadeke ku tijî ye bi rîska mirinê de berdewam dike. Kesên ku li vî gundî dijîn jî, bi lomekarî dipirsin: “*Wisa be çima leşker wan teqemenîyan ranakin?*”[38]

### B) Zarokên ku bi Guleyan Tên Kuştin

*“Diwazde salî sêzde gule berdanê. Ne yek ne dudo ne sisê…”*[39]

Dayika Uğur bi van gotinan dest bi axaftina xwe dike. Sibeha 21’ê Mijdara 2004’an, bavê wî ku ajokarê kamyonê bû ji bo ku bide ser rêya dirêj; Uğur jî ji bo ku biçe dibistanê, xwe kar dikirin ku ji malê derkevin. Bavê wî, ji bo ku hewcetîyan dayne ber kamyonê derket pêşîya malê; Uğur jî xwest alîkarîyê pê re bike. Piştî çend deqeyan her duyan jî, li ber mala wan, bi guleyên ku hêzên ewlekarîyê li wan reşandin, jîyana xwe ji dest da. Hema piştî bûyerê, Walîtîya Mêrdînê daxuyanî da û Uğur Kaymaz ê 12 salî wekî “yek ji endamekî PKK’ê ku bi hêzên ewlehîyê re ketiye şer û hatiye kuştin” nasand (Human Rights Watch, 2007: 18). Vê daxuyanîyê li xwe dikir armanc ku zarokbûna Uğur veşêre ku gava li ber mala xwe alîkarî bi bavê xwe re dikir, hat kuştin. Kesûkarê Uğur, tiştên ku wê rojê qewimîn, wiha vedibêje:

*“Wê Oxir biçûna mektebê û Ehmed jî biçûna erebê biçûna şifêrtiya xwe bikirana. Û zaten çûn firaqên xwe têxin erebê, wê gavê (…) çûn ser cadê teqînî çêbû. Çawa Ehmed*

---

[36] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban, Bûyera Li Gundê Elemûnayê- 14.02.2025

[37] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban, Bûyera Li Gundê Elemûnayê- 14.02.2025

[38] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban, Bûyera Li Gundê Elemûnayê- 14.02.2025

[39] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser, Bûyerên Uğur Kaymaz-Ahmet Kaymaz- 25.02.2025

*û Oxir derketin ser cadê bera wan dane. (...) Go zaten go Ehmed, Oxir herkê keleşkof destê wan de ne û wan bera me daye. (...) me birin qereqolê vê derê (...) min go ka Ehmed û Oxir go wa rakirine Mêrdîn, me jî go qey tişt nekirine li Mêrdînê ne, me nizanibû wan kuştine. Û heya evarê bi qereqolê man. (...) Me derxistin û em hatin malê, min zanim tiştek bûye ji me re nedigotin ha, digo Ehmed Oxir hatine kuştin me yeqîn nedikir. (...) Û limêja serê sibê, cenazê wan anîn... Ehmed û Oxir ber hev danê. Welle bi qura Oxir erê wilo Oxir bejna wî bi qasî Ehmed bû. Û çavê Oxir a wilo vekirî bû, xwesûya min destê xwe da ser çavê wî qapat kir (...) Ê zaten ê min di wir de ez bayilmîş ketim, min xwe nedî. Wele bila kes nebîne, (...) Îja wan go [dewletê] bera me daye ha, Oxir kare, Oxir kare sîlehê qullanmîş ke, lawikê duwazde salî? Lawikê duwazde salî sêzde gule bera danê. Go terorîst e. (...) Her du jî bêsûc û bêsebeb hatin kuştin. (...) Go terorîst e, digo na mezin e. Qelafetê wî nêrtin digo mezin e, e digo wa mezin e, digo binçengê wî çêbûye digo kî digo mezin e yanî ev ne zarok e digo. Sîleh jî danîbûn ber û herkê keleşkof jî danîbûn ber wan. Kêleka wan digo wan bera me daye."*[40]

Kuştina Uğur Kaymaz ê 12 salî, wekî yek ji mînakên bi bandor ku nîşan dide ka zarokên kurdan çawa di raya giştî de bi hêsanî tên krîmînalîzekirin, di vebîran de cî da xwe. Piştî bûyerê, angaşta ku digot, Uğur "terorîstek" e, hat belavkirin; vê bêjarê jî nîşan da ku piştî mirina zarokekî jî îtibar dikare were hedefkirin. Kesûkarên wî ragihand ku gora Uğur bi caran hatiye xerakirin. Peykera ku li Qoserê bi navê Uğur Kaymaz hat çêkirin û zarokên ku di pevçûnan de hatibûn kuştin, sembolîze dikir, di sala 2017'an de, ji alî şaredarê qeyûm ve hat rakirin. Ji hêla din ve, navê yek ji polêsan ku di bûyera kuştina Uğur Kaymaz de cî girtibû, li Kocaeliyê dan jorbihurkekê.[41]

Pêpeskirina mafê jîyana kurdan ne bûyerên yekanî ne. Piştî Uğur Kaymaz, di sala 2009'an de, Ceylan Önkol a 12 salî ku ajel biribûn çêrandinê, bi teqemenîyeke mihîmatê, di sala 2015'an de jî Nihat Kazanhanê 12 salî, gava li ber mala xwe ji xwe re dilîst, fîşeka gazê ku hêzên ewlehîyê avêtin li serê wî ket û hat kuştin. Ev kuştin, digel pêpeskirinên mafê jîyanê yê zarokan, nîşan bi cihêgirîyeke avanîyî dike ku di ser zanavê (identity) re li kar dikeve. Gava li herêmên din ên li Tirkîyeyê zarokek dimire, ji miqamên herî jor ên dewletê daxuyanîyên xwedîtîlêkirinê tên dayîn, lê kuştina zarokên kurd, pirî caran bi bêdengî an jî bi bêjarên/gotinên ku sûcdar dike û krîmînalîze dike, tê derbirîn. Hevaxêver pir zêde balê dibin ser vê cotstandardîyê.

[40] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser, Bûyerên Uğur Kaymaz-Ahmet Kaymaz- 25.02.2025

[41] Ajansa Nûçeyan a Dicleyê. (2016) "Navê polêsê ku Uğur Kaymaz kuşt li jorbihurkê hat kirin" Cotmeh 22. http://diclehaber.net/news/content/view/541261?page=33&from=3305028514

*"Yanê, tu niha dizanî, wekî Eren Bülbüller. (...) Ji ber ku yê me zarokê kurdan e, nêrîneke wisa heye, wekî dîtir.. Yanê ji ber ku em kurd in bi çavekî dîtir li me dinêrin. Yanê, a niha hûn dizanin ev jî mirov e, ev zarok e, bêsûc e, belsedem çûye."*[42]

*"Çi ke, qeçeko ke ûca de bimiro en azindan ê Kûrdan o. Yanî en azindan ê Kûrdan o. Ha ê Kûrdan nêbo se o ca de hîrê finî wa bêrê pak kerê. Ama çi çiyo? Qeçeko ke şêro ûca ê Kûrdan o."*[43]

Hevaxêverên ku hewl didin van pêpeskirinan bi tûmerî watedar bikin, tînin ziman ku tiştên diqewimin ne rasthatin in û parçeyekî wan polîtîkayan in ku li cografyaya kurdan tên meşandin. Lê belê bi taybetî di kuştinên zarokan de, bendewarîya bo edaletê sojek û giran e.

*"Zarokeke 12 salî. Temam, li herêma me bi salan in mirov êşê dikêşin lê ya ku derba tiştan lê ketiye zarok e haa. Miroveke bêsûc miriye."*[44]

"Ma ne wezîfeya polês ew e me biparêze? Ma qey wezafeya wî ew e zarokên me bikuje?"[45]

Dayika Mehmet Uytun ê 1,5 salî ku gava di hembêza dêya xwe de ye, fîşeka gazê li serê wî dikeve û tê kuştin, bi gotineke pir sade balê dibe serê ku hê hewcetîya kurê wê bi xweytîlêkirinê hebû û dibêje, "*Kurê min hêj şîrê bedena min dixwar.*"[46]

Pêpeskirina mafê jîyanê ya zarokekî 1,5 salî, çi mekanîzmayên edaletê li tevgerê xist çi jî di raya giştî de bû sedema rarûbûneke rastîn. Lê belê, ev yek ji bo kesûkarên Mehmet ne wisa bû. Wan dixwest şoka ku ketibûnê watedar bikin.

*"Yek kurê mirovî di mala mirovî de bikuje bê beleheq. Li milê dîya wî, wî kuştiye. Ew mermî mesele. Daye me qarşiyê balkona me de dîrekmen şep berdaye kurik."*[47]

Tirkîye, ya ku alîgireke Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî ye, berpirs e ku mafê jîyana hemû zarokên ku li ser axa wê dijîn, têxe misogerîyê. Lê belê, van bûyerên hanê bi zelalî nîşan da ku ev berpirsî nehat bicîanîn. Ev zarokên ku hatin kuştin, li cografyaya kurdan, bûn sembolên bingehîn ên birînên ku ji ber bêedaletî û cihêgirîyê çêbûne û hê jî di vebîrê de nekewîyane.

---

[42] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr -Bûyera Nihat Kazanhan -Gulan 2023

[43] Hevdîtin: Amed, Çêrmûg – Bûyera Umut Petekkaya – 04.12.2023

[44] Hevdîtin: Amed, Licê, Gundê Dolek – Bûyera Ceylan Önkol -03.12.2023

[45] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Nihat Kazanhan – Gulan 2023

[46] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Mehmet Uytun – Gulan 2023

[47] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Mehmet Uytun – Gulan 2023

Ev zarok ji statîstîkekê pêk nayên; jîyanên nîvcomayî, zaroktîyên nehatî temamkirin û ciwanîyên ku tu carî nehatin jîyandin in. Di sala 2022'yan de, pirtûka bi navê "Heke Nehatana Kuştin Wê Niha Bibûna Hevalên Me" ku di sala 2022'yan de hevsalên zindîmayî yên zarokên hatine kuştin, nivîsîn, careke din jî, vê rehenda mirovbûnê datîne ber çavan:

> *"Mirov nikare nefikire, heke Nihat bijîya, wê a niha 18 salî bûya. Gelo ev taybetîyên ku dikin ku em Nihat nas bikin û wî dikin ew, çi qas biguherîyana? Helbet bersiva van pirsan tune, lê belê, Nihat dikaribû bi jîyînê bibersivanda. Lê Nihat wekî zarokekî ma! [...] Zarokbûna li bajarên kurdan tê wê wateyê ku li gorî zarokên ku li bajarên din dijîn, dibetîya zindîmayîna we û berdewamkirina we ya jîyana xwe, pir kêm e. Û tê wê wateyê ku tu li pêşberî her tiştî, digel dema ku diçe û li pêşberî mirovên ku mezin dibin, heta hetayê zarok dimînî."* (Soydan et al., 2023: 36 ve 10)

### C) Dînamîkên Komalî yên Mirinên Takekesî: Cenazeyên ku Cenazeyan Tînin

Protestoyên 28'ê Adara 2006'an ku li jor behs jê hat kirin, ji bo ku em karibin rehenda komalî ya kuştinên/mirinên zarok û ciwanan a wê demê têbigihîjin, serriştên giring didin destê me. Enes Ata, yê ku di bûyerên 28'ê Adarê de hat kuştin, xelekeke giring a zincîra şîngirtinê ye. Her çend me bi malbata Enes Ata re hevdîtin çênekiribe jî (Zıngıl et al., 2025), ev bûyer ne tenê li Amedê, li bajarên din û di bûyerên din de jî, ji cîyekî girêder careke din jî hat pêşberî me û kir ku em bidin ser şopa bandora bûyerê ya komalî. Ji ber ku di vê vekolînê de, yek ji encam û vebînîyên bi bandor ew bû ku mirinekê/kuştinekê dibû sedem ku teqil li mirinên/kuştinên din jî bikeve û dîyardeya "cenazeyên ku cenazeyan tînin" bû ku bi rojan didomîya.

Me di bin vê sernavê de, di ser hin mînakan re ku şîngirtin hatine çewisandin, cenaze hatine bêdengkirin û beşdarên cenazeyan hatine kuştin, ev rewşa "mirina bi vardîye" û vegotinên ku li dora wê teşe digirtin, nirxandin.

Gava di bûyerên 28'ê Adarê de fîşeka gazê li Enes Ata ket û ew kuşt, ev bûyer ne destpêka şîngirtinan û cenazeyan bû, lê kêlîya qurifînekê bû û dibû destpêka pevçûneke nû. Digel ku derketina kuçe û kolanan şêweyekî şîngirtinê bû, piştî kurtedemekê encama vê şîngirtinê dibû kuştinên/mirinên din. Kêlîyên ku li Enes xistin û nehêlan wî bibin nexweşxaneyê, ji serî de Amed, di gelek bajarên kurdan de bandoreke şokbûyînê çêkir. Ji ber ku bajarên kurdan di nava çerxeke zincîrane wisa de bûn ku "kuştinekê kuştineke din dianî." Kesûkarê İlyas Aktaş ku di 30'yê Adara 2006'an de gule li serê wî hingivandin û hat kuştin, sedema ku ew çûye kuçeyê û tev li protestoyan bûye, wiha tîne ziman:

> *"Jixwe sedema ku diçû cîyê bûyeran. (...) Der heqê zarokan de pir hesas bû. Mesela, jixwe piştî Enes Ata ji malê derket. (...) 'Li ber çavên me zarok tên kuştin, tu vî derîyî li min vekî jî venekî jî ez ê herim' [Zavê wî dixwaze nehêle ew here tev li protestoyan bibe.] Zavê min li ber derî, bûyer li Baxlarê ye... Gotiye, 'Îlyas neçe' Bi derî girtiye, gotiye, 'Îlyaz neçe!' Gotiye [Îlyas], Îro li vê derê, li ber çavên me zarok tên kuştin, heke ez neçim ji min bêşereftir. (...) Mirov tune, tu yê berdî. Ji ber ku tiştekî min ê din tune. Ji ber ku zarok tên kuştin.'"*[48]

Û İlyas ji malê derdikeve. Gule li serê wî dihingivînin. Li Amedê ku gihîştina bo nexweşxaneyê û midaxelekirina tibî ya bi awayekî lezgîn, zehmettir bûye, malbata wî wisa difikire ku bi awayekî tekûz nehatiye tedawîkirin û wî dibin Enqereyê. Li nexweşxaneyê, rojekê gava bi qasî ku karibe biaxive xweş e, gotinên wî yên dawî ku ji dêya xwe re dibêje, der heqê sedema tevlêbûna ciwanan a li protestoyan de ravekirineke giring dide der:

> *"Gava cara pêşî çavên xwe vekirin, ji min re got; 'Dayê ez ê peyvekê tenê ji te re bêjim. Ez îro di nav cîyan de me, dizanim tu çi qas xemgîn î, dizanim. Lê tu yê tu carî serê xwe xwar nekî. Serê xwe tim bilind ke. Min tiştekî xerab nekiriye. Min dizî nekiriye, min bênamûsî nekiriye, ez di rêya rast de çûme. Ez di rêya rast de çûm, çi hewce bû min kir. Min çi hewce bû, kir."*[49]

Gava İlyas li nexweşxaneyê li dijî mirinê li ber xwe dide, rojek şûnde, di 1'ê Nîsana 2006'an de, li bajaroka Qosera Mêrdînê, Ahmet Araç ê 26 salî, gava taştêya xwe dixwe, ji televîzyonê nûçeya mirina Enes Ata dibihîse. Kesûkarê Ahmet, dûmahîka wê dibêje:

> *"...min taştê xwar ew jî hat. Ez rabûm ew rûnişt (...) Yanî ew a ku li Amedê, ew zaroka ku kuştibûn (...) Ew jî wê dibînin, pir çîk dibin, ew jî radibe derdikeve. Û vîya dîrekmen dere, li koşê bi panzêrê lê dixin, û de vîya tişt di destan de tune ye ha, û yek dadikeve ji dawîya aqrebê û tê gule berdidê. (...) Ew jî wek tevdê kurda, wî jî tepkîya xwe da û ew kuştin."*[50]

Di wan rojan de, şîngirtin vediguhere ser protestoyê, protesto jî ji nû ve vediguhere ser şîngirtinê. Cenazeyê Ahmet nûçeya kuştineke din tîne. Di 2'yê Nîsana 2006'an de, piştî merasîma cenazê Ahmet, derba guleyan hevalê wî Mehmet Sıddk Öner jî dikeve. Kesûkarê Ahmet, wê rojê wiha vedibêje:

---

[48] Hevdîtin: Amed, Dîcle, Gundê Herîdan – Bûyera İlyas Aktaş -26.05.2024

[49] Hevdîtin: Amed, Dîcle, Gundê Herîdan – Bûyera İlyas Aktaş -26.05.2024

[50] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser – Bûyera Ahmet Araç - 19.05.2024

> *“Me cenaze stend. Me hanî. Me defin kir. Me piştî defin kir [çatişmê] dîse eynî dewam, bû sibe Sidîq kuştin îdî. (...) li orta sûkê. Ew jî ji bo Ahmet bû ha, feqîro tiştkî wî tunebû. Yanî ji vê derê, ji te'zîyê çû. Ew jî şehîd kirin.”*[51]

Rawestandina tundîya zincîrî ya ku di kuçe û kolanan de berdewamî dida xwe hema bêje nepêkan bû, loma jî, carinan malbatan ji bo ku kuştinên nû çênebin înîsîyatîf hildidan destê xwe. Abdulkerim Seyhan, ciwanekî 26 salî ye. Dêya wî, der heqê wî de dibêje, *“ne ciwanekî polîtîk bû.”* Di 10' Îlona 2014'an de, digel girseyeke gel a pir qerebalix, tev li cenazeya du ciwanan dibe ku li Kerborana Mêrdînê hatin kuştin. Li gorî ku dêya wî dibêje, di wê gavê de bûyer çêdibin û leşkerên ku ji helîkopterê dadikevin, gule direşînin ser gel. Li wê derê gule li Abdulkerim dikeve û her wekî em di gelek bûyeran de jî dibînin, ji ber ku midaxeleya tibî dereng tê kirin, jîyana xwe ji dest dide. Di cenazeya Abdulkerim de, gelê Kerboranê dixwaze meşekê li dar bixe. Dêya wî destûrê nade. Dibêje, bi vî awayî, bi merasîmeke cenazê ya bêgelemşe, min nehişt cenazeyên nû çêbibin:

> *“Kirin û nekirin min nehişt, mi go noo. (...) Bi xwedê ha hingî wê şevê ku anîbana devê wa qereqola da îşin kiribana belkî wa jî dey kiribana. Lê heyra mi go ma çavê we lê ye win hineke dî jî bikujin. Wele min go em dey nakin. (...) Mi go na keko, ha em ê di vê rêkê de çin û (...) bila kesêkî din ji nemire. Ji ber wê min bêdeng cenaze xwe rakir.”*[52]

## 2) Li Pey Mirî: Cenaze, Binaxkirin, Hawarî, Şîngirtin û ya Dûmahîkê

Pêvajoya ku piştî her mirinê/kuştinê dest pê dike, pirî caran bi qasî mirinê diperitîne. Ji kêlîya kuştinê heta bi birina nexweşxaneyê, bi saetan rawestîna li ber morgê, ji otopsîyê heta bi teslîmgirtina cenazeyê, her gav, ji bo malbatekê dibe çerçirîneke cuda. Nedana cenazeyê an jî binaxkirina wê ya bi dizîka, astengîyên ku di gava binaxkirinê de tên çêkirin, çewisandinên li ser mala şînê û krîmînalîzekirina şîn û hawarîyê, nahêlin ku piştî mirinê jî, hem mirî hem jî yên mayî têkevin aramîyê. Hevdîtinên ku me di çarçoveya vê vekolanê de kirin, nîşan didin ku çerxa “cenaze-binaxkirin-hawarî-şîn”ê, êdî ne pêvajoyeke xwezayî ya piştî mirinê ye, lê belê, ew pêvajo ye ku mekanîzmayên çewisandin û kontrolkirinê yên dewletê ji nû ve li kar dikevin û dibin xelekeke din a tundîyê.

[51] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser – Bûyera Ahmet Araç - 19.05.2024

[52] Hevdîtin: Mêrdîn, Kerboran – Bûyera Abdulkerim Seyhan - 25.05.2024

### A) Ji Mirinê Heta Bi Otopsîyê

Berî ku em biçin ser dijwarîyên ku di dema lêdana derbên kuştinê de çêdibin, divê em bi awayekî berfireh behsa rewşeke bikin ku hevaxêveran bi awayekî zelal ew anîn ziman. Gelek malbat wisa bawer dikin ku ji ber ku midaxale zû nehatiye kirin loma mirinê jî lez girtiye. Hin hevaxêver dibêjin, ji ber ku ambulans nehatine heke hatibin jî ji ber ku pêşî lê hatiye girtin da ku dereng bigihîje nexweşxaneyê, ji ber ku li nexweşxaneyê nehiştine doxtor midaxaleyê bikin û ji ber gelek sedeman, ew ên ku wê nemirana jî mirine. Tew hat gotin, di hin bûyeran de, berî mirinê şkence li birîndaran hatiye kirin û vê yekê jî mirineke zû bi xwe re aniye.

Di sala 2001'ê de, li bajaroka Farqînê ya Amedê, operasyoneke şefeqê tê çêkirin û digirin ser mala ku Selma (Gurbet) Kılıç a 17 salî digel dêya xwe tê de dijî. Kesûkarê Selma, wê şevê wiha vedibêje:

> *"Wele li derî xistin hatin malê nihêrtin, malê ew kirin, anons kirin got, 'Tişkî tune di malêda, mal temîz.' (…) Piştî wî ku ew derketin çûn, ez jî derketim. Ku ez derketina ku derketim min dî yekî jor va li serî xanîyê me da ket xwarê. (…) Ku derketine ku ez derketim min dî Xurbeta min li ber derî dirêjkirî ye, ku dirêjkirî ye min hicûmê serê kir. Ku mi kir min (yanî min dît) li mi xistin. Çar-pênc hev zêdetir li min da. Li min da, min dîsa min dî go 'ay dayê!' Ez ber hindî hema şipara (ji paş de) rakir awa fîstanê min qelaşt heta xwarê. (…) Êdî qîzikê davên embelasê. Divê 'bêje, mêvanê bavê te kî ye, tu bêjî em ê te baş bikin.' Ew jî dibêje 'kesinlikle mêvanê bavê min keskî tunebû.' Divê 'ti yê bêjî.' Ev dike nake veya jî dibê 'e tişkî nikarim bêjim.' Di embelansê de ewk lê dixin, tifingê serê wê dixin, sîlehê. Êdî ka beyîn qanamasî dike çi dike. Ê ku piştî qîzkê divin xestê, dikin nakin dixtor nahêli mudahale pê bikin. (…) qê qîzê rehmet kir."*[53]

Tundîya ku li ser mirî tê pêkanîn, bi avanîya xwe ya tevlihev, bi sîstematîkbûna xwe û bi berdewamîya xwe ve jî balê dikişîne ser xwe. Bi birîndarî şkence tê kirin, ji hêlekê ve bi gotinên wekî "cehimî" şîn û hawarî tên manîpulekirin ji hêla din ve jî ev hemû wekî rêbazeke ku agirê şer û pevçûnê gur dike, xuya dike. İkbal Yaşar jî, gava birîndar e, nahêlin ku wî bibin nexweşxaneyê. Lê belê, hevalên wî erebeyekê peyde dikin û dixwazin wî bibin nexweşxaneyê:

> *"Wê birindarîyê razandîbûne erdê û îşkence lê kirin. Birîndar bû îşkence lê kirin, cilê wî ji ber kirin. Qabûrgayê wî şikandi bûn, milê wî, deste wî şikandi bûn. (…) Me kiribû tîcarî texsî de bû, hatin tîcarî texsî de jî derp kirin, şoför kutan, yê di gel de pismamê*

[53] Hevdîtin: Amed, Farqîn – Bûyera Selma (Gurbet) Kılıç - 03.12.2023

*wî bûn, ew derxistin, ew derp kirin, (...) Heta ambûlans hat... Me ambûlans xwest, zaten goya gotibûn 'Li pênc deqîqeyan de...' Ama derew bû, çûmkî li wê derê hindî ku lê dabûn ev qabûrgayên wî [şikestibû] zaten qelbê xwe de birîndar bû (...) Ser gule lêdanê, me kire ticarî texsîyekî me yê bibira xestexanê. Nehêlan, înan anîne xwarê. (...) Em hatin vê derê [nexweşxaneyê] rastê polês [hatî] nehêla. Heqaret kirin, îşte 'Geberdî..!' falan got"*[54]

Piştî kuştinê jî pêleke din a tundîyê dest pê dike. Li şûna ku pêvajoyên otopsî û morgê bibin ew demên dilêş ku kesûkarên kuştî tê de ne, di van bûyeran de, ew dem, bi piranî, dibin qonaxa tundî û nedîyarîyeke nû. Malbatên ku bi saetan li ber morgê tên rawestandin û nikarin cenazeyên xwe bigirin, dibêjin; cendekan bi xwe jî dikin "amrazeke kontrolkirinê." Loma jî, berdewamîya di navbera şkenceya berî mirinê û morga piştî mirinê de çêdibe, rûyên cuda yên pêkanînên tundîyê aşkere dike.

Yek ji mînakeke bi bandor a vê rewşê, Ceylan Önkol a 12 salî ye ku bi teqîna teqemenîyê jîyana xwe ji dest da. Li gorî ku kesûkarên wê dibêjin, dozger bi hinceta ku dever wekî devera terorê tê hesibandin, qebûl nake ku here şûna bûyerê û li qereqoleke nêzî bûyerê li bendê dimîne. Malbat, jibêgavî û bi neçarî laşê parçeweslebûyî ya Ceylanê hildigire û dibe. Ji vê kêlîyê û şûnde zincîra pêpeskirinê ku dest pê dike, ji lêkolîna di şûna bûyerê heta bi otopsîyê berdewam dike:

*"Me wê çaxê, 5-6 saet li erdê hişt. Dozger nehat. Harî dawî wan got kameraman tê cîyê bûyerê. Kameraman hat, kumek li ser serî, makîneyeke fotografê yê normal di dest de. Ev kî ye? Melayê gundê Dolek. Dozger kamereyek daye destê wî û gotiyê, "here li cîyê bûyerê çend fotografan bikêşe.' Ji serî heta dawî, bindoşekkirin e, ji dozger heta bi lêkolana otopsîyê, bindoşek dikirin. (...) Ez behsa feramoşkirinan dikim. Di konteynereke di nava qereqolê de otopsîya Ceylanê dikin. Yanê, li baxçeyê qereqolê de, di nava konteynerê de, çi zanim doxtorekî heqîqî ye an jî personelê nexweşxaneyê tê? Bifikire, li ber çavê malbatê lêkolînê bike, bi ya min ne tiştekî rast e. Cîyên cudatir hene, dikaribûn lêkolîna wê di cîyekî paqijtir de bikirana, lêkolîna wê, lêpirsîna wê bi nişmîtir bikirana. (...) Dozger telîmatan dide. Dibêje, ez hatime qereqola Dolekê. (...) Dibêje bila bînin vê derê ku otopsîya wê were kirin. (...) Di wê êşê de, rabûn 2-3 saet lêkolînek kirim."*[55]

Di bûyera ku 28'ê Tebaxa 2005'an de, li Batmanê qewimî, Hasan İş jîyana xwe ji dest da. Kesûkarên wî ji bo ku otopsîyeke li gorî qaydeyê were kirin, hewl da. Di vê rewşê de, li şûna ku kesûkar hawarîya xwe bikin û şîna xwe bigirin, têkoşîna wan a trajîk a ji bo otopsîyeke rastîn, her tiştî aşkere datîne rastê:

---

[54] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera İkbal Yaşar - 28.04.2025

[55] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Dolek- Bûyera Ceylan Önkol - 03.12.2023

*"A, li mal bûm. (...) min telefon dan û êdî em çûn. Çûn, li ser ranzê, dewletê xestanesî, (...) Êdî vêca xwîn jê dihat. Qotîk ji va yê çopê danîbûne ber xwîna wî. Êdî amir da hazira serê we sax çû. (...) Birine otopsîyê, go na li derve hatiye şehîdkirin. Ne di nav cihê olayîyê de ye. Ew bû. Me go na, li wir hatiye şehîdkirin. Êdî li wê derê ma û otopsîyê [rapora] qebûl nekir, me sibehî bire Amedê. (...) Li Amedê otopsî berfereh kirin. Û go, dîsa jî tam negirtin. Werhasil, pey wê de carekî dî bû, bû du meh sê meh têde çûn, go em ê parçekî jê bibine adlî tipê. Ew jî birin, birine adlî tipê. Vegereha, mehekê tiştkî ma vegereha. Êdî vêna berferehtir kir êdî. Çêtir da nîşandan. (...) Û rabû me parêzer girt û li vêdê tiştekî wilo tam bi ser neket, dane dinya mahkemesî. [mebesta xwe, Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ye]."*[56]

## B) Ji Ber Derîyê Morgan Heta Bi Nobetgirtinên Bo Cenazeyan

Pêvajoya ku bi otopsîyê dest pê dike, derfeta şîngirtinê bo mirî, nepêkan dike. Ev qonaxa ku divê ji bo malbatan bibe gava pêşî ya şîngirtinê, bi midaxaleyên rayedaran vediguhere têkoşîneke nû. Carinan bi saetan, bi rojan li ber derîyê morgan disekinin; carinan cenazeyan nadin malbatan û hewl didin ku bi dizîka wan di goristanên bêkesûkûs de binax bikin. Bi vî awayî, digel mafê jîyanê, mafê xatirxwestinê jî tê xespkirin. Ji ber vê hindê, gelek malbat li ber derîyê morgan nobetê digirin. Ji bo wan mesele êdî berxwedan e ku li dijî mandelkirina hebûna kesûkarên kuştî tê kirin, derdê esasî xweytîkirina li cendekê kuştî ye û binaxkirina cendekê ya li gorî gerdîş û bîrûbawerîya xwe ye. Bi vî awayî, hawarî û şîngirtina ku divê li pey kuştî/mirî were kirin, dibe berxwedaneke ku li dijî "tunehesibandinê" tê kirin.

*"Em cenazê nadin! Ev biryareke dewletê ye."*[57]

Ev gotina ku li Enqereyê, di Sazîya Tiba Edlî de, ji kesûkarên İlyas Aktaş re hatiye gotin, hişyarkirinek e ku kurteya azmûna hevpar a gelek malbatan e ku me di qadê de bi wan re hevdîtin kir, helwesta ototrîter a rayedaran e û midaxaleya li kêlîya herî mehrem a hawarî û şîngirtinê ye:

*"Min got, dinya jî bi ser serê me de were xwarê, ez ê vî cenazeyî bibim gund. Me erebeyeke cenazê, yeke taybet, kirê kir. (...) Me ferq dikir. Wî dewrî yê din, yê din dewrî yê dîtir, emnîyeta hemû bajaran dewrî hev dikir [erebeya cenazê]. Li pey me bûn. [Ji Enqereyê] Wekî eskort li pey me bûn. Em tenê erebeyek bûn: em û ew, polês..."*[58]

---

[56] Hevdîtin: Batman, Navend – Bûyera Hasan İş - 24.05.2024

[57] Hevdîtin: Amed, Dîcle-Gundê Herîdan, Bûyera İlyas Aktaş - 26.05.2024

[58] Hevdîtin: Amed, Dîcle-Gundê Herîdan, Bûyera İlyas Aktaş - 26.05.2024

Pêvajoya teslîmgirtina cenazeyê her tim wisa çênabe. Bêmal Tokçu di cenazeya Veysel İşbilir û Mehmet Reşit İşbilir de hat kuştin û di 6'ê Berfanbara sala 2014'an de jî, Rojhat Özdel ê 16 salî jî di bibîranîna Bêmal Tokçu de, gule li paşstûyê wî ket û hat kuştin. Li gorî vegotina malbata wê, du saetan li şûna ku lê hat kuştin, hat sekinandin; nehiştin ambulans were şûna bûyerê. Kesûkarên Rojhat ku wê rojê hewl dane xwe bigihînin wî, wiha behsa wê rojê dikin:

> *"Em çûne xestexanê, dormedorên xestexanê hemî girtibûn, qiyas esker kiribûnê da bêhisab, (...) nehêlan em biçine xestexanê. Hemî qapat kiribûn, min jî hima deriyê erebê vekir, min xwe nav destê wan da havêt, me jî tam nezanî kanê Rojhat e, kî ye, me nezanî. (...) ez çûm, min xwe nav da xilas kir, êdî min nezanî, (...) ber derî jî carek dî eynî ozel hereketê girtibû, hemî maskelî bûn, derî girtibûn nehêlan em biçim wê odeya mudaheleyê diken, nehêlan em biçine pêş kanê kî ye. Wela zavê me xestexanê da ser ambulansê da şol diketin. Ew jî têt bêjîte xwîşka min, bêjîtê kanê were çi cil li ber Rojhat da ne (...) hat gote min, gotê çi berdan e, min jî gotê şelek reş ber kiriye û ustek reş, wek dî êdî çi ber kiriye min got ez tam olaraak nizanim, belkî li ber derî tiştek ber kiribît ez nizanim. Wela dibêjîte keçikê ev cilkene berda ne, bêjîtê cilkene berda ne (...) hindî xwîn berze kiribû, xwînê da nenas kiribû, hindî xwîn berze kiribû, wela carek dî diçît, axir [xwîne] temîz kirin. Xwîşka min got wela şehîd Rojhat e. Keçik bêje şibî ewekê li min dûr bû, wê derê kire qêjîn, wextê kire qêjîn min zanî Rojhat e. (...) Hindê êdî me çi kir nehêlan êk ji me bi aliyê wî ve biçîtin, nehêlan, kirine nav ewatirê da, derê piştê da birin, (...) welhasil xestexane we lê kirin, bîber gaziyê da me nezanî kurik çawa nav da birin. Êdî kurik wesanê nav da birin, piştî hingê..."*[59]

Di rewşa kaosî ya li nexweşxaneyê de, bêyî ku agahî bidin kesûkarên wî, dixwazin cenazeyê ji nexweşxaneyê derxînin. Lê belê kesûkarên wî destûrê nadin. Li ser vê yekê, dibêjin; wê cenaze ji bo otopsîyê bibin bajarekî din:

> *"Got, em ê gel xwe biben, got, em cenaze anaden, got, em ê ben, bên otopsiyê, bên Culemêrgê, Culemêrgê bêne Şirnaxê. Me jî gotê ne, em cenaze naden, zaten xestexanê da bû şer, xestexanê da ateş li me kirin (...) cam şikandin, yanî eskeriye hate jorda, pê jopan dayik ew qutan, (...) me nehêla cenaze biben, yoksa cenaze hazir kiribûn dê biriban. Piştî hingê zaten ana xwe havêt êdî milet kete endîşa dayka min da, milê wê ew hemî hilgirtine alçiyê da, dayka min got ne, hûn kurê min naben. Madem we kuştiye o zaman bidene me. Hema kuştiyê wî jî bît em ê bo xwe biben çal biken, me bir, roja paştir me dê çal kiriba dev nokta mezarligê li wêrê jî êrîşî cenaze kirin, êrîşî miletî kirin, gotin hûn çal naken. (...) Ew bi xwe jî biben ewêdîtir biken, e. Yanî biriban, dê biriban Erzeromê*

[59] Hevdîtin: Culemêrg, Gever- Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

*kimsesizler mezarligî heye, (...) dê biriban wêrê, yanî me xeberdar bû dê biben, êdî ew e me nedihêla.”*[60]

Berxwedana li dijî vê pêkanînên tundîya pirteweqî her tim pêk nayê. Kesûkarê İkbal Yaşar ku di 27 salîya xwe de hat kuştin, hegemonyaya rayedaran a li ser şîngirtinê û heqê wan ê binaxkirinê çawa hatiye xespkirin, wiha vedibêje:

*“Em çûn [Morgê], me İkbal dît. (...) sisêyê şevê bû em hatin derbas bûn mal de saet şeşê de telefon hatin bo me. İkbal bi emrê qeymeqam birine veşartîye. (...) em direk çûne savcîlîxê, gotin ‘We îmze avêtîye.’ Me got ‘Me îmze navêtîye. Zaten gotine me sibê werin cenazeye xwe hilgirin. Me jî gor urf û adetên xwe bi miletê xwe em ê hilgirin û em ê biriba yanî.’ Got ‘Çawa we îmze nekirîye?’ Mi jî got [ji savcî re] ‘İmzeyê me derxînin [nîşanî me bidin]’ (...) Savcî seh kir ku çi onaya me nîn e, gote ‘Rast e, eve sûc e.’ Got ‘Bila li wê derê be, gerek nake, guneh e.’ Me got ‘Na! Em ê derxînin û em ê gor urf û adetên xwe ewk bikin.’ (...) Me gel avûqat hatin, wekîl ew hatin îşte, savcî karariyla me ji wê derê derxist û me bir mezel de defin kir.”*[61]

## C) Binaxkirin: Cezayekî ku Li Ser Kuştinê Tê Zêdekirin

Di cenazeya İkbal Yaşar de, şêweyekî din ê bicezakirinê dide der ku li ser kuştinê tê zêdekirin. Cenaze ji malbatê tê vedizîn, şev nîvê şevê ji morgê tê derxistin, pismamên kuştî yên di girtîgehê de ne tînin û gora wî bi wan didin kolan. Bêr û koling didin destê wan û dibêjin, “hûn bikolin em ê binax bikin.” Kesûkarê wî şahidîya xwe ya wê şevê wiha vedibêje:

*“Mamê wî û pismamê wî hefsê de bû, [wan] ji girtîgehê derxisti bûn, pê wan de kolandin ew cih. Goti bûn [ji wan re] ‘Malbatê qerar daye...’ Yê din jî Bêmal bû, yê din jî Bêmal gel de bû [Bêmal Tokçu] (...) Ew jî hefsê de bû, ji hefsê derxistibûn, (...) bêrê dane destê wan û gotine ‘Hûn bikolin em ê bikine tê de (...) ew jî şaş dimînin, dibêjin ‘Çi aile nehatîye, hanî malbat, annesi yok, babası yok, eşi yok, kimse yok yani. Gece saat uçte, ew jî dibêjin ‘Zaten aile qerar daye, hûn defin bikin.’ Ew jî zaten li wê derê şaş dimînin. Ew jî li wê derê dikolin û dikine tê de.”*[62]

Pêvajoya ku piştî mirinê/kuştinê dest pê dike jî, herî kêm bi qasî mirinê/kuştinê vediguhere ser qadeke polîtîk. Hin kes ji bo ku cenazeyê xwe bigirin, di korîdorên nexweşxaneyê de disekinin û jop li wan tê xistin hin ji wan bi dizîka di goristana bêkesûkûsan de tên

[60] Hevdîtin: Culemêrg, Gever- Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

[61] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera İkbal Yaşar - 28.04.2025

[62] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera İkbal Yaşar - 28.04.2025

veşartin hin ji wan jî ji bo ku cenazeyên xwe biparêzin li ber morgê nobetê digirin. Medeni Yıldırım, 28'ê Pûşpera 2013'an de, li Licê ya bajaroka Amedê hat kuştin. Kesûkarê wî yê ku li ber dibetîya revandina cenazeyê heta sibehê li ber morgê nobet girtiye, wiha vedibêje:

> *"[Li] Diyarbekirê otopsî kirin. (...) Ew şev piştî cenazê me [ez] neqetiyam [ji] otopsiye. Piştî otopsiyê ez çûm di morgê da li ber serê wî [Medenî] sekinim. Polîs molîs jî dihatin ez dernediketim, Heya serê sibê di morgê da li ber cenaze sekinîm ji bo kî bê me cenaze dernexin nebin ewk nekin."*[63]

Ji ber van astengkirinan ku piştî gelek kuştinan tên kirin, malbat ji bo ku cendeka hezkirîyên xwe biparêzin û wan li gorî bîrûbawerî û adetên xwe binax bikin, jibêgavî têdikoşin. Her çend, binaxkirin û rêzgirtina li mirî, wekî nirxeke gerdûnî, li hemû deran tê qebûlkirin jî, ev rîtuela dînî û çandî, car caran, li bajarên kurdan, vediguhere yek ji qadên ku pevçûnên dijwartir tê de diqewimin (Aydın, 2017). Her çend her malbat dixwaze cenaze li gorî adet û gerdîşên xwe û li wî cîyê ku ew dixwaze binax bike jî, ev pêvajo, bi piranî, ji ber midaxaleyan naçe serî. Carinan cenaze li şûna ku malbat dixwazin nayê binaxkirin carinan jî gava tê binaxkirin polês êrîş dikin. Malbatên ku daxwaza binaxkirina bêdeng û beng dikin, vê carê jî, girtin û tundî li wan tê qewimandin. Ji ber ku heta ku endamên malbatê neyên wê derê, cenaze nikarin werin binaxkirin, binaxkirin piranî hem ji bo kesê kuştî hem jî ji bo kesûkarên kuştî vediguhere ser cezayekî. Kesûkarê Ceylan Önkol, vê rewşê wiha vedibêje:

> *"Yaw em naçin cîyekî, em narevin, cenazeê me heye. Jixwe parçeparçe bûye. Gere ew cenaze wê şevê were veşartin. (...) Mirov ji li benda me ne. Dibêjin, heta ku bavê wê, kekê wê neyên em ê veneşêrin. Li wê derê mesela, girt di nava wê êşê de, berê cenazê bi vî alî ve, [ber bi mezelan ve] zivirand, berê min û bavê min dan alî Licê. (...) 2-3 saet li wê derê îfadeya me girtin. Heta em hatin saet bû 11'ê şevê. Me bi şev cenaze veşart."*[64]

Kesûkarê İslam Terkoğlu yê 24 salî ku di 23'yê Mijdarê de hat kuştin, dibêje; "*me jibêgavî bi şev bianax kir*." Malbata İslam dibêje, em bêgav man ku cenaze di mercên ku rayedarên dewletê dîyar kirin, bi awayekî bêdeng û bi şev binax kir. Ji ber vê yekê jî, divê ev tercîh, wisa were nirxandin ku ji bo ku rîskên binçavkirinê û dibetîya revandina cenazeyê werin kêmtirkirin, wekî tevdîrî hatiye kirin.

> *"Nehêlan em biçine ser cenazeyê xwe... (...) Cenaze jî nedan û cenaze jî bi teyare birin gund de. (...) Birin otopsîyê. Cenaze deste dewletê de bû. Birin otopsîyê. Me nizanibûn,*

[63] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Nenyas - Bûyera Medeni Yıldırım - 25.06.2024

[64] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Dolek - Bûyera Ceylan Önkol - 03.12.2023

*biribûn Culemêrgê, biribûn Wanê. Pênc roja zaten cenaze deste dewletê de bû. Wextê îna jî cenaze teslîmê me nekirin. Car din dîrekmen bi teyare birin gund de. Qebûl nekirin, gotin 'Kesînlîkle cenaze li wê derê [Li Gewerê] veneşêrin.' (...)Dewletê cenaze pê teyarê bir, cenaze teslîmê me nekir. (...) Ew esker wexta ew biriye wê derê [gund] gotiye 'Heta we veneşêrin em belav nabin.' (...) Man gund de. Zaten çevreyê gund zeft kiribûn. Gotin 'Heta hûn veneşêrin em gerî....' bi şev jî em veşartin. (...) Mirovê me hemê jî hatin. (...) Qatilmîşê cenazeye bûn. Ama yanî toren yan jî tiştekî din nehiştin em biken, yanî qebûl nekirin."*[65]

Pirsgirêkên ku di dema merasîma cenaze û binaxkirinê de çêdibin, tenê bi dewletê re sînorkirî namînin; carinan di navbera malbat, nûnerên sîyasî yên kurdan û serkêşên qeneatê de jî dibe sedema tengijeyan. Yek ji mijarên ku pir zêde tên behskirin, qilqîna malbatan e ku ditirsin ku rîtuelên cenazê veguhere ser protestoya girseyî. Hin malbat, ji ber sedemên cuda, diqilqilin ku pêvajoya binaxkirinê bi girseyî çêbibe û veguhere ser protestoyekê. Ji ber vê yekê jî, carinan razî nabin ku merasîmên bi vî rengî çêbibin. Carinan dîyarkirina şûna gorê jî di nava vê qilqilînê de cî dide xwe. Di vê mijarê de, yek ji herî mînakên berbiçav di cenazeyî Mehdi Taşkın de qewimî ku di 19'ê Tebaxa 2014'an de li bajaroka Licê ya Amedê de hat kuştin. Li gorî şahidîya endamên malbata Taşkın, kesûkarên wî xwest wî di goristana beşa malbatî de binax bikin, lê "Partî" şûneke din hilbijart. Lê belê, goristana ku hatibû hilbijartin, cîyekî wisa bû ku hem çûyîna wê dijwar bû hem jî dewletê gelek caran têketin û derketina wê derê berasteng dikir. Li gorî vegotina wan, gelemşeya herî mezin ev bû ku di dema binaxkirinê çêbû. Kesûkarê Mehdi, bi van gotinan gazincên xwe ji tevgera sîyasî ya kurdan dike:

*"Mesela diyam, te çiqa dît çi qasî êşayî giranê. (...) Ser wî ra zî [cenaze yê] wî birina ser wî çiyayî. Mesela, tamam çiya, ê ku hemî li wê ne [yên li wê hatine definkirin] wekî birayê me ne, em nav yekî da ferq nakin. Hema ew çaxî me got bila Licê da be. Diya min yaşlî ye, nikare [biçe û bê]"*[66]

Dêya Mehdî jî, têkoşîna xwe ya ji bo dîyarkirina şûna gorê û dijwarîya ku di çûn û hatina ser gora lawê xwe de lê diqewimin, wiha vedibêje:

*"Mi go mêze kin, bihêlin, ez nikarim, ez axtiyar im, ez nikarim biçim bêm, ereba min tune. Mesrefa giran e, ez nikarim dûr e. Mi go ez şixwa bibim yatilîyê, (...) Mesela 15 rojan carekî ez şixwa biçim ser mezel, fathekî meriv bixwîne îçê meriv rehet dibe. (...) Du sal berê. Ez û vê qîza xwe û bûka xwe û van zarokên xwe em ketin erebê, rokî*

[65] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan - Bûyera İslam Terkoğlu - 27.04.2025

[66] Hevdîtin: Amed, Navend – Bûyera Mehdi Taşkın - 18.05.2024

*eynî fena vê, em çûn Sîsê, (...) Em diherîn wê derê, paşê me dî sê heb panzer wan e ser rê, sê heb. (...) Qomitan rabû hate pêşîya me, go 'hûn diçin ku?' Me go 'em diçin ser şehîdê xwe, em diçin şehîdlixê.' (...) Go 'yasax e!' Mi go 'çawa yasax e? Rê bidine me, em çin, cîgera min e, kezeba min e, mi go bihêlin ez şixwa diçim.' (...) Go emir zi Diyarbekir da hatiye, go walîyê diyarbekir gotiye ser şehîda yasax e.' (...) Yanu dilê min ûsa dişewite ez dixwazim ku hero biçim, yanî mehê da carek, sale da du car ez dixwazim ku ez biçim ser mezelkî..."*[67]

Der heqê dîyarkirina şûna gorê de malbat nikare li ber pêdagirîyê bisekine û bi vî awayî, cenaze li gundekî Licê tê veşartin. Kekê wî, bi gotinên *"Yanê ev ne tiştekî mirovane ye, yanê çi bûye jixwe bûye, yek hatiye serdana gorê, pêşî lê veke da ku derbas bibe"*[68] li hemberî helwesta dewletê loma û gazincan dike.

### D) Şîn Danîn: Mala Şînê, Konê Şînê

Yek ji pêkanînên giring ên piştî karên cenaze û bianaxkirinê, girtina şînê ne bi awayekî takekesî lê bi awayekî kolektîf e. Ev şîna ku ji wêdetirî mala şînê tê veguhastin, bi bêdengîya hevpar a gundekî, bajarokekî an jî bajarekî xuyanîtir dibe. Adeta daxistina derebeyan jî yek sembolên herî xurt ên şîngirtinê ye. Ev pêkanîn, ne tenê hêzê dide malbatê; di heman demê de, bi wateyeke polîtîk dibe rêya teşhîrkirina kiryar jî. Kesûkarên İlyas, gava bi şanazî dibêjin, *"hemû gund derebeyên xwe anîn xwarê"*[69] balê dibin serê ku girtina şîna wî belavî hemû komalê bûye. Derebedaxistin, li bajarên kurdan, wekî pêkanîneke ku ji salên 1990'î û bi vir ve ye didome, digel ku nîşane ye ku şîn berpirsîya hevpar a her kesî ye jî, di heman demê de, bersiveke bêdeng, lê belê xurt e ku li kiryar tê dayîn. Ciwanekî Cizîrî ku tev li cenazeya Yahya Menekşe bûye, wateya vê pratîkê wiha vedibêje:

*"Roja cenazeyê Yehya hemû Cizîr tev li cenazeyê bû. Di rewşa normal de, gava li Cizîrê mirineke wisa çêdibû, her kesî derebeya xwe dianî xwarê. Dîsa wisa bûbû. (...) Çi kes hebe ku derebeya xwe daneanî, nebû hevparê şîna me û êşa me parve nekir, bû hedef. Ji ber ku gava derebe danedixistin, ev yek dihat wê wateyê ku ew li cem wan kujyaran in ku bûne sedema tundîyê û hevalê me kuştine. Ev yek bersiva me ye ji bo wan kesan ku ev şîn bi me dan kirin."*[70]

---

[67] Hevdîtin: Amed, Navend – Bûyera Mehdi Taşkın - 18.05.2024

[68] Hevdîtin: Amed, Navend – Bûyera Mehdi Taşkın - 18.05.2024

[69] Hevdîtin: Amed, Dîcle – Gundê Herîdan- Bûyera İlyas Aktaş - 26.05.2024

[70] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bi Ciwanan Re Navend-Grûp - 14.02.2025

Di xweserîya vê vekolînê de, wateya çalakîyên daxistina derebeyan, wekî “daxuyandina şînê” jî dide der. Di van şînan de ku tên daxuyandin, bi organîzasyona sazîyên civaka sivîl, birêvebirên cihkî an jî kesûkarên mirî, li şûngehên wekî “mala şînê” an jî “konê şînê”, “şîn tê danîn” û şîn tê girtin. Mala şînê an jî konê şînê; dibe qadeke giştî ku li wir windakirin tê nasîn, êş tê parvekirin û piştevanîya komalî xuyanîtir dibe. Bi rîtuela  şîndanînê, şahidî li heqîqeta windakirinê tê kirin, piştgirî li kesên mayî tê kirin û li şûna ku windakirin were bêdenghiştin, li qeydeke vebîrê tê veguherandin. Ji ber vê yekê, ji bo malbatê hawarîdanîn an jî rûniştina ji bo şînê giringîyeke xwe ya mezin heye.

Şîngirtin, di konteksta pevçûn û pêpeskirinên mafan de, rehendeke xwe ya daxwazkirina mafan jî li xwe digire: xwegihandina bo cenaze, qaydeyên binaxkirinê, berbendkirina şîngirtinê û sînorê midaxalekirinên bo ewlehîyê, di pêdeçûna şîngirtinê de berbiçavtir dibe. Loma jî, şîngirtin, hem ji alî domdarîya rîtuelê hem jî ji bo sarêjkirina komalî ve nûnertîya şêmûgeke/bendeke giring dike. Şahidîya kesûkarên İbrahim Halil Oruç ê 17 salî ku di 20’ê Nîsana 2011’an de li Amedê, di xwenîşandaneke komalî de hat kuştin; derfetê dide me ku em pêvajoya ku bi midaxaleyan hatiye sekinandin û piştevanîya ku bi xweytîlêkirineke xurt hatiye kirin, digel hev bixwînin:

> *“Min kurê xwe xist nav mezelê. Min kurê xwe vedişart lê dîsa jî gaz û bombe barandin ser min. Min ber xwe da, şîna lawê xwe kir. Ez bikuştama jî min ê konê xwe vedaya [konê şînê], ez ê tê de bimama. Qîrîyam, min got werin min jî bikujin, ez ê şîna xwe bikim.”*[71]

> *“Yanê, xweytîyeke baş li me hat kirin. Her kes hat, mielimên mektebê hatin, heval hatin, loma wisa wextekî girtî ma [dibistan]. Şîna me sê roj in, wê çaxê kon datanîn. Ew qas milet hat, belediye ji bo me du sê kon danîbû. Yanê, pir zêde kes hatin û çûn. Bi giştî konek tenê tê danîn, lê vê carê, du sê kon bi hev re hatibûn danîn. Bi rastî jî, gelek kes hatin û çûn. Ji hemû alîyan hatin. (...) Ew ne ji eşîr û malbatê ne, kesên ku em qet wan nas nakin.”*[72]

Gava serokên sîyasî, şaredar, rêxistinên sazîyên sivîl û hunermend tev li şîngirtinê dibin, ev yek ji bo malbatan dibe piştgirîyeke giring. Di heman demê de, wekî şêweyekî sarêjker a piştevanîya komalî jî xwe dide der. Ev tevlêbûn, her çend bi temamî birînan baş neke jî, merasîmên cenaze û binaxkirinê vediguherîne zemînên komalî yên edaleta sarêjker. Digel fîgurên polîtîk ên wekî Selahattin Demirtaş, Gültan Kışanak, Ahmet Türk, Emine Ayna, Osman Baydemir, Aysel Tuğluk, Sezgin Tanrıkulu û Esad Canan, hema bêje di her malê de,

[71] Hevdîtin: Amed, Bismil – Bûyera Halil İbrahim Oruç - 22.06.2024

[72] Hevdîtin: Amed, Bismil – Bûyera Halil İbrahim Oruç - 22.06.2024

navê sazîyên sivîl ên wekî Komeleya Piştevanîya Bi Malbatên Ku Kesûkarên Xwe Winda Kirine (KOM-PMKW), Komeleya Piştevanîya Digel Malbatên Ku Di Dergûşa Şarezayîyan De Kesûkarên Xwe Winda Kirine (KOM-PDMKW), Komeleya Mafên Mirovan (KMM), Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyeyê (WMMT), Baro û Sazîyên Civaka Sivîl (SCS) tê gotin. Malbat, hê jî tîne bîra xwe ku di dema cenaze û hawarîyê de ev kes û sazî li cem wan bûne û vedibêje. Ev yek jî nîşanî me dide ku, li hemberî îdeolojîya fermî ku bi bêjarên cihêgir (parser) yên wekî "qaçaxkar", "terorîst" û "yê ku serî li dewleta xwe rakiriye" kuştinên sivîl rewa dike, bi vê piştevanîya ku tê kirin, hîsa edaletê ya malbatan ku tune tê hesibandin, ji nû ve tê avakirin û mesaja "hûn ne tenê ne" bo malbatan tê ragihandin.

Kesûkarên Hasan İş girseya tev li hawarîyê bû bi gotina "*milyonek mirov hebûn*", kesûkarên Abdulkerim Seyhan, "*bi qasî rehmeta Xwedê mirov hebûn*", kesûkarên Medeni Yıldırım, "*bi qasî cenazeya Tahir Elçi qerebalix bû*", didin der ka ev hevparkirin û piştevanîya di hawarîya zarokên xwe de çendî giring û jîyanî ye.

Ne tenê mezinbûna hejmaran, mirovên ji derdorên cuda jî tên û di hawarîyê de li hev dicivin û ev yek jî balê dikişîne ser xwe. Kesûkarên Abdulhaluk Geylani ku li Geverê hat kuştin, balê dibin ser vê yekê:

> *"Her milletek, her qewmek (...) yanî kû însanek here kû, çawa kû mirov bêje, hindek kê nirxê xwe, ji kûrdînîyê dûr be jî wê çaxê hat bû dahîl. Em bi vîya jî bûn şahît. (...) Kû Gever, yanî em bêjin, ez çawa bêjim, Gever jî ji gundê xwe yanî bû yek dengek. (...) Yanî îlk defa ji bo şehîdan hindek kîtle xir bû. Kes nema kû nehate. Kes nema yanî. Hindek, ne kû tenê li memleketê Geverê de em bêjin, ji Colemêrg, Şirnex, Wan, yanî ji bîlî partîyê ez dibêjim, bilî partîyê sîyasî... Tê bîra min ji Şirnexê hatin, ji Wanê hatin, Dîyarbekir hatin, tête fikra min. (...) Ji İranê hatin."*[73]

Şîngirtin, ne tenê cihkî ye, xweytîlêkirineke herêmî û dersînorî ye jî; ev yek jî nîşan dide ku mirin, di komala kurdan de, ji nasnav û fikirê serbixwe, qadeke hevpar a wijdan û piştevanîyê çêdike.

## E) Helwesta Dewletê

Bi dirêjeya cenaze, morg, otopsî, binaxkirin, hawarî û şîngirtinê, qedemeyên cuda yên dewletê, pirî caran, dijwarîyê li malbatan û girseya ku tev lê dibe, çêdikin. Lê belê, hin nûnerên heman dewletê, carinan dixwazin tev li hawarîyan bibin, serdana malên şînê bikin û piştevanîyê bi malbatan re bikin. Di vê rewşê de, helwesta malbatan li ser du mîxwerên ji hev cuda teşe digire: hin malbat bi helwesteke hişk van daxwaz û destpêkerîyan red

[73] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Abdulhaluk Geylani - 28.04.2025

dikin hin ji wan jî, li ser gerdîşê dimînin û dibêjin, "kî were mala me em derîyê xwe jê re nagirin" berdewam dikin û derî li wan vedikin. Wezîrê Çandinîyê yê wê demê Mehdi Eker xwest tev li hawarîya İbrahim Halil Oruç bibe, lê kesûkarên wî bersiveke pir hişk lê vegerandibû: "Heke dixwaze were hawarîyê pêşî bila wê gazê bide rawestandin *[gaza ku hêzên ewlehîyê bera nav konê şînê dane]*. Me rê neda ku were hawarîyê."[74]

Rayedaran ji hêlekê ve kiryarên van kuştinan dernedixistin pasê ji hêla din ve jî di heman şûngehê de xwe nîşan didan û dixwestin xwe rewa bikin. Ev rewş ne tenê di bûyerên komalî de, di kuştinên wekî operasyon û teqîna mayînan de jî tê pêşîya me. Her wekî di qetlîama li Elemûnayê de jî xuya dike, rayedarên dewletê, carinan ji bo ku malbatan serwext û nerm bikin diçin hawarîyan, belêna piştgirîyê didin: "Walî û heyeta wî hatibûn. Erê, roja hawarîyê hatin, tew got, 'Çi hewce bike, em ê li heqê van zarokan bipirsin, çi hewce bike em amade ne ku bikin.' Lê tu tişt nekir."[75] Her wekî di Robozikê de jî wisa bû, li vê derê jî soz û bext hatibû dayîn, lê piranîya van serdanan ne ji bo lêgerîna edaleteke berayîn bû, loma jî, diqulibî ser hewldana rayedaran a ji bo perdekirina berpirsîyê. Ev mînak, dibin ew qad û nîşan ku ji me re vedibêjin ka destpêkerîyên hem ji bo çewisandinê hem jî ji bo xweytîlêkirinê çawa li cem hev tên bicîanîn û di heman demê de jî, têkilîya ku bi rayedaran re tên danîn, çawa bi awayekî herî aşkere tê hêçandin.

## 3) Lê paşê! Dijwarîyên Serederîkirina Bi Windakirinê Re

Yek ji pirsên herî zehmet ên vê vekolanê ew bû ku ka kesên mayî çawa serederî bi windakirinê re dikirin. Piştî kuştinekê, şîngirtin sê roj, sê hefte belkî jî sê mehan didomin; ên diçin ên tên, qerebalix çêdibin. Lê paşê mal bêdeng dibe, derî tên girtin û malbat bi êşên xwe re dimînin. Di vê rewşê de, ev pirs dide der: *her çend bergindeke wê ya komalî hebe jî, gelo mirov dikarin serederîyeke çawa bi valahîya ku piştî çûyî/mirî re bikin?*

Her çend, kesûkarên kesên kuştî, rê û rêbazên şîngirtin, tirûşkirin û xwelijîyanêgirtinê yên cuda pênase dikin jî, hemû jî di heman hîsî de digihîjin hev: êdî tu tişt ne wek berê ye.

### A) Jîyanên ku Diguherin

*"Telefonek ji te re tê, heyata te qompîle degiş dibe, çökmiş dibê..."*[76]

Gotinên kesûkarê Halil İbrahim Oruç, puxteya hîsên ku bi kesûkarên zarokên kuştî re çêdibe, tîne ziman. Hilweşandina manewî ya ji ber kuştina zarok û ciwanan çêdibe,

[74] Hevdîtin: Amed, Bismil – Bûyera Halil İbrahim Oruç - 22.06.2024

[75] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban – Bûyera Li Gundê Elemûnayê - 14.02.2025

[76] Hevdîtin: Amed, Bismil – Bûyera Halil İbrahim Oruç - 22.06.2024

ne tenê bandorê li dê û bavan, di heman demê de, bandorê li hemû endamên malbatê, hevalên kuştî û di jîyana wî ya rojane de bandorê li mamosta, karsaz û bandorê li kesên ku pêwendîya wî bi wan re çêbûye, dike. Gava ciwanên ku tevkarîya dahat û debara malê dikin, tên kuştin, ev windakirin di heman demê de, encamên darayî jî çêdike. Li cografyayeke wisa ku desteka psîko-sosyal qet têrî nake û tundî û çewisandin didome, şîngirtin jî, berdewamkirina jîyana xwe jî, piştî bi salan jî, ji bo kesûkarên kuştî dibe têkoşîneke rojane.

Kuştina her du birayên Aydın Erdem û Cengiz Erdem, mînakek e ji bo rûxandinên pirrehend ku pêpeskirinên mafê jîyanê di kesên mayî de çêkirine û di vê raporê de hatine lêkolan. Di 9'ê Berfanbara 2009'an de, li Amedê, di protestoyekê de, Aydın Erdem ê 24 salî hat kuştin û em ji kesûkarên wî guhdarî dikin ka jîyaneke çawa maye ji bo kesên li dû wî mayî:

> *"Wexta Aydin çû hemî tiştî bi xwe re bir. (...) Em bûn mehkûm, em aîlecek bûn mehkûm. (...) Zarokên me, psîkolojîya tev de xera bû. Yanî, Hatîce pênc sala mekteb ara daye. Polêsên ku dihatin zarokên me wisa çavên wan diçû ku herin saldirmîş bikin. Yanî bûbûn wek saldirganan. Îcar ez bûm mehkûm 2014'an de, û Cengiz ma li wir [li gund]. Û Cengiz ma li wir, ji bin qontrola min derket. Ez jî mekûm im ez nikarîbûm biçûma."* [77]

Berendamê mamostebûnê Cengiz Erdem ku birayê Aydın Erdem e, gava di nava erebeya xwe de ye, tê kuştin. (Adanır, 2016). Her wiha, bobelata ku bi windakirinekê dest pê kir, bi girtina bav û bi kuştina Cengiz berdewam kir. Malbat, êşa ku bi wan re çêbûye, bi gotinên *"Nayê gotin. Bila Xwedê neyîne serê tu kesî, nayê gotin"* pênasenekirî dihêle.

> *"Min felç derbas kir û piştî wê heyat li me bû zîndan. (...) hê me Aydin ji bîra nekiribû, yê din jî çû. Dinyaya me wilo îcar ters çêbû, wekî ku tu bi ser serê xwe bimeşî. Te fêhm kir? Tu ser serê xwe bimeşî [wêkî] çavên te xwîn ji wan birije."*[78]

Gava hewlê didin ku serederî bi dijwarîyên pîskolojîk yên li dû kuştî çêbûyî re bikin, ji hêleke din ve jî, hewlê didin ku serederîyê bi dijwarîyên fizîkî yên rewşê re bikin. Malbat, bi awayekî ekonomîk, nikare li cîyên ku lê ne jîyana xwe bidomîne. Yek ji cudahîya salên 1990'î ya ji salên 2000'î, jişûnkirina bi darê zorê bû û heman tişt wekî tevdîr û pêşgirîyekê tê pêşberî me. Her çend dewlet tu kesî bi darê zorê nade koçkirin jî, malbat ji bo vê yekê bêgav dimînin. Ji ber biserdegirtina malan ku tim û tim çêdibin, çavdêrîkirina dewletê ya hertimî û tacîzên ku li endamên din yên malbatê tên kirin, ji bo ku zarokekî xwe yê din jî winda neke, malbata Aydın, koçî Mêrsînê dike. Dijwarîyên ku li wê derê hatine pêşîya wan, wiha behsa wan dike:

[77] Hevdîtin: Mêrsîn, Navend – Bûyera Aydın Erdem - 19.12.2024

[78] Hevdîtin: Mêrsîn, Navend – Bûyera Aydın Erdem - 19.12.2024

*"Me newêrîbû, e. Merivkî, me av li ser navê te çêkir, me ceyran ser navê wê çêkir, erê, me ditirisîyan... Ji ber ku cihê me belî nebe. Dîsa me jî bi me hisîyan. Mala me li vê derê nava bajêr bû, avêtin ser mala me, (...) îcar em diçûn êvarê pereyê xwe didan xelkê me xanî kirê dikir, serê sibê dîsa dibû û digotin 'Em nadin we!' Yanî xelkê xanî jî nedidan me. (...) Yanî welatê xelkê bû, gundê xelkê bû, em jî li wê derê esîr bûn. Me jî digot em bisitirin, zarokên me bila bisitirin. (...) Piştî wêna [ji kuştina Aydın û Cengiz ve] şikestinek çêbû di nava zarokên me de. Şikestinek pir mezin çêbû, pir, pir mezin çêbû. Her kes ji xwendinê jî cemidî, her kes ji heyatê jî cemidî, (...) Piştî em hatin vê derê. İcar kesî me qeyd [dibistanê] nedikir. (...) Niha wa ye [tu dibini] heyata me heyateke çawa ye, çawa ji te re bêjim, heyateke pir zor, pir zor me derbas kir. (...) Çaxa ku aborîya te xweş be, sureç zêde te naêşîne. İcar aborî tunebe, van zarokan destê wan qelem negire ew ê herin îcar wek mevsîmlik îşçî li bexçeyê xelkê bişixulin. Û ez jî di hefsa de. Te dît çîqas zor e? Pir zor e."*[79]

Ev travmaya pirawa ku li malbata Aydın diqewime, yek ji mînakên herî aşkere ye ji bo dijwarîyên jîyîna bi windayî re. Ji ber ku mesele êdî ne windakirina kesekî ji xwe ye, di jîyana takekesî de, êrîşên ji yekê zêdetir lê çêdibin û ew jî hewlê dide ku xwe ji bo parastinê amade bike. Yek ji bûyereke din ku mînak e ji bo travmaya pirawa û berdêldayîna pirhêlî, kesûkarên Rojhat Özdel ê 16 salî bû ku li Geverê hat kuştin. Gava Rojhat hat kuştin bavê wî di girtîgehê de bû.

*"...însan dibêjin tiştekê hîs biketin, yanî ew ê ancax dayik bab, ew ê hîssê bizanîtin, giranatiyeke pir giran kete ser dilê min. Ez zêde huzursuz bûm wê konuyê da, min jî li derî da, serokê gardiyanan ewêdî kir, min jî gotê ez hez dikem derkevime telefonê carek dî, got, xêr bît, pirsgirêk çi ye? Min jî gotê pirsgirêk ewladê min e, tiştek hate serî. (...) Ewan jî ewtir nekir, qebûl nekirin, min li derî da, min hizursuzlixeke mezin derêxist wê anê, piştî wê demê wela midûrî ez gazî oda xwe kirim. (...) Ez wesa wê hanê da çûme oda midûrî, min dî zêndemê da savci yê rûniştiye xwarê, êke jin bî, ez çawanê çûm min dî rabû, got, gel otur. Min jî gotê da hangisidir? Ee, min jî gotê hangisidir? Min dît gote min gel otur, gel otur got, min gotê hangisidir? Rojhat midir? Gote Rojhat e, çawanê got Rojhat e, êdî min çavêt xwe sê çar saetan piştî hingê xestexanê vekir. (...)"*[80]

Bavê wî ji dozger dibihîse ku kurê wî hatiye kuştin û dixwaze tev li cenazê bibe. Lê destûra vê yekê nayê dayîn. Hem destûr bo wî nayê dayîn hem jî destûr nayê dayîn ku bi hevalên xwe yên qawîşê re şînê dayne û tê sirgûnkirin. Di êş û azarê de, berdestê sibehekê wî ji jûra wî digirin û dişînin girtîgeha cîyekî ku pê nizane.

[79] Hevdîtin: Mêrsîn, Navend – Bûyera Aydın Erdem - 19.12.2024

[80] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

> *Hema saet, derdorê sê nîv çarê seharê bû, ozel hereket bû, ewadîtir bû, esker bûn, polîs bûn, heybetek hima girtîgeh ful kirin. Hatine derê odê da, ez bême te xwe nehêlan ez wehe terlîka xwe ber kem, hema yataxê da ez wesanê pê atlet û şorti ez hema wesanê duz erebê siwar kirim, nehêlan ez tiştêt xwe bînim, hima çi tiştê min gel min neînandin. (...) Min taleb kir, [ji bo ku beşdarî cenaze yê bim] baş Savcî jî hate wêrê, got, îşte niza çi, (...) got, belkî em neşên guvenlîka te helgirin. (...) Min jî gotê ez bêsîleh im dê ligel te bêm biçime ser mezarê zarokê xwe."*[81]

Gava bavê Rojhat di girtîgehê de şîna xwe dikir, dayika wî jî li derve êşa xwe dikişand. Ancax bi dermanên psîkyatrîyê dikaribû razê. Piştre zarokên wê yên din jî hatin krîmînalîzekirin: Malbat dibêje, *"Gava me nasnameya xwe dida, paşnavê me jî bidîtana an jî li borîroja me binihêrtana, em hay lê dibûn ku bi çavekî din li me dinêrin."*[82] Malbat, ji ber ku nikare zêde li ber vê zordarîyê tirûşê bike, koçî Bursayê dike. Malbat, zordarîya ku li Geverê li wan çêbûye û wan biryara koçkirina li Bursayê daye, wiha vedibêje:

> *"Te dî, vê jî zêde tesîr li me kir, yanî, ji cîyekî şûnde mirov dibêje, wisa be ev der ne ew cî ye em lê bimînin, em ji wê sedemê rabûn çûn wî alî rojavayê, me got, ka em binêrin wê çawa be. (...) Em bişixulin. Me derîyê xwe rada û em derketin çûn."*[83]

Zarokên din êdî naxwazin biçin dibistanê û bawer nakin ku wê di jîyanê de her tişt rast bigere. Bi gotina, "Piştî ew çû û bûyerên ku em li wan bûn şahid, jîyanên me yên din jî têk çû; piştî wê me nexwest tiştekî bikin"[84], di rastîya xwe de, bi kurtayî behsa wê bandorê dikir ku vê windakirinê li yên mayî, kiribû.

> *"Em hez naken mektebê berden lê piçekê onyargilî ne, em ê bixwînin em ê bine çi, niza dê çi bît, sankî dê kadroyê dene me! Hep bununla büyüdük aslında biraz, bir önyargı oluştu."*[85]

## B) Zarokên ku Bêbav Mezin Bûn

Ev zarokên ku bêbav mezin dibin, azmûnên wan ên sext ên li bajarên Rojavayê û libinguhêhevketinên wan, ji windakirina takekesîyê wêdetir diçe û nîşan bi travmayeke di navbera nifşan de dike. "Zarokên ku bêbav mezin dibin", bi taybetî di qada Wan û Geverê de derketin pêşîya me û herî baş, kesûkarekî wan, bi gotina "qet ne adil e" dijwarîyên ku

[81] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

[82] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

[83] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

[84] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

[85] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera Rojhat Özdel - 29.04.2025

li wan diqewime, tîne ziman. Ev zarokên ku bavê wan hatiye kuştin, xwe mîna ku ji bo bêdengîyê û dixwedebûnê hatine mehkûmkirin, dizanin.

Hin ji wan bi qasî ku bavê xwe bîne bîra xwe, mezin bûye hin ji wan demeke pir kurt pê re derbas kiriye hin ji wan jî qet bavê xwe nas nekiriye. Di dema hevdîtinan de, em dibînin hin ji wan li malê ne lê piranîya wan bi me re neaxivin. Bermala 11 salî ya keça Bêmal Tokçu, gava bavê wê hatiye kuştin, di zikê dêya xwe de bûye. Di dirêjeya hevdîtinê de, misêwa fotografa bavê xwe tîne û nîşanî me dide û bi meraqekê li tiştên ku dêya wê dibêje, guhdarî dike.

> *"Te dît, dêbêjin mesele, bejna babê me çend dirêj bî. Çend bejna wî dirêj bî, çi dikir babê me, filan û bêvan. (...) Kiçik, gelek pirsyar diken. Eve pirsyar diket. Mesele babê xwe ve girêdayî ne. (...) Yanî te dît car caran, ewk dikin, piranî kurik, keçik jî wisan in, biçûk piştî babê xwe, gelek meraq diken, kanê ecêba, babê me, babê me maba dê bo me çawanê ba, dê jîyara me çawanê ba, belkî ew ji dayka me çêtir ba, an dayka me çêtir e. Ew hez diken, mesele, wan jî hez dikir babê we bibînin, ka jîyara ligel babê çawanê ye. (...) Ew têt fikurît kanê dêbêjin xwezî babê me jî sax ba."*[86]

Digel vê yekê, kurê İslam Tekoğlu ku gava pênc rojî bûye bavê wî hatiye kuştin, îo 19 salî ye û bi gotina kesûkarên wî, tim bêdeng e û xortekî dixwede ye. Zarokên Ercan Uca yên li pey wî mayî, zarokên İkbal Yaşar û bêdengîya ku hevaltî li jîyana hemû zarokên bêbavmayî dike; carinan gava leqayî kiryarên berdibetî dibe, vediguhere rarûbûneke sext. Mînaka balkêş a yek ji vê rewşê, li şubeya leşkerîyê, li kurê yek ji wan ên ku hatine kuştin, diqewime. Li gorî ku dêya wî radiguhêzîne; pirsa *"Bavê te çi karî dike?"* ku bi awayekî rutîn tê pirsîn, bi reflekseke kontrolnekirî, wekî *"We bavê min kuşt"* dibersivîne. Bersiva ku lê vedigere ev e: *"Me qenc kiriye û bavê te kuştiye."* Ev bûyer, nîşan dide ku hêrsa ku wisa di hundir de mezin bûye çawa dikare ji nişkê ve, mîna ku biteqe, bêkontrol der bibe. Ji hêla din ve, nîşan dide ku çi mexdûr çi jî kiryar, tu carî tiştên qewimî ji bîr nakin.

### C) Jinên ku Hevjînê Wan Hatine Kuştin

Li Wanê û li Geverê, yek ji temayên ku xuyanî ne, jinên ciwan in ku hevjînê wan hatiye kuştin. Her çend çarçoveya vekolîna me ji zarok û ciwanan pêk tê jî, li vê derê, ji ber zewacên di temenê pir ciwan de, profîla kesûkarên zarok û ciwanan ji bajarên din cudatir e. Hevdîtinên ku me digel jinên ku hevjînê wan hatine kuştin, çêkirin, têkoşîna wan a hem di qada sîyasî de hem jî di jîyana rojane de datîne rastê. Rapora Navenda Vebîrê ya bi navê *Hilanîna Fotografê* (Kaya & Bozkurt, 2014), jinên ku di salên 1990'î de hevjînê wan hatiye kuştin, dixe navenda xwe û ji alî zayenda civakî ve tundî û têkoşîna bo edaletê datîne rastê.

[86] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan- Bûyera Bêmal Tokçu - 28.04.2025

Di salên 2000'î de li bajarên kurdan, bi taybetî li bajaran, qadên komalî yên bihêz hene ku hayjêbûnên jinan pir zêde çêdibe, dikarin zemînên têkoşînê yên li dijî çewisandinên sosyal û ekonomîk biafirînin û vê yekê di pratîkên jîyana rojane de pêk bînin. Di hevdîtina yek bi yek de ku me bi wan jinan re kirin ku hevjînê wan hatiye kuştin, wan hin tişt got û bi qasî ku me çavnêrîya wê kir, yek ji bergindên giring ên van qadên bihêz ku jinan ji xwe re ava kiriye, şêweyê qebûlkirina wan a berpirsîya xwe ya di têkoşîna bo edaletê de ye. Hevaxêvereke me ya jin ku hevjînê wê yê yekem di bûyereke kiryar nedîyar de, hevjînê wê yê duyem jî di bûyereke komalî de hatiye kuştin, bi tena serê xwe 6 zarokên xwe yên ku ji hevjînê xwe yê pêşî ne, mezin dike. Gava me hevdîtin çêkir, fotografên her du hevjînên wê yên kuştî jî bi dîwêr ve daleqandî bûn û wiha vedibêje jîyana xwe ya ku tevlihev e û bi qasî wê jî tijî têkoşîn e:

> *"Gava mesele ku tiştek kurdayî ye jî, dê bêjin gava zelam çît, jinik bêqîmet dibît, hima we nîn e. Mesel bi vi şiklî dibêjin, ne bê qîmet bî, mesele çi qîmeta me hebît wekî berê ye, gurura min wekî berê pitir e, ez pitir berexwedana xwe dikim, jîyana xwe bi rê ve dibem. Wekî zelam sax, mesele, dê zelam me xudan ket, mesele ez dê xwe bêjim, zelam dê me xudan biket, ama hekî zelam çû, mirov pitir xwe bi rê ve dibetin."*[87]

Hevdîtinên ku bi wan jinan re hat kirin ku hevjînên wan hatine kuştin, azmûn zêdetir li dor şîngirtin, windakirin û lêgerîna bo edaletê tê behskirin. Lê belê, giring e ku em ji perspektîfa zayenda civakî li azmûnên wan û tiştên qewimî binêrin, dijwarîyên ekonomîk ku derketine pêşîya wan, çewisandinên komalî û malbatî ku wan li dijî wan li ber xwe daye û têkoşîna ku wan ji bo berdewamkirina jîyana xwe kiriye, li ber bala xwe bihêlin. Tengijeyên di nava malê de ku di gelek hevdîtinan de nayê behskirin, di hevdîtineke me ya li Culemêrgê de wiha tê vegotin:

> *"Yanî xesû tiştekî bêjît, zaten bo mirovî dibîte sixintî, xezûr tiştekî bibêjît bîte sixintî, tîyê mirovî tiştekî bibêjîte... biçûkêt xwe bi rê ve dibem, [mezin dikim] (...) yanî sixintîya malê, jinka bêzelam bikêşît geleke zor e, jinka bêzelam neşêt sixintîya malê, yê xezûrî, ya xwesûyê, ya tîyî, an ya êkedî bikêşît. Incax mirov ya mala xwe, ya biçûkêt xwe û ya xwe."*[88]

Jinên ku hem li hundir hem jî li derve têdikoşin, herî pir jî ji bo ku bigihîjin edaletê hewlê didin. Em rastî gelek bûyeran hatin ku dewletê kesên li dû kuştîyan mayî dixist bin zordestîyê û ji bo kuştinên kiryarê wan dîyar pêşî li lêgerîna bo edaletê bigire, hewlekê mezin dida. Halime Yaşar a hevjîna İkbal Yaşar, têkoşîna bo edaletê ya niwaze dimeşîne

[87] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan- Bûyera Bêmal Tokçu - 28.04.2025

[88] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan- Bûyera Bêmal Tokçu - 28.04.2025

û di 25 salîya xwe de, li Geverê, bi du zarokên xwe re, bi tena serê xwe, dikeve bin barekî mezin. Hê hawarîya wê lidar e, li dijî qeymeqamê bajarokê radibe û têkoşîna xwe dide destpêkirin.

> *"...Paşê tekrardan qaymaqam ez gazî kirim, (...) gote 'Helîme du zarokên te hene, tu jî wek xwişka min were mesela bêje ku ew e, îşte dewletê nekuştîye, dewletê nekuştîye. Were ez ê zarokên te dema ku mezin betin ez ê qadroyê bidimê de, ez te jî, yanî İkbal heke çend qerê (deyn) wî hebîtin jî, qerê wî çend hebîtin jî, were destê xwe bike milê min de, destê xwe wekî xwişkekî min, ez birayê te, tu jî xwişka min a biçûk, were em ê çarşîyê de biçin, çi çend qere hebin ez ê hemûyan bidim û e zê xanîyekî wisa ji bo te çêbikim, millet, zaten muxtar jî gel me bû şahîd bû, milletê Geverê ha wisa li xanîya binihêrin.' Min got 'Xwîna me nefirotî ye, me xwîna xwe nefirotîye.' Zaten min got, 'Bi saya te, te emîr daye ku kuştina wî, te emir daye, ez ê çawa bêjim ku yekî din kuştîye? Te kûştîye zaten. Bîr de min îhtîyaç ne bi pereyê te heye, ne qadroya te heye, ne jî çi. (...) Tu tiştekî wisa bikî ez ê biçime sawcîlixê, dawayê vekim ji bo te.' (...) Du roj tê de çû tekrar hatin ez girtim. Ez hatim wêrê de pere ser maseyê bû. (...) Dedim "Qaymaqam bey beni niçin çağırmışsın?" Dedi "İşte bir araba erzak falan hazırlamıştım, bu parayı da benim yeğenlerime götür." Min got "Bir kere onlar senin yeğenlerin değil. (...) Çi kes me nestendiye. Biz satılık değiliz. Paranı da al. Te hem mala min xira kir, te hem biçûkê zarokên min bê bav, yetîm kir, tu bîr de pere didî min?"*[89]

Lîteratura travmayê, a der heqê travmayên pirawa/an jî zincîrî de, mirovan bi vî awayî hişyar dike: dibe ku bûyerên travmatîk bi bûyerekê tenê sînorkirî nemîne. Bi taybetî pevçûnên çekdarî, jişûnkirin û koçkirin; dikin ku mirov şûngeha xwe, çanda xwe û pêwendîyên xwe li pey xwe bihêle û bandorên giran ên travmatîk dike (Ergin & Koman, 2021).

Çîroka malbatên ku me di vekolînê de bi wan re hevdîtin kir jî, mînakên berbiçav ên vê travmaya zincîrî danî rastê. Kesên ku piştî bûyerê bi gotinên wekî; "Êdî ez nîv-mirov im", "hemû endamên malê piştî Gurbetê mirin", "18 sal in her şev digirîm û xwe sûcdar dikim; ka min çi kir ku Xwedê ez bi ceza kirim", "kesên ku paşnavê wan wekî yê me ne, bo kar nayên qebûlkirin" bi kurtayî vedigotin, hin ji wan ji kar hat avêtin hin ji wan ji tenduristîya xwe bû hin ji wan jî astengîyên wan ên wisa çêbûn ku wê bi dirêjeya temenê wan bidome. Û hin ji wan giranîya vî barî, bi gotina, "Me jî hêvîya hatina rehma Xwedê kir; Xwedê sebr da min" hilgirt. Ev rengpêdana bavê Hasan İş jî, domdarîya jîyana rojane ya digel winda, bi awayekî balkêş û bi kurtayî dibêje: "Te got hîsên me? Te dî, derzîyekî te winda dibe, du sal di ser re diçe, diçî lê digerî, çavên te lê digerin û tu dibêjî, derzîyê min li vê derê winda bû."[90]

---

[89] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Bûyera İkbal Yaşar - 28.04.2025

[90] Hevdîtin: Batman, Merkez - Bûyera Hasan İş - 24.04.2025

## D) Girêdana Şîna Hevalên Xwe: Travmayeke Kolektîf

Yek ji mîxwera bingehîn a vê raporê, şahidîya wan azmûnan bû ku di salên 2000'î de digel şêweyên tundîya dewletê ku diguherîn, derdiket rastê. Her çend di hemû beşê de me kesûkarên windayan xistibe navenda xwe jî, şîna ku tê girtin vediguhere ser travmayeke kolektîf. Şahidîya Mahsum Karaoğlan û Aydın Erdem, yek ji mînakên balkêş a vê yekê ye. Her du jî li Zanîngeha Dîcleyê xwendekar in û di heman demê de jî hevalên hev in. Mahsum di 4'ê Nîsana 2009'an de, hevalê wî Aydın Erdem jî, di 6'ê Berfanbara 2009'an de, di xwenîşandanên komalî de tên kuştin. Xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê gava cenazeyê hevalên xwe di morga zanîngehê de dibînin, ev yek ji bo wan dibe şokeke wisa ku nayê gotin. Derya Moray ku hevala her duyan e jî, dibêje, "xwendekarekî zanîngehê, ji dibistana ku her roj diçûyê cenazeyê wî jê dihat derxistin" û têkderîya wê rojê radiguhêzîne. Di vê demê de, Zanîngeha Dîcleyê, bi gotina xwendekaran, ji hêlekê ve dibe şûngeha ku şînên polîtîk lê tê girêdan ji hêlekê ve jî dibe zemîna ku protesto lê dest pê dikin. Derya bi van gotinan wê demê vedibêje:

> *"Ji bo me, tiştekî mîna şokê bû... [di dema pêvajoya aştîyê de] Em wisa cemidîn. (...) Piştî ku grûpa aştîyê hat, Aydın hat kultin. Yanê ev ji bo welat, bendeke pir giring e. (...) A rast, di wê demê de hêvîya me sar bû. (...) Ew navê polîtîk ê Zanîngeha Dîcleyê, sekna wê ya polîtîk, ji cîyekî şûnde, veguherîbû û bûbû cîyê ku şînên polîtîk lê tên kirin, protestoyên polîtîk lê tên kirin û a herî giring jî, bûbû cîyekî ku mirovên polîtîk di qetlên polîtîk de dihatin kuştin."*[91]

Piştî Aydın, hefteyek ders hatin boykotkirin û meşên xwendekaran dest pê kirin. Piştî ku bûyer zêdetir bûn, rektorî zanîngeh xist betlaneyê. Piştî demeke kurt, Derya jî hat girtin, ceza lê hat birîn û neh sal di girtîgehê de ma. Deryaya ku jibêgavî li girtîgehê şîna du hevalên xwe girê da, van şîngirêdanan wekî şêmûga/benda polîtîkbûna xwe û wiha pênase dike:

> *"Sekneke min a wiha polîtîk hebû lê ez zêde dernedîketim pêş. Di sala 2009'an de du bendên giring hebûn. (...) Yek, di 4'ê Nîsanê de Mahsum Karaoğlan li Amarayê hatibû kuştin ku min ew ji zanîngehê nas dikir. Ji ber ku mesela ez salên 90'î (...) tim hin kesan ji me re vegotiye, loma dizanim. (...) Qet nehatibû bîra min wê ew çîrok di rastînîya min de jî cî bigirin. (...) Me kuştinên kiryar nedîyar [ên salên 90'î] bihîstibû lê hindikî be jî, bi hatina AKP'ê re dibûn şahidî wî tiştî ku dewletê xwe rexne dikir û digot wê tiştên berê neqewimin. Ji ber vê yekê, qet nedihat bîra min ku wê mirovek li tenişta min, ev qasî nêzikî min, di nava her kesî de were kuştin."*[92]

[91] Hevdîtin: Amed, Navend – Bûyera Aydın Erdem - 24.06.2024

[92] Hevdîtin: Amed, Navend – Bûyera Aydın Erdem - 24.06.2024

Berdêlên tên dayîn bi tenê bi endamên malbatê re sînorkirî namîne; teşe dide qada komalî jî. Carinan gundekî hemû şîn girê dide, derebe tên daxistin, carinan hemû zanîngeh bi hefteyan nakeve dersan. Pratîka tundîyê ku diguhere, jîyana yên li dû mayî ji binî ve diguherîne. Her bûyerek, hem di asta takekesî hem jî di asta komalî de lêgerîna bo edaletê û hêvîyê geş û zindî dihêle. Gotinên bavê Nihat, bi kurtayî tirûşdarîya yên li pey mayî û daxwaza wan a ber bi siberojê ve ya ji bo edaleta sarêjker, tîne ziman:

> *"Ne mimkun e ku em Nihat ji bîr bikin lê ji bo xatirên zarokên xwe yên din, em dixwazin xweş bibin."*[93]

---

93 Hevdîtin: Şirnex, Cizîr– Bûyera Nihat Kazanhan – Gulan, 2023

# BEŞA 3'yan
# Lêgerîna bo Edaletê

Her wekî berê jî hat dîyarkirin, lêgerîna bo edaletê, yek ji mîxwerên bingehîn a vê xebatê ye. Lê belê, ev beş, wekî berdewama analîzên şûngehî û komalî yên tundîyê ku di beşên berê de hatin nirxandin, azmûnên piştî tundîyê ku tê de şîngirtin, têkoşîn û lêgerîna bo edaletê hevdibirin dixe navenda xwe. Hevdîtinên ku me bi malbatan re çêkirin dike rêgeha xwe û lêdikole ka pêvajoyên hiqûqî yên piştî kuştina zarok û ciwanan çawa li kar ketine, ev pêvajo ji alî kesûkarên mexdûran ve çawa hatine famkirin û di jîyana wan de cîyekî çawa girtiye. Di heman demê de, bêyî ku bi edaleta hiqûqî sînorkirî bimîne, hewlê dide têbigihîje ka derbirana "Edalet Sarêj Dike" li ba mexdûran û kesûkarên mexdûran wateyeke xwe ya çawa heye.

Her wekî me di beşa destpêkê de jî destnîşan kir, ji bo gelek kesûkarên mexdûran, lêgerîna bo edaletê serê pêşîn tê wateya têkoşîna hiqûqî. Bicezakirina kiryaran û naskirina berpirsîya dewletê ya bi biryara dadgehê, di nav daxwazên herî pêş de ne. Lê belê, her wekî gelek xebat û raporên akademîk jî nîşan didin, li Tirkîyeyê û bi taybetî li bajarên kurdan, ev têkoşîn, her tim berhemberî mekanîzmayên cezanekirinê yên avanîyî dibin (Sevdiren, 2015).

Serê pêşîn, polîtîkayên jêvegerandin û tirsandinê, dikarin li ber destpêkirina rapirsîyan an jî lêpirsînan bibin kend û bend. A duyem, gava mesele dibe sîstema hiqûqê, kend û bendên avanîyî çêdibin. Bi taybetî, di pêvajoyên dozên ku li ser windakirinên bi darê zorê hatine vekirin, doz bi salan wisa li azîyê tên hiştin, bersûc û şahidan nayînin dadgehê û doz ji bo bajarekî dûrî cînişîna kesûkaran tê veguhastin û ev yek; yek ji wan stratejîyan e ku me di pêvajoyên darizandinê de bi awayekî berbelav dîtine. (Alpkaya et al., 2017). Wekî dawî, barê ekonomîk ên pêvajoyên hiqûqî ku pir dirêj dibin û şêweyên çewisandinê yên li ser kesûkarên mexdûran tên meşandin, dikin ku ev têkoşîn dijwartir bibin. Ev xebat, li xwe dike armanc ku destnîşan bike ka van teweqan hemûyan, di dema ketî behsê de, çawa teşe daye têkoşîna malbatan û rehendên wê yên dilînî û komalî çawa dîyar kirine.

Digel vê yekê, ev beş bala xwe tenê nabe ser daxwazên edaleta cezaker; di heman deman de, qadê çêdike ji bo aşopkirinên edaleta sarêjker û veguherîner. Li ser rêyên xweşbûna (sarêjbûna) bi awayekî takekesî û kolektîf, li ser pratîkên vebîrkirinê û li ser pirsa ka gelo destpêkerîyên bi vî rengî edaletê çawa ji nû ve pênase dikin, gengeşeyê dike. Her wekî di beşên berê de jî hebûn, her çend daxwaz bi awayekî takekesî werin kirin jî, asoyeke hevpar bi awayekî aşkere tê ziman: bêyî çêbûna dewleteke hiqûqî û hatina aştîyê, wê asoya edaletê tarî bimîne.

## 1) Sînorên Têkoşîna bo Hiqûqê

### A) Kiryar Kî ye? Pirsyarîkirina Berpirsîya Dewletê

Hema bêje ji bo hemû malbatan, têkoşîna bo hiqûqê wekî qada rarûbûna bi dewletê re tê pênasekirin. Gava pirsa "Kiryar kî ye?" ji wan tê kirin, derbiranên ku amraz û sembolên cuda yên dewletê nîşan dikin, tên pêşberî me: "qedemeyên jorîn ên dewletê", "qomitanê tofê", "ajan û MİT"[94], "polês", "ew ên ku altaxî kirine", "ew ên ku xwe li ehmeqşeytanîyê datînin û dixwazin bûyerê bindoşek bikin", "ew ên ku ji helîkopterê peya dibin û gule li gel direşînin", "harekata (tîmên) taybet", "JÖH û PÖH"[95], "amraza bizirx", "sîstem", "kesê ku amraza bizirx diajo", "leşkerên dewletê", qomitanê tabûrê", "birêvebirî."

Bi tevî van pênaseyan ku dewletê dixin navendê, mexdûr berpirsîya dewletê ya bo parastinê bi bîr dixin û di heman demê de jî, hemû sazî, takekes û guhnedanan wekî parçeyekî vê "dewleta" kiryar pênase dikin: xebatkarên tenduristîyê yên ku li nexweşxaneyê midaxaleyê nakin, ambulansa ku nehatiye, hêzên ewlehîyê yên ku bend datînin ser rêyan, rayedarê dewletê ku agir berdide kayê... Ji bo mexdûran, hemû zincîr, nîşan bi kiryarekî ne yekanî lê yê kolektîf dike.

Piştî 3 salan a pevçûneke ku li bajaroka Çêrmûgê ya Amedê çêbû, di 7'ê Pûşpera 2011'an de, Umut Petekkaya yê 15 salî, bi teqemenîya ku di nav zinaran de dibîne û pê dilîze û ji ber teqîna teqemenîyê jîyana xwe ji dest dide. Kesûkarê Petekkaya "berpirsîya dewletê ya bo parastinê" bi bîr dixe û kiryarê wiha pênase dike:

> *"Dewleta! Sorumlîyê mergê Umutî dewleta! Ma hinî vajim. Qet ewro ma ferz bikerim ke, xo ra ez nêzana bomba ê kamî ya. (...) Mi rê çi. Ti [dewlet] ewro gandê mi rê, maldê mi rê sorimlîyê ke mi qorîmîş bikerê. Ewro görevê to o yo. (...) Çatişma virazîyaya. Olabîlîr vejîyeno. Heme ca de vejîyeno. Ti çi rê kerraya xo paknêkenê? Sûclîyê ti, bîrebîr sûçlîyê ti. Yanî ti sûçlîyê ke ti ûja paknêkerdo. Lajî mi şîyo, qeçek o, dîyo û pê kaykerdo. % 99-%100 dewlet bu ölümden sorumludur ve suçludur."*[96]

Gelek caran tê gotin ku sîstema polîtîk a lidar e jî kiryar e. Ji avabûna Komarê û bi vir ve ye polîtîkayên asîmîlasyonê yên ku li bajarên kurdan tên bicîanîn, şêweyên birêvebirina neasayî û pêkanînên tundîyê, nîşan bi mekanîzmayên zordestî û bicezanekirinê dikin ku gelek hevaxêver an rasterast an jî nerasterast wan wekî serçavî nîşan dide (refere dike).

---

[94] Sazûmana Îstixbarata Milî

[95] JÖH-TTC: Tevgerîna Taybet a Cendirmeyan, PÖH-TTP: Tevgerîna Taybet a Polêsan

[96] Hevdîtin: Amed, Çêrmûg - Bûyera Umut Petekkaya -04.12.2023

Hevalê Aydın Erdem û Mahsum Karaoğlan ku dibêje “Ji ber wê yekê jî, divê em behsa xerabîyeke kûrtir û hê bêtir organîzebûyî bikin” û kiryaran wiha pênase dike:

> *“Ev sîstem bi xwe van [kiryaran] hildiberîne. Sîstem bi xwe pirsgirêk e, kana pirsgirêkê jî ew e çareserî bi xwe jî ew e. Ji ber vê wisa ye, gava ez bêjim “qatil” û bikim kirina kesekî, wê nebe bersiva tiştên ku li vê derê diqewimin. Ji ber ku domdarîyek heye di vê yekê de, stratejîyek heye, di nava vê yekê de cografyayek heye, polîtîkayên ku tenê xweserî gelekî hatine çêkirin û tên meşandin heye.”*[97]

Her çend, kesûkar û malbat dibêjin, bi biryar û fermana rayedar û birêvebirên payebilind ev kuştin çêbûye û kiryar “dewlet” bi xwe ye jî, beşek ji malbatan, rasterast kesê ku kuştin pêk anîye an jî yekeya ku ew tê de ye dizanin. Di hevdîtinan de aşkere dibe ku malbat der heqê hêzên ewlehîyê de ku amraza bizirx diajo, gule berdide, fîşeka gazê difiştiqîne an jî gule direşîne, xweyî agahîyên bi hûrgilî ne. Ev rewş di bûyera Mehmet Uytun de berbiçavtir dibe. Kesûkarên wî vedibêjin ku kiryar ev sûc bi zanebûn, bi daxwaza xwe û bi nîşandanê kiriye:

> *“Heke berdayî jî zarokên li wê dê görgî şahîdî digotin. Digot hehehe dikenî. Tu dibêjî qey çûye çeperê de neyarek kuştiye. Te yê zarokek li mile dayîka wî kuştî.”*[98]

Ji ber ku kiryar bi pêbendîyên xwe yên bi dewletê re heyî tên pênasekirin, ev yek, di heman demê de, dibe sedem ku malbat xwe li têkoşîna hiqûqî nedin an jî piştî demekê dev ji têkoşînê berdin. Dibe ku sedema vê biryarê ji ber awayê têkilîdanîna malbatan a bi hêzên ewlehîyê re be an jî dibe ku ji ber awayê têkilîyên ku ew bi birêvebirên cihkî yên dewletê re datînin be, her wiha; dibe ku sedema wê tirs û gefxwarin be jî. Malbatek vê rewşê wiha dibêje: *“me ji tirsan re nekarî bigota, em gilîkar in’; em tirsandin.”*

Astengîyeke din ku digel vê tirsê ye, bawernekirina ji sîstema darizandinê ye. Ji bo gelek malbatan, lêgerîna bo mafan a di sîstema dewletê de, hê ji serî de rêyeke ji hêvîyan xalî ye. *“Ne pêkan e em bi dewletê re serî derxînin. Loma jî ez nakevim lêgerîna bo mafê xwe, wê Xwedê heqê me ji wan bistîne. Serê van karan, van dozan nagihîje cîyekî.”* Azmûnên ku bi dewletê re çêdibin, di hiş û mêjiyê malbatan de giranîyeke pir zêde çêdike, loma jî, bi serwerîya hiqûqê û bi mezinahîya dewletê re, dimîne wekî dibetîyeke spêleyî.

> *“Lê belê malbateke biçûçik û dewleteke mezin. Wê çawa be. Zehmet e.”*

---

[97] Hevdîtin: Amed, Navend - Bûyera Aydın Erdem - 24.06.2024

[98] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr - Bûyera Mehmet Uytun – Gulan, 2023

## B) Doz Lê Vekirin-Nekarîn Doz Lê Vekin

Hema bêje hemû malbatên ku me bi wan re hevdîtin kirin, piştî bûyerê, heman rojê an jî çend roj şûnde, destpêkerî kiriye ji bo ku pêvajoya hiqûqî bidin destpêkirin. Li gorî asta zanînê û têkilîyên wan, malbat serî li gelek rêbazan didin. Hin malbat, qereqola eleqedar an jî dozgerî gazî wan dike, hin malbat jî bi xwe diçin. Gava pêvajo tê destpêkirin, hin parêzer bi awayekî dilyarî xwe didin ber dozê, carinan partîyên sîyasî -bi gelemperî nûnerên sîyaseta kurdan- bi parêzerên xwe ve tev li pêvajoyê dibin carinan jî rêxistinên civaka sivîl ên ku di vî warî de dixebitin dikevin navê. Piranîya malbat dibêjin, parêzerên nûner ên KMM, Baro û sîyaseta kurdan, xwe didin ber dozên wan. Lê belê, hin malbat jî, bi derfetên xwe ve dozê dimeşînin. Hin malbat dozê dispêrin sazîyeke eleqedar û êdî dozê naşopînin hin malbat  jî gava hewce dike ku doz ji nêzik ve were şopandin, dozê dispêrin parêzerên taybet.

Gava malbatek bi sîstemî nizanibe, jê fam neke, nikaribe bişopîne ka çawa li kar dikeve; her çend pêvajoya hiqûqî bidome jî; pêvajo wisa geremolî dibe ku malbat nikare wê bişopîne. Ji ber ku ev rewş bi malbatan re hîsa bêzarî û têrînekirinê çêdike, ev yek dibe sedem ku dozê bispêrin sazîyeke ku pê bawer in. Malbata Mehmet Nuri Tançoban, ji ber ku nekarîye dosyeya dozê bişopîne, nizane ka doz hatiye kîjan qonaxê:

> *“Welehî sözde ew avûqatê me vekirin. Avûqatên partîyê hebûn. (...) İşte ew dawa vekirin. Ew gotin ‘Em ê îlgîlenmîş bibin, em ê, haya me jê hebe.’”*[99]

### *Nepenî: Rapirsînên Ku Aqûbeta Wan Nayên Zanîn*

Di qonaxa pêşî de, gelemşeya ku herî zêde derdikeve pêşberî malbatan, liazîyêmana lêpirsînê an jî sergirtina wê ya ji ber neşopandinê ye. Malbatên ku nikarin çibûna aqûbeta lêpirsînê hîn bibin, sedema wê, zêdetir li “biryara nepenîyê” bar kir. Ev gotina ku pêkanîneke hiqûqî wekî serçavî nîşan dide (refere dike), ji alî hin malbatan ve, ne bi wateya teknîkî, lê ji bo dijwarîya xwegihandina bo agahîyê tê derbirandin. Tevî ku gelek sal di ser re derbas dibin jî, malbatên ku nikarin der heqê lêpirsînê de agahîyeke zelal û teqez hildin, sedema bipêşveneçûna pêvajoyê û birêvenebirina wê ya bi awayekî şefaf, wekî polîtîkayeke dewletê dizanin. Kesûkarên Halil İbrahim, wiha derdibirin:

> *“Ez çûm ba sawcî, sê çar sal bere (...) got ‘Bütün oklar polisi gösteriyor ama bana delili de getiren polistir. Ben ne yapayım?’ Û ji wê rojê de ez neçûme ba sawcî. Ez çûm Insan Haklarî û ez çûm Baroyê. Ji ber ku belkî “Gizlilix Karari” ser de heye.”*[100]

---

[99] Hevdîtin: Wan, Çildêran – Gundê Hecî Xatûn - Bûyera Mehmet Nuri Tançoban -24.04.2025

[100] Hevdîtin: Amed, Bismil – Halil İbrahim Oruç -22.06.2024

Di vê bûyerê de, malbat, parêzerên wan, Baroya Amedê û KMM, ji bo ku aqûbeta lêpirsînê hîn bibin, digel ku gelek hewlan didin jî, balê dibin ser giringîya vîna sîyasî:

> *"Avûkat şeş heft kesîn. (...) Hetta wê çaxê meclis başqanî Arinç,*[101] *hatibû baroya Dîyarbekir, Mehmet Emîn Aktar*[102] *gotiye 'Binêre ez ji Bismilê me. Li Bismil gêncek hat kûştin. Heq û hiqûqa wî gêncî baro olarak em dikin nakin, em nikarin kî wî gêncî qetil kirîye û kî were yargilanmişkirin hûn nahêlin tiştek derê meydanê.' [Ew jî] gotiye 'Ez ê li ser bisekinim.'"*[103]

Malbat, wekî çareserîyeke berdibetî, pirî caran, ji bo lezdayîna li pêvajoya hiqûqî ku bi pêş ve naçe û ji bo xwegihandina bo agahîyê, behsa serîlêdana bo nûnerên dewletê yên ji derveyî darazê dikin, lê belê ev rêbaz kêm caran bandoreke berbiçav dide der. Ji vî alîyî ve, mînaka dayika Medeni Yıldırım, îstîsnayek e. Gava rêyên hiqûqî dixetimin, xwe digihîne miqamê herî jor ê dewletê û pêvajoyê bi awayekî neasayî dide destpêkirin.

> *"'Gîzlîlîx' li ser hebû. (...) mi rokê mêze kir, telefonê televzonê vekir mi go hela bise di Batiyê da çi heye hanî, li vir sekiniye ama li Batiyê başlar kiriye şer e. Wele mi mêze kir mi dî go vay go [Recep Tayyip] Erdoxan go saetkî paşê go li Diyarbekirê peya dibe tê dere. (...) Çar sed heba go nîkaha wan qiymîş dikir, li unîversitê hinda faqultê. (...) fotrafê xwe [ya Medenî] girt ez çûm pêşiya wî. (...)"*[104]

Bi tena serê xwe ji gund radibe, pankarteke mezin ku fotografê Medeni li ser e, di bin kirasê xwe de û bi nava xwe ve girê dide û li Amedê, tê wî cîyê ku lê marbirîneke komî tê çêkirin. Bi ser dikeve û xwe digihîne cîyê herî nêzikî serokwezîrê wê demê Erdoğan, lê belê li wê derê hêzên ewlehîyê wê radiwestînin û dixin binçavan.

> *"Wî gavê gi ez çûm pêşiya wî qurmayê wî, wî kirin valîlikê hatin pêşiya min, li min kom bûn ez fetisim. (...) Wî gavê başbaqan bû, min go 'ez qatîlê xwe ji wî dixwazim'. Çûn jê ra gotin, ew fetilîn bi ser min da, gotin doxrî ye wî bibin teslîmê ekîbê bikin. Ew ê rojê li ekîbê bûm, kîmlika min hatin girtin birin dan destê wî, ê araştirmîş kirin doxrî ye, tişkî tune ye rast dibêje"*[105]

---

[101] Bülent Arınç: Serokê MMMT'ê yê Serdema 22'yan û Cîgirê Serokwezîr

[102] Serokê Baroya Amedê yê Wê Demê

[103] Hevdîtin: Amed, Bismil - Bûyera Halil İbrahim Oruç -22.06.2024

[104] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Nênyas- Bûyera Medeni Yıldırım -25.06.2024

[105] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Nênyas- Bûyera Medeni Yıldırım -25.06.2024

Ji bo ku biryara nepenhiştinê were rakirin û doz were vekirin, xwestiye derkeve pêşberî serokwezîrê wê demê. Dibêje, piştî 5 mehan ku kurê wê hat kuştin, biryara nepenhiştinê ya li ser dosyeyê heyî, hatiye rakirin.

> *“Armanca min, min ê wiya bigotana, ez ê dîrek biçiyama pêşiya wî eger bigiyamayê, min ê pê bigirtana [Bi Recep Tayyip Erdoğan], ‘qatîlê min kî ye se savunmîş neke wî bide min.’ Min ê bi gota; ‘Qatîlê min bide.’ Piştî wî, hîna Licê sawcî ba me kir hîna me çû dawê vekir (...) Ez gihîştim heqê xwe. Ez gihîştime en azından hingê derket, yanî veneşart.”*[106]

Her çend çalakîya Fahriye Yıldırımê îstîsna be jî, di heman demê de jî, mînakeke balkêş e ji bo ku bizanin ka pêvajoya hiqûqî dikare çawa bikeve nava jîyana takekesî û qada gelemperî. Ew bi xwe hînî Tirkî dibe, li televîzyonê temaşe dike, pîlanan çêdike û hewlê dide ku bi awayekî rasterast xwe bigihîne rayedar û birêvebiran. Ev mînak, nîşanî me dide ku kesûkarên ku di nava sîstemê de tevnagerin, dikarin qadên cuda yên jîyanê bi kar bînin û rêyekê peyde bikin û lêgerîna xwe ya bo edaletê bidomînin. Lê belê ne pêkan e ku em bêjin, ev têkoşîna rikdar di gelek bûyeran de encamekê çêdike.

### C) Edaleta Hatî Bêdengkirin: Salonên Dadgehê

Bi tevî hemû berastengkirinên fiîlî jî, her çend dozên ku heta bi salonên dadgehê hatine gihandin wekî serkeftinekê were qebûlkirin jî, salon jî dibin ew têkilîyên şûngehî ku di nava gelek salan de bi cî dibin û gelek caran malbatan dixin nav bêhêvîtî û neçarîyê. Çûnûhatina li salonên dadgehê, ji bo malbatan dibe rutîneke peritîner. Kesûkarên Mehmet Uytun, dipirsin ka ew ê kîngê vegerin rutîna jîyana xwe ya ku xera bûye:

> *“Ez ê heta ku derê mesela her 2 rojan ez dê biçime mehkemê? (...) Ez hew dikarim biçim mehkemeyan jî. (...) Her 20 rojan te fekir ez çûm mehkemê hema mesele ez rabim bêjim mêvanê min yê hatîn rûniştîn. Ez xweyî mal im xweyî hal im. Xwudê îro tazîya me hebû em neçûyîn tazîyê. Ez dê heta kengê biçim mehkemê?”*

Her çend zehmet be jî, kesûkarên windayan ku bi hêvîyekê diçin wan salonan, bi tevî dijwarîyên ku li wê derê çêdibin û ew ê çêbibin jî, giringî pê didin ku li wir bin. Hin malbat, li wê derê, ji hêlekê ve zehmetîyê dikêşin ji hêla din ve jî balê dibin ser giringîya qerebalixên ku tev li wan dibin. Ji ber ku ji bo malbatên ku di jîyana xwe ya rojane de tenê dimînin, ev piştevanî dibe kan û çavkanîya hêzê û ya hêvîyê. Malbata Nihat Kazanhan, roja dadgehê wiha dibêje:

[106] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Nênyas- Bûyera Medeni Yıldırım -25.06.2024

*“Jixwe hefteyek dima roja mehkemeyê me xwe kar û amade dikir. Ji ber ku di rojên mehkemeyê de pir qerebalix e [mirov] tên. Pir zêde parêzer tev lê dibûn. Di dema Tahir Elçi de. Jixwe hê wê çaxê nehatibû kuştin. Çend caran ew bi xwe jî tevl êbû lê heta vê rojê jî hevalên parêzer ên din jî tev lê dibin. Ji Amedê, ji cîyên din. (...)”*[107]

Wateyeke xwe ya din heye ku ew li salona dadgehê bin. Kesûkarên windayan, ên ku me bi wan re hevdîtin çêkir, her çend motîvasyona wan a bingehîn a di salonên dadgehê de xwegihandina bo edaletê be jî, salonên dadgehê, pirî caran, wekî qadeke fermî tê dîtin ku wê rastî li wê derê were qebûlkirin. Ji lew re, her çend bizanibin ku wê edalet bi cî neyê jî, tomarkirina heqîqetê û daxuyandina wê ya li qada gelemperîyê, bi tena serê xwe wateya xwe ya têkoşînê heye (Göral, 2019). Ji ber ku her wekî ku me ji hevdîtinan jî fam kir, *“her çend wê darizandin bikin ku kiryar bibin kesên hesabdayînbar jî, salonên dadgehê, ji bo kesûkarên kuştîyan ku bi salên dûr û dirêj ji hewldanên wan encam çênebûye, qadekê çêdike da ku ew karibin li ber çavên miqamên fermî dengê xwe bigihînin û karibin heqîqetê bînin ziman.”* (Alpkaya et al., 2017).

Di dozên windakirina bi darê zorê de, her çend ji ber hinceta ewlehîyê mîna ku biryar hatibe dayîn tê nîşandan jî, em dizanin ku bi veguhastina dozan a li der û bajarên din, ev piştevanî û rarûbûn tê qelskirin (Alpkaya et al., 2017). Ev pêkanîn, ji bo pêpeskirinên mafê jîyanê yên di salên 2000’î de, ne berbelav e. Tekane mînaka ku em dikarin çavnêrîya vê rewşê bikin, bûyera Ahmet Kaymaz û Uğur Kaymaz e. Piştî ku danişîna yekem li Mêrdînê hat kirin, doz ji alî parêzvanên bersûcan ve, bi hinceta ewlehîyê, li Dadgeha Cezayê Giran ê Eskîşehîrê hat veguhastin. Di navbera 20’ê Tîrmeha 2005’an û 18’ê Nîsana 2007’an de, li Eskîşehîrê gelek danişîn hat çêkirin. Her wekî *daxwaznameya bi 10 rûpelan ku birayê Ahmet Kaymaz derpêşî dadgehê kiriye* û tê de tê destnîşankirin, di dema danişînan de, parêzerên polêsên bersûc, ji endamên malbata Kaymaz re gotine “terorîst” û li wan daberizîne û heqaret kiriye.[108]

Tevî ku veguhastin bûne qadên rarûbûnê yên salonên dadgehan jî, dîsa jî, veguhastin yek ji wan astengîyan e ku tê bicîanîn. Di dozên windakirina bi darê zorê de, guherîna her tim a desteya dadgehê, neanîna bersûc û şahidan û danîna perdeya reş a ber delîlan, di dozên pêpeskirina mafê jîyanê yên di salên 2000’î de jî xwe dide der. Feramoşkirinên ku di dema rapirsînê de dest pê dikin, ji binî ve bandorê li qonaxa lêpirsînê jî dike. Wekî mînak, di hin bûyeran de ku me di vê xebatê de jî ew lêkolan, tiştên ku divê komên lêkolîna şûna bûyerê wan bikin, dimînin di stûyê kesûkarên malbatê de. Malbat, bi derfetên xwe delîlan kom dike, lêkolînê li ser şûna bûyerê dike, fotografan digire, tew carinan jî, şahidên xwe ew bi xwe peyde dikin û wan dibin dadgehê.

[107] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Nihat Kazanhan -Gulan, 2023

[108] Der heqê doza Uğur Kaymaz û Ahmet Kaymaz de, bnr:

> *"Îcar hatin go delîl tişt heyî di destê we de, min go bandek heyî, hînê negihaştiye mi. (...) Ew band ji min re hatiye. Go ka bandê. Me band derxist, me kir CD û me dîlekçe da sawcî. Sawcî hat wê cadê'dê, li wan cihê gula giş nêrî, derket soqaxê çû cihê olayê, vegerîya hat. Ê go ka dev ji dewê berdin, ca wî sûretê wî danî ber..."*[109]

Bi qasî derengmayînên ku di warê komkirina delîlan de çêdibin, kêmanîyên ku di parastin û hêvişandina wan de jî çêdibin, aşkere ne: ji ber birêvebirina emaneta adlî ya lawaz, hin materyal winda bûne an jî ji navê hatine windakirin û ji ber ku dema wan a hêvişandinê bihuriye, qeydên giring êdî nayên peydekirin. Vê yekê, di qonaxên lêpirsînê de jî daye der û ev encam jê çêbûne; doz dereng hatine vekirin, danişîn piştî bi salan hatine kirin û derfet ji dest çûne ku li ser delîlên bingehîn û madî lêkolîn werin kirin. Wekî tevahî, ev gelemşeyên avanîyî ku di dema komkirina delîlan û hêvişandina wan de çêdibin, bi awayekî cidî dibin sedem ku bûyer neyên zelalkirin, berpirs neyên dîyarkirin û miqamên gelemperî û yên dewletê hesabê nedin.[110]

Mînakên bi vî rengî, didin xuyakirin ku lêgerîna bo edaletê, ne bi mekanîzmayên sazîyî lê bi hewldanên takekesî tê domandin. Lêgerîna bo edaletê dike ku malbat hem ji hêla hiqûqî hem jî ji hêla dilînî ve bikevin bin barekî giran. Karên wekî komkirina delîlan, şopandina wan û geşkirina dozê ku di rastîya xwe de berpirsîya sîstema edaletê ye, dibin têkoşîna rojane ya malbatan.

### D) Dozên ku "Nayên Qazanckirin"

Rapirsînên ku bi neşopandinê bi encam dibin, beraatkirina kiryaran an jî dozên ku dikevin ber mirûrî zeman, bi malbatan re hîseke têkçûnê çêdike. Loma jî, ev biryar rengvedana cezanekirina sîstematîk in di warê mafên mirovan de. Her çend kiryar dîyar bin jî; kiryar ji alî amrazên dewletê ve tên parastin, lêpirsîn û rapirsîn bi awayekî nealîgir û kartêker nayên kirin û mexdûr tên çewisandin û ev hemû kendûbendên avanîyî yên li ber têkoşîna hiqûqî ne. Ev rewşa ku hin malbat wê wekî "sîstem" bi nav dikin, digel ku qelsîya bûyîna dewleta hiqûqî û serbixwetîya darazê ya li Tirkîyeyê dide der jî, wekî encama polîtîkayên ewlehîxwaz dide der ku li bajarên kurdan bi pevçûn û pêkanînên mêtnigerîyê tên meşandin.

Digel ku dewletê wekî berpirsa sereke ya bicezanekirinê qebûl dikin jî, hin malbat, di hewldanên xwe yên lêgerîna bo edaletê de, balê dibin feramoşkirinan ku di parêzeran an jî yên sazîyên sivîl de leqayî wan dibin. Ji ber ku dozên ku bi rêya sazîyên civaka sivîl an jî bi rêya partîyên sîyasî hatine vekirin ji alî parêzerên wan ve bi awayekî sererast nayê

[109] Di vê beşê de, ji bo ku bandor li pêvajoyên dadgehê neyê kirin, navê malbat û bûyeran hatiye anonîmkirin.

[110] Rapora hiqûqê ku di çarçoveya vê vekolînê de tê weşandin, bi awayekî kitekit, astengîyên li hemberî meşandina bi bandor a qonaxên lêpirsîn û rapirsînê, analîz dike (Ataktürk Sevimli vd., 2025).

şopandin, ev yek dibe sedem ku hin doz bikevin ber mirûrî zeman an jî betal bibin. Yek ji dozên giring ku di navenda gengeşeyên li ser feramoşkirinê cî digire, doza Robozikê ye ku raya giştî jî ji nêzik ve pê dizane. Bi qasî ku raya gelemperî pê dizane, di gava pêşî ya pêvajoyê de, doz li Amedê hatiye vekirin, lê piştî demeke kurt raye dewrî dadgeha leşkerî hatiye kirin. Digel vê yekê, hêvîya malbatan vê carê bi serîlêdana li Dadgeha Makeqanûnê (DMQ) hatiye girêdan; lê belê li vê derê jî ji ber geremolîya pêvajoyê, kêmanîyên teknîkî û qelsîyên di navbera sazîyan de serîlêdan nehatiye temamkirin; û ji ber ku belgeyên hewce di dema xwe de nehatine ragihandin, rêya DMME (Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê) bi temamî hatiye girtin.

Her çend feramoşkirinên takekesî jî dikevin behsê ku endamên malbatê jî balê dibin serê, divê ev rewş, di konteksta mercên dijwar ên ku parêzvanên mafan û parêzer tê de dixebitin, were nirxandin. Her wiha, hin kesûkarên mexdûran ku van gilî û gazincan bi lêv dikin jî, balê dibin ser van mercan. Wekî encama sîstemekê; mekanîzmayên destekkirinê yên hiqûqî naşixulin û berpirsîya di sazîyan de bi prensîba dilyarîyê tê meşandin, loma jî her tişt li hev tê dewrkirin. Zêdebûna kar ku dikevin para parêzeran, mercên dijwar ên ekonomîk û tacîzkirina darazê ku li wan jî diqewime, dibin sedem ku di şopandina dozan de kêmanî çêbibin. Wekî mînak, ji ber ku îtiraz di dema xwe de nayên kirin rêya dadgeheke raser tê girtin û ev yek dibe sedem ku rêya DMME'yê jî were girtin û hêvîyeke mezin a malbatan jê heye.

> *"Dema heqê te yê îtirazkirinê 15 roj in. (...) Wext bi vî awayî çû. Piştî kuwext çû (...) me jî bi sîstema e-devletê lêkola, me agahî da derûdorê. Ha me dît, piştî ku dewletê, Dewleta Komata Tirkîyeyê biryar daye, ev doz li tu derê nehatiye vekirin. Neçûye dadgeha raser."*[111]

Di van vegotinan hemûyan de; tiştê ku dibe sedem û yek ji kartêkên herî dîyarker ew e ku rewş xwe bi vî awayî bide der û loma jî nexuyayî bimîne, tunebûna derfetên pereyî/darayî yên malbatan e. Ji bo gelek malbatan, dozlêvekirin an jî şopandina doza ku dimeşe, ne tenê têkoşîneke hiqûqî ye, di heman demê de, aborî ye jî. Ji ber ku ji bo ku mirov karibe ji zimanê hiqûqê fam bike, rêyên wê yên serîlêdanê bizanibe û pêvajoyê bişopîne, çavkanîyeke aborî pêwîst e, xizanî li pêşîya vê pêvajoyê dibe astengîyên herî mezin. Kesûkarên Umut Petekkaya, vê rewşê wiha vedibêjin:

> *"Mi nêeşka xo rê jo avûqat tepişi. Avûqat o perê mi zî çinê bo. (...) Mi qandê o pereyî dawa xo kerde vinî. Mi nêeşka hiqûqê lajê xo araştirmîş bikerî."*[112]

---

[111] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr – Bûyera Yahya Menekşe – 15.02.2025

[112] Hevdîtin: Amed, Çêrmûg – Bûyera Umut Petekkaya -04.12.2023

Lê her çend her destpêkerî bêencam mabe jî, qewlê "venegerîna ji dozê", ji bo malbatan ji hewldaneke hiqûqî wêdetir, dibe şêweyekî berxwedanê. Derbiranên li jêr ên kesûkarên Umut, bi bîra me dixe ku lêgerîna bo edaletê ku ji nava xizanî, nezanî û tenêtîyê derdikeve û bi rikeberî didome, dibe şêweyekî berdewamkirina jîyanê bi xwe.

> *"Ti heme çî kenê vînî yanî. Hema zî ez dîrenmîş bena. Ez hewna zî dîrenmîş bena. Ma vajim, mi terk nêkerdo. Ez do bibî zî hendî ke emrê mi bibo. Mi qeçekanê xo ra zî vato, mi vato 'Ez mirena şima zî dewan bikerê. Wazgeçmebê!'"*[113]

Ev lêgerîna bi pêdagirî ku ji nifşekê bo nifşa din tê veguhastin, carinan jî di lêgerîna bo edaletê ya nifşên nû de, dibe sedem ku têrînekirinên malbatan were pirsyarîkirin, jê wêdetir jî, hesab ji wan werin pirsîn. Her wekî di mînaka Fahrettin İnan de jî wisa ye; nifşa ciwan, dozên ku ji ber sedema feramoşkirin, nezanî, tengasîyên aborî û bawernekirina ji edaletê nehatine vekirin an jî nehatine şopandin, qebûl nake û dikare biryarê bide ku lêgerîna bo edaletê geştir bike.

> *"Êdî ev doz dikeve ber mirûrî zeman, bû 20 sal. Ez çûm ba parêzer, wisa got. Yanê, heta du mehan wê dema wê temam bibe. (...) Ka ewraqên wî li ku ne? (...) Rapora tiba edlî li ku ye? (...) Heta ku mirov nede pey tiştekî jixwe çênabe. (...) Yê winda paş venagere, tu tişt paş venagere lê hindikî be jî wê dilê min rihet be."*[114]

Ev vegotin nîşan didin ku kêmanîya edaletê, di asta psîkolojîk de çawa kûrtir bûye. Tirs, bawernekirin û neçarîya ku li hemberî hêza dewletê tê hîskirin, ji bo gelek malbatan, berî ku têkoşîna hiqûqî dest pê bike, bi dawî dike; hin doz jî, hê di gava yekem de, berî ku vebin, betal dibin. Dozên ku dikarin werin vekirin ji ber feramoşkirin, nezanî an jî ji ber têrînekirinên pereyî/aborî, bêyî ku were berdewamkirin, betal dibin. Ev valahî, dem pê de, bi malbatê re qurifînê çêdike, tew di navbera nifşan de jî, dibe sedema hesabxwestinan. Her wekî di dosyeya Fahrettin İnan de jî tê dîtin, ev xeta ku di navbera bêdengîya dêûbavan û pêdagirîya zarokan de ditengije, datîne rastê ku lêgerîna bo edaletê ne tenê têkoşîneke hiqûqî ye, her çend rêyên hiqûqî biqedin jî, lêgerîna bo edaletê, di jîyana mirovan de, mijareke wisa ye ku naqede û her hebûna xwe didomîne.

### E) Çerxa Cezanekirinê û DMME

Di vekolîna pêpeskirina mafê jîyanê ya zarok û ciwanan a di salên 2000'î de jî, encama herî dîyarker a lêgerîna bo edaletê, domdarbûna cezanekirinê ye. Di dosyeyên ku di wan de kiryar tên zanîn, şahid tên peydekirin û delîl aşkere li ber destan in jî, dosye pirî caran bi

[113] Hevdîtin: Amed, Çêrmûg – Bûyera Umut Petekkaya -04.12.2023

[114] Hevdîtin: Wan, Navend – Bûyera Fahrettin İnan -25.04.2025

biryarên neşopandinê tên girtin an jî bi salan li azîyê tên hiştin. Mekanîzmayên sîstematîk yên wekî dewrkirina li dadgeha leşkerî, parastina kiryaran, bêdengkirina şahidîyan a bi rêya gefxwarinê û danîna perdeya reş a li ber delîlan, dikin ku mirûrî zeman li dozan biqewimin an jî bersûc bêsûc werin qebûlkirin. Her wiha, ev yek li ser êşa windayîyan li malbatan dibe derdê ser derdan û malbat jibêgavî bi berbendkirina bi zanebûn a lêgerînên bo edaletê re jî rarû dibe. Li paş vê rewşê jî, dîyardeyeke avanîyî ya bi navê "bicezanekirin" heye. *"Bicezanekirin, ne tenê hiqûqî, di heman demê de, qadeke gelemşeyê ya gerdûnî ye ku rehendên wê yên etîk û polîtîk hene. Nîşan bi dîyardeyeke sosyal dike ku bandora xwe bi tevayî li komalê dike û wê karakterîze dike û seqaya çewisîner û otorîter geş û zindî dihêle. Bicezanekirin, wekî têgiheke hiqûqî, wê rewşê derdibire ku hin kirinên ku divê di sîstemeke hiqûqê de werin bicezakirin, ji ber sedemên 'de jure' an jî 'de facto', nayên cezakirin."* (Alpkaya et al., 2017: 29).

Malbatên ku me bi wan re hevdîtin kirin, ji azmûnên xwe yên salên 1990'î yên wek wiha, têrî xwe nasyar in li pêvajoyên wekî "bicezanekirin", "mirûrî zeman" û "DMME"yê. Her yek ji wan, dikarin pêşbînîyekê bikin ka ev têgih tên çi wateyê, kîjan qonax li pêşîya wan in û pêvajo wê çawa bêencam bimîne û ev yek jî nîşan dide ka bicezanekirin çendî bi kûr ve çûye û reh berdaye. Kekê Ceylan Önkol, beranberîya vê rewşê ya di jîyana rojane de, wiha dibêje:

> *"Ji ber ku pergaleke adil tune ye, dibe ku her saet her deqe her kêlî tiştekî li mirov biqewime, mirov dûçarî êşên din bibe."*[115]

Digel vê yekê jî, malbat, wekî hevwelatîyên vî welatî, dixwazin bila darizandineke adil were kirin û kiryar werin bicezakirin. Ji bo malbatan, parastina kiryaran an jî bindoşekkirina dozan, wekî meseleyeke herî peritîner bi pêş de tê. Lê belê, bicezanekirin û guhnedêrîya sazîyî ya di dadê de dide der, ji wêdetirî vê daxwazê diçe û dibe sedem ku pevgirêdana wan a hevwelatîbûnê jî were pirsyarîkirin. Malbat, di dema hevdîtinê de, pirî caran, mîna ku bi rayedarekî dewletê re biaxivin, vê kontekstê û berpirsîyên dewletê bi bîr dixin, daxwaza xwe ya "hevwelatîbûna wekhev" bi awayekî zelal dibêjin û ev yek jî nîşan dide, ka li beranberî bicezanekirinê têkilîya dewlet-hevwelatîbûnê çawa tê pirsyarîkirin.

> *"Em ji dewletê li benda her tiştî bûn: dibe ku ez bimirin, dibe ku werim kuştin an jî dibe ku tiştekî din li min were qewimandin lê berpirsîya te heye û divê tu vê berpirsîyê bi cî bînî. Divê birêvebirinek li hemberî gelê xwe adil be, bêyî ku wan ji hev cihê bike û bêje tu hevwelatîyê pileya yekem tu yê duyem î. Divê mirov kesên birêvebir jî bi awayekî adil darizîne. Ji ber ku gava hûn danerizînin ne adilî çêdibe, ne rastînî ne jî birêvebirin*

[115] Hevdîtin: Amed, Licê, Gundê Dolek - Bûyera Ceylan Önkol-03.12.2023

> *çêdibe, jê tu tişt çênabe. Xerabîya di vê pergalê de bi vî awayî didome, sibê du sibe wê bipeke ser tişt û kesên din jî, wê zarokê kesekî din jî biçe"*[116]

Ev bûyer nîşan didin ku bicezanekirin, wê tenê sûcên ku di borîrojê de hatine kirin bindoşek neke; di heman demê de, wê zemînekê çêke ji bo sûcên ku wê di siberojê de bên kirin. Malbatên ji Robozikê, gava aşkere dikin ka çima edaletê dixwazin, di heman demê de jî yek bi yek vedibêjin ka bicezanekirin dikare di siberojê de bibe sedemên rewş û kirinên çawa:

> *"Yani ji bo çî me edalet xwest? Aslında îro mesele ev insan neyên cezakirin, neyên darizandin, yargılama pêk neyê, wê hin komkujîyên din jî çêbibin. Yanî wê sûd bigirin, we cesaretê bigirin. Ma wek me çênebû? Piştî 2015'ê komkujîya Ankarayê (...) Cezasızlık polîtîkasi heye, ev neyê şikandin wê hin tiştên din jî bibin. Yanî işte berpirsyarên komkujîya Roboskiyê nehatin darizandin. Berpirsyarên komkujîyên din jî nayên darizandin. Yanî algiyeke wisa pêş ket. Me got bila ev tişt neyê kirin. Berpirsyarên vê êşê, berpirsyarên vê zulmê, berpirsyarên vê komkujîyê bila bêne darizandin kî çi komkujîyên din pêk neyên."*[117]

Di sîstemekê de ku hesabdayînbarîya darazî tê de tune ye, pêximkarî ji navê radibe û pêşîya kuştinên nû tê vekirin. Loma jî, malbat tenê lêgerîna bo edaleteke takekesî nakin; daxwazên wan ên ji bo parastina jîyana komalî jî hene. Kesûkarê Aydın Erdem, gava mentîqa vê çerxa sakar (basît) lê balkêş derdibire, pê re jî, wisa lê difikire ku ger kiryarê sûcekî were aşkerekirin û were darizandin, wê pêşî li kirinên tundîyê yên di pey re çêbibin jî werin girtin.

> *"Daxwaza min a dawî: Cezayê... îro qatîlê Aydin derketana, darizandin bûna, îcar Cengîz jî nedida şopa wî û nediçû. Yê din jî nediçû. Wexta yê Mahsûn Karaogla [faîlê wî] bihata darizandin, hevalê wî [yê Aydin] bû, wî da pey şopa wî, Aydin jî wilo nedibû. Îcar bi hezaran zarokên kurdan çûne û wilo bêdarizandin û bêcezakirin, hemî çûne."*[118]

Gava rêyên hiqûqa navxweyî biqedin, hêvî li DMME'yê tê veguhastin. DMME ji bo malbatan derîyê dawî yê hêvîyê ye. Lê bi qasî wê jî şûngeheke bi nakok e: ji hêlekê ve heqîqetê bi çespandina pêpeskirinê û bi xuromeyeke sembolîk tomar dike, ji hêla din ve jî heqê kakilê edaletê -bicezakirina kiryaran- nade. Loma jî, her çend biryarên DMME'yê, pirî caran ji bo malbatan were wateya ku "heqîqeteke li dinyayê hatiye daxuyandin" jî, têrî nake ku çerxa bicezanekirinê bişikêne. Di wan rewşan de ku bersivekê ji DMME'yê jî nayê

---

[116] Hevdîtin: Amed, Licê, Gundê Dolek - Bûyera Ceylan Önkol -03.12.2023

[117] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatî -22.12.2024

[118] Hevdîtin: Mêrsîn, Navend - Bûyera Aydın Erdem -19.12.2024

wergirtin, hêvîqurifîna ku li malbatan diqewime, dibe çend qat. Heke lêborînxwestinek jî çêbibe, daxuyanîyeke ku heqîqetê durist dike jî were kirin, wê bibe dilmînîyek, lê na, gava malbat dûçarî bêdengîyeke ker dibin, hîsa "cotceza"yê bi malbatan re çêdibe. Kesûkarên Mahsum bi vî awayî derdibirin:

> *"Hiquqî süreç amaç nedaye. (...) En son sawcî tehdît amacîylan go 'daha bi daha buralara gelme, dosyada zaten gizlilik kararı var, dosyayi qapatiyoruz.' Go 'gîzlîlîk qarari war,' ha bunun üzerinden Avrupa însan haqlarî, hîç bîr yerden, Boyle bir kaxid gelseydî ben tesellî olurdum. Boyle bîr yazî da gelseydî ben daha rihet ederdîm. (...) Hêvîya mi ji 'edeleta Turkîyeyê tune ye, û car din jî ku wa kaxidek ji min ra bihata min kêf dikir. Hema yazîkî bihatana... (...) Ewrupa însan heqlerî vîya gotiba bes bû. Yanî li pey ekonomî mekonomî filan bêvanê jî nîn im. Leborînekî dixwazim."*[119]

Tu bergindeke madî/berbiçav ya biryarên DMME'yê ji bo malbatan tune ye. "Kaxizekî" ku bav bi hêvîyekê li benda wî dimîne, tê wê wateya ku heqîqet di asta navneteweyî de tê ziman, berpirsîya dewletê tê naskirin û lêborînxwestinek tê belavkirin. Kesûkarê İbrahim Halil Oruç bi hevokên pir sade pênase dike ku di çi warî de dibe bila bibe, çendî pêwîst e ku edalet li rastê were danîn û kakilê edaletê û wateya cezakirinê çi ye.

> *"Yanê, bi ya min edaleta kuştinekê tune. (...) Heke qatilê wî jî bi eynî awayî were kuştin jî wê êşa me sivik nebe an jî neyê birîn. Tenê ji bo ku hinekî din jî hêsa bibe, em dixwazin bila bi rastî jî cezayê xwe bibîne. Bila were aşkerekirin [kiryar], qet nebe em jî bizanibin ka kî ye, çi ye, çawa ye, em jî der heqê windayê xwe de bibin xwedî agahî."*[120]

Di vê kontekstê de, aşkere ye ku ne tenê daraza Tirkîyeyê, DMME'yê jî, di çav malbatan de kêm maye. Biryarên ku dadgehê dane, pirî caran, tenê di asta çespandina pêpeskirinê û xuromedayînê de dimîne, lê ji bo ku dewlet binbarîyên xwe bi cî bîne, mekanîzmaya şopandin û hesar danîna ser (impose sanction) ku ya Komîteya Wezîrên Konseya Ewropayê ye, li kar naxe. Ev yek jî dike ku hîseke wisa çêdibe ku DMME'yê bêhemdî xwe be jî, zemînek amade dike û çerxa bicezanekirinê didome. Bi tevî van sînoran, her wekî di dozên windakirina bi darê zorê de jî wisa ye, ji bo gelek malbatan, çi di miqamên neteweyî çi jî di miqamên navneteweyî de, domandina vê têkoşîna bo hiqûqê, pir tiştan derdibire û wan pêdagir dike: *"Tevî ku her tişt ev çend newekhev e û tu şansekî te yê qazanckirinê tunebe jî mirov çima têdikoşe? Aşkere ye ku ji bo kesûkarên windayan, biryara dadgehê ne surprîz e; ji ber ku bi dehan salan in, li bajarên kurdan, çewisandin û pêkanînên mêtingerîyê li kesan û li wan malbatan tên qewimandin û ew jî daxwazên xwe yên bo edalet û heqîqetê,*

---

[119] Hevdîtin: Amed, Erxenî - Bûyera Mahsum Karaoğlan -07.05.2024

[120] Hevdîtin: Amed, Bismil - Bûyera Halil İbrahim Oruç -22.06.2024

*car ser caran digihînin gelek miqaman. (...) Malbatên ku dev jê bernadin û lêgerîna xwe ya bo edaletê di dadgehan de bi cî tînin û têkoşîna bo hiqûqê ya wan û parêzeran, têkoşîneke wisa ye ku mirov dikare li ser navê windayên bajarên kurdan û ji bo xatirê nifşên siberojê, wê di her şert û mercê de bidomîne. Gotinên Abdülaziz Altınkaynak ku piştî ku biryara dadgehê dibihîze, bi tevî rûxandina beraatkirina kiryaran jî, dikare bêje, 'Em 26 sal têkoşiyan, em amade ne ku 26 salên din jî têbikoşin', bi awayekî zelal nîşan dide ku ev libendêmana bi pêdagir a ji bo edaletê, ne şûneke pasîf e." (Lévy-Aksu, 2025: 22).*

Ev vegotin û azmûn hemû, vê yekê nîşanî me dide: edalet ne tenê meseleyeke hiqûqî ye, di heman demê de meseleyeke sarêjkirina komalî û pêbawerîya der heqê siberojê de ye. Ji ber vê sedemê, ji bo ku em fam bikin ka bicezanekirin birînên çawa çêdike, giring e ku em bala xwe bidin ser lêgerîna malbatan a ji bo edaleta sarêjker û ka gelo edalet di jîyana rojane de çawa tê aşopkirin.

## 2) Edaleteke Çawa: Lêgerîna bo Sarêjbûnê

Çerxa bicezanekirinê, hem hêvîya malbatan a ji bo edaletê hem jî pevgirêdana wan a bi dewletê re heyî jî diherişîne. Lê digel hemû rûxînerîya wê, tiştekî bihêz heye ku di hevdîtinan de derdikeve pêşberî me: ew jî lêgerîna bo sarêjbûnê ye. Malbat dizanin ew ê nikaribin windayîyên xwe paşve bînin; hay jê hene ku heke kiryar werin bicezakirin jî wê êşên wan nekewe. Tevî vê yekê jî, ji bo ku windayîyên wan werin nasîn, heqîqet bi awayekî aşkere were gotin, şîngirtina wan neyê krîmînalîzekirin û heman êş li nifşên siberojê neqewimin, li rêyên cur bi cur digerin.

Fikira edaleta sarêjker, di vê rewşê de, wekî sarêjbûna komalî û ji nû ve çêkirina pevgirêdanê tê pêşberî me. Ev yek ji bo malbatan wisa rû dide; carinan li ser gorê daxwaza xwe ya bo edaletê dibêjin carinan di salona dadgehekê de heqîqetê diqîrin carinan jî ji zarokên xwe re dibêjin, "doza me li vê derê bi dawî nebû" û vebîrê radiguhêzînin. Edaleta sarêjker, bi vê hêla xwe ve, digel birînên kûr ku bicezanekirinê ew vekirine, der barê siberojê de yek ji aşopkirinên herî xurt û bihêz e.

Ev lêgerîn, di aşopkirina malbatan de, bi tevayî bi sê rehendan e: rarûbûn û lêborînxwestin, xurome û piştevanî. Lêborînxwestin dike ku winda werin nasîn û dewlet bi rewşê re rarû bibe; xurome dike ku jîyan ji nû ve were avakirin; piştevanî jî misoger dike ku ew neyên jibîrkirin. Gava ev her sê hêman tên cem hev, ji bo ku qurifînên ku ji ber çerxa bicezanekirinê çêbûne, sax û sarêj bike, dibe alîkar da ku hewcetîyên ku malbat herî zêde wan tînin ziman, xuyanîtir bibin; û datîne rastê ku edaleta sarêjker ji daxwazeke şexsî wêdetir, aşopkirina siberojeke kolektîf e.

### A) Efû û Lêborînxwestin

Bêîstîsna, hemû malbatên ku me bi wan re hevdîtin çêkir, dixwazin bila kiryar were bicezakirin Lê belê di warê daxwazên din de dîtinên wan cuda ne. Digel ku kesûkarên mexdûran ne grûpeke homojen e, pratîkên wan ên dîtina sîyasî ya cuda, bawerîyên cuda û pratîkên jîyanê, dike ku ew di nav malbatekê de bin jî aşopkirinên wan cuda bin. Di çarçoveya vê xebatê de, me hewl da em rewş û deravên wisa çêkin ku ev ranêzikîyên cuda, bêyî ku bibin darêzer, karibin xwe derbibirin.[121] Yek ji mijarên ku dibe sedema bendewarî û bertekên cuda, têgihên efû û lêborînê ne ku di rêgez û pêkanînên edaleta sarêjker de cîyekî giring didin xwe.

Wekî çawa Nesrin Uçarlar jî di jêgirtina li jêr de balê dikişîne serê, di konteksteke ku tê de rarûbûn çênebe û tundî bidome û mirov rabe pirsa bexişandinê ji malbat û mexdûrên pêpeskirinên mafên mirovan bike, ev yek dibe ku ji alî etîkî û polîtîkî ve çewtîyek be. *"Pirsa bexişandinê ku ji mexdûran tê pirsîn, têrî nake ku bi derbiranên masûm ên wekî nedicîde, neguncan an jî şelipîner werin pênasekirin, ji ber ku dibe ku bersivên bo vê pirsê bên dayîn, xizmetî vekirina derîyê suîstîmala polîtîk veke. (...) Li şûna jinavêrakirina mehrûmîyetên mirovî û polîtîk ku ji ber kêmanîya binesazîyê, xizanîyê, tundîyê û bicezanekirinê çêdibe, balê dikişîne serê ku divê mirov li pêşberî karê rarûbûna bi borîrojê re ku tê pêkanîn, baldar be; ji ber ku bi destpêkerîyên ne di cî de hewlê didin ku mexdûrîyetan ne bi sazî û avanîyan re lê bi kesan re; ne bi xizmetan lê bi dilînan bi rê ve bibin. Gava mirov bi pêdagirî ne behsa bexişandinê lê behsa efûya polîtîk bike, ev yek pêşînî lê dike ku karê rarûbûna bi borîrojê re, di navenda mafan û li dor meseleya hevwelatîbûnê de were fikirandin."* (Uçarlar, 2023).

Di çarçoveya vê vekolînê de, me ev hişyarkirin li xwe kir rêber û me ji mexdûran pirsa derfeta bexişandinê nepirsî, lê wekî mekanîzmayên sîyasî, pirsa efû û lêborînxwestinê kir. Lê belê, helwesta wan a di vî warî de çi dibe bila bibe, kesûkarên gelek zarok û ciwanên hatî kuştin, bi awayekî zelal îfade kirin ku ev rehendên şexsî û sîyasî ji hev cihê nabin. Ji vî alîyî ve, jêgirtina li jor, li hemberî hewldanên "birêvebirina bi hîsan" hişyarkirineke mafdar jî dike, tê dîtin ku gava qad ji bo van hîs û bendewarîyan were vekirin wê gavê ji bo aşopkirina aştîyeke hê giştgir dibe gaveke giring.

Ji bo hin malbatan, gava dewlet, hikûmet û/an jî peywirdarên dewletê sûcên ku kirine qebûl bikin û ji malbatan lêborînê bixwazin, ev yek wê bibe gaveke wisa ku xizmetî rarûbûnê dike. Kesûkarên Nihat, vê hewcetîyê bi vî awayî tîne ziman:

[121] Digel forûma girtinê ya sempozyûma edaleta sarojker a navneteweyî ku di Mijdara 2024'an de hat lidarxistin, forûm û navend-grûpên di qadê de hatin çêkirin, ji bo famkirina ranêzikîyên cuda yên di warê qerebû û lêborînxzwestinê de, serriştên giring dane.

> *"Yanê, mesela ez pir farazî xeber didim. Peywirdarekî ji miqamê jorîn ê dewletê bihata bigota, memurên me, polêsên me, leşkerên me, belaheq tiştên wisa kirin, lê êdî em bi van tiştan re rarû dibin û van tiştan qebûl dikin û ji hemû malbatan lêborînê dixwazin û em ê ji niha û pê de çi hewce bike bikin. Yanê, a niha, bi rastî jî, tiştekî wiha çêbûye, me yê xwe çêtir hîs bikira. Yanê, me yê bigora, hemin ku mezinên dewletê dibêjin, nexwe provakasyon çêbûye û jixwe ew kes jî wê cezayê hewce bidiyê. Yanê, ji bo me ya çêtir ew bû."*[122]

Jineke ku hevjînê wê hatiye kuştin jî, têkilîya rarûbûnê ya bi edaletê re, bi awayekî zelal û wiha tîne ziman:

> *"Heke ew mêrik [kiryar] were û serçavê zarokên min maç ke û bêje, 'ez qatilê bavê we me, min jîyana we berbend kir, ez bûm sedema mirina wî, ez bûm sedema ciwanîya bavê we' û heke bêje 'bavê we jî dixwest wekî min jîyaneke wî hebe. Ez bûm sedem û min bavê we kuşt.' Ez dikarim tiştekî wisa bêjim. Yanê, ku ez a niha bêjim wî hevjînê min kuştiye ez jî herim wî bikujim, ev çênabe."*[123]

Lê belê, di navbera hin endamên malbatê de jî dîtinên dijber çêdibin. Kesûkarekî Abdulhaluk Geylani dibêje, "çi dibe bila bibe, ez ê tu carî efû nekim, ceza jî bidinê ez ê tu carî efû nekim; lêborîn jî bixwaze ez ê efû nekim", lê kesûkarekî wî yê din dixwaze bi kiryar re rarû bibe û ew ê karibe di van mercan de efû bike. Lê belê, balê dikişîne û dibêje gava ew vê yekê dike û efûkirin bi aştîya civakî re tê pêwendîdarkirin, ev yek ne tercîheke şexsî ye, lê wateyeke wê ya civakî heye:

> *"Sîstem e, temam, dewlet ev îmkanan dabû te [mîna ku bi kiryar re diaxive], temam! Wijdanen, yanî wijdanen çawa wijdana te rehet bûye ku tu însanekî dikujî? Boşî boşina, bêsûc bû. Helbet ev pirsîyarî lê bê kirin. Wijdana te çawa rehet dibe? Yan jî ewladê te bûya, îro kû ewladê te bûya dê wijdana te çawa lê rehet bûya? Ku yekî din ev tişt kiriba, dê dilê te çendî rehet biba? Helbet em dibêjin van pirsyaran hemû lê bê kirin.*
>
> *Helbet, helbet. Efûkirin jî heye, efûkirin jî heye. Mirovê ku vîya dike mirov wî efû dike, mirovê ku dikuje mirov wî efû dike. Çimkî heke efûkirin, pêkhatin tunebûya wê li dinyayê dêmek her dem wê şer bibe. (...) Ama helbet ez hes dikem ku rojekî, heke ew roj bihata û me, min ev pirsyar lê kiriba. Yanî wijdana te çawa rehet bû?*

[122] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr - Bûyera Nihat Kazanhan – Gulan, 2023

[123] Hevdîtin: Culemêrg, Gever, Gundê Alekan - Bûyera Bêmal Tokçu -28.04.2025

*Gênc bû, cahêl bû, te çawa vîya kir? Te çend lê kînlî bûyî yan jî çend kîn li dilê te hebû? Mirov hes dike van pirsîyaran lê bike."*[124]

Ev vegotin nîşan didin ku daxwaza lêborînxwestinê, di çav malbatan de, bi awayekî yekparçe nade der, berevajîya wê aşopkirinên ji hev cuda yên edaletê dide der. Hin jê wisa difikirin ku efûkirina di her şert û mercî de nepêkan e hin jê jî wisa difikirin ku gava merêcn lêborînxwestin û rarûbûnê çêbibin, mirov dikare li ser efûkirinê bifikire. Lê belê, her wekî ku di destpêka vê beşê de jî bal pê hat dayîn, hevdîtinên ku me kirin, datînin rastê ku meseleyên lêborînxwestin û efûkirinê, ji asoya rarûbûn û aştîyê ne cihê ne. Di dema vekolînê de, ne ku mercên vê rarûbûn û aştîyê tunebûn; efûkirin an jî axaftina li ser efûya sîyasî jî, ji bo gelek hevaxêveran ne di cî de bû. Pêvajoya nû rastî mehên dawî yên vê xebatê hat, lê hat çavdêrîkirin ku tevî ku pêvajoya nû hê qadeke rastîn a rarûbûnê venekiribe jî, bûye sedem ku daxwaz û bendewarîyên sazîyî, sîyasî û şexsî ji nû ve geş û zêdetir bûne. Hêmaneke din ku ji vê konteksta sîyasî û asoya aştîyê cihê nîn e, meseleya xuromeyê ye.

### B) Qerebû - Xurome

Xurome di ranêzikîyên edaleta sarêjker de yek ji wan têgihan e ku pir zêde li ser gengeşe tê kirin. Her çend têgih nîşan bi sarêjkirinê bike jî, digel wateya etîk û sîyasî ya xuromeyê, der heqê bandorên wê yên takekesî û komalî de dîtinên sîyasî û akademîk yên cuda hene. Hin ranêzikî balê dibin ser rehendên veguherîner ên xuromeyê hin dîtin jî balê dibin ser metabûna mafên mirovan û jinavêrabûna hesabdayînbarîyê. Bi tevî van cudatîyan, hêla ku di lîteratura xuromeyê de dibe hevpar ew e ku xurome nikare bi tena serê xwe edaletê pêk bîne û ji bo ku bi rola xuromeyê (tazmîn) rabe, divê sê taybetîyên xwe yên bingehîn hebin: naskirina mexdûrîyeta ku hatiye qewimandin; di pêpeskirinên ku dikevin behsê de, qebûlkirina dewletê ya berpirsîya xwe; divê ji bo xwegihandina bo heqîqetê tevkarîyê lê bike (De Greiff, 2006). Ji vî alîyî ve, pêkan e ku em bêjin, pêkanînên xuromeyê ku dewleta Tirkîyeyê derpêş dike, bi rola xuromeyê ranabe. Wekî mînak, "Qanûna Der Heqê Dabînkirina Xisarên Ku Ji Ber Têkoşîna Li Dijî Terorê Çêbûne" ku di sala 2004'an de hat danîn, yek ji mînakên wan polîtîkayan e ku tevkarîyê nake li hesabdayînbarî û heqîqeta pêpeskirinên mafan ku di arîşeya kurdan de xisar gihandine (Kurban, 2012).

Ev rewş dike ku kesûkarên zarok û ciwanên hatine kuştin, li hemberî mijara xurome û qerebûyê bi endaze bin û pirî caran jî bi bertek bin. Pêkanînên xuromeyê yên qanûnî û neqanûnî yên li Tirkîyeyê ku ji alî tevgera sîyasî ya kurdan û ji alî parêzvanên mafan ve bi hişkî tê rexnekirin, li şûna ku tevkarîyê li rarûbûnê bikin, pirî caran, ji bo berdewamkirina bicezanekirinê û ji bo bêdengkirina daxwazên edaletê tên bikaranîn. Bi gotineke din, di

[124] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Abdulhaluk Geylani -28.04.2025

ranêzikîyên edaleta sarêjker de, her çend xisara gihîştî di takekes û di civakê de hindik be jî, digel ku qerebûyê (telafî) dike jî, pêkanînên xuromeyê ku tevkarîyê li avakirina pergaleke komalî dike, li Tirkîyeyê, rehenda sîyasî ya têkoşîna bo edaletê mandel dike, wê dike takekesî û metayî û wekî qadeke din a desthilata dewletê teşe digire (Atalay, Aytemur & Zeren, 2019). Ji ber hindê jî, her çend ji bo hin kesûkarên mexdûran ev yek were wateya ku berdêleke giran didin, redkirina xuromeyê tê wateya ku ew dilsozî têkoşîna xwe ya bo heqîqet û edaletê ne. Piştî qetlîama Robozikê, dewletê zordestî li kesûkarên mexdûran kir da ku xuromeya ku dewlet dê bike qebûl bikin û dev ji têkoşîna hiqûqî berdin; ev yek jî aşkere nîşan dide ku gava normên dewleta hiqûqî û yên aştîyê tunebin, pêkanînên xuromedayînê çawa dikarin werin suîstîmalkirin (Bozcalı, 2019). Kesûkarên mexdûran ku vê feraseta xuromeyê red dikin û di warê rarûbûn û darizandina kiryaran de pêdagirîyê dikin, hin ji wan tên girtin û bi vî awayî tên krîmînalîzekirin. Her çend, li hemberî van çewisandin û nepêkanîya têkoşîna hiqûqî, piranîya malbatan xuromegirtinê qebûl kiribe jî, ev pêvajo bûye sedem ku birîn kûrtir bibin û asoya rarûbûnê hinekî din jî teng bibe:

> *"Me got bila ev tişt neyê kirin. Berpirsyarên vê êşê, berpirsyarên vê zulmê, berpirsyarên vê komkujîyê bila bêne darizandin kî çi komkujîyên din pêk neyên. Me ev xwest. Yanî dewletê aslında çi şeklî tazminat da me; sulhname bi me da imzakirin. Mesela her malbatê çû wê derê sulhnameyek heye. (...) Ez hatim girtin, artık hêdî hêdî malbatên me tazmînat standin. Yanî ew örgütlemeya me, kombûna me ya li ser goristanê, hemû şikest yanê. Yanî tirs çêbû. Piştî girtina min malbatên me artık serlêdana tazmînatê kirin. Gotin wê me jî bigirin. gotin ew girtin wê me jî bigirin. wê zarokên me jî bigirin. piştî girtina min êdî daxuyanzya ser goristanê nehat kirin."*[125]

Ji bo gelek malbatan berbiçavbûna edaleta sarêjker ancax bi mekanîzmayên qerebûyê pêkan dibe. Her çend êdî wê winda qet paşvenegerin û êş jî nekewin, dabînkirina qerebûya manewî û darayî/pereyî, wekî rehendeke giring a edaletê tînin ziman. Bendewarîya qerebûyê tenê bi xuromeya darayî/pereyî ne bisînorkirî ye; hin malbat, qadroya di dewletê de, di karpêdanê de pêşînîdayîn an jî piştgirîya perwerdeyê ya ji bo zarokên li dû mayî, wekî parçeyekî edaletê qebûl dike. Gavên wisa, ne tenê qerebûya pêpeskirina di borîrojê de hatî kirin e, di heman demê de, wekî şertekî misogerîya siberojê tê aşopkirin. Loma jî, qerebû, wekî hewcetîyek ku malbat bi pêdagirî wê bi lêv dikin, derdikeve pêş ku hem rehenda ekonomîk a edaleta sarêjker hem jî rehenda wê ya sosyal dinimîne.

Bavê Emrah Fidan ku di bûyerên 28'ê Adarê de jîyana xwe ji dest da, dibêje, ew hê jî ji travmaya ku lê qewimîye xelas nebûye û tevî ku ji ber pêdeneçûna pêvajoya hiqûqî

[125] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatî -22.12.2024

hêvîqurifîn pê re çêbûye jî, ya ku tengîyê li wan çêdike, astengîyên ekonomîk in ku piştî bi salan jî zorê dide wan. Ew daxwaza xwe ya edaletê tenê bi bicezakirina kiryaran bi sînor nake; di heman demê de jî, bi awayekî aşkere, bendewarîya xwe ya ji bo qerebû û xuromeyê dibêje:

> *"Ha öyle, öyle, öyleee onsekîz yılê min qedîya. (...) Zaten dawa min ya sonuc lê tê ya dive ya nave ez wê nizanim. Sebîyê min [yê din] çîye ketiye kirê. (...) İşê xelkê dike. Hîç olmesa bi awayêkî min bikira îşkî. Ji xwe re rehet rehet nanê xwe derxista. Evare bihata mala xwe. Dilê min rehet bû. (...) Madem katili bulunamıyor, madem dava sonuçlanmıyor bari hayatımız düzelsin. Bir işe girelim, belediye yardım etsin bize."*[126]

Her çend ev yek ji bo kesûkarên mexdûran mîna kirineke ku lêgerîna bo edaletê berbend dike, xuya bike jî, divê mirov rehenda wê ya pratîk û lezgîn ji ber çavan nede alî. Ji ber ku tunebûna misogerîya ekonomîk, li ser travmayê dibe barekî ser baran. Ev vegotin, wekî qerebûyê, ji bo ku jîyan ji nû ve were avakirin, nîşan dide ku divê polîtîkayên sosyal ên mayende werin bicîanîn.

Kesûkarekî Çekdar Kanay ku daxwaza xwe bi awayekî zelal û bi gotinên wekî "*bila dewlet heqê me bide me, bila kar bide me; ger yek ji malbata me, yek ji kurê min têxista karekî, qet nebe me yê rihet bikira.*"[127] anî ziman û ev yek jî nîşan dide ku daxwaza malbatan rasterast bi jîyana rojane ve girêdayî ye û piştgirîya karpêdanê parçeyekî giring a aşopkirina edaletê ye. Kesûkarekî din ê Çekdar jî, daxwaza xwe ya qerebûyê di çarçoveyeke berfirehtir de bi cî dike: balê dibe serê ku qerebû mafekî hiqûqî ye û di heman demê de tîne ziman ku bicezakirina kiryaran, parçeyekî jêneqet ê edaletê ye.

> *"Dawîya me ji karim ev bejim; xwedê heqê me bistîne ez dibêm. Artî weka ku min go ya wana îşê dinyayê ne heqê me ne bana me ne digotin maddî manevî tazminat hiqûqê heqê meye û e wê ku awha kiriye cezanlandirilmîş bibin. Dewlet teraf ê dewletê wan ceza bikin, em dixwazin wî ya bikin ewqa me tê fireh dibin. (...) Hem maddî hem manewî me got bira heqê me hinda ne bo, eway wer kirin e artî tazminat e! Çima lawê min sûc sûcsûz rabin awha bikin. Avîya di şerîetê da jî heye, di nava însanan de jî heye heq hiquq heye. Heqê me heqsizî li me bûye, xwedê heqê neyle bir ikincisi jî tazminat e yanî, çûnkî sûcsiz yerde wana çûne..."*[128]

---

[126] Hevdîtin: Amed, Kayapınar (Peyas) - Bûyera Emrah Fidan -04.12.2023

[127] Hevdîtin: Amed, Bağlar (Rezan) - Bûyera Çekdar Kanay -02.12.2023

[128] Hevdîtin: Amed, Bağlar (Rezan) - Bûyera Çekdar Kanay -02.12.2023

Bala me çû serê ku di dirêjeya hevdîtinan de, daxwazên ji bo xuromeyê, pirî caran, bi awayekî aşkere nedihat ziman. Mirov dikare vê rewşê wiha şirove bike û bêje, hin malbatan nexwestiye ku wisa bê famkirin ku ew "êşa xwe dadişikînin ser pere." Ji hêla din ve, em di hevdîtinan de lê bûn şahid ku daxwaza bo xuromeyê di navbera malbatan de tengijîneke giran çêkir. Her çend dîtinên cuda hebin jî, meseleya xuromeyê, di têkoşîna malbatan a ji bo edaletê de wekî hêmaneke giring bi pêş de tê. Ji ber vê yekê jî, xurome, wekî hewcetîyekê tê famkirin ku divê edlaeta sarêjker, bi mekanîzmayên ekonomîk û sosyal werin destekkirin.

### C) Palpiştî

Palpiştîya komalî, di aşopkirina edaletê de, wekî hêmaneke dîtir bi pêş de tê ku malbat balê dibin serê. Ji lêborînxwestin û qerebûyê cudatir, palpiştî bendewarîyên malbatan a ji komalê jî derdixîne holê. Di hevdîtinan de, yek ji hewcetîyên ku herî zêde hat ziman ev bû; wan hêvî dikir ku civak wan tenê nehêle. Ji bo malbatan ev yek, ji destpêkerîyên polîtîk ên mezin û geremolî zêdetir, bi piştgirîyên biçûk lê bi rêk û pêk berbiçav dibe: serdana malana a bi rêk û pêk, agahdarbûna ji malbatê, serdanên di cejnan de, amrazeke ku wê di serdanên ser goran de were bikaranîn, telefonkirineke ji bo parvekirina êşê an jî berdewamkirina serdanên şîn û hawarîyê. Ev daxwaz, derdibirin ku divê windakirina qewimî neyê jibîrkirin û êş bi awayekî kolektîf were parvekirin. Palpiştî, bi vî awayê xwe ve, ji bo malbatan, mekanîzmayeke piştgirîyê ye û ji bo werin bibîranîn û karibin jîyana xwe bidomînin, şêweyekî peydekirina hêz û qewetê ye.

Malbata Ceylan Önkol dibêje, nameyên ku piştî bûyerê hatin û di çewalan de bi cî nedibûn, nîşan dida ku hebûna mirovên ku ew tenê nehêlane, bi qasî jîyanê giring e:

> *"Mirovan piştgirîya manewî da me. Bi rastî jî ez minetdar im. Me dît em ne tenê ne. êş, helbet êşa me ye lê gava em dibînin ku mirov hene êşa me parve dikin û dilmînî didin me, me hêz ji wan hildida. Bi rastî jî mirov bi kêrî me dihatin, em tenê nehêlan û di her warî de piştgirî dan me. Em minetdar in ji ber ku wan em tenê nehêlan"*[129]

Ev gotin nîşan didin ka palpiştî çawa dibe hêzeke kolektîf û hîsa tenêmayînê bêbandor dike. Gava "werin bibîrxistin" û mirov "li cem wan bin", ev yek ji bo malbatan, ji bo hilgirtina giranîya travmayê, dibe rewşeke jênager. Bi heman awayî, ev gotina bavê Umut Petekkaya jî, aşkere datîne rastê ka palpiştî û jîyana rojane çawa ketine nava hev: "fena ke çime mi qapîde bi, mi vatê "Wa jo embaz bêro ma gamêk xo rê sohbet bikim"[130]

[129] Hevdîtin: Amed, Licê – Gundê Dolek- Bûyera Ceylan Önkol -03.12.2023

[130] Hevdîtin: Amed, Çêrmûg - Bûyera Umut Petekkaya -04.12.2023

Ev derbiran nîşan didin ku palpiştî ji bo kesûkarên windayan, bi "pirsîna hal û rewşê" ku wekî pratîkeke biçûk xuya dike, lê wisa berbiçav dibe ku di rastîya xwe de jî bi qasî jîyanê giring e. palpiştî, ji gotinên polîtîk ên qelew zêdetir, wekî şêweyekî sax û sarêjkirinê bi pêş de tê ku di pêwendîyên rojane de geş û mezin dibe. Digel vê yekê jî, azmûna kesûkarên Mehdi Taşkın, nîşan dide gava palpiştî neyê kirin, çawa vediguhere tenêtî û qurifoktîyekê. Ji bo dayika Mehdi, kêmanîya herî mezin, ne tenê bêencammana pêvajoya hiqûqî ye; kêmanî ew e ku ew nebirine serdana gorê.

> *"Mesela dilê min usa dişewite ku ez dixwazim ku her ro biçim. Hebe tinebe anî mehê da carek, sale da du car ez dixwazim ku ez biçim ser mezel..."*[131]

Ev daxwaza dayikê, dibe nişaneya berbiçav ka palpiştî di çav wan de çawa kêm hatiye hiştin.

> *"Erebekî wun dikaribûn bigrin yaw, wele erebekî pir tişkî giran nîn e, diyam tenê nin e, bînlerce ê wek diya min hene. Bigrin, pê bibin, gune nin (...) Kêfxweşî ye wê ye yanî, evîya zî xizmetkî ye, evîya zî exlaqkî pir xweş e. Hema deh sal derbas biye (...) Ma her tişt sê roj e? E mêze dikim heta ser mezela, ser mezel qediya, ew û acî şixwa baş başa dimîne. Însan ser hev de diçe kî, însan aciya hev xafîfletmîş bike. Însan çiqa xeber dide, însan ewqa rehetlemîş dibe..."*[132]

Azmûna malbata Mehdi, datîne rastê ka tunebûna palpiştîyê vediguhere qurifoktîyeke çawa, ev rewş di heman demê de, berpirsîya komalî jî tîne rojevê. Malbat li bendê dimînin ku komele, partîyên sîyasî û sazîyên cihkî, van pratîkên palpiştîyê bidomînin. Ji ber ku ji bo malbatan palpiştî, tenê ji çend rojên serdanên hawarîyê pêk nayê; ew dixwazin bi awayekî biserûber werin bîra mirovan, bibînin ku êşa wan nehatiye jibîrkirin û vî barî bi hev re hilgirin. Di vê rewşê de, bendewarîyên der barê piştgirîya komele û partîyan de, nîşan dide ku palpiştî berpirsîyeke sazîyî ye. Hevjîna İkbal Yaşar ku ew bi xwe jî di partîyeke sîyasî de endama meclîsê ye, wekî xwerexnekirinekê jî, rewşê wiha dibêje:

> *"Malbat bi tena serê xwe dimînin. Ev gelemşeyeke mezin e û bêedaletî ye. Civak û partî li me bigeriyana, xwezî pirsa me bikirana û bibûna hevparê hîsa me ya tenêtîyê."*[133]

Her wiha, em bûn şahidên vegotinên wisa û me dît, gava palpiştî dibe pratîkeke sazîyî bandoreke çawa ya sarêjker çêdike. Gava bi awayekî bi rêk û pêk serdana malan werin kirin, ev yek ji bo malbatan tê wê wateyê ku ew dikevin bîra mirovan û êşên wan di vebîra

---

[131] Hevdîtin: Amed, Kayapınar (Peyas) - Bûyera Mehdi Taşkın -18.05.2024

[132] Hevdîtin: Amed, Kayapınar (Peyas) - Bûyera Mehdi Taşkın -18.05.2024

[133] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera İkbal Yaşar -28.04.2025

kolektîf de cî digire. Kesûkarê İslam Terkoğlu vedibêje ka palpiştîyeke berdewamkirî çawa qulibiye ser kan û çavkanîyeke hêzê:

> *"Wele wexta ku partîya me tê, zaten hemî deman tên, pirsyara me dikin û keyfa me jî tê. Yanî zaten ew e. Vê gavê zaten partîya me jî em bêjin, walehî aydan bigire, her tiştekî zaten bitun şehîdên me mal bi mal digerin. Tê digerin, keyfa me jî tê, kêyfa tabî yanî aîleya şehîdan tê. Demek kî ev şehîd nayên jibîrkirin. Wexta ku bêne serlêdana aîleya şehîdan ew şehîd nayên jibîrkirin."*[134]

Daxwazên ji bo rarûbûn û lêborînxwestinê, qerebû û palpiştîyê, di aşopkirina malbatan a bo edaletê de ji hev ne dûr e; wekî hêmanên hevtemamker dikevin nava hev. Her yek ji wan, berê xwe dide sarêjkirina rehendeke cuda ya birînên ku bicezanekirinê ew vekirine: lêborînxwestin, dike ku yê windakirî were nasîn; qerebû, dike ku jîyan ji nû ve were avakirin; palpiştî jî dike ku jibîrnekirin û jîyîna digel hev misoger bibe. Lê belê, ev mekanîzma hemû, tu car di çav malbatan de nakeve şûna daxwaza bicezakirina kiryar. Berevajîya wê, mercê yekem ê bicîhatina edaletê, dibe aşkerekirina kiryaran û darizandina wan. Herçî lêborînxwestin, qerebû û palpiştî ne, digel vê daxwaza bingehîn, wekî rêyên pêreyî û lêzêdekirî tê dîtin ku ew ê qurifînên ku ji ber çerxa bicezanekirinê çêbûne, siviktir bikin. Li pêş lêgerîna bo edaletê çi qas zêde astengî hebin jî, anînziman wan, wekî di warê hêvîyeke rikdar a der barê siberojê de, wekî pêdagirîyeke ku ji nifşekê bo nifşa din tê veguhastin û wekî berdewamîya pêdagirîya "bi tevî bicezanekirinê jî edalet", derdikeve pêşberî me.

## 3) Bi Bîra Xwe Anîn

Di ranêzikîyên edaleta sarêjker/veguherîner de, pratîkên vebîrê û yên bibîraxweanînê ciyekî giring digirin. Bihevvebûnên di navbera vebîrên takekesî û kolektîf de, ji alî çêtirfamkirina azmûnên kesûkarên mexdûran û ji alî hûrlênêrîna berdewamî û qurifînên di salên 1990'î û 2000'î de, rehendeke giring a vê vekolanê pêk tîne. Ji bo dêûbavên mexdûrên ciwan û lêzimên wan ên salmezin jî rewş ev bû; vebîra salên 1990'î ku bi jişûnkirinên bi darê zorê û bi mehrûmîyetan tijî ye û bîranînên jidayikbûn û zaroktîya zarokên ku winda kiribûn, di nav hev ketibûn. Gelek zarok, pevçûnên salên 1990'î; an di biçûkîya xwe de li wan bûbû şahid an jî çîrokên êş û berxwedanê ku di malbatêde hatibûn gotin, guhdarî kiribû û wisa mezin bûbû. Gava sal dibe 2000, ev vebîr hinekî ximamî dibûn û ji alî hevaxêveran ve gelek zehmet bû ku vegotineke dîyar a ku vê serdemên pênase dike, were çespandin; ji ber ku, rewşa tundîya sîyasî û şer û pevçûna ne giran ku li salên 2000'î tê barkirin, berevajîyeke tûj çêdikir digel zarokên wan ên kuştî û azmûnên ku ji nêzik

---

[134] Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gıundê Alekan - Bûyera İslam Terkoğlu -27.04.2025

ve li jîyana wan qewimîbûn. Lêzimekî Abdulhaluk Geylani, vê rewşê bi van gotinan û bi kurtayî dibêje:

> *"Heta 2015'an erê rast e. Heta 2015'an hindek nermî hebû. (...) hindek nermahî hebû ama nermahîyekî wisa ewk nebê ku mesela mirov bêje temam e, heqeten heye! Çimkî însan, mesela ez behsa birayê xwe dikim, heke nermahî heba, ê pekî birayê min 2005'an de li sûkê de bû, mesela li merkeze de çawa tê kuştin? Ne ku ez tenê behsa birayê xwe dikim, bi deha jî hebû. Heke ku nermahîyekî wisa cîddî heba demek kî ew kuştin gerek o zaman çenebûya"*[135]

Rûxîna beştkî ya pêvajoya aştîyê ya salên 2015-2016'an û tundîya giran ku qewimî, sî daxist ser vebîra salên 2000'î. Kesûkarên mexdûran di gelek bûyeran de, li bajarên kurdan jî kuştinên zarokan hatin nexuyakirin û hewl hat dayîn ku ev vebîr werin windakirin. Di vê çarçoveyê de, hewldanên ku di qadên taybet û gelemperî de û ji bo zindîhiştina vebîrên ketî behsê tên dayîn; bi taybetî li hemberî mexdûran berpirsîyeke exlaqî, ji bo yên mayî jî, wekî kana dilmînîdanê û ji bo raya giştî û dewletê jî wekî helwesteke sîyasî, giringîyekê dide der.

### A) Vebîrên di Nava Malbatê de

Vebîra mexdûran a di nava malê de, bi awayên cuda tê zindîkirin. Di gelek bûyeran de, fotografa mexdûr di nava malê de bi dîwêr ve kirî ye û nîşanî serdanîyan tê dayîn. Di gelek malbatan de, ji deftera dibistanê heta bi kincan an jî tişteyên ku qîmeta wan a manewî heye -wekî mînak, serpêça Selma (Gurbet) Kılıç (Soydan et al., 2023: 91-92), faykeya Çekdar Kanay an jî berçavka tavê, tizbî û gustîla Serhat Encü -tiştên şexsî yên mexdûran tên hêvişandin. Li mala Medeni Yıldırım, şiklê rûyê dikene ku Medeni û birayê wî li arîka darîn nîgar kirine, bi berdewamî kesayetîya wî ya yarîker tîne bîra malbata wî. Di mînakên dîtir de jî, vebîra mexdûran, di ser tişteyên sembolîk ên berdemî re tê berdewamkirin: wekî mînak, gava Ceylan Önkol jîndar bûye, çêleka ku bo wê hatiye dayîn, ji ber ku "Tekane tiştê ku ji Ceylan maye ew çêlek e", bi salan in malbata wê, wê xweyî dike.[136] Wek wisa, dara gûzê ku İlyas Aktaş berî ku were kuştin, danîye, piştî ku malbata wî ji malê bar kiriye jî, bûye şûngeheke ku carinan diçin serdana wê.[137] Xwarin jî, wekî sedema bibîraxweanîna mexdûran derdikeve rastê; xwarinên ku mexdûran pir jê hez kiriye tê çêkirin û di salvegera kuştina wan de, ji bo kesûkaran şîv tê dayîn û vebîr tê zindîkirin. Bibîraxweanîn, carinan ji bo hin kesûkarên mexdûran dibe tiştekî şexsî: wekî mînak, dêya Rojhat Özdel, navê kurê xwe wekî deq li ser milê xwe daye nivîsandin û ji alîyê psîkolojîk ve, cîyekî vê yekê yê

---

[135] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Abdulhaluk Geylani -28.04.2025

[136] Amed, Licê, Gundê Dolek- Bûyera Ceylan Önkol -03.12.2023

[137] Hevdîtin: Amed, Dîcle – Gundê Herîdan- Bûyera İlyas Aktaş -26.05.2024


giring heye ji bo serederîkirina wê ya windakirina ku lê qewimiye. "Heta ku ez bimirim wê kurê min li ser milê min bijî, daxwaza min ev e, ev dike ku ez xwe baş hîs bikim."[138] Lêzimên Halil İbrahim Oruç û Ahmet Kaymaz jî, ji bo ku di bibîranînan de werin xwendin, li ser windayan helbestan dinivîsin.[139] Her çend piranîya wan balê dibin serê ku sarêjbûneke bi temamî ne pêkan e jî, di hemû mînakan de jî, zindîhiştina bîranîna zarokên xwe yên kuştî, ji bo malbatan, hem peywireke exlaqî hem jî wekî rêyeke serederîkirina bi windayan re xuya dike. Ev pêvajoyên şexsî û malbatî, digel ku aîdî qada taybet e jî, di derbiranên kesûkarên mexdûran de, wateya wan a sîyasî xweş dide der: her wekî têkoşîna hiqûqî, winda wekî "şehîd" tên bibîranîn û rûmetdarkirin û ev yek parçeyekî têkoşîna sîyasî ye ku li dijî sîstema ku wekî berpirsa kuştina van kesan tên dîtin, tê meşandin û şêweyekî girêdanîya ji bo têkoşînê derdikeve holê.



*Sûretê ku Medeni Yıldırım li mala li gund digel birayê xwe xêz kiriye.*

[138] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Rojhat Özdel -29.04.2025

[139] Hevdîtin: Amed, Bismil - Bûyera Halil İbrahim Oruç -22.06.2024, Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser - Bûyera Uğur Kaymaz, Ahmet Kaymaz -25.05.2024




*Deqa ku Rojhat Özdel li ser zenda dêya xwe daye çêkirin.*

Ji hêleke din ve, malbat pir xweş hay jê hene ku di vê rewşê de ku raçavkirin û çewisandin ji sivdera malê jî bihuriye, gava di nava malê de tişteyên ku windayan bi bîr tîne hebin, dibe ku rayedarên dewletê wan krîmînalîze bikin. Di pevçûnên giran ên li bajaran ên di navbera salên 2105-2016'an de çêbûn, bi temamî ev yek rû dide. Di wê demê de, hêzên ewlehîyê diavêjin ser gelek malan; hin malbat dibêjin, di wan biserdegirtinan de, fotografên zarokên wan ên bi dîwêr ve kirî, bi wan dane rakirin an jî bi zanebûn ew fotograf qelaştine. Tundîya sembolîk a van kirinan, her wekî ku hin malbat jî tînin ziman, wekî êrîşkirinên ku li dijî goristanan tê kirin tê wateya bêrêzîya li yê mirî û mandelkirina heqê şingirtina malbatan. Di sala 2015'an de, piştî ku hêzên ewlehîyê bi ser malê de digirin û dayika Rojhat Özdel tê malê û dibîne ku fotografa kurê wê hatiye qelaştin û li ser dîwaran jî gotinên heqaretî hatine nivîsîn; dayika wî, bi van gotinan rehenda xisara gihandî vedibêje:

> *"Kêrik jî danabûne ser da, ez hatim, [piştî yasaxê] ku min resma Rojhatî dît, vê derê, ez êdî dinya min bû êkê dî. Min nezanî yanî, min haj jî, ez bo mal û halan ne ew bûm, ku yanî têr nebûne hêşta. Resmê, çi ber kiriye, sê caran ev male xirab kirine, yasaxê xirab kirine, wextê bo carek dî baskin dan malê, carek dî xirab kirin, carek dî dîsa eynî baskin dan malê, carek dî eynî dîsa mala min xirab kirin, terabera kirin, sê caran ev male xirab kirine."*[140]

[140] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Rojhat Özdel -29.04.2025

Bi heman awayî, fotografên İslam Terkoğlu jî ji dîwêr daxistibûn û qelaştibûn û şikandibûn. Di hin mînakên din de jî, malbatên ku pêşbînîya tundîyeke wiha kiriye, hewl daye ku fotografê biparêze. Wekî mînak, malbata Abdulkerim Seyhan, di dema pevçûnên li bajaran de, gava mala xwe şemirandiye, fotografên Abdulkerim jî bi xwe re dibin.[141] Lê belê, carinan ev pêşbînî têrî parastina fotografan nake: Li Geverê, kesûkarên Abdulhaluk Geylani, berî ku ji malê derkevin, fotografên Abdulhaluk ji dîwêr dadixin û di cîyekî de vedişêrin jî, lê hêzên ewlehîyê bi ser malê de digirin û her tiştî dişewitînin.[142] Ev refleks nîşan didin ku tundîya sembolîk û fizîkî ku bi çend nifşan li wan hatiye qewimandin, tecribeya ku der heqê taktîkên dewletê de bi malbatan re çêbûye û şêweyên berxwedanê, yên ku malbatan li dijî wan pratîkan bi pêş xistine, çawa teşe girtiye.

### B) Bibîranînên di Qada Gelemperî de

Fotografên mexdûran, di heman demê de, sembola berdewamîyê ye ku di navbera vebîra di nava malê de û bibîranînên di qada giştî de heye. “Hêvişandinda fotografên” windayan, ji navîna salên 1990’î û şûnde, bûye sembola berxwedana Dayikên/Mirovên Şemîyê ku li Cizîrê, li Stenbolê û li bajarên din têkoşîna heqîqet û edaletê dikin (Kaya & Bozkurt, 2014). Kesûkarên mexdûran, fotografên windayan di qadên gelemperî de hildigirin û bi awayekî sembolîk windayên xwe ji nû ve heyî dikin û komaleke berfirehtir gazî rarûbûn bi heqîqetê re dikin. Her çend, xala nîskokê (focal point) ya Dayikên/Mirovên Şemîyê, windakirinên di salên 1990’î be jî, kesûkarên zarok û ciwanên ku di salên 2000’î de hatin kuştin jî dibêjin, ew tev li van kombûnan dibin û fotografên zarokên xwe hildigirin. Li gorî gotinên kesûkarên İslam Tekoğlu, ev tevlêbûn, di nava şêweyên bibîranînan de, ya herî watedar e:

> *“Roja cumartesîyan em diçin fotoğrafa wan digirin û tînin bîra xwe. Hema ev e, yanî wekî din çi nîn e.”*[143]

Gava windayên salên 2000’î digel yên 1990’î werin bibîranîn, ev yek wekî encama berdewamîya tundî û berxwedana di navbera her du deh salan de jî derdikeve pêşberî me. Her çend, di salên 2000’î de, kuştinên ji ber pevçûnan qewimî, pir kêm hatibin dîtin û di vê dema azadbûna îzafî de bûyerên rûdayî wekî qeza an jî îstîsna hatibin binavkirin jî, ev jesta sîyasî, kuştinên di salên 2000’î de qewimî, li ser pêpeskirinên mafan ên demeke dirêj e bandora xwe ya li ser bajarên kurdan zêde dike; û dike ku berpirsîya dewletê ya di windakirina bi darê zorê, di kuştinên bêdarizandin û di pêpeskirinên din ên li ser mafê

---

141 Hevdîtin: Mêrdîn, Kerboran - Bûyera Abdulkerim Seyhan -25.05.2024

142 Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Abdulhaluk Geylani -28.04.2025

143 Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan - Bûyera İslam Terkoğlu -27.04.2025

jîyanê de heyî, xuyanîtir be. Malbatên mexdûran derdibirin ku di warê kişandina bala raya giştî de dijwarî li wan çêdibe û carinan, partîya wan a sîyasî jî ji bala xwe dide alî û di vê rewşê de, palpiştîya ku Dayikên/Mirovên Şemîyê didin wan giring e. Ev alîyê meseleyê, bi taybetî ji alî dayikên zarokên hatine kuştin, wateyeke xwe ya din heye; Her wekî dayika Fahrettin İnan ku windayê wê jî çêbûye û hindik be jî di nava jinên ku li heqîqetê û edaletê digerin, aramîyê dibîne.[144]

Kombûnên Dayikên/Mirovên Şemîyê, tenê qadeke berxwedan û palpiştîyê ya wisa nîn e ku li dor windayan xwe birêxistin dike; kesûkarên mexdûran balê dibin ser giringîya bibîranînên ku li taxan, deveran, bajaran û li herêman tên lidarxistin. Bi tevî merasîma cenazeyan, ji ber ku bi giştî kombûnên di qada gelemperî de tên qedexekirin an jî bi awayekî hişk tê kontrolkirin, komikên cihkî, ji bo ku bîranîna zarok û ciwanên kuştî zindî bikin, rêyên alternatîf peyde dikin. Wekî mînak, li Qosera Mêrdînê ku Ahmet Araç lê dijîya, çalakîya navlêkirinê bûye rê û rêbazek ji bo ku vebîra Ahmet li nifşên siberojê were veguhastin:

> *"...di vê taxê de, di vê sikakê de yanî piştî ku Ahmet şehîd ket, nêzî pêncî malbatî navê zarokên xwe kirin Ahmet. Hew qasî Ahmet, cîyê ku lê jîyan dikir însanan jê hez dikir."*[145]

Mirov dikare di ser têkoşîna navlêkirinê re ku di navbera malbatên kurdan û dewleta Tirk de her berdewam e, rehenda sîyasî ya navlêkirinê û pevgirêdana wê ya bi meseleya kurdan re heyî, bibîne. Salên 2000'î, di vî warî de bûye xala werçerxê: tevgerînên komalî ku li dor mafên çandî û zimanî geşe daye xwe û reformên hiqûqî yên di vê demê de hatine kirin, her çend hin astengkirin bidomin jî, derfetê dide ku navên Kurdî di tomarkirinên fermî de cî bigirin; ev yek jî tevkarîyê lê dike ku di navlêkirinên bi Kurdî de zêdebûnek çêbibe (Aslan, 2009). Ji hêla din ve, navê zarok û mexdûrên ciwan li zarokan tê kirin û ev yek jî wekî nîşaneyeke din a zanavê û di cografyaya kurdan de wekî rêyeke din a palpiştîyê derdikeve pêş. Her wekî kesûkarekî Yahya Menekşe jî diyar dike, ji bo kesûkkarên mexdûran wateyeke xwe ya taybet heye:

> *"Yanê te divê bila cîranên me bin, te divê bila li bajrên din bin, mesela li Sîlopyayê maşbatek heye. Cêwîkên wan çêbû, keçek û lawek. Yek ji wan navê Yehya ya din jî Menekşe lê kirin."*[146]

---

[144] Hevdîtin: Wan, Navend - Bûyera Fahrettin İnan -25.04.2025

[145] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser - Bûyera Ahmet Araç -19.05.2024

[146] Hevdîtin: Şirnex, Cizîr - Bûyera Yahya Menekşe -15.02.2025

Yek ji aktorên xebata vebîrê ya der barê zarok û ciwanan de ku hatine kuştin, Sendîkaya Kedkarên Zanist û Perwerdeyê (Eğitim-Sen) e û rêxistinên ciwanan ên li zanîngehê ne. Wekî mînak, şaxên Eğitim-Senê yên li Amedê, di vî warî de, xebateke vebîrê dest pê kir û der heqê zarokên kuştî de pêşbazîya nivîsîna çîrokan li dar xist. Şaxa Amedê ya Eğitim-Senê, ji Tîrmeha sala 2006'an û bi vir ve ye, ji bo bibîranîna pênc zarokên ku di navbera 28'ê Adarê û 1'ê Nîsanê de, ji ber bikaranîna hêza zêde û teqandina çekan hatin kuştin, pêşbazîya çîrokan li dar dixe. Pêşbazîya çîrokan, bi zimanên Kurdî û Tirkî û bi navê Abdullah Duran tê lidarxistin ku Duran, xwendekarê pola sêyem ê dibistana seretayî bû û di van bûyeran de jîyana xwe ji dest da. ("Öldürülen Çocuklar Anısına", 2006). Her wisa, li Amedê, endamên Jûra Endezyarên Avahîyê (genç-İMO), ji bo bibîranîna Aydın Erdem ku di sala 2009'an û di xwenîşandana ku ji bo protestokirina girtina/betalkirina Partîya Civaka Demokratîk (DTP) de, bi guleberdana polêsan hat kuştin, Turnuvaya Futbolê ya Kevneşopîyê li dar dixe. ("Genç-İMO üyeleri futbol turnuvası düzenledi", 2013).

Piranîya kesên ku me hevdîtin bi wan re kir, digel ku giringîyê didin şêweyên bibîranîn û bibîrxistinên dijber, ên ku li dor vebîra zarok û ciwanan teşe digire, balê dibin ser hewcetîya bibîranînên fermî yên di qada gelemperî de. Di navbera çend bûyerên ku di qada gelemperî de hat xuyanîtirkirin û gelek bûyer hene ku qet di qada gelemperî de behsa wan nehat kirin û merasîmek bo wan nehat çêkirin û di vî warî de valahîyeke mezin heye. Gava bi awayekî cografîk bal pê tê dayîn, bibîranînên li navendên bajaran xuyanîtir in ji yên deverên çolterî yên Şirnex û Geverê ku malbatên mexdûrên wê derê xwe mîna ku hatine jibîrkirin hîs dikin. Gundê Elemûnayê jî wekî sembola vê îzolasyon û jibîrkirinê dide der ku di Mijdara 2003'yan de piştî teqîna teqemenîyê 12 zarok lê mirin:

> *"Çi merasîm çi jî tiştekî din... Bendewarîyeke me hebû, min dixwest bila tiştek jî çêbibe. Qet neb ev hemû zarok bûn, 13-14 zarok ne hindik e. Mesela di her salvegerê de, çapemenî, wekîlekî me daxuyanîya çapemenîyê bidaya, wê pir baş bûya. Yanê em ê nehatana jibîrkirin."*[147]

Her wekî di cîyên din de jî wisa ye, li Elemûnayê jî, bendewarîyên der barê bibîranînan de, zêdetir li ser partîya sîyasî ya kurdan û/an jî li ser şaredarîyan tê barkirin. Digel vê yekê, bendewarîyên ji sazîyên dewletê bi qasî ku mirov bêje qet tune, hindik in. Tevî ku di xebatên akademîk yên li ser kontekstên dema têperîn û piştî dema têperînê de, polîtîkayên vebîrê yên li dora dewletê wekî hesabdayînbarî û rehendeke bingehîn a lihevkirinê hatiye pênasekirin jî, di konteksta pevçûna kurdan de ku didome, di warê vebîrê de, daxwazeke ji bo midaxalekirina dewletê nade der. Berevajîya wê, daxwazên beryad û bibîranînê û binavkirina ji nû ve, wekî parçeyekî têkoşîneke berfirehtir tên pênasekirin ku li ser

[147] Hevdîtin: Şirnex, Qilaban - Bûyera Li Gundê Elemûnayê -14.02.2025

paşvegirtina qadên gelemperî ye ku bi pratîkên mêtinger ên wekî rûxandin û raçavkirinê hatine dagirkirin. Li Amedê, Wanê û Mêrdînê, kesûkarên mexdûran, giringîyê didin park û kuçeyan, peykerên/beryadên ku li ser bîranînê navê zarokên wan li wan hatine kirin; ew van qadên sembolîk hem wekî rêbazeke xurt a bibîranînê hem jî li dijî hegemonyaya dewletê wekî serîhildaneke berbiçav pênase dikin. Di sala 2012'an de, li Bismilê, parkeke bi navê Halil İbrahim Oruç hat vekirin û kesûkarekî Oruç ku vê tîne bîra xwe û wateya wê bi van gotinên balkêş derdibire:

> *"Ê ku park çêbûn tiştekî mayînde ye. Sureklî ji ber ku heqsizîyê hatiye kirin, sureklî di bîra gel de dimînê. Miletê ku hebû li wê derê, dibe em bêjin li ser nava wî, dibe 'Tu yê herî ku derê?' dibê 'Ez ê herim Parka Xelîl İbrahîm.' Hemen Xelîl İbrahîm tê bîra wî. (...) Ji bo ku vî miletî ji bîr neke, tiştekî bi şeref e jî. Ji bo malbatê jî şeref e."*[148]

Lêzimên Fahrettin İnan ku li Wanê, navê wî li navendeke konferansê û li parkekê hat kirin an jî dayika Yahya Menekşe ku ji bo demeke kurt mabe jî navê wî li kuçeyekê hat kirin, heman dilînan didin der. Ev mînak, ji bo wan malbatan jî dibe sedema besthilanînê ku navê zarokên wan li qadeke gelemperî nehatiye kirin: wekî mînak, lêzimekî İkbal Yaşar, gava li Geverê xeyala taxeke bi navê İkbal dike, kesûkarekî İslam Terkoğlu jî, hêvî dike ku navê wî li parkekê bikin.[149] Herçî malbata Rojhat Özdel ê li Geverê ye, tevî ku haya wan jê tune ku li Amedê û li Mêrdînê navê mexdûrên ciwan li parkan hatine kirin, wateya şexsî û sîyasî ya van şûngehên vebîrê wiha derdibire:

> *"Ez jî şaşirmîş bûm tiştekî wesa çêkirine, çunkî gelek xwestiye ez jî mesela çeşmekê, an tiştekî wesa, ozellîkele mezarlik min got ez ê çêkem, mesela wextê mezarên xwe av diden falan, mesela bila hem bo mirîyê me hem bo mirîyêt dî bila xêr bîtin. Min gelek hez dikir (...) Nemir olarak tête nivîsîn, mesela da û baban, aîlê da çi caran nayête bîrkirin, ema genel jî tiştekî ho rengî bête kirin dê baş bîtin, rastî jî heta dawiyê tiştekî wesa hez dikem bibînim. (...) Çunkî armanca me ew e em vê hereketê her dewam biken, yanî bo roj bi rojê geştir biken, ewadîtir biken, yanî tiştekî ho rengî çêbîtin tabîkî dê tiştek pîroz bîtin bo me hemîyan."*[150]

Di salên 2000'î û di destpêka salên 2010'an de, peykerên ku ji bo bibîranîna zarokên ku li bajarên kurdan hatin danîn, ji bo ku ev bûyer di qada gelemperî de werin vebîrkirin, wekî şêweyekî herî berbiçav didin der. Divê ev kirin, hem di warê vebûna qada vebîrê ya li Tirkîyeyê hem jî di warê veguherînê de were nirxandin ku li sîyaseta kurdan diqewime.

---

[148] Hevdîtin: Amed, Bismil - Bûyera Halil İbrahim Oruç -22.06.2024

[149] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera İkbal Yaşar -28.04.2025, Hevdîtin: Culemêrg, Gever – Gundê Alekan- Bûyera İslam Terkoğlu -27.04.2025

[150] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Rojhat Özdel -29.04.2025

Her wiha, ev peyker, çêbûna dij-vegotinekê didin der ku dîroka fermî û îdeolojîyê didin ber pirsyarîyan; û zemînek çêdike ji bo ku di qada gelemperî de daxwaza aştîyê were kirin. Digel beryadên ku li ser têgihên neberbiçav û fîgurên dîrokî hatine danîn, peykerên ku li ser Uğur Yılmaz û Ceylan Önkol hatine danîn û beryada Robozikê ya li Amedê, bi armanca bibîranîna mexdûran tên çêkirin ku di salên 2000'î de ji ber tundîya berdewam a dewletê û pevçûnan hatine kuştin. Ji vê hêlê ve, her çend çêkirina beryadên ketî behsê bi saya nermbûna îzafî ya sîyasî ya wê demê pêkan bûbe jî, zarokên ku kirdeyên peykeran in, di demekê de ku dewletê belêna aştî û demokratîkbûnê dida, nîşan pê dike ku tundî û bicezanekirina dewletê hê jî lidar e. Ji ber hindê jî, ev beryad, ne tenê bêjarek in der barê borîrojê de, di heman demê de, dibin şûngehên şahidîyên roja îro, yên berxwedanê û yên qaqiboxwestinê.



*Beryada Uğur Kaymaz a ku di sala 2006'an de hat vekirin. Bajaroka Sûr a Amedê.*

Di sala 2016'an de şaredarên hilbijartî ji peywirê tên xistin, qeyûm di şûna wan de tên avêtin û li dijî qada dij-vebîrê ku di salên berê de derketibûn holê, êrîşên giran tên kirin; ev kirina wan, giringîya sîyasî ya beryadan xuyanîtir dike, loma jî, navê park û kuçeyan tên guhertin, peyker ji şûna xwe tên rakirin. Beryadên ku dest didin tundîya dewletê û meseleya kurdan, bi taybetî ji vê polîtîkaya rûxandina sîstematîk bandorê digirin ku hin akademîsyen vê kirinê wekî "vebîrkujî" (Çelik, 2018) pênase dikin. Wekî mînak, Beryada Robozikê ku li Amedê ji alî Şaredarîya Kayapınarê (Peyasê) ve hat avakirin, di Rêbendana sala 2017'an de hat rakirin û bloka mermer ku navê 34 mexdûran li ser nivîsandî bû, hat şikandin. Beryada ku li ser bîranîna Uğur Kaymaz û ji alî Şaredarîya Sûrê ve hat çêkirin,

di Gulana 2015'an de, ji alî kesên nedîyar ve hat şikandin; û di sala 2018'an de jî, bi biryara qeyûm bi temamî ji şûna xwe hat rakirin. Beryadeke din a Uğur Kaymaz ku Şaredarîya Qoserê di sala 2009'an de danî, di Pûşpera 2017'an de, bi talîmata qeyûm ji şûna xwe hat rakirin. Tundîya sembolîk a van rûxandinan, hem bandor li hemû civaka kurdan kir û hem jî ji bo kesûkarên mexdûran dibe birîneke kûr. Di sala 2016'an de, piştî destpêkerîya derbeya neserkeftî, navê parka Halil İbrahim Oruç bi navê "Millet Bahçesi (Baxçê Milet)" hat guherandin û gotinên lêzimekî Halil İbrahim Oruç, êş û hêrsa ku ji ber vê yekê çêbûye, wiha dider der:

> *"...piçek umuda min hebû ew jî yox bû. Daha bêtir li qarşî çavê min reş bû, daha bêtir ez îsyan dikim. (...) Ji wî navê jî tirsîyan û ew navî ji wî rakirin. Îcar ji bo wî ez zanim kû Tirkîye adaletsiz bir ülkedir."*[151]

Gava ev vekolîn dihat kirin, qada vebîrê, wekî qadeke berberîyê bû ku bandora bipêşketinên sîyasî yên herêmî û navneteweyî rasterast li serê çêdibû. Piştî hilbijartinên vê dawîyê, li hin deveran, şaredarên kurdan car din, hatin ser karê birêvebirinê; loma jî kesûkarên mexdûran bendewarîyên xwe yên ji wan bi awayekî aşkere didin der. Wan dixwest bila beryad ji nû ve werin danîn, dîsa navê mexdûrên ciwan li park, kuçe û qadên din ên gelemperî bikin. Ji wêdetirî windayîyên xwe yên şexsî, hin malbatan aşop dikir ku xebateke wisa ya vebîrê were kirin ku wê navê hemû mexdûrên ciwan bîne cem hev û wê vegotineke nû ava bike. Lêzimekî Abdulhaluk Geylani, bi van gotinan bendewarîya xwe dide der:

> *"Ji bo her malbatekî, belê em hes diken, em hes diken navê wan neye jîbirkirin.(...) Navê wan li ser mehleyekî de hebe, navê wan li ser pirtûkekî de hebîtin, navê wan li ser parqedî de hebîtin. (...) Çimkî heq e, heqê wan e."*[152]

### C) Bandorên ku li ser xebatên vebîrê dikin

Ji wêdetirî şahidîya van malbatan, têrî xwe çavkanî di destê me de tune ye em binirxînin ka beryadên ketî behsê ji alî girseyeke gel a berfireh ve çawa hatiye nirxandin. Xebatên akademîk ên ku li ser xebatên vebîrê hatine kirin, balê dibin serê; gava beryad yekser li ser kes û bûyerên navdayî hatibin dîyarîkirin jî, xuyakirina wan a di qada gelemperî de û hatina pejirandina wan a komalî, girêdayî dînamîkên sîyasî û komalî yên guherbar in (Ahiska, 2011). Ji ber vê yekê jî, pêwendîya hundirî ya di navbera têkoşîna sîyasî ya kurdan û van beryadan de heyî, kiriye ku pejirandina beryadan a ji alî kirdeyên polîtîzebûyî ve hêsantir bibe. Bi awayekî paradoksî, piştî sala 2016'an ev beryad ji alî dewletê ve hatin

[151] Hevdîtin: Amed, Bismil - Bûyera Halil İbrahim Oruç -22.06.2024

[152] Hevdîtin: Culemêrg, Gever - Bûyera Abdulhaluk Geylani -28.04.2025

rûxandin û dibe ku êrîşkirinên sîstematîk ên dewletê ên li dijî vebîr û çanda kurdan, kiribe ku ew beryad bibin sembol û ji alî komala kurdan ve wateya wan a sîyasî xurttir kiribe. Ji hêla din ve, pêvajoya xebata qadî ya ku di dema vê xebatê de hat kirin, nîşan bi bertengbûna xebatên vebîrê yên di asta şaredarîyan de jî dike. Serê pêşîn, her çend beşeke mezin ji kesûkarên mexdûran, bi girêdayînekê hewl dabin ku vebîra windayan di nava malê û di komalên xwe yên cihkî de zindî bikin jî, di pêvajoyên vebîrkirina di qada gelemperî de, xweyî mafekî pir dorteng in. Bêyî ku armanc û rêbazên der heqê xebatên vebîrê de nirxandineke giştgir were kirin, der heqê şûna beryadên ku tên sîparîşkirin û der heqê aşopkirina wan de çi dîtina malbatan çi jî ya raya giştî tê pirsîn (Baydemir, 2015). Yek ji mînakên vê têrînekirina ku di warê tevahîgirîyê de çêbûye ew bû ku yek ji lêzimên Uğur Kaymaz digot, wî bihîstiye ku li ser navê Uğur parkek hatiye çêkirin lê nizane li ku derê ye.[153] Her wiha, di sala 2017'an de, ji alî Şaredarîya Kayapınar a Amedê (Şaredarîya Peyasê) ve, Beryada Robozikê hat danîn û yek ji lêzimên mexdûrên Robozikê jî, rexne li şaredarîyê dikir ji ber ku wan ev xebat bi awayekî liderhiştina kesûkarên mexdûran kiriye û gelemşeya xweytîlêkirinê bi van gotinan dianî zimên:

> *"...hin projeyên wisa de, sadece di açılışê de bangî me dikirin. Digotin tiştekî wisa hatine kirinê. Ama detayên wê tam ji me re parve nedikirin. Açılışa em diçûn."*[154]

Ev rexne tenê bi şaredarîyan ve ne bisînorkirî ne. Hewldanên civaka sivîl ên ku di warê vebîrkirinê de xebatan dikin jî, carinan daxwaz û hewcetîyên malbatên mexdûran nade ber çavan û li şûna ku sarêj bike bêtir xisarê digihîne wan. Wekî mînak, malbatên mexdûrên Robozikê, ji bo aşopkirina Muzeya Robozikê, hewlê didin ku digel platformeke ku ji aktîvîst, hunermend û mîmaran pêk tê, hevkarîyê bikin û ev hewldanên wan bi ser nakeve û ji ber vê yekê jî vê yekê kiriye ku malbat hêrsa xwe bînin, hêvîya wan biqurife û bawerîya wan a ji bo qada vebîrê bişikê:

> *"Yanî ew xwestina ji malbatan re bên kirin ew xwestin bi wan re jî şikest. Hin însanan me samîmî dîtin me ji wan bawer kir. Demek kî ew samîmîyet ne samîmîyetek welê bi cih bû. Bila xelet fêm nekin. Hin însanên baş jî hebûn. Ez wan tenzih dikim. Ema hin însanên xerab jî hebûn. Li ser êşa me, li ser tişta me jiyan kirî, maxduriyeta me wekî amur ji xwe re bi kar anîn. Mixabin ez vê bêjim."*[155]

Gelemşeya xweytîlêkirin û wergirîyê, ji bo wan hilberînan jî litê (valid) ye ku di van deh salên dawîyê de ji bo zarok werin bibîranîn hatine lidarxistin. Gelo strana "Ceylan" a ku Sezen Aksu û Tarkan gotiye, der barê tundîya ku li bajarên kurdan berdewam dike û di

[153] Hevdîtin: Mêrdîn, Qoser - Bûyera Uğur Kaymaz, Ahmet Kaymaz -25.05.2024

[154] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatî -22.12.2024

[155] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatî -22.12.2024

raya giştî ya li Tirkîyeyê de hayjêbûn û lêşîyarî zêde kiriye? Lîstika bi navê "Şarapnel- 34 parçeyên Qetlîamê" ku Mehmet Ergen ew bi rê ve biriye û di sala 2015'an de li Londra û li Stenbolê hat lîstin, çi qas karibûye tundîya giran a qetlîama Robozikê raguhêzîne? An jî fîlmê bi navê "13 Gule" ku Mehmet Hatman di sala 2015'an û der heqê Uğur Kaymaz de çêkiriye, gelo girseya armanckirî ya vî fîlmî kî ye? Tevî ku balkêş e ku ev nimandin di ser çend bûyerên sembolîk re tên vegotin û ji bo hin kesên ku me hevdîtin bi wan re kir, ev xebat wekî mînakên bestdêr werin binavkirin jî, ev rewş rîskekê di xwe de dihewîne û dibe ku di navbera mexdûran de hîyerarşîyek çêke û bi taybetî jî ji alî wan malbatan ve ku wekî îzolekirî mane, rîskeke çêkirina bêedaletîyê di xwe de dihewîne. Ahmet Güneştekin di sala 2021'ê de, li Amedê pêşaneyeke bi navê "Jûra Vebîrê" li dar xist û gengeşeyên sext ên li ser vê pêşaneyê çêbûn, rengekî wisa dan xwe ku der barê tundî û nimandina windayan de ronî didan ser dijwarîyên etîk û sîyasî. Protestokeran, sî û çar darbestên rengîn ku bi awayekî nerasterast qetlîama Robozikê bi bîr dixist, ji sûrên Amedê avêtin xwarê û wan di demekê de ku tundîya dewletê serdest bû, ev xebata hunerî bi bêwatebûnê rexne kir. Ji hêla din ve, pêşane hem di asta cihkî hem jî di asta neteweyî de dengekî mezin veda. Heke huner karibe azmûnên şexsî û kolektîf ên tundî û windakirinê xuyanî bike û karibe bibe derbiraneke bihêz a sarêjkirin û veguherandinê, bendewarî û îtirazkirinên malbatên mexdûran û komikên cihkî heq dikin ku tev li wan gengeşeyan werin kirin ku der heqê etîka nimandinê û rêbaza wê de tên kirin. Lê belê, ev vekolîn nîşan dide ku vebîrkirin, nimandin, edalet û maf, di bendewarîya rojane yên piranîya kesûkarên mexdûran de ku ji bo aborîya xwe têdikoşin, ciyekî navendî nagire. Gava der heqê gengeşekirin û bertekan de ku li ser pêşaneya "Jûra Vebîrê" hatin nîşandan, pirs ji kesûkarên mexdûran hat kirin, yek ji kesûkarê mexdûran ku me hevdîtin pê re kir, bi van gotinan anî bîra me ku zordarî û bêedaletîyên ku li gelek kesan diqewime, pir dûr e ji van pratîkên wan ên rojane û ji gengeşeyên ku tên kirin.

> *"Ez hingî di zindanê de bûm. Haya min jê nîn e."*[156]

[156] Hevdîtin: Şirnex, Robozik – Forûma Malbatî -22.12.2024

# BER BI RANÊZIKÎYEKE TEVAHÎGIR VE DAXWAZ Û AŞOPKIRIN

*"Heke hûn bi milyonan, bi trilyonan mirov jî bikujin, wê di dawîyê de ew aştî çêbibe. Nexwe em li hêvîya çi ne..."*[157]

Digel ku ev rapor, pêpeskirinên mafê jîyanê yên li bajarên kurdan diqewimin, xuyanîtir dike jî, ji bo ku dayne rastê ka lêgerîna bo edalet, aştî û sarêjkirinê, ji alî wan kesan ve ku ev bûyer li wan diqewime, çawa tê vegotin û aşopkirinên li ser siberojê ku hevalbendî li vê yekê dikin çawa tên honandin. Digel ku daxwazên hevaxêveran êşên borîrojê bi bîr dixin jî, ji bo jîyanê, di nava xwe de hêvîyekê jî dihewîne. Roja îro ku "pêvajoya mizakerekirinê" ji nû ve dest pê kir, divê ji bo vekirina zemîna ku ev deng tê de deng vedidin were vekirin, bibe fersendek. Êdî mesele ne tenê qedîna pevçûnê ye; mesele avakirina komalek e ku her kes dikare tê de li ser hîma hevwelatîtîya wekhev bijî. Gotinên malbatan, di vê dema nû de, ji pirsîna hesabê borîrojê wêdetir diçe, gazî me dike da ku em aştî û edaleta siberojê ava bikin. Di gotinên wan de, digel edaleteke cezaker ku heqîqetê xuyanîtir dike, siberojeke wisa tê aşopkirin ku wê tê de edaleteke sarêjker jî were danîn û wê xisar jî werin qerebûkirin. Daxwazên ku li jêr cî dane xwe, şêweyên berbiçav yên vê aşopkirinê ne; derbirana zelal û mayende ya daxwaza aştî, edalet û sarêjkirinê ye ku mirovan bi dirêjeya salan ew di xwe de kom kiriye.

▪ Darizandin û bicezakirina kiryaran daxwaza hevpar e. Kesûkarên kuştîyan dibêjin, bila "kiryar werin cezakirin" û diyar dikin ku bicîanîna edaletê mercê pêşî û bêîstîsna ye. Ji ber ku ji bo pêşî li kuştinên/mirinên mîna yên rû dayî were girtin, bidawîbûna bicezanekirinê wekî bêgavîtîyekê qebûl dikin. Malbatên ku dibêjin, "Heke kujyarên Ahmet, Uğur û Enes bihatana bicezakirin, wê îro tu kesî newêrîya gule berdaya zarokekî" nîşan pê dikin ku ew bi hêza pêximkar a edaletê bawer dikin û ev yek wê bibe gaveke giring ku wê careke din sûcên bi vî awayî neyên kirin.

◆ Gava heqîqet aşkere bibe, ev yek ne tenê bingeha bicezakirinê, di heman demê de, bingeha rarûbûna komalî ye jî. Derbirana "Ez dixwazim bizanibim ka birayê min bi guleya kê hat kuştin" nîşan dide ku mafê zanîn û hatina nasîn, parçeyekî edaletê ye

▪ Digel ku der heqê alînegirî û wekhevîya sîstema darazê de, bi malbatan re hayjêbûneke xurt heye jî, pirsyarîkirineke cidî jî dihewîne di xwe de. Bal pê tê dayîn ku divê edalet bi qasî salonên dadgehan, di hemû birêveçûna dewletê de, bi awayekî wekhev were belavkirin. Derbiranên wekî "Divê rêveberîyek li hemberî gelê xwe adil be, divê tu kesî neke mirovên ji pileya duyem" bi zelalî datîne rastê ku edalet ji mexdûrîyetên takekesî wêdetir gelemşeyeke newekhevîtîyeke avanîyî ye. Ev yek derdixe holê ku newekhevî ne tenê di pêkanîna hiqûqê de, di nimandin û xwegihandina bo wê de jî tê hîskirin. Daxwaza nimandina kurdan a bi awayekî wekhev a di nava sîstema hiqûqê de, pir zêde tê bilêvkirin. Malbat bi gotina, "me wisa dizanî ku wê di pêvajoya aştîyê de, li nexweşxaneyan û li dadgehan axaftina bi Kurdî serbest be,

[157] Hevdîtin: Batman, Navend – Bûyera Hasan İş - 24.05.2024

me digot qey wê dadger û dozger kurd bin" destnîşan dikin ku çareserî ne tenê di xurtkirina serbixwebûna darazê de ye, di heman demê de, di pêkanîna edaleta zimanî û çandî ya di nava darazê de ye jî; malbat bi vî awayî tînin ziman ku divê mekanîzmayên edaletê bi awayekî wisa were bipergalkirin ku mafê darizandin û parastinê jî li xwe bigire û wekî mafekî were dîtin.

▪ Digel bicezakirina kiryaran, der heqê amrazên darazê û yên dewletê de, bendewarîyên malbatan ên ji hev cuda hene. Ev bendewarî, gavên ji bo naskirina heqîqetê û sarêjkirina wê pênase dikin.

◆ Daxwazên ji bo qerebûyê tên kirin, her wekî di pêkanînên heyî de wisa ye, ne wekî "bidawîkirinek e" ku dewlet wê bi awayekî yekalî pênase dike, berevajîya wê, digel balpêdana ji bo hesabdayînbarî û edaletê, tê ziman. Malbat dibêjin, hewcetî bi mekanîzmayên qerebûyê yên wisa heye ku karibe berpirsîya pêpeskirinên mafan û rûxîna ku bûye sedema wê, bi awayekî zelal dayne rastê û ji bo yên mayî jî misogerîyeke jîyanî çêke.

◆ Malbat û kesûkar dixwazin bila dewlet lêborînê bixwaze û berpirsîyê qebûl bike. Gotina "Heke lêborînek bihata xwestin wê nîvê birîna dilê min bihata kewandin", nîşan dide ka meseleya "rarûbûn û lêborînxwestinê" ji bo aştîya civakî çi qas giring e. Ev meseleya lêborînxwestinê tenê ji gotin û peyvan pêk nayê. Li gorî helwestên mandelker ku ji demên dawî yên Osmanîyan bi vir ve ye, ji alî amrazên dewletê ve hatiye pejirandin, nîşan bi guherîneke radîkal a sîyasî dike.

◆ Xwegihandina li desteka psîko-sosyal jî wekî hewcetîyeke giring dide der. Tê gotin, sîstema heyî, çi ji alî darayî ve çi jî ji alî xizmetên ku tên kirin ve, hewcetîyên mexdûran naqedîne. Ji bo nirxandin û sarêjkirina rûxandina ku ji ber teweqên tundîyê yên domdar çêbûye û ji bo bêbandorkirina tundîya ku ji nifşekê bo nifşa din tê raguhastin û li ser yên ku li dû tên, dimîne; divê mekanîzmayên destekê yên takekesî û grûpî werin avakirin; pisporên cihkî ku di vî warî de dixebitin, mirovên dilyar û înîsîyatîf werin destekkirin.

▪ Bi awayekî piralî, hewcetîya pratîkên vebîrê û belgekirina berfireh tê bilêvkirin ku wê hem birêvebir hem jî hemû civak tê de bi roleke aktîf rabin.

◆ Ji bo tomarkirin û belgekirina heqîqetê, gotinên wekî "bila were nivîsîn, bila li Ewropayê jî were zanîn", tê gotin û bi van gotinan tê xwestin ku li dijî jibîrkirinê vebîreke kolektîf were avakirin û di vî warî de lêkoler, rojnameger û parêzvanên mafan xebatan bikin û xebat jî werin berbelavkirin.

◆ Parastina goran û rêzgirtina li mirîyan û gotinên wekî "gorên me hilneweşînin; gor çi bi we kiriye?", bi me didin zanîn ku êrîşên di van qadan de, travmayeke nû çêdike.

◆ Piştî ku berhemên hunerî, peyker, nav û qadên vebîrê ku pêpeskirinên mafê jîyanê dinimandin, ji alî şaredarîyên qeyûman ve hatin rûxandin, daxwaz tê kirin ku ew ji nû ve werin

avakirin û tê ziman ku divê ji bo mexdûrên ku heta niha li ser wan xebata vebîrê nehatiye kirin jî xebat werin kirin. Daxwazên wekî "Bila peykera Uğur car din were danîn", "bila li ser navê wî park were çêkirin" wekî arezûya sarêjkirina sembolî derdikeve pêşberî me.

◆ Xweytîlêkirina komalê jî wekî cureyekî sarêjkirinê tê qebûlkirin. Gotina, "Em hatin jibîrkirin, bila me bînin bîra xwe", nîşan dide ku vebîr, bi rêya pevgirêdana civakî, car din dikare were avakirin.

■ Tê gotin, ranêzikîya edaleta sarêjker û mekanîzmayên wê, ancax çi gava digel hesabdayînbarîtîya wê û bi daxwazên din ên bo mafan were nirxandin, wê gavê dikare bibe veguherîner. Ji vî alîyî ve, ji pêkanînên ku ji bo bûyerên takekesî tê kirin zêdetir, xuya dike ku hewcetî bi mekanîzma û pêvajoyên wiha heye; desteyên edaletê yên cihkî û înîsîyatîfên mafan ên civakî û komîsyonên heqîqetê yên tevahîgir, ew ên ku karibin rarûbûnê û guherînên avanîyî pêk bînin.

Ev daxwaz û aşopkirin hemû, bi awayekî zelal nîşan didin ku bendewarîyên edaletê, nîşan bi veguherîneke piralî û komalî dikin. Bi derbirana "Heta ku edalet bi cî neyê wê aştî jî çênebe", bal pê tê dayîn ku aştî û edalet du pêvajo ne ku hev temam dikin. Daxwazên bo "aştîyê" jî li ser vê hîmê tên gotin:

■ Hevoka "Bila êdî tu kes nemire", wekî xala hevpar a hemû hevdîtinan derdikeve pêşberî me. Aştî, ji bo malbatên ku zarokên wan hatiye kuştin û ji bo komala ku ev şer û pevçûn tê de çêbûye, wekî aşopkirineke ku êş tê de bi dawî bûye û jîyanê jî ji nû ve dest pê kiriye, derdikeve pêş.

■ Pêvajoyeke aştîyê ya wisa tê xwestin ku gel jî tev lê bibe, bi şefafî bimeşe û mayende be. Derbirana wekî, "pêvajoya aştîyê ya bêyî lêbelê, bêyî feqet ku her kes pê dizane", hewcetîya aştîyeke komalî tîne zimên ku ji pêneewletîyên di borîrojê de çêbûyî jî wêdetir diçe.

■ Daxwaza çareserkirina bi rêya sîyasetê bi awayekî xurt tê ziman. Gotinên wekî "Sîyaset, sîyaset, sîyaset! Çareserî, çareserî, çareserî!" bal pê dide ku aştî ancax dikare bi rêyên demokratîk pêk were.

■ Tê xwestin, bila aştî digel mafên çandî û zimanî were avakirin. Derbiranên wekî "Heke aştî çêbibe, Kurdîya me serbest bibe, zarokên me neyên kuştin wê dilê me hêsa bibe", nîşan didin ku wekhevîya çandî pêşmerca aştîyê ye.

Ji vî alîyî ve, aştî nîşan bi asoyekê dike ku wê li wir sîstema hiqûqî û sîyasî were veguherandin. Ev veguherîna ku wê tê de têgihên wekî azadî, wekhevî û hevwelatîyê ji nû ve werin nirxandin û digel wê jî, wê reformên berfireh werin pejirandin, divê ne tenê ji bo bajarên kurdan be; helbet ji bo ku li hemû welêt civakeke dadwer û wekhev ava bibe, ev yek tiştekî jênager e. Der heqê ka gelo ev veguherîna avanîyî dikare di rewş û seqaya sîyasî ya heyî de pêk were an na, gelek dîtinên kûr û cuda hene. Aşkere ye ku polîtîkayên dewletê yên çewisandin û mandelkirinê yên ji sed salan zêdetir e didome, pêneewlebûnek jî çêkiriye. Lê belê, digel hemû berbendkirinan jî, tê bawerkirin ku di navbera gelên ku li Tirkîyeyê dijîn, pêkan e ku aştîyeke li ser hevwelatîyeke wekhev çêbibe. Gotina, "Ev cografya têrî me hemûyan dike", xwaz û daxwaza jîyaneke wekhev tîne ziman.

# LI SER BÎRANÎNA ZAROK Û CIWANÊN KU JÎYANA XWE JI DEST DANE

Di vê beşa dawî ya raporê de, ji bo ku em çîrokên zarok û ciwanên ku di navbera salên 2000-2015'an de hatine kuştin, xuyabar bikin, me der heqê jîyana wan a takekesîyê de hin agahî dan hev. Me li gorî dem û dîroka kuştina wan, ew bi awayekî kronolojik bi rêz kirin. Me bi agahîyên ji destê yekem ku kesûkarên wan vegotin û ragihandin me, her çend bi sînor be jî, kitekitên giring dan hev. Kesên ku di vê danehevê de cî girtiye, ji nav 40 bûyerên ku me di vekolînê de lêkolîn li ser wan kir, hatine hilbijartin ku bi awayekî aşkere tenê destûrê didin ku em parvekirineke bi vî rengî bikin.

---



## SELMA (GURBET) KILIÇ

**Amed, Farqîn**

18 salî

Di **17'ê Cotmeha 2001'ê** de, berdestê sibehê bi ser mala wan de tê girtin û di malê de lêgerîn tê kirin. Hêzên ewlehîyê dixwazin di embara malê de jî lêgerînê bikin. Gurbet diçe kilîta embarê tîne, derîyê wê vedike û paş vedigere. Di wê gavê de gule tê berdan û yek ji guleyan li wê dikeve. Di nava malê de birîndar dibe, wê dibin nexweşxaneyê lê li nexweşxaneyê jîyana xwe ji dest dide.

*“Navê Gurbetê di nasnameyê de Selma ye. Me li malê jê re digot, Gurbet. Gurbet qet neçû dibistanê. Li malê, alîkarî bi me re dikir. Stûna mala me bû. Pir wêrek bû. Biryardar û tirûşdar bû. Ji tu tiştî neditirsiya. Yeke nazik, kubar û pêjnkar bû. Xweytîya xwişk û birayên xwe û karê malê hemû wê dikir. Pir hevalên wê hebûn. Li taxê, li derdorê, di nava malbatê de pir jê hez dikirin. Tiştên destkarîyê çêdikirin, tentene çêdikir. Herî dawî, dest bi çêkirina rûbera maseyê ya tenteneyî kiribû, ew jî nîvî ma. Paşê min ew çêkir. Niha, ez wê wekî bibîranîneke jê mayî dihêvişînim. Ji rengên kesk û sor û zer hez dikirin. Herî zêde ji pasteyê û ji kekê hez dikir. Gava stranên bi Kurdî guhdarî dikirin, kêfxweş dibû.”*

## TEQÎNA LI ELEMÛNAYÊ
**Şirnex, Qilaban, Gundê Elemûnayê**



**ZAHİR ÖLMEZ**
11 salî, diçû dibistana seretayî pola 5'an



**SEVİM ÖLMEZ**
10 salî, diçû dibistana seretayî pola 4'an



**SONGÜL ÖLMEZ**
6 salî, diçû dibistana seretayî pola 1'an



**WELAT (AHMET) ÖLMEZ**
6 salî, diçû dibistana seretayî pola 1'an

Di **2'yê Mijdara 2003'yan** de, komeke xwendekarên dibistana seretayî ku li ser rêya dibistanê dimeşin, li erdê tiştekî ku nizanin çî ye dibînin. Deng li Zahir dikin. Zahir gava tê û lê dinêre, texmîn dike ku dibe ku teqemenîyeke neteqîyayî be û hewlê dide ku her kesî ji wir dûr bixe. Di wê kêlîyê de, hê ku çend zarok ji wir dûr ketine, teqîn çêdibe. Di dema teqînê de 9 zarok hene li wir. Teqîn bandorê li 13 zarokan dike. Zahir, Songül, Sevim û Welat jîyana xwe ji dest didin.

*"Wekî tu jî dizanî, gava mirov zarok e, mirov pir kelecanî ye, tiştek nayê bîra mirov. Mirov di [gava zarok e] sergerm e, jîyana mirov tenê lîstik e. Zarok dixwazin henek û yarîyan bi hev re bikin. Van zarokan xwe dixemiland. Bi hev re bi futbolê dilîst. Yanê ev zarok şên û bi wîrewîr bûn. Yanê, wan lotik diavêtin, xwe çeng dikir, yanê ew tim kêfxweş bûn. Yê hemûyan jî, xeyalên wan hebûn."*



## MAŞUK UCA

**Wan, Çildêran**

14 salî

Di **8'ê Mijdara 2004'an** de, rojeke yekşemê ku dibistan betlane ne. Maşuk digel şivanê gund, ji bo çêrandina ajelan diçe ser erdê ku yê malbatê ye. Li wê derê, tiştek li erdê dibîne, tevî ku nizane çi ye jî, pê dilîze. Mayîna ku li erdê dîtiye, diteqe û Maşuk jîyana xwe ji dest dide.

*"Zarokekî pir baş bû. Yanê, zarokekî wisa bû, jê dihat hezkirin. Mamostayekî gundê me hebû, digot; "Wî bidin min ez ê bibim wî li ser navê xwe qeyd bikim." Hê biçûk bû. Maşûk hê diçû dibistana navîn, pola 2'yan. Di dersên xwe de serkeftî bû. Jîr û jêhatî bû. Pir ji dersxebitînê hez dikir. Ji xwezayê hez dikir. Hişê wî zelal û vekirî bû û zû hîn dibû. Zarokekî kêfxweş bû."*



## UĞUR KAYMAZ

**Mêrdîn, Qoser**

12 salî

Di **21'ê Mijdara 2004'an** de, bavê wî yê ku ajovanê kamyonê ye, ji bo ku bide ser rêya dirêj amadekarî dike. Ji ber vê jî, ji bo ku malzemeyên pêwîst têxe kamyonê ji malê derdikeve. Gava endamên din malbatê taştê dixwin, Uğur jî, berî ku biçe dibistanê, ji bo ku alîkarî bi bavê xwe re bike, bi bavê xwe re malzemeyan hildigire dibe datîne nava kamyonê. Di wê gavê de gule tê berdan û her du jî bi derbên guleyan tên kuştin.

*"Li dibistana seretayî xwendekarê pola 5'an bû. Di xwendina xwe de pir serkeftî bû. Jêhatî bû. Di demên xwe yên vala de, ji bo ku piştgirîyê li me bike, bi erebeya destan bar hildigirt. Gava nediçû dibistanê, li her derê dişixulî. Ji helbestxwendinê pir hez dikir. Helbestên bi Kurdî dixwendin. Li baxçê mala me, bi zarokan re lîstik dilîstin. Diçû êzingan, di karên baxçê de hem alîkarî bi me re hem jî bi cîranan re dikir."*



## AHMET KAYMAZ
**Mêrdîn, Qoser**
30 salî

Di **21'ê Mijdara 2004'an** de, li ber mala xwe gule berdidinê û tê kuştin. Ahmet karê ajovanîya rêya dirêj dike. Berî ku bide ser rê, ji bo ku malzemeyên ji bo rêwîtîyê pêwîst dayne nava kamyonê digel lawê xwe Uğur ji malê derdikeve. Di wê kêlîyê de gule berdidin wan û her du jî bi derbên guleyan tên kuştin.

*"Lawê biçûk ê Ahmet, telefoneke kevn û tizbîyeke ku ji bavê wî maye, wekî bîranînên jê mayî dihêvişîne. Lawê wî yê din, di çalakîyan de ji bo bavê xwe helbestan dixwend. Çendê wî alî, kincên Ahmet û Uğur anîn dan min. [Cilên ku wê roja hatine kuştin li wan bûne, ji bo ku li hin cîyan werin nîşandan, berîya gelek salan ji malbatê hatine girtin.] Çakêtê ku Ahmet li xwe kiriye û cilên ku li Uğur bûne! Hemû jî dabûn hev û şandibûn vê derê. Min jî ew hildan birin ser mezelan. Ez çûm, min gorên wan vekirin, cil danîn ber serê wan û hatim."*



## FAHRETTİN İNAN
**Wan, Navend**
19 salî

Di **21'ê Pûşpera 2005'an** de, ji bo merasîmeke cenazeyekî yê girseyî amadekarî tên kirin. Fahrettin jî bi koma hevalên xwe re tev li merasîma cenazê dibe. Cenaze hê negihîştiye Wanê, gule berdidin ser girseya ku ji bo pêşwazîkirina cenazê li hev kom bûye. Derba guleyê li qelbê Fahrettin dikeve û tê kuştin.

*"Fahrettin ciwanekî şên û henekbaz bû. Yekî pir sosyal bû. Derdora wî geş bû, hevalên wî pir bûn. Pir wêrek û otorîter bû. Li ber neheqîyê tirûş nedikir. Li ku derê neheqîyek çêbibûya, hema diçû destê xwe dixistê. Dikaribû seroktîyê li derdora xwe bike. Herî zêde kêfa wî dihat ku goreya spî, îşlîga spî û pantorê reş li xwe ke. Pir ji kûçikan hez dikir. Jixwe karê ajelkarîyê dikir. Guh dida stranên Müslüm Gürses. Gava guhdarî dikir, bi hoparlorê li hemû taxê jî dida guhdarîkirin. Li baxçê, kased di teybê de bi cî dikir, dengê teybê radikir û bi hemû taxê dida guhdarîkirin. Pir jê hez dikir."*



## HASAN İŞ
**Batman, Navend**
23 salî

Di **28'ê Tebaxa 2005'an** de, li Batmanê merasîmeke cenazê ya girseyî tê lidarxistin. Ji ber ku ew roj ji bo Hasan roja betlaneyê ye, bi hevalên xwe re diçe çixarîyê. Piştî ji çixarîyê vedigerin, Hasan leqayî merasîma cenazê dibe û tev li girseyê dibe. Di dema merasîmê de bûyer diqewimin, gule li serê Hasan dikeve û Hasan tê kuştin.

*"Bi ya min mirovê herî qenc ê dinyayê bû. Qet xwe nêzî tiştekî xerab nedikir. Çi tişt jî biqewimiya, dîsa jî tiştekî xerab nedikir. Mirovekî xêrxwaz û sosyal bû. Hem alîkarîya malbata xwe hem jî alîkarîya kesên din dikir û piştgirî dida her kesî. Piştî dibistana seretayî êdî neçû xwendinê. Leşkerîya xwe kir û paşê li dikana birayê xwe ya oto sanayîyê dest bi şixulê kir. Li wir dişixulî. Jîyaneke aram û bêdeng diqedand. Me amadekarî dikir ku wî bizewicînin."*



## ABDULHALUK GEYLANİ
**Culemêrg, Gever**
22 salî

Di 9'ê Mijdara 2005'an de, li bajaroka Şemzînana bi ser Culemêrgê ve, li hemberî Umut Kitabeviyê êrîşeke bombeyî hat kirin. Piştî vê êrîşa bombekirinê û bûyerên li pey wê qewimî, li Şemzînanê û li Culemêrgê çalakîyên protestokirinê hatin kirin. Di **15'ê Mijdara 2005'an** de, li Geverê jî, der heqê vê mijarê de çalakîya daxuyanîya çapemenîyê ya girseyî hat kirin. Piştre bûyer diqewimin û derba guleyê li Abdulhaluk Geylani dikeve û tê kuştin.

*"Neçû dibistanê. Li înşaatan dişixulî. Karaktera wî hinekî sert bû. Lê hema bêje ew çend jî dilzîz bû. Pir cindî bû. Yekî hişk, cindî, dilzîz, dilpak û dilsaf bû."*



## İSLAM TERKOĞLU
**Culemêrg, Gever**
24 salî

Di **23'yê Mijdara 2006'an** de, ji bo ku êzingan berhev bikin bi du hevalên xwe re diçe cî û warên çolterî. Piştî ku êzing bar dikin, didin ser rêya vegera li gund û di rê de bi derba guleyê tê kuştin.

*"İslam karê ajelkarîyê dikir. Qet em nediêşandin. Dilê me nediêşand. Me jî qîmîşî wî nedikir. Ji ber ku bêbav mezin bûbû çi tiştê ku dixwest bi cî dihat. Gava zarok bû jî me nedixwest bişixule. Ciwanekî şên, kêfxweş û xweşsihbet bû. Hê 11 meh bû ku zewicîbû. Roja ku hat kuştin, pitika wî hê 5 rojî bû."*



## MEHMET UYTUN
**Şirnex, Cizîr**
1,5 salî

Di 9'ê Cotmeha 2009'an de, li Cizîrê, gava çalakîyên protestokirinê tên kirin, ew li şaneşîna mala wan û di hembêza dêya xwe de bûye; fîşeka bombeya gazê tê li serê wî dikeve, bi giranî birîndar dibe. Piştî ku li nexweşxaneyê 10 rojan di sexbêrîya zêde de dimîne, di roja **19'ê Cotmeha 2009'an** de jîyana xwe ji dest dide.



## ÇEKDAR KANAY

**Amed, Licê**

17 salî

Çekdar di **2'yê Tîrmeha 2010'an** de, ji bo betlaneya bi 10 rojan ji Amedê diçe Licê. Êvarê, ji bo ku wextê li xwe xweş bikin, bi hevalên xwe û bi pismamên xwe re diçin ser erdekî ku yê malbata wî ye. Di wê gavê de, ji tarîyê bi awayekî ketûber gule tên berdan û guleyek li ser wî dikeve û tê kuştin.

*"Çekdar, herî pir ji Licê û ji siwarbûna li hesp hez dikir. Pir hez jê dikir li çîya û deştên Licê dema xwe bibe û li wan deran hespê xwe biajo. Li gund hespekî wî hebû û loma jî gelek caran diçû gund. Wê rojê jî, ji ber vê sedemê çûbû gund. Ji bo ku wexta xwe li Licê bibihurîne û li hespê xwe siwar bibe. Zarokekî jêhatî bû. Ji bo ku pere qazanc bike her tim li cî û deran dişixulî. Pir dilrast û alîkarîxwaz bû. Ji fasûlîya spî û pasteyê hez dikir. Alîgirê Galatasarayê bû. Dêya wî jê re lihêfeke bi logoya Galatasarayê kirîbû, tim ew diavêt ser xwe."*



## AHMET ARAÇ

**Mêrdîn, Qoser**

26 salî

Di 28'ê Adara 2006'an, di wan rojan de ku li Amedê çalakî li dar diketin, çalakîyên protestokirinê li bajarên din jî çêdibin. Di **1'ê Nîsana 2006'an** de, Ahmet şîyar dibe, berî ku biçe ser karê xwe, li malê taştêya xwe dixwe û pê re jî nûçeyên dawî yên der heqê 28'ê Adarê de guhdarî dike. Hîn dibe ku li Amedê, Enes Ata bi derba guleyê hatiye kuştin. Bandora vê nûçeyê lê dibe, derdikeve derve û tev li çalakîyên protestokirinê dibe. Di çalakîyê de gule lê dikeve û tê kuştin.

*"Kantîna dibistanekê di destê wî de bû. Têkilîya wî bi xwendekarên wê dibistanê re xweş bû. Ciwanekî jidil û dilrast bû. Her tim aştîxwaz bû. Hewl dida ku li derdora wî pevçûn çênebin û ger pirsgirêkek hebûya jî dixwest wê çareser bike. Roja bûyerê jî, ji bo ku ciwan keviran neavêjin paceyên dikandaran xwe kiribû sîper. Herî zêde ji xwarina êroqê hez dikir. Alîgirê Galatasarayê bû. Ciwanekî dilrehm û bi empatî bû. Alîkarîxwaz bû. Ahmet dilê mirovekî tenê jî neêşand."*



## EMRAH FİDAN
**Amed, Rezan**
17 salî

Gava di 28'ê Adara 2006'an de li Amedê bûyer diqewimîn, di **3'yê Nîsana 2006'an** de, piştî ku pir zêde pêdagirî li bavê xwe dike, bavê wî destûrê didiyê ku her li kuçeyê bi hevalên xwe re bi gokê bilîze. Paşê, demeke dirêj tu agahî jê nayê girtin. Rojek şûnde, agahî digihîje wan ku derba guleyê li serê Emrah ketiye û li nexweşxaneyê jîyana xwe ji dest daye.

*"Emrah zarokekî pir jêhatî bû. Diçû lîseyê. Me qeyda wî li dersxaneyê jî çêkiribû. Xwe ji bo azmûna zanîngehê amade dikir. Ji çûna dibistanê û ji xebitîna dersa xwe pir hez dikir. Di demên xwe yên vala de jî li malê ders dixebitî. Destnivîsa wî pir xweşik bû, kê didît lê dibû heyran. Mamostayên wî jî heyranên destnivîsa wî bûn. Ji futbolê hez dikir. Hem lîstina wê hem jî temaşekirina wê. Alîgirê Galatasarayê bû. Herî pir ji çûna gund û ji siwarbûna li hesp hez dikir."*



## İLYAS AKTAŞ
**Amed, Rezan**
24 salî

Di 28'ê Adara 2006'an di wan rojan de ku li Amedê çalakîyên protestokirinê li dar diketin, gava dibihîse ku derba guleyê li Enes Ata ketiye û hatiye kuştin, guh nade kesûkarên xwe yên ku pêşî lê digirin da ku neçe derve û tev li çalakîyên protestokirinê dibe û gule li serê wî dikeve. Gava midaxaleyên li Amedê têrî başkirina wî nakin, doxtor wî dişînin Enqereyê. Di **14'ê Nîsana 2006'an** de li Enqereyê jîyana xwe ji dest dide.

*"Li Zanîngeha Dîcleyê, di Beşa Mîmarîyê de diçû pola 2'yan. Pêwendîyên xurt datanî; û li ser zarokan pêjnkar bû, ciwanekî dilzîz bû. Zêde dernediket derve, wexta xwe li malê dibihurand. Pirtûk dixwendin, li baxçê bi zarokan re lîstik dilîstin. Herî zêde ji xwendina pirtûkan hez dikir. Ji Dostoyevskî û ji romana Sûc û Ceza hez dikir. Ez dibêjim qey du sê car ew xwendin. Bi xwişka xwe re pir xweş li hev dikirin. Li ranzayê, yek li jêr yek li jor, bi hev re pirtûk dixwendin. Wan herî pir ji pirtûka Portakala Şekiran hez dikir. Wekî din jî, kupurên rojnameyên ku dixwendin jê dikirin û ew kom dikirin. Ciwanekî bikeys û bipergal bû. Dixwest bila rêz li qada wî ya taybet were girtin. Herî pir ji patîleyê hez dikir. Alîgirê Galatasarayê bû û herî pir jî ji Xelîl Xemgîn guhdarî dikir. Dareke gûzan danîbû di baxçê mala me de. Dar hê jî di şûna xwe de ye."*



## YAHYA MENEKŞE

**Şirnex, Cizîr**

16 salî

Di **15'ê Sibata 2008'an** de, di gava çalakîyeke protestokirinê de amrazeke bizirx lê diqelibe û tê kuştin. Gava çalakîya protestokirinê dest pê dike, Yahya ji bo ku firavîna xwe bixwe û car din here ser karê xwe, tê malê. Piştî xwarinê ji malê derdikeve.

*"Yahya, piştî ku ji dibistana navîn derçû, xwendina xwe nedomand. Li hin deran dişixulî. Zarokekî pir bi edalet bû. Yekî rûliken û jêhatî bû. Şên û komîk bû. Xweş henek dikirin. Her kes dida kenandin. Di nav hevalên xwe de wisa dihat nasîn. Pir hevalên wî hebûn. Ciwanekî bejnbilind û rûqemirî bû. Herî pir ji dîlanê hez dikir. Û ji govendgerandinê. Li ku derê dawetek hebûya diçû li wê derê govenda xwe digerand. Tim dixwest tiştên sorkirî bixwe. Wê rojê jî, gava ji bo firavînê hat malê, kartolên sorkirî û miqarne xwarin."*



## İKBAL YAŞAR

**Culemêrg, Gever**

27 salî

Di **23'yê Adara 2008'an** de, li Geverê, birêveberên cihkî û rayedarên fermî li ser roja pîrozkirina Newrozê li hev nekirin û gel bi xwe biryar da ku ew ê Newrozê di roja xwe de û li cîyê ku dixwaze pîroz bike. Lê piştî vê biryarê, gava girse derdikeve derve, hêzên ewlehîyê pêşî li wan digirin. Di van bûyeran de pîrozkirina Newrozê qulibî ser protestokirinên civakî û di van çalakîyan de gule li serê İkbal dikeve û tê kuştin. İkbal zewicandî bû û roja ku lawê wî yê biçûk bû 2 salî, hat kuştin.

*"Min dizanibû wê di wê Newrozê [wê salê] de bûyer çêbibin. Ji bo ku neçe min paltoya wî şûşt. Ez wisa fikirîm ku ew ê nikaribe paltoya şil li xwe bike. Lê, li xwe kir, çû û hat kuştin. İkbal yekî şên, xeberdok û sosyal bû. Ji gerê hez dikir. Her şev wekî mêvan diçû mala yekî. Pir hez jê dikir di civatên qerebalix de dema xwe bibihurîne. Bi her kesî re têkilîyên germ datanî. Her kesî jî jê hez dikir. Mirovekî pir cuda bû. Hostayê dîwarlêkirinê bû. Têkilîya wî bi zarokan re pir baş bû. Bi zarokên xwe re jî xweş dida û distend. Bi wan re dilîst. Ji wan re stran digotin. Alîgirê Galatasarayê bû."*



## MAHSUM KARAOĞLAN

**Riha, Xelfetî, Gundê Amarayê**

22 salî

*Aydın Erdem ku piştî heşt mehan ji kuştina wî hat kuştin, hevalê wî yê polê û hogirê wî bû.*

Di **4'ê Nîsana 2009'an** de, ji bo rojbûna Abdullah Öcalan, ber bi gundê ku lê ji dayika xwe re çêbûye, meşek tê lidarxistin. Hêzên ewlehîyê pêşî li wan digirin û gule berdidin wan. Guleyek li qelbê Mahsum dikeve û tê kuştin.

*"Mahsum li Zanîngeha Dîcleyê di Beşa Matematîkê pola 3'yan de bû. Ji ber ku ji govendgerandinê hez dikir, tev li koma govendê bûbû. Ji bo ku sporê bike, dibezîya. Gava bavê wî jê re gotibû, "Tu nizanî bibezî", li bavê xwe vegerandibû û gotibû, "Min jî digot qey ez nizanim, lê gava bezîyam min fam kir ku dizanim."Alîgirê Galatasarayê bû. Jêhatî, bi xîret û jîr bû. Yekî sosyal û xerîbdost bû. Li ber neheqîyê tirûş nedikir. Di dema xwendekarîya zanîngehê de jî ketibû nav rêxistinên xwendekaran û di qada civaka sivîl de dixebitî."*



## CEYLAN ÖNKOL

**Amed, Licê, Gundê Xiraba**

12 salî

Di **28'ê Adar 2009'an** de, gava ji bo çêrandina ajelan diçe mêrgê, ji ber teqîna topa hewanê ku li ser erd e, jîyana xwe ji dest dide.

*"Ceylan, biçûka malê û wek keçik tayek tenê bû. Çavbeleka me ya hemûyan bû. Diçû dibistana şevînî. Pir jîr û jêhatî bû. Dixwest biçe zanîngehê bibe dozger an jî dadger. Dêya wê çêlekek dîyarî wê kiribû. Pir jê hez dikir. Piştî Ceylanê jî, her kesê li gund ew çêlek wekî "çêleka Ceylanê" bi nav dikir. Deftereke wê hebû, navê hemû pêxemberên ku di Quranê de derbas dibû, tê de nivîsîbûn. Pir qîmet dida wê defterê. Hez dikir di hembêza dêya xwe de razê. Ji xwarinan herî zêde ji miqarneyê hez dikir. Wê rojê, gava ajel dabûn ber xwe û ji malê çûbû, ji dêya xwe xwestibû bila miqarneyê çêke."*



## AYDIN ERDEM

**Amed, Navend**

24 salî

*Aydın hevalê polê û hogirê Mahsum Karaoğlan bû ku berî kuştina wî bi heşt mehan hatibû kuştin. Heval û hogira wan a sêyan Derya ku zindî maye, wiha dibêje; "Qelem bi konê şînê ya Aydın ve hatibû kirin. A rast, di wan salan de, şîn li qelemê jî, li kelamê jî li Aydın jî bûbû strî."*

Di **6'ê Berfanbara 2009'an** de, gelê Amedê xwest biryara Dadgeha Makeqanûnê ya girtina partîya sîyasî ya kurdan Partîya Civaka Demokratîk (PCD) bi awayekî girseyî protesto bike. Gel ber bi avahîya PCD'ê dest bi meşê kir û bi fîşekên gazê midaxale li gel hat kirin. Aydın Erdem jî di nav girseyê de bû, di vê midaxaleyê de guleyek li qelbê wî ket û hat kuştin.

*"Bavê wî, wî bi gotinên wekî "Aydın stêrkek bû" pênase dike. Li Zanîngeha Dîcleyê xwendekarê pola sêyem a Beşa Matematîkê bû. Dixwest xwendina xwe bibe serî û bibe mamosta. Ciwanekî rûken û demokrat bû. Ji jîyanê hez dikir. Ji jîyînê, kêfkirinê, ji gerê, ji xwendinê, ji cillixwekirinê, ji xwarin û vexwarinê hez dikir. Mirovekî sosyal bû. Tu kes çênedibû ku ew nikaribe pê re têkilîyê dayne. Em nizanin ka ji kîjan cure muzîkê hez jê dikir lê herî dawî muzîka telefona wî strana "Ez Kurdistan im" a Hozan Serhat bû. Carinan, piştî dibistanê, ji Zanîngeha Dîcleyê heta bi navenda bajêr, digel hevalên xwe, di ser pira çemê Dîcleyê re dimeşiya û sihbetên dûrûdirêj dikirin."*



## MEHMET NURİ TANÇOBAN

**Wan, Çildêran, Gundê Hecî Xatûn**

15 salî

Di **31'ê Adara 2010'an** de, ji ber ku dibistan ketibûn betlaneyê, Mehme t Nuri hatibû gundê xwe û ji bo ku mazotê bînin, digel hevalên xwe, ber bi sînorê Îranê ve dide ser rê. Li ser rêya vegerê, gule berdidin koma ew tê de. Di vê guleresandinê de, guleyek li sînga Mehmet Nuri dikeve û ew tê kuştin.

*"Mehmet Nuri diçû lîseyê û pir serkeftî bû. Li navenda bajêr di Lîseya Anatolyayê de bi awayekî şevînî dixwend. Gava zarokên ciranên wan û pismamên wî xwest ku ew jî bi wan re biçe, wî jî pêdagirî li min kir, min jî destûr dayê û ew jî çû. Mehmet Nuri, tenê ji bo ku bi hevlaên xwe re be û demê bi wan re bibihurîne, çû. Zarokekî pir jîr û jêhatî bû. Ew qas ku li gund bû yê yekem û Lîseya Anatolyayê qazanc kir. Yekî biaqil bû. Li ser ziman û çanda xwe bû. Heke bijîya, teqez wî yê zanîngeh qazanc bikira û bixwenda.."*



## HALİL İBRAHİM ORUÇ

**Amed, Bismil**
17 salî

Di **20'ê Nîsana 2011'an** de, ji ber ku Desteya Bilind a Hilbijartinê, daxwaznameya mebusên kurdan a ji bo tevlêbûna hilbijartinan veto kir, li bajarên kurdan xwenîşandanên protestokirina biryarê dest pê dikin. Di protestokirina li Bismila Amedê de, gule li sînga Halil İbrahim dikeve û ew tê kuştin..

*"Diçû xwendina lîseyê û di pola sêyan de bû. Hem diçû dibistanê hem jî diçû dersxaneyê û bi xurtî xwe amade dikir ji bo qazanckirina azmûna zanîngehê. Zarokekî jêhatî, serkeftî û bi îrade bû. Soz û bext dabû bavê xwe ku ew ê di azmûnê de bi ser bikeve û bibe parêzer. Zarokekî kêfxweş û bextyar bû. Hez jê dikir ku sihbetê bike, biçe cem mirovan û hevalên xwe û alîkarîyê li derdora xwe bike. Di demên xwe yên vala de, diçû karxaneya kesûkarên xwe, alîkarî bi wan re dikir û ji bo ku li her kesî belav bike, çay dem dikir. Her tim 15-20 heb şekirên topitopê hebûn di berîka wî de û gava diket nav taxê ew li zarokan belav dikirin. Zarokên taxê gava ew didît, wan digot, "Îbo, Îbo, Îbo..." û li dora wî kom dibûn. Alîgirê Galatasarayê bû. Herî zêde fasûlîya spî ya bigoşt û ji belezîzê hez dikir. Wekî din jî, kek û paste û tiştên wisa jî hez jê dikirin."*



## UMUT PETEKKAYA

**Amed, Çêrmûg**
15 salî

Di **7'ê Pûşpera 2011'an** de, gava ji bo çêrandina ajelan diçû mêrgê, teqemenîyek di bin zinaran de dibîne, pê dilîze, teqemenî diteqe û jîyana xwe ji dest dide.

*"Umut, biçûkê malê bû. Ji ber vê jî, bi şîr û şekir dihat mezinkirin. Ji jîyanê hez dikir û kêf jê hildida. Şên bû, hinekî dînikî û henekbaz bû. Çi gava tiştekî ku bavê wî jê hez nedikir, bikira, her tim heneka "Dayê ez di trafîkê de asê mam" dikir. Yekî bi edalet bû. Ji hevalên xwe pir hez dikir. Çêlekek wî hebû, pir jê hez dikir. Ew qas jê hez dikir, ji ber ku ditirsîya çavînî bibe, çêleka xwe ji çavan dûr dikir. Gava ew dibir çêrandinê jî, çêlek ji rêyên ku kes tê de tunebûn dibir û dianî. Heyranê Umut Karanê bû ku di tîma milî ya Tirkîyeyê de jî dilîst. Hewesa kalên li gund dikir û wekî wan şalwer li xwe dikir, qûşa xwe jî bi nava xwe ve girê dida."*



## ERCAN UCA
**Wan, Çildêran**
27 salî

Di **30'yê Tîrmeha 2011'an** de, şev nîvê şevê, bi 2 hevalên xwe re, ji bo ku mazotê bikirin, diçin ser sînorê Îranê. Li cîyekî nêzî sînor, dora Ercan û du hevalên wî tê girtin û gule li wan tê reşandin. Ercan li wê derê tê kuştin. Ercan karkerê înşaatan bû. Zewicandî bû û çar zarokên wî hebûn.



## QETLÎAMA ROBOZIKÊ
**Şirnex, Qilaban, Gundê Robozikê**

Şeva **28'ê Berfanbara 2011'an** balafirên şer ên Hêzên Hawayî yên Tirkan, bomber barandin ser gundîyên ku li ser sînor bazirganî dikirin. Di bombekirinê de, piranîya wan zarok, 34 sivîl hatin kuştin..

**Bilal Encü (16),** Özcan Uysal (18), **Seyithan Enç (21)**, Cemal Encü (17), **Vedat Encü (17)**, Selman Encü (38), **Selahattin (Karker) Encü (16)**, Nadir Alma (25), **Celal Encü (16),** Şervan Encü (19), **Nevzat Encü (19)**, Salih Encü (18), **Osman Kaplan (31)**, Mahsun Encü (17), **Muhammet Encü (13)**, Hüsnü Encü (30), **Savaş Encü (14)**, Erkan Encü (13), **Cihan Encü (19)**, Fadıl Encü (20), **Şerafettin Encü (18)**, Hamza Encü (21), **Aslan Encü (17)**, Mehmet Ali Tosun (24), **Orhan Encü (13)**, Salih Ürek (16), **Yüksel Ürek (16)**, Adem Ant (19), **Hüseyin Encü (20)**, Bedran Encü (13), **Serhat Encü (16)**, Abdulselam Encü (22), **Zeydan Encü,** Şivan Encü.

*"Heke bombeyên ku ez kuştim edalet jî nekuştibe, ez doza edaletê dikim... Ma edalet ne mafê her kesî ye?"**

* Platforma Edalet bo Robozikê, agahîyên rastîn ên ku li Robozikê bi bombekirinê hatin kuştin, bi kar anî û ji bo her kesî, bi devê wî, nameyek belav kir. Ev çîrok, 34 rojan û her roj hatin belavkirin û bi rêya faksê û e-mailê, bo Serokkomarî, Serokwezîrî, Wezîrtîya Edaletê û Wezîrtîya Karên Navxweyî, hat şandin. Ev jêgirtin, di dawîya her nameyê de hat nivîsîn. Name di sala 2012'an de, li Bianetê hatin weşandin. ("Nameyên Robozikê", 2012).

*Ev fotograf, di sala 2013'an de, di kargeheke bi navê "Robozik; Bi Fotografên Zarok û Ciwanan" de hatiye girtin ku bi zarok û ciwanan re hatiye kirin. Gülnaz Encüyê vê fotografa xebata rengan ya Gülnaz Encü (7 salî) û Kevser Encü (10 salî) girtiye.*



## MEDENİ YILDIRIM

**Amed, Licê,**
**Gundê Nenyasê**
19 salî

Di **28'ê Pûşpera 2013'an** de, li dijî 'kalekol'ên ku wê li bajarokê Licê ya Amedê werin çêkirin, xwenîşandanên protestoyî tên kirin. Medeni jî, piştî ku dikeve azmûna zanîngehê ku pir xweş xwe bo wê amade kiribû, ji bo ku betlaneyê bike, diçe gundê xwe yê li Licê. Di wê demê de jî tev li protestoyekê dibe, guleyek li qelbê wî dikeve û tê kuştin.

*"Li dibistanê xwendekarekî serkeftî bû. Xeyal dikir ku li Zanîngeha Yüzüncü Yılê ya Li Wanê Beşa Birêveberîya Raya Giştî bixwîne û bibe qeymeqam. Wekî din jî, gava biçûya Wanê, têra xwe diket Behra Wanê. Piştî ku Medeni hat kuştin, encama azmûnê hat û têra xwe puan wergirtibû da ku karibe li dibistana ku xeyala xwendina wê dikir, bixwîne. Ciwanekî şên, kêfxweş, komîk û henekbaz bû. Ji xêzkirina karîkaturan hez dikir. Li arîka mala wan a li gund, rûçikên komîk xêz kiribûn û ew hê jî lê ne. Senaryo dinivîsîn. Senaryoyek wî ya bi navê "Ubîyan" nîvco mabû ku mijara wê ev bû; yên fezayî dihatin û Licê dagir dikirin. 40 roj berî bûyerê, dara ku li baxçê mala wan a li gund danîbû, hê jî li wir e. Herî pir ji şîr, mast û dew hez dikirin."*



## BÊMAL TOKÇU

**Culemêrg, Gever**
25 salî

Di 6'ê Berfanbara 2013'an de, li Geverê li dijî rûxandinên goran xwenîşandanên protestoyî dest pê dikin. Di van çalakîyan de Mehmet Reşit İşbilir (35) û Veysel İşbilir tên kuştin. Di merasîma cenazeyên wan de jî bûyer diqewimin û gule li ser Bêmal Tokçu dikeve û bi giranî birîndar dibe. Bêmal radikin nexweşxaneyê û ew di **12'ê Berfanbara 2013'an** de jîyana xwe ji dest dide. Bêmal zewicandî bû û sê zarokên wê hebûn.


*"Yeke wêrek bû. Henekbaz, şên û xeberdok bû. Pir ji sihbetkirinê hez dikir. Ji xebitînê hez dikir. Hez dikir alîkarîyê bi lêzimên xwe re, bi hevalên xwe re û bi cîranên xwe re bike. Têkilîya wê ya bi zarokên xwe re wekî heval û hogiran bû. Bi wan re sihbet dikir. Ji hev re henek dikirin. Yeke hişasa bû. Pir bi aqil bû. Mirovekî pir qenc bû, mirovên qenc zêde namînin. Bejnbilind û çavşîn bû. Ciwaneke wisa bû ku mirov qîmîş nedikir lê binêre."*



## RAMAZAN BARAN
**Amed, Licê**
23 salî

Di **7'ê P4şpera 2014'an** de, ji bo 'kalekol'ên ku wê li Licê werin çêkirin, çalakîyên nobetgirtinê û protestokirinê tên kirin. Gava çalakîya nobetgirtinê tê kirin, gule li wan tê reşandin û tê kuştin.

*"Ramazan, ciwanekî aram bû. Pir aram bû. Derdora wî pir jê hez dikir. Gava zarok bû tim li kuçeyê bû. Li derve pir dilîst. Di wî emrê xwe de dişixulî jî. Carinan dendik difirotin, carinan sol boyax dikirin. Zarokekî mînakî bû. Ji fîlmên Yılmaz Güney hez dikirin, qeydên fîlman dianîn malê. Me bi hev re temaşe dikirin. Alîgirê Galatasarayê bû."*



## MEHDİ TAŞKIN
**Amed, Licê**
23 salî

Di **19'ê Tebaxa 2014'an** de, li bajaroka Licê ya Amedê, piştî ku biryar hat dayîn ku peykera Mahsum Korkmaz ji şûna xwe were hildan, gelê Licê, li şûna peykerê dest bi çalakîya nobetgirtinê dike. Mehdi jî diçe wê derê û gava ku li bin peykerê ye gule tê berdan, yek li wî dikeve û tê kuştin.

*"Mehdi biçûkê malê bû. Gava pir biçûk bû bavê wî mir. Bêbav mezin bû. Gava lîse dixwend, dev ji dibistanê berda û çû li aşxaneyê şixulî. Ciwanekî pir bi meraq bû. Têkilîyên wî bi malbata wî re, bi hevalên wî re pir baş bû. Xeyalên Mehdi hebûn. Wî xeyal dikir ku di siberojê de malek ji xwe re dayne û ji bo wê jî amadekarîya wê dikir. Ji bo mala xwe gelek eşya û têkber kirîbûn û pere dabûn hev. Gustîlên nîşanîya xwe jî kirîbûn. Amadekarî ji bo zewacê dikir."*



## ABDULKERİM SEYHAN

**Mêrdîn, Kerboran**

26 salî

Di **9'ê Cotmeha 2014'an** de, dema bûyerên protestokirina Kobanîyê tên kirin, du ciwan li Kerborana Mêrdînê tên kuştin û di merasîma cenazeyê wan de, gule li girseyê tên reşandin û Abdulkerim di wê gulereşandanê de tê kuştin.

*"Abdulkerim, piştî ku ji dibistana seretayî derçû êdî neçû dibistanê. Li karxaneya malbatê dişixulî. Mirovekî aram û di hal û hemdê xwe de bû. Ji çîyayan hez dikir. Piştî kar, diçû li çîya û banîyan digerîya û li xwezayê dima. Yekî jêhatî bû. Xwarin nedişikandin lê herî pir ji xwarinên bigoşt hez dikirin. Abdulkerim, zarokekî dilpak bû. Abdulkerim mirovekî pir qenc bû. Zarok bû, biçûk bû... me ew xweyî kir, me ew mezin kir, me wekî çavê xwe xweytî lê kir... Ew hatin û wan ew ji me stend."*



## ROJHAT ÖZDEL

**Culemêrg, Gever**

16 salî

Di **6'ê Berfanbara 2014'an** de, ji bo bibîranîna salvegera kuştina Bêmal Tokçu (25) meşek tê lidarxistin ku ew jî salek berê di protestokirinên rûxandina goran de Mehmet İşbilir (35) û Veysel İşbilir de hatibû kuştin. Rojhat Özdel, di vê meşa bibîranîna Bêmal Tokçu de tê kuştin.

*"Rojhat, xwendina xwe ya dibistanê nedomand. Ji ber ku bavê me di girtîgehê de bû, berpirs bû ku bişixule û malbata xwe xweyî bike. Di firinekê de dişixulî. Yekî henekbaz, rûken, şên û kêfxweş bû. Bi berpirsîyên xwe dizanibû. Li malê, tim bi dêya me re henek dikirin û dikenîya. Gava serê xwe dişûşt jî stran guhdarî dikirin û bi dengekî hêlî stran digotin. Xweytî li çand û zimanê xwe dikir. Ji strana Mem Ararat a bi navê "Zana û Andok"ê hez dikir. Bavê min erebeyeke nû kirîbû. Bavê min ket hepsê, em biçûk bûn. Diçû erebe ji ber derîyê xalê min digirt, ew stran dida serê, li hemû taxê digerîya û bi her kesî dida guhdarîkirin."*



## NİHAT KAZANHAN

**Şirnex, Cizîr**

12 salî

Di **14'ê Rêbendana 2015'an** de, gava ji dibistanê vedigerîya malê, ji ber ku dêya wî ne li malê ye, li paş mala wan, bi hevalên xwe re lîstikan dilîze. Wê rojê, li bajarokê tu bûyer, xwenîşandana protestokirinê tune. Di wê gavê de, hêzên ewlehîyê agir dikin û fîşeka gazê lê dikeve û tê kuştin.

*"Nihat diçû dibistana seretayî. Di xwendina xwe de serkeftî bû. Di tekane roja aram a Cizîrê de, gava li kuçeyê lîstik dilîst, derba fîşeka gazê lê dan û hat kuştin."*

# ÇAVKANÎ

Adanır, B. (13.01.2016). Cengiz Erdem, Abisinin Yanına Defnedildi. *Bianet*. https://bianet.org/haber/cengiz-erdem-abisinin-yanina-defnedildi-171067

Ahiska, M. (2011). "Monsters that remember: Tracing the story of the Workers' Monument in Tophane, stenbol." *New Perspectives on Turkey* 45: 9-47.

Akın, R.J. & Danışman, F. (2011). *Bildiğin Gibi Değil. 90'larda Güneydoğu'da Çocuk Olmak*. stenbol: Metis Yayınları.

Alpkaya, G., Ataktürk Sevimli, E., Ballıktaş Bingöllü, B., Çiftçioğlu, K., Gebeş, M. & Yavan, D. (Eds.). *Dava İzleme: Duruşma Salonunda Devlet ve Yurttaş*. stenbol: Hafıza Merkezi.

Altay, M. E. (8.02.2016) "Cizre'de bodrum kat karanlığı; ilk günden bugüne neler yaşandı?" *T24 İnternet Gazetesi*. https://t24.com.tr/haber/cizrede-bodrum-kat-karanligi-ilk-gunden-bugune-neler-yasandi,327392

Alıcı, N. (2024). "Learning from Civil Society Actors in Turkey: Using Transitional Justice in an Ongoing Conflict." *International Journal of Transitional Justice* 18(2): 250-266.

Alıcı, N. (2025). Transitional Justice and the Kurdish Conflict: A Grassroots Approach. London: Routledge.

Andiç, J. & Pasta, F. (2025). *Diyarbakır Etrafında Bağlar Var: 1980-90'larda Zorunlu Kentleşmenin İzini Sürmek*. stenbol: Hafıza Merkezi.

Aslan, S. (2009). "Incoherent State: The Controversy over Kurdish Naming in Turkey." *European Journal of Turkish Studies* 10.

Ataktürk Sevimli E., Kılıç, E., Zeren, G., Gebeş, M. & Zıngıl, Ö. (2021). *1990'lı Yıllardaki Ağır İnsan Hakları İhlallerinde Cezasızlık Sorunu: Kovuşturma Süreci*. stenbol: Hafıza Merkezi.

Ataktürk Sevimli E., Kılıç E., Özcan İ., Yaşar E. & Zıngıl, Ö. (2025). *Güvenlik Gölgesinde Hukuk: Kürt İllerinde Çocuk ve Gençlere Yönelik Yaşam Hakkı İhlalleri (2000-2015)*. stenbol: Hafıza Merkezi.

Atalay, C., Aytemur, G. & Zeren, G. (2019). "The Use of Blood Money in the Establishment of Non-Justice: Necrodomination and Resistance." In Bargu, B. (Ed.). *Turkey's necropolitical laboratory: Democracy, violence and resistance*, 160-186. Edinburg: Edinburgh University Press.

Aydın, D. (2017). *Cemeteries and Memorials. Violence, Death and Mourning in Kurdish Society*. Teza lîsansa bilind ya ku nehatiye weşandin. Sabancı Üniversitesi.

Baydemir, R. (2015). *Anıt ve Heykellerin İdeolojik Mesajları ve Toplumsal Algılar: Diyarbakır Örneği*. Teza lîsansa bilind ya ku nehatiye weşandin. Gaziantep Üniversitesi.

Biner, Ö. Z. & Biner Ö. (2019). *Beklerken. Zamanın Bilgisi ve Öznenin Dönüşümü*. stenbol: İletişim Yayınları.

Bozçalı, F. (2014). "Hukuki-Maddi bir kategori olarak sınır: Türkiye-İran sınırında kaçakçılık, mahkeme süreçleri ve sınırın 'resmi' temsilleri." *Toplum ve Bilim* 131: 135-162.

Bozçalı, F. (2019). “Money for life: Border killings, compensation claims and life-money conversions in Turkey’s Kurdish borderlands.” In Bargu, B. (Ed.). *Turkey’s necropolitical laboratory: Democracy, violence and resistance*, 187-208. Edinburg: Edinburgh University Press.

Çağlayan, H., Özar, Ş. & Tepe Doğan, A. (2011). *Ne Değişti? Kürt Kadınlarının Zorunlu Göç Deneyimi*. Enqere: Ayizi Kitap.

Çelik, A. (2018). From homicide to memorycide: The cultural revolution in Amed which led to the decimation of Sur. *The Region*. https://www.academia.edu/36187349/From_homicide_to_memorycide_The_cultural_revolution_in_Amed_which_led_to_the_decimation_of_Sur

Çelik, A. (2019). “Challenging state borders: Smuggling as Kurdish infra-politics during ‘the years of silence’.” In Drechslova, L. & Çelik, A. (Eds.). *Kurds in Turkey: Ethnographies of Heterogeneous Experiences*, 159-184. Lexington Books.

Çelik, A. (2020). The Armenian genocide in the Kurdish collective memory. *Middle East Research and Information Project*. August 19. https://www.merip.org/2020/08/the-armenian-genocide-in-kurdish-collective-memory-295/

Çelik, A. (2021). “Geçmeyen bir geçmişle yüzleşmenin zorlukları: Ermeni Soykırımı ve Kürt müdahil öznelliğinin dönüşümü.” *Birikim* 398: 34-52.

Çelik, A. (2025). *Cent ans plus tard, les Kurdes au bord de la survie / Dans la Turquie d’Erdogan, l’arme judiciaire au service du négationnisme d’État ?*. Paris: Collection “Imprimés AOC”.

Çelik A. & Dinç N. K. (2018). *Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbakır*. Diyabakır: Zan Vakfı Yayınları.

Çiçek, C. (2012). *Küreselleşme ve Yerel Demokrasi Liberal Katılım Söyleminin Sınırları Diyarbakır Örneği*. Amed: Weşanxaneyê Vateyî.

Çiçek, C. & Coşkun, V. (2016). *Dolmabahçe’den günümüze çözüm süreci: Başarısızlığı Anlamak ve yeni bir yol bulmak*. Enqere: Barış Vakfı.

Çocuk da olsa ‘gereği’yapılacak!. (31.03.2006). *Evrensel*. https://www.evrensel.net/haber/169942/cocuk-da-olsa-geregi-yapilacak

Clamp, K. (2014). *Restorative Justice in Transition*. London: Routledge.

Clamp, K. (der) (2016). *Restorative Justice in Transitional Settings*. London: Routledge.

Clark, P. (2014). “Bringing the peasants back in, again: state power and local agency in Rwanda’s *gacaca* courts.” *Journal of Eastern African Studies* 8(2): 193-213.

Darici, H. & Hakyemez, S. (2019). “Neither civilian, nor combatant: Weaponised spaces and spatialised bodies in Cizre.” In Bargu, B. (Ed.), *Turkey’s Necropolitical Laboratory: Democracy, Violence and Resistance*, 71-94. Edinburgh University Press.

de Greiff, P. (2006). “Justice and Reparations.” In de Greiff, P. (Ed.), *The Handbook of Reparations*, 451-477. Oxford: Oxford University Press.

Dinç, N. K. (1997). *Göç Hikayeleri. Acıyı Gören İnsan Başkasını Acıtmaz*. Stenbol: Göç-Der.

Diyarbakır Barosu Çocuk Hakları Merkezi. (2018). *Zırhlı Araç, Mayın ve Çatışma - Savaş Atığı Kaynaklı Çocuk Hakkı İhlaller*. Diyarbakır: Diyarbakır Barosu. https://www.diyarbakirbarosu.org.tr/public/uploads/document/turkce-1659448143.pdf

Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştirmalar Enstitüsü. (2018). Çocukların Travmalarıyla Baş Etme: Çatışma Sürecinde Psiko-sosyal Destek, Sur ve Bağlar Örneği, Diyarbakır: DİSA Yayınları.

Engle, K. (Ed.) (2016). *Anti-Impunity and the human rights agenda*. Cambridge University Press.

Epli, E. & Yaşar, E. (2024). "2006-2011: Demokratikleşme Söyleminden Otoriter Yönetime Doğru." In Ataktürk Sevimli, E. *Değişen Yasa, Değişmeyen Baskı: 1980'den Bugüne Terörle Mücadele Mevzuatı*, 152-196. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Ergin, E. & Koman, E. (2021). *Taş, Kâğıt, Makas: Çatışma Dönemlerinde Çocuklara Yönelik Psikososyal Destekte Sanatın Rolü*. ***Stenbol***: Anadolu Kültür.

Foucault, M. (1997). *Il faut défendre la société: Cours au Collège de France*. Paris: Seuil.

Fraser, N. (1990). "Rethinking the public sphere: A contribution to the critique of actually existing democracy." *Social Text* 25/26: 56-80.

Gambetti, Z. (2005). "The Conflictual (Trans)formation of the Public Sphere in Urban Space: The Case of Diyarbakır." *New Perspectives on Turkey* 32: 43-71.

Gambetti, Z. (2010). "Decolonizing Diyarbakir: Culture, Identity and the Struggle to Appropriate Urban Space." In Asdar, K. Ali & Rieker, M. (Eds.), *Comparing Cities: The Middle East and South Asia*, 95-127. Oxford: Oxford University Press.

Gayer, L. (2014). "Ni guerre, ni paix: guerres sans fin(s) ou désordres ordonnés?" In Badie, B. & Vidal, D. (Eds.), *Nouvelles guerres. L'état du monde 2015*, 54-67. Paris: Éditions La Découverte.

Genç-İMO üyeleri futbol turnuvası düzenledi. (11.04.2013). *TMMOB İnşaat Mühendisleri Odası*. https://diyarbakir.imo.org.tr/TR,37415/genc-imo-uyeleri-futbol-turnuvasi-duzenledi.html

Göral, Ö.S. (2019). "İmkansız bir Talep olarak Adaleti Beklemek: Kaybedilenler ve Yakınları." In Biner, Z. Ö. & Biner, Ö. (Eds.) *Beklerken: Zamanın Bilgisi ve Öznenin Dönüşümü*, 45-87. İstanbul: İletişim Yayınları.

Gready, P. & Robins, S. (Eds.). (2019). *From Transitional to Transformative Justice*. Cambridge: Cambridge University Press.

Günay, O. (2009). *Political debt and development discourse. Translating incommensurable worlds in Diyarbakır*. Teza lîsansa bilind ya ku nehatiye weşandin. Boğaziçi Üniversitesi, Stenbol.

Has, Ö. (2023). "Tek Cumhuriyet, İkili Devlet." In Işık, A., Kılıçaslan, G., Hiroğlu, B., Sağır, K. & Kurt, Ç. (Eds.), *Kürtler ve Cumhuriyet*, 435–444. Enqere: Dipnot Yayınları.

Heinrich Böll Stiftung Derneği. (2013). *Kürt Meselesinin Çözümüne İlişkin Algılar, Aktörler ve Süreç*. https://tr.boell.org/sites/default/files/kurt_meselesinin_cozumune_iliskin_algilar-aktorler_ve_surec.pdf

Human Rights Watch. (2007). *Türkiye: Temmuz ayındaki Genel Seçimlere doğru İnsan Hakları Konusundaki Kaygılar*. https://www.hrw.org/legacy/backgrounder/eca/turkey0707/turkey0707tuweb.pdf

İnsan Hakları Derneği. (2003). Mayın ve Sahipsiz Bomba Patlaması Sonucu Ölüm ve Yaralanmalar İHD 2003 Vaka Raporu. https://www.ihd.org.tr/images/pdf/ihd_mayin_vaka_raporu_2003.pdf.

İnsan Hakları Derneği. (2006). 28 Mart 2006 Diyarbakır Olaylarına İlişkin İnceleme Raporu. https://www.ihd.org.tr/28-mart-2006-darbakir-olaylarina-k-celeme-raporu

İnsan Hakları Derneği. (2012). Roboski Katliamı Raporu-03 Ocak 2012. https://www.ihd. org.tr/roboski-katliami-raporu-03-ocak-2012

Jongerden, J. (2008). *Türkiye'de İskan Sorunu ve Kürtler*. Amed. Weşanxaneyê Vateyî.

Karatay A., Akkan B., Çiftçi C. (2009). *ÇAÇA | Çocuklar Aynı Çatının Altında Derneği, Çocuklara Yönelik Toplum Temelli Sosyal Hizmet Modeli*. Amed: ÇAÇA.

Kaya, Ö. & Bozkurt, H. (2014). *Fotoğrafı Kaldırmak: Eşi Zorla Kaybedilen Kadınların Deneyimleri*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Kurban, D. (2012). *Reparations and displacement in Turkey: Lessons learned from the compensation law*. Brookings International Center for Transitional Justice.

Kurt, G. (2014) *Cezasızlık Sorunu: Soruşturma Süreci*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Kılıç, H. (2023). "21. Yüzyılda Devletin Dönüşümü: Güvenlik Devleti ve Türkiye Deneyimi." *Hukuk Kuramı* 8(1): 1-13.

Lévy-Aksu, N. (2025). *Dargeçit Belgeseli. Kayıplar için Adalet Arayışı*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Linhardt, D. & Moreau, C. (2013). "Ni guerre, ni paix : Dislocations de l'ordre politique et décantonnements de la guerre." *Politix* 104(4): 7-23.

Llewellyn, J. J. (2012). "Integrating Peace, Justice and Development in a Relational Approach to Peacebuilding." *Ethics and Social Welfare* 6(3): 290-302.

Llewellyn J. & Philpott, D. (Eds.) (2014). *Restorative Justice, Reconciliation and Peacebuilding*. Oxford: Oxford University Press.

McEvoy, K. & Mallinder, L. (2012). "Amnesties, Transition and Governing of Mercy." In J. Simon, & R. Sparks (Eds.), *Handbook on Punishment and Society*, 829-872. Berkeley & Edinburgh: Sage Publications.

Monitor Türkiye Raporu. (2001). Mayınsız Bir Türkiye Girişimi. http://www.mayinsizbirturkiyegirisimi.org/docs/content/97971843f0d4eb323b9895ddeb5a7745.pdf

Nocella, A. J. (2011). "An Overview of the History and Theory of Transformative Justice." *Peace & Conflict Review* 6(1): 1-10.

Öldürülen Çocuklar Anısına Öykü Yarışması. (19.07.2006). *Bianet*. https://bianet.org/haber/oldurulen-cocuklar-anisina-oyku-yarismasi-82471

Öztürk, Ö. (2019). Vatandaşların Korunması ve Duy-Der Deneyimi: Türkiye'de Mayın ve Çatışma Atıkları Sorunu. Çiçek C. Barış Mekânları. Çatışma Çözümü ve Toplumsal Barış İnşasında Sivil Toplum Kuruluşlarının Deneyimleri içinde, 129-156. Diyarbakır: DİSA.

Roboskî. İyi ki Varsın Atölye-Gençlerin ve Çocukların Fotoğraflarıyla Roboskî. (2013). Diyarbakır: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi.

Roboski Mektupları. (28.12.2012). *Bianet* . https://bianet.org/haber/roboskimektuplari-143164

Ruh Sağlığı ve Toplumsal Adalet. (2025). *Psychology Kurdî Dergisi*. Sayı 20.

Sevdiren, Ö. (2015). *Türkiye'de Cezasızlık Mevzuatı*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Sezer, D. & Çelik, A. (2021). "Yeni Bir Hatırlama Kültürüne Doğru: Sunuş." *Birikim Dergisi* 392: 6-9.

*Sosyal Kültürel Yaşam Geliştirme Derneği*. (2003). Stenbol.

Soydan, Y., Nakçi, M., & Görücü, X. (2023). *Öldürülmeselerdi Arkadaşlarımız Olacaklardı*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Tekdemir, Ö. (2016). "Radikal plüralist demokratik parti olarak HDP'nin 'başka Türkiye' önerisi: Hasım politikası, agonizm ve popülizm." *Ankara Üniversitesi SBF Dergisi* 71(4): 1236.

Türkiye İnsan Hakları Vakfı. (2019). Çatışma Dönemlerinde Çocuk Hak İhlalleri Raporu (7 Ağustos 2015-16 Ağustos 2016). Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı Yayınları. https://tihv.org.tr/wp-content/uploads/2020/04/catisma-donemlerinde-cocuk-hak-ihlalleri.pdf

Türkiye İstatistik Kurumu (TÜİK). (2000). *Genel Nüfus Sayımı*. TÜİK Nüfus İstatistikleri Portalı.

Türkiye İstatistik Kurumu (TÜİK). (2010). *Genel Nüfus Sayımı*. TÜİK Nüfus İstatistikleri Portalı.

Taşları yerinden oynatanlar: Kürt çocukları ve siyaset (2009). *Toplum ve Kuram Dergisi*. Sayı 2.

Turgut, Z. (2024). *Geç Kalan Buluşmalardan: Taş Atan Çocuklar*. Stenbol: Hafıza Merkezi.

Uçarlar, N. (2015). *Hiçbir şey yerinde değil*. Stenbol: İletişim Yayınları.

Uçarlar, N. (2023). *Bağışlama: Politik bir İmkansızlık*. DEMOS Araştırma Kolektifi.

Uğur Kaymaz'ı öldüren polisin adı üstgeçide verildi. (22.11.2016). *Dicle Haber Ajansı*. http://diclehaber.net/news/content/view/541261?page=33&from=3305028514

Umana, C. (2025). "La primera sentencia de la JEP: algunas preguntas para lo que viene." *Razon Publica*. îlon 21. https://razonpublica.com/la-primera-sentencia-la-jep-algunas-preguntas-lo-viene/

Ünlü, B. (2018). *Türklük Sözleşmesi: Oluşumu, İşleyişi ve Krizi*. Stenbol: Dipnot Yayınları.

Yıldırım, E. (2013). *Di Sedsala 20'an de Kurdistan û Sînor*. London: Weşanxaneya Azad.

Zehr, H. (2002). *The Little Book of Restorative Justice*. New York: Good Book.

**DERYA BOZARSLAN**

Di sala 2005'an de, li Zanîngeha Dîcleyê di beşa Ziman û Wêjeya Tirkî de xwendina lîsansê kuta kir. Di sala 2008'an de, li ofîsa projeyan a Yekîtîya Ewropayê ya Odeya Sanayî û Bazirganîyê ya Amedê 3 salan xebitî û di navbera salên 2011-2013'an de, li ofîsa Amedê ya Anadolu Kültürê (Çanda Anatolyayê) ya bi navê Navenda Hunerê ya Amedê, di navbera salên 2013-2022'yan de, li ofîsa Stenbolê ya Anadolu Kültürê xebitî; dîyaloga navçandan a bi rêya hunerê, xebatên ziman û wêjeyî ya Kurdî, pirtûkên zarokan, mafên zarokan û penaber û di wan programan de ku li ser zarokên li herêmên şer û pevçûnê tê meşandin, cî girt. Bozarslan, piştre di sala 2022'yan de, heqê bursa ku ji alî Martin Roth-Initiative ve ji bo birêvebirên çandê tê dayîn, wergirt ku ji alî Wezareta Karê Derveyî ya Elmanyayê ve tê destekkirin û salek li Berlînê jîya. Di vê demê de, serdana gelek gelek welatan kir ji bo ku lêkolînê li serê bike ka zarokên koçber, penaber û penaxwazan ku koçî Ewropayê dikin, mekanîzmaya desteka psîkososyal a ji bo wan çawa û bi rêya hunerê tê meşandin. Ji sala 2023'yan û bi vir ve ye, di bernameya Vebîr û Aştî ya Hafıza Merkeziyê (Navenda Vebîrê) de, li ser pêpeskirinên mafê zarokan dixebite.

**NOÉMİ LÉVY-AKSU**

Di sala 2010'an de, ji Ecole des hautes études en sciences socialesê (EHESS) li ser dîrokê bawernameya doktoraya xwe wergirt. Di navbera salên 2010-2017'an de, Di Beşa Dîrokê ya Zanîngeha Boğaziçiyê de wekî doçenta alîkar xebitî û navê xwe di gelek weşanên akademîk de belav kir. Di salên 2016-2018'an de, bi bursa British Academyê, li Fakulteya Hiqûqê ya Birkbeck Collegeyê, der heqê dîroka rewşa neasayî ya li Tirkîyeyê de vekolîn kir. Lévy-Aksu ya ku ji dîrokê derbas hiqûqê bû, di sala 2018'an de, li Londrayê Graduate Diploma in Lawê kuta kir. Di salên 2018-2019'an de, di Democratic Progress Institute ve Redress Trustê de tev li xebatên hiqûq û mafên mirovan bû. Di salên 2019-2020'î de bû bursîyera projeya Mercator Stiftung "re:constitution"ê û li Centre for Democracy and Peace Researchê (CDPR) bû koordînatora programa bipêşxistina zerengîyê ya ji bo akademîyên piştevanîyê yên li Tirkîyeyê. Di Pûşpera sala 2020'î de tev li koma Navenda Vebîrê bû. Wekî Birêvebira Programê ya Xebatên Vebîr û Aştîyê, di biwarên vebîr, edalet û ciwanan de xebatên xwe didomîne. Di navbera salên 2025-2027'an de, ew ê di nav grûpa xebatê ya "Edaleta dema têperînê û edaleta sarêjker" de ku li Forûma Edaleta Sarêjker a Ewropayê ye, li ser ranêzikîyên edaleta nûxwaz û veguherîner xebatên xwe bidomîne.

**ADNAN ÇELİK**

Di sala 2018'an de, li Dibistana Vekolînên Bilind a Zanistên Sosyal a li Parîsê (École des hautes études en sciences sociales, EHESS), di biwara Antropolojîyê de bawernameya xwe ya doktorayê wergirt û ji sala 2024'an û bi vir ve ye, li heman zanîngehê wekî doçent dixebite. Pirtûka bi navê *Dans l'ombre de l'État: Kurdes contre Kurdes* (Li Ber Sîya Dewletê: Kurd Li Dijî Kurdan, Brepols, 2021) nivîsî. Digel Namık Kemal Dinç, Yüz Yıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbekir (Axîna Sed Salî! Li Ser Şopa Vebîra Komalî 1915 Diyarbekir) (İBV, 2015) û bi M. Novelli, B. Kutan, P. Kane, T. Pherali ve S. Benjamin re pirtûkên bi navê *Laboratories of Learning: Social Movements, Education and Knowledge-Making in the Global South* (Laboratuwarên Hînbûnê: Tevgerên Komalî yên Li Başûrê Kurewî, Perwerde û Hilberandina Zanînê, Pluto, 2024) nivîsî. Her wiha, bi Lucie Drechselová re, edîtorîya pirtûka bi navê *Kurds in Turkey: Ethnographies of Heterogeneous Experiences* (Kurd Li Tirkîyeyê: Etnografyaya Azmûnên Di Nav Pirrengîyê De, Lexington Books, 2019) kir. Vekolanên wî, mijarên wekî tundîya polîtîk, rejîmên vebîrê û aktîvîzma wêdetirî neteweyê dixe navenda xwe.

© Hakikat Adalet Hafıza Merkezi, 2025

Ev rapor, berhema vekolana sê salan a bi navê Edalet Sarêj Dike a Navenda Vebîrê ye. Vekolan, bi ranêzikîyeke navdîsîplînî, li ser pêpeskirinên mafê jîyanê hûr dibe ku di navbera salên 2000'î û 2015'an de, li bajarên Kurdan û li dijî zarok û ciwanan hat bicîanîn.

Ev xebat, wekî berdewama xebatên Navenda Vebîrê ye ku der heqê salên 1990'î de hatibû kirin; digel wê jî, xebata di destê we de, vekolanê li serê dike ka pêpeskirinên mafê jîyanê û bicezanekirinên di navbera salên 2000-2015'an de li bajarên Kurdan hatî pêkanîn, çawa veguherîye û berdewam kiriye. Digel wê jî, hewlê dide da ku dayne rastê ka lêgerîna bo edaletê, aştîyê û sarêjkirinê, ji alî wan kesan ve ku pêpeskirinên mafan li wan hatiye qewimandin, çawa tê vegotin û xeyalên li ser vê yekê çawa tên kirin. Xebat me vedixwîne ji bo ku em cihêtîya di navbera edaleta bicezaker û edaleta sarêjker de heyî bidin ber pirsyarîyan û em hewla famkirinê bidin û bêjin; gava edalet were avakirin, wê ev ranêzikî, ji alî kes û civakan ve, çawa karibin hev temam bikin û bi roleke veguherîner rabin.

Ev xebat, di demeke wisa de hat kirin ku asoya edaleta qonaxa têper kêm bû an jî ximamî bû; loma jî, xebata di destê we de, balê dibe ser giringîya berdewamkirina têkoşîna pirhêlî ya bo edaletê ku bandorê hem li îrorojê hem jî li siberojê dike û newekhevîyên avanîyî û teweqên tundîyê jî li xwe digire.